



DI ÇARÇOVEYA
KÊŞEYA
KURDÎ Û
AŞTIYA SIYASÎ
DE
PARKIRINA
HÊZÊ Û
NENAVENDÎTÎ

CUMA ÇÎÇEK

**DI ÇARÇOVEYA KÊŞEYA KURDÎ
Û AŞTIYA SIYASÎ DE**

**PARKIRINA HÊZÊ Û
NENAVENDÎTÎ**

CUMA ÇÎÇEK

WERGERA JI TIRKÎ: ZANA FARQÎNÎ

HAKİKAT ADALET HAFIZA MERKEZİ

HAFIZA MERKEZİ



HAKİKAT ADALET HAFIZA MERKEZİ

Ömer Avni Mahallesi

İnönü Caddesi Akar Palas No:14 Kat:1

Beyoğlu, 34427, İstanbul

T: +90 212 243 32 27

info@hafiza-merkezi.org

www.hakikatadalethafiza.org

NİVİSKAR

Cuma Çiçek

WERGÊR

Zana Farqînî

DÎZAYN

Ekîn Sanaç

© Hakikat Adalet Hafıza Çalışmaları
Derneği Yayınları (Truth Justice and
Memory Studies Association
Publications) 2022



Hafıza Merkezi spasiyê li Olof Palme
International Centerê dike ji bo alikariya wan a
bo çapkirina vê reportê.



SIGRID RAUSING TRUST

Em spasiyê li Weqfa Oakê û li Weqfa the Sigrid
Rausing Trustê dikin bo alikariya wan a ku li
saziyê kirine.

KURTEBÊJE	6
KURTEYA BIRÊVEBER	7
DESTPÊK	11
1. PARKIRINA HÊZÊ Û NENAVENTÎTÎ: DESTPÊKEKE TEORÎK Û DÎROKÎ	14
Çarçoveyên Nîqaşên Têkildarî Nenavendîtiyê	16
Konteksta dîrokî û siyasî	17
Teoriyên demokrasiyê û nenavendîtî	18
Meseleya geşepêdanê û nenavendîtî	20
Modernîzasyon û rasyonelîzasyona birêvebirina gelemper û nenavendîtî	21
Polîtîkayên neolîberal, veguherîna dewletê û nîqaşên li ser nenavendîtiyê	22
Çareseriya lihevxiştinê û ji bo avakirina aştîyê nenavendîtî	24
Li Tirkiyeyê Nenavendîtî: Paşxaneyê Dîrokî	28
Polîtîkayên navendîbûnê yê osmanî û serhildanên kurdan ên pêşî	29
Nîqaşên li ser xweseriyê yê berî Komarê û Makeqanûna 1921ê	30
Avabûna Komarê û bi Makeqanûna 1924'an avakirina birêvebirina rasterast	35
Derbasbûna li sistema pirpartîtîyê, geşepêdan û "Meseleya Rojhilat"	37
Makeqanûna 1982'yan, neolîberalîzm û veguherîna birêvebirinê cihkî	39
Şertê Xweseriya Birêvebirinê Cihkî yê Ewrûpayê	41
Salên 90'î: Nîqaşên li ser federasyon û modela Baskê	42
Kurdistan: Herêma taybetî/xweser a dewletê	44
2. PÊVAJOYA ÇARESERİYÊ 2013-2015 Û NENAVENTÎTÎ	48
Pêvajoya Îmraliyê (1999-2004) û Teza "Komara Demokratîk"	51
Şikestina yekem a jeopolîtîk: Li Iraqê damezirîna dewleta kurdî ya federe	52
Teşebusa AK Partiyê ya reforma birêvebirina gelemper (2003-2007)	55
Yekeyên herêma statîstîkî û ajansên geşepêdanê	57
Pêvajoya Osloyê (2008-2011) û Nîqaşên Li Ser Xweseriya Demokratîk	59
Reform: Ji bo çareseriya kêşeya kurdî demokrasî û mafên çandî	59
Xweseriya demokratîk an jî nenavendîtiya herêmî	61
Gelo modela Îtalya yan jî Spanyayê?	63
Nediyariyên xweseriya demokratîk	64
Helwesta mixalefetê	66
Pêvajoya Çareseriyê (2013-2015), Demokrasiya Cihkî û Li Rojava Xweseriya Demokratîk	68
Helwestên nakokdar ên aktorên siyasî yê kurdî	69
Azadiya derbirinê ya AK Partiyê û polîtîkayên wê yê ku di mafên çandî de asê bûne	77
CHP: Ji aştîya civakî re belê, ji Pêvajoya Çareseriyê re na	80
Bandora rabêjiya MHP'yê ya li ser derdora çep û sosyalîstan	81
Şikestina duyem a jeopolîtîk: Li Rojava damezirîna "Xweseriya Demokratîk"	82

3. JI PÊVAJOYA ÇARESERYÊ HETA ÎROJ: RESANTRALÎZASYON Û DEKONSANTRASYON	89
Îlanên Xwebirêvebirinê û Lihevixistinên li Bajaran	90
Teşebusa Derbeya 15'ê Tîrmehê, Rewşa Neasayî û Tayînkirina Qeyûman	93
Sîstema Serokatîyê ya Xweserî Tirkî û Vegerîna li Otorîteriyê	96
Şikestinên Jeopolîtîk: Rojava û Hêrêma Kurdistanê ya Iraqê	100
Rojava: Cihê lihevixistinê yê nû	100
Herêma Kurdistanê ya Iraqê û referandûma serxwebûnê	102
Jeopolîtîka Kurdistanê û zêdebûna endîşeya Tirkîyeyê ya ji ber beqayê	104
4. PARKIRINA HÊZÊ Û NENAVENDÎTÎ: ASTENG, DERFET Û VEBIJÊRK	108
Endîşeya ewlehiyê ya dîrokî û rabêjiya beqayê	109
Nerîta dewlet û siyaseta zêde navendîparêz	109
Newekheviya herêmî û navendîbûna/kombûna kanên aborî	110
Sîbera kêşeya kurdî ya li ser birêvebirina nenavendîtiyê	112
Di avakirina rejîma otorîter de amrazîkirina kêşeya kurdî	112
Derfet, Çavkanî û Firsend	115
Civariya dîrokî ya der barê nenavendîtiyê de	116
Azmûna birêvebirina cihkî û herêmî	116
Teşebusên reformên birêvebirina gelemper	116
Firsenda îdareyeke gelemper a modern û rasyonel	118
Nexşeya siyasî ya Tirkîyeyê û pêwîstiya birêvebirina nenavendîtiyê	120
Wek hêzeke teraz û pişkinanê birêvebirinê cihkî	122
Mitebeqata siyasî ya der barê xurtkirina birêvebirinê cihkî de	123
Firsenda bipêşketina giştgir û mekanî ya terazdar	118
Nenavendîti: Ji Aştiya Kurdî Zêdetir	125
Ji bo bidawîhatina lihevixistina kurdî nenavendîtiya îdarî	125
Ji bo çareseriyê seqamgir û giştgir herêmên/wilayetên xweser	126
Piştî nenavendîtiyê: Cihêbûn an jî avakirina dahatûya hevpar?	131
LÎ ŞÛNA ENCAMÊ	133
VESER: Pîvaneyên ku Dikarin Ji bo Diyarkirina Yekeyên Birêvebirina Herêmî Bê Bikaranîn	135
VESER 1. Cografya û Jîngeh: 26 Kûranên Çeman ên Tirkîyeyê	135
VESER 2. Nerîta Dîrokî: Sîstema Wilayetên Osmanî	136
VESER 3. Fonksiyonî: Herêmên Fonksiyonî	138
VESER 4. Bipêşketina Sosyo-ekonomîk: Senifandina Yekeyên Herêma Statîstîkî	139
VESER 5. Civariya Îdarî: Veavabûna Herêmî ya Saziyên Gelemper û Sektora Taybetî	140
VESER 6. Metropolbûn: 30 Bajarên Mezin	141
ÇAVKANÎ	142

Kurtebêje

- AK Partî:** Partiya Dad û Geşepêdanê (*Adalet ve Kalkınma Partisi - AK Parti*)
- ANS:** Artêşa Neteweyî ya Sûriyeyê
- ASA:** Artêşa Sûriyeya Azad
- BDP:** Partiya Aştî û Demokrasiyê (*Barış ve Demokrasi Partisi*)
- BHQ:** Biryarnameyên bi Hikumê Qanûnê (*Kanun Hükümünde Kararname- KHK*)
- CHP:** Partiya Komarê ya Gel (*Cumhuriyet Halk Partisi*)
- CIU:** Lihevnezbûn û Yekîti (*Convergencia i Unio*)
- DAÎŞ:** Dewleta Îslamê ya Iraq û Şamê
- DBP:** Partiya Herêmên Demokratîk (*Demokratik Bölgeler Partisi*)
- DTP:** Partiya Civaka Demokratîk (*Demokratik Toplum Partisi*)
- DYA:** Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê
- GAP:** Projeya Başûrê Rojhilatê Anadolîyê (*Geneydoğu Anadolu Projesi*)
- HDP:** Partiya Gelen a Demokratîk (*Halkların Demokratik Partisi*)
- HKI:** Herêma Kurdistanê ya Iraqê
- HSD:** Hêzên Sûriyeya Demokratîk
- HUDAPAR:** Partiya Daweya Hur (*Hür Dava Partisi*)
- IMF:** Fona Pereyan a Navneteweyî (*International Monetary Fund*)
- ÎTC:** Cemiyeta Îttihad û Tereqiyê (*İttihat ve Terakki Cemiyeti*)
- KCD:** Kongreya Civaka Demokratîk (*Demokratik Toplum Kongresi -DTK*)
- KCK:** Koma Civakên Kurdistanê
- KKP:** Partiya Komünîst a Kurdistanê (*Kürdistan Komünist Partisi*)
- MHP:** Partiya Tevgera Neteweperest (*Milliyetçi Hareket Partisi*)
- MÎT:** Rêxistina Saloxgeriya Neteweyî (*Millî İstihbarat Teşkilatı*)
- NY:** Neteweyên Yekbûyî
- OECD:** Rêxistina Hekariya Aborî û Geşepêdanê (*Organization for Economic Co-Operation and Development*)
- ÖSP:** Partiya Azadî û Sosyalîzmê (*Özgürlük ve Sosyalizm Partisi*)
- PAK:** Partiya Azadiya Kurdistanê
- PAKURD:** Partiya Kurdistanî (*Kürdistanî Parti*)
- Partiya Azadî:** Ji bo Edalet, Bawerî û Azadiyê Partiya Azadî (*Adalet İnanç ve Hürriyet İçin Özgürlük Partisi*)
- PDK- Bakur:** Partiya Demokrat a Kurdistanê - Bakur
- PDK-T:** Partiya Demokrat a Kurdistanê -Tirkiye
- PKK:** Partiya Karkerên Kurdistanê
- PP:** Partiya Gel (*Partido Popular*)
- PSK:** Partiya Sosyalîst a Kurdistanê
- PSOE:** Partiya Sosyalîst a Karkerên Spanî (*Partido Socialista Obrero Español*)
- PYD:** Partiya Yekîtiya Demokratîk
- RN:** Rewşa Neasayî
- RPD:** Rêxistina Palansaziye ya Dewletê (*Devlet Planlama Teşkilatı - DPT*)
- SYHS:** Senifandina Yekeyên Herêma Statîstîkî (İBBS; İstatistikî Bölge Birimleri Sınıflandırması)
- YE:** Yekîtiya Ewrûpayê
- YPG:** Yekîneyên Parastina Gel
- YPJ:** Yekîneyên Parastina Jin

Kurteya Birêveber

Ev lêkolîn di çarçoveya kêşeya kurdî de, aştîya siyasî û mijara parkirina hêzê hildide dest. Li dora pirsên “gelo ji aliyê konteksta parkirina hêzê ve nenavendîtî dikare ji bo kêşeya kurdî ya Tirkîyeyê aştîya siyasî pêk bîne” û “nenavendîtî ji kêşeya kurdî wêdetir çi wehd dike”, derfet û sînorên nenavendîtîyê, Pêvajoya Çareseriyê û rewşa piştî wê ji xwe re dike navend û nîqaş dike.

Nîqaşên ku li ser bûyerên li dem û cihên cuda qewimîne tên kirin, didin nîşandan ku der barê parkirina hêza siyasî û mijara birêvebirina nenavendîtîyê (desantralîzasyonê) de, şeş dînamîk diyarker in: (1) Kevneşopiya dîrokî û siyasî ya welatê eleqedar ku rasterast rêxistinbûna dewletê diyar dike û têkiliyên hêzê/desthilatê dişewîne. (2) Meseleya nenavendîtîyê ku rasterast bi texeyula demokrasiya li welêt û bi tecrübeyê re eleqedar e. (3) Meseleya nenavendîtîyê ne tenê bi dameziraweya siyasetê re û pê re eleqedar bi rêxistinbûna dewletê re sînorkirî ye, lê newekheviyên di navbera cihkî (mehelî) û herêmî de, parkirina kanan/çavkaniyan û daxwazên geşepêdanê jî li xwe digire. (4) Bi qasî rehendên (demokratbûyîna) siyasî û (geşepêdana) aborî yên li ser nîqaşên nenavendîtîyê, hebûna rehendên sazûmanî/îdarî. (5) Wekî ku polîtîkayên neolîberal ên piştî 1980'yî û nîqaşên li ser veguherîna dewletê nîşan didin, meseleya nenavendîtîyê bi têkiliyên hêzê yên di navbera navend û cihkî de, ne sînorkirî ye. Ji ber ku rehendên siyasî, îdarî, aborî, cihî, civakî jî digire nav xwe. (6) Parkirina hêzê/desthilatê û nenavendîtî, di warê çareserkirina lêkdanên rajêr-dewlet (*intra-state*) û avakirina aştîyê de, xwedî giringiyê ne.

Gava li nîqaşên li Tirkîyeyê bê nihartin, tê dîtin ku ev her şeş mijarên hanê, bi temamî derbasdar in. Di encama polîtîkayên ku di çarçoveya modernbûna osmanî de hatine rojevê, di nivê pêşîn ê sedsala 19'an de bi hejmareke zêde mîrekî û hikûmetên kurdan hatin tesfîyekirin. Meseleya nenavendîtîyê ku di dewrên dawî yên osmanî de cardin hatiye rojevê û nemaze di salên 1918-1923'yan de berbiçav bûye û vebeyiyaya Makeqanûna 1921ê, bi avabûna Komarê û Makeqanûna 1924'an re bi rêjeyeke mezin ji rojevê rabû. Meseleya nenavendîtîyê ku bi avabûna Komarê hatibû girtin, bi mehneya rast li salên 1990'î di konteksta çareseriyaya lihevxiştina kurdî de hat rojevê. Di nîqaşên li ser federasyon, eyalet, modela Baskê/ya Spanyayê de, çendî cext li ser geşepêdana aborî û rasyonelîzasyona birêxistinbûna dewletê hatibe kirin jî, lê dînamîka sereke lêgerîna li ser çareseriyaya lihevxiştina kurdî bû.

Di bîst salên dawî de, ji bo çareseriyaya kêşeya kurdî pêvajoya sê diyalogên mezin li dar ket: Pêvajoya Îmraliyê 1999-2004, Pêvajoya Osloyê 2008-2011 û Pêvajoya Çareseriyê

2013-2015. Her sê teşebus jî bi awayekî neserkeftî bi encam bûn. Di vê dema hanê de, di xeta Ocalan, PKK/KCK û DBP-HDPê de daxwazên guherbar hatin derbirin. Pêşniyazên ku di çarçoveya têgihên wekî komara demokratîk, xweseriya demokratîk û demokrasiya cihkî de hatin formulekirin, ji çapana cihkî ya nenavendîbûna îdarî heta bi ya navedîtîya siyasî û îdarî ya herêmî li xwe vedihewandin. Mixalefeta kurdî ya li derveyî DBP-HDPê, bi piranî daxwaza federasyonê kir. Di gel vê yekê, destek neda teza “komara demokratîk” a ku parkirina hêzê li xwe nedigirt, lê destek da pêşniyaza xweseriyê ku wek çareseriyeye navberê, vê yekê dikaribû “çareseriya nihayî” ya kêşeya kurdî hêsan bikira.

AK Partiyê¹ ji 2002'yan bi vir de, bi awayekî xuya, siyaseteke bîstiqrar meşand û daxwazên xweseriyê ku dibe ew bihatina wateya nenavendîtiya siyasî, destek nekirin. Di gel vê, di çarçoveya berfirehiya rayeyê de, deverîbûyîn û xurtkirina birêvebirinên cihkî parastin. Jixwe reformên ku di salên 2000î de hatin kirin, di çarçoveya berfirehiya vê rayeyê de, bi şeweya dekonsantrasyonê pêk hatin, ku kapasîteya îdarefî ya birêvebirina navendî li bajar û bajarokan mezin dikir.

CHP û komên civakî yên ku wê ew temsîl dikirin, heta Pêvajoya Çareseriyê ya 2013-2015'an, ji aliyekî ve li dijî pêvajoyên diyalog û mizakereyan radibû, ji aliyê din ve jî li dijî hemû teşebusên din radibû ku dibe vê yekê deriyek eleqedarî nenavendîtiyê vekira. Di Pêvajoya Çareseriyê ya 2013-2015'an de, ku CHPê mixalefeta xwe nerm kiribû, Şertê Xweseriya Birêvebirinên Cihkî yê Ewrûpayê bi temamî pejirand û xurtkirina xweserîtiya îdareyên cihkî parast. Bi awayekî giştî MHP jî, bi şeweyeke bîstiqrar li dijî hemû teşebusên ji bo çareseriya kêşeya kurdî rabû. Wê, teşebusên sînordar jî wek teşebusên “Sevrê” nirxandin.

Tevî salên 2000î, jeopolîtîk bû xwedî dînamîka sereke ya diyarker ku kêşeya kurdî ya Tirkiyeyê “çarçove dikir.” Avakirina serweriyeye kurdî ya terîtoryal a li Herêma Kurdistana Iraqê (HKI), di kêşeya kurdî de “xaleke referansê” çêkir û hem ji bo siyaseta kurdî hem jî ji bo dewleta tirkî û siyaseta wê parametreyên kêşeyê guherandin. Di sala 2012'an de li Rojava avakirina herêmeke *de facto* ya otonom/federe tesîra şikestina duyem a jeopolîtîk pêk anî. Di gel vê yekê, bandora Rojava ji ya HKI'yê hîn xurttir çêbû.

Piştî dewra Pêvajoya Çareseriyê ya 2013-2015'an ku bi awayekî neserkeftî bi encam bû, di warê mijara parkirina hêzê de, li Tirkiyeyê bîpaşketineke mezin pêk hat. Veguherîna di vê dewrê de bi du têgihan dikare bê terîfkirin. Navendîbûna ji nû ve (resantralîzasyon) û dekonsantrasyon. Ji aliyekî ve gava ku hêza navendî zêde dibû,

¹ Nişeya wergêr: Li ser daxwaza nivîskarê vê xebatê, ji ber ku navê fermî AK Partî ye lê ne AKP ye, di tevahiya wergerê de ev navê hanê hat tercîhkirin.

li aliyê din li bajar û bajarokan kapasîteya piralî ya îdareya navendê wisan berfireh bû ku bi demên borî re nayê qiyaskirin. Li Tirkiyeyê demokratîkbûyîneke qismî di salên 2000î de çêdibû ku di nav pênc salên dawî de ber bi ototerîtiyê ve gav avêtin. Di rewşa heyî de, di endeksên demokrasîyê yên rojane yên navneteweyî de, ew bi awayê "otokrasiya mitedil", di navbera rejîma otorîter û demokrasîya biqisûr de, mîna welatekî li ber kenarê otorîteriyê ye, tê senifandin.

Li Tirkiyeyê der barê parkirina hêza siyasî de ev qewimîna bi paş de, dikare bi çar dînamîkên sereke ve bê girêdan. Ji van a pêşî, ew lihevxiştin in ku piştî biencambûna Pêvajoya Çareseriyê ya sernekeftî, neqilî bajaran bûn. Dînamîka sereke ya din jî teşebusa derbeya leşkerî ya 15ê Tîrmehê û piştî wê îlankirina Rewşa Neasayî (RN) bû. Wek dînamîka sêyem a girêdayî RN'yê, mirov dikare bal bikêşe ser polîtîka qeyûman û sepanên aîdî vê polîtîkayê. Bi qeyûman re, şaredariyên li hemû bajar û bajarokên ku di bin rêvebirina HDPê de bûn, bi awayekî fiêlî ji holê hatin hildan, ew li departmaneke/ miduriyeteke/saziyê bin emirê qeymeqam û waliyan, hatin dagerandin. Jê hîn girîngtir polîtîqaya qeyûman a li cografyaya kurdan, wekî feraseteke siyasî û teknîka îdarekirinê, li tevahiya Tirkiyeyê hat belavekirin. "Sîstema Serokatîyê ya Xweserî Tirkî" ku bi navê Sîstema Hikûmetê ya Serokkomariyê ket meriyetê, dînamîka çaran pêk tîne. Bi vê sîstemê re hêza îdarî û siyasî ku ji aliyekî ve wek rêveberiya arastekirî dihat navendîkirin, ji aliyê din ve jî li hemû cihkiyan (bajar û bajarokan) hat belavekirin. Herî dawî di dînamîkên jeopolîtîk ên kêşeya kurdî de, divê bal li ser guherînên ku di pênc salên dawî de qewimîne, bê kişandin. Di vê dewrê de, kêşeya kurdî, ku mirov nikare bi raboriyê re qiyas bike, navneteweyî bû û ji kêşeya navxweyî ya Tirkiyeyê derket bû meseleyêke wisan a derveyî sînor û herêmî, ku DYA û Rûsya jî rasterast bûn midaxilên wê.

Gava di çarçoveya kêşeya kurdî de, pêvajoya avabûna dîrokî û siyasî ya nêzikî du qirnî li pêş çav bê girtin, divê di warê parkirina hêzê û nenavendîtiyê de dêhn û bal li pênc astengên sereke bê kişandin: (1) Rabêjiya beqayê ya ku li dewleta tirkî û li siyaseta sereke ya tirkî serdest e û endîşeya ewlehiya dîrokî, (2) kevneşopîya dewlet û siyaseta zêde navendîparêz, (3) newekheviya herêmî û navendîbûna/kombûna çavkaniyên aborî, (4) sîbera lihevxiştina kurdî ya li ser nenavendîtiyê û (5) sînorên siyaseta tirkî yên têkildarî kêşeya kurdî û amrazîkirina kêşeya kurdî.

Di gel vê, di warê nenavendîtiyê de pênc derfet û çavkaniyên sereke û sê firsandên hîmî hene: (1) Civariya dîrokî ya der barê nenavendîtiyê de, (2) ji aliyê îdareya gelemper (ameyê) ve, ew tecrubeya ku li ser birêvebirina cihkî û herêmî derketiye holê, (3) teşebusên reformên piştî 2000î yên eleqedarî birêvebirina cihkî û herêmî, (4) der barê xurtkirina birêvebirinên cihkî de mitebeqata li nav partiyên siyasî yên rewta sereke

û (5) nexşeya siyasî ya Tirkiyeyê. Firsendên hîmî yên ku nenavendîtî dikare dabîn bike jî ev in: (1) Geşedana giştgir û terazdar, (2) bi modernîzasyon û rasyonelîzasyona îdareya gelemper re, di xizmetên gelemper de zêdekirina çalaktî û berhemdariyê û (3) di mistewiya tîkane de bi pêkanîna hêzeke teraz û pişkinanê xurtkirina demokrasiyê.

Gava ev asteng û derfet, çavkanî û firsendên hanê, bên nirxandin, der heqê parkirina hêza siyasî û nenavendîtîyê de, dikare bê gotin ku du vebijêrk derdikevin pêş: (1) Nenavendîtîya îdarî ya di asta bajêr de û (2) nenavendîtîya îdarî û siyasî ya li ser bingeha herêmên cografîk. Vebijêrka pêşî, ji bo maweya demkurt xwedî wê potansiyelê ye ku dikare der barê meseleya kurdî de devê rûpela şidetê bigire. Di gel vê, ji bo çareseriyêke giştgir û biîstiqrar, vebijêrka diduyan ku dikare îmkan bide parkirina hêza siyasî, wek tercîheke hîn rasyoneltir derdikeve pêş. A diduyan, ew çareserîya lihevxiştîneke rajêr-dewletê ya li ser binyada nasnameyê û terîtoryal wekî kêşaya kurdî, bi demokratîkbûyîn, mezinbûyîna mekanî ya terazdar û giştgirî û bi modernîzasyon û rasyonelîzasyona îdareya gelemper ve eleqedar dike û bi vi awayî modeleke somdar û giştgir pêşkêş dike.

Destpêk

Ji bo çareseriya siyasî ya lihevixistinên terîtoriyal² a li ser bingeha nasnameyî ya rajêr-dewletê (*intra-state*), mîna kêşeya kurdî, yek ji mijarên herî krîtîk, parkirina hêzê (*power sharing*) ye. Ji bo çareseriya lihevixistinê û çêkirina aştiyê, di gel xwedî giringiya xwe ya navendî, dikare bê gotin ku ev mesele têra xwe heta roja îroj der heqê lihevixistina kurdî de nehatiye nîqaşkirin. Ji serê salên 1990î heta îroj, çendî li derdora temayên cuda yê mîna federasyon, xweseriya demokratîk, cihkîbûyîn (mehelîbûyîn), demokrasiya cihkî hin nîqaşên diyar hatibin kirin û meşandin jî, Pêvajoya Îmraliyê 1999-2004, Pêvajoya Osloyê 2008-2011 û Pêvajoya Çareseriyê 2013-2015, di van her sê teşebusên sereke de ku ji bo biencamkirina lihevixistina kurdî bûn, em negihîştin nuqteyêke wisan ku em bikarin li ser vê meseleyê biaxivin (Çiçek 2015).

Siyaseta kurdî ev mijar li demên cuda û li ser konseptên cuda nîqaş kir û ew wek yek ji sernavên sereke yê rojeva pêvajoyên diyalogê dît (Çiçek 2016; Akkaya & Jongerden 2011). Di gel vê, di destpêka salên 1990î de, eger îfadeyên serokkomarê wê demê Turgut Ozal ku derî ji federasyonê re jî vekirî dihişt (Doğan 1994) û referoyên serokwezîra wê demê Tansû Çiller ên li ser modela Baskê (Milliyet 1993) li derve bîn hiştin, dikare bê gotin ku ji aliyê cepheya dewleta tirkî û siyaseta wê ve ev mijar têra xwe li derî nîqaşê hatiye hiştin. Di salên 2000î de bi desthilata Partiya Dad û Geşepêdanê (AK Partî) re, di çarçoveya reforma îdareya gelemper û xurtkirina birêvebirinê cihkî de li ser vê mijarê bi rêjeyeke zêde hatiye sekinandin (Dinçer & Yılmaz 2003) û teşebusên ji bo çareseriya siyasî ya lihevixistina kurdî jî li derî rojevê hatin hiştin.

Ev lêkolîn, di somdariya kêşeya kurdî de, mijara aştiya siyasî û parkirina hêzê hildide dest. Bi awayekî spesîfîk li ser pirsên “Gelo ji aliyê konteksta parkirina hêzê ve birêvebirina nenavendîtiyê dikare çareseriya siyasî ya kêşeya kurdî ya Tirkîyeyê pêk bîne?” û “ji aliyê parkirina hêzê ve birêvebirina nenavendîtiyê ji kêşeya kurdî wêdetir çi wehd dike?” hûr dibe. Di vê kontekstê de, li ser derfet û sînoren nenavendîtiyê, Pêvajoya Çareseriyê 2013-2015 û piştî wê hûr dibe û nîqaş dike. Li dora temayên mîna nenavendîtiya îdarî û siyasî lîmîtên parkirina hêza siyasî, mîna skalayên cihkî û herêmî, rabêjiyên aktorên cuda yê der barê mijarê de ku ji hev cihê dibin, nêzikahîtdan û helwestên wan hildide dest û li ser wan disekine.

² Têgiha “territorial” a bi îngilîzî, çendî li tirkî bi tégihên mîna “herêmi”, “niştîmani”, “bejahî”, “xakî” bê wergerandin jî, ji ber ku yek ji van tégihan bi tenê ji bergînda wê nade, di vê xebatê de bi awayê “territoryal” tê bikaranîn. Di îngilîzî de “territory” tê wateya “qada cografî ya sînoren wê xuyakirî ku di bin serweriyeke diyar de ye” û ev sînor ji sînoren tégîha “herêmê” hîn bêhtir zelal in. Loma “territoryal” wek “eleqedarî qada cografî ya ku di bin serweriyeke diyar de ye û sînoren wê xuyakirî ne” dikare bê wergerandin. Wek nimûne li Fransayê birêvebirinê cihkî yê di asta bajar û herêmên raserî bajarê de, mîna *collectivité territoriale*, yanî “kolektîfê/civatên ku li bin serweriyeke diyar û sînoren wê xuya ne” tèn binavkirin.

Çendî ku lêkolîn Pêvajoya Çareseriyê û piştî wê ji xwe re hildide navendê jî, ji bo ku nîqaşan bi awayekî kûr analîz bike û derfet û sînoren nîqaşên li ser nenavendîtiyê di çarçoveya kêşeya kurdî de xuyabar bike, vê meseleya ku dabaş li ser e, dîrokî dike. Loma ji vî aliyê ve meseleya îdareyên cihkî ji dewra dawî ya osmanî û ji salên destpêka avabûna Komarê ve, di konteksteke dîrokî de bi cih dike.

Lêkolîn ji aliyê metodê ve di gel dîrokîkirinê, ranêzikiya perspektîfa berawirdî ji xwe re bingeh digire. Di somdariya parkirina hêzê de, meseleya nenavendîtiyê ji aliyê çarçoveyên/kontekstên nîqaşa asta kurewî ve hildide dest. Her wiha tiştên ku piştî Pêvajoya Çareseriyê qewimîne jî, bi krîza Spanya-Katalonyayê ya 2017-2018'an re, bi awayekî berawirdî dinirxîne.

Xebat ji çar peşan pêk tê. Di beşa pêşî de, der barê nîqaşên parkirina hêza siyasî û nenavendîtiyê de bi destpêkeke teorîk û dîrokî dest bi xebatê tê kirin. Di vê çarçoveyê de serê pêşîn der barê meseleya nenavendîtiyê de çarçoveyên nîqaşê tê lêkolînkirin. A diduyan, ji dewra dawî ya osmanî û salên pêşî yê Komarê heta bi Pêvajoya Çareseriyê ya 2013-2015'an, der heqê nîqaşên nenavendîtiyê de analîzeke paşxaneyê tê kirin, kêşe tê dîrokîkirin û bi cureyekî arkeolojiya bipêşneketina (nekarîbûna bipêşketina) nenavendîtiyê yan jî navendîparêziyê ya li Tirkiyeyê, tê kirin.

Beşa duyem, bi awayekî bingehîn di çarçoveya Pêvajoya Çareseriyê ya 2013-2015'an de, li ser meseleya nenavendîtiyê tê sekinandin. Di vê kontekstê de nêzikahîtedan, pozîsyon û rabêjiyên (dîkursên) aktorên polîtîk ên der barê kêşeyê de tîrînxandin. Li ser Pêvajoya Çareseriyê bi xwe jî, bi lêgerînên aştîyê eleqedarkirî tê rawestandî, ku ev lêgerîn ji sala 1999'an heta bi roja me ya îroj didomin.

Beşa sêyem li ser dewra piştî Pêvajoya Çareseriyê ye; li ser pêvajoya qeyûman hûr dibe ku ev yek bi wan polîtîkayan re ahengdar e ku ew kêşeya kurdî wekî li dijî dewleta tirkî û yekkeriya miletê tirkî mîna kêşeyeke "ewlehî" û "terorê" kod dike.

Di beşa dawî de, encamên sereke yê nîqaşên ku di beşên berê de bi dest ketine li ber çav digire û li çarçoveya çareseriyaya siyasî ya kêşeya kurdî ya li Tirkiyeyê, di warê parkirina hêzê û nenavendîtiyê de astengên hîmî û derfet, çavkanî û firsend tîrînxandin.

Encama sereke ku lêkolînê ew derxistiye holê ev e: Di navbera formasyona rejîma siyasî ya li Tirkiyeyê û kêşeya kurdî de rasterast tîkiliyek heye. Siyaseta tirkî ya sereke di avakirina rejîmeke navendîparêz, neteweperwer û otorîter de kêşeya kurdî wek çavkaniyeke fonksiyonî amrazî kir. Ji vî aliyê ve nenavendîtiyê û parkirina hêzê, ji

çareserkirina kêşeya kurdî wêdetir, îmkana ku rê dide li Tirkiyeyê di warê avakirina rejîmeke demokratîk a pluralist de wekî çavkaniyekê bê bikaranîn.

Gava ku qewimîna dîrokî ya kêşeya kurdî û ranêzikiyên komên siyasî yên sereke li pêş çav bîn girtin, nenavedîbûna îdarî ku mafên kolektîf û beşdariya siyasî li der dihêle, dê daxwazên mixalefeta kurdî bi cih neyîne. Di gel vê, parkirina hêzê ya li dora avahiyeke federatîf a du yan jî pirneteweyî, dê li bariyera endîşeya beqaya dîrokî ya kuçeya tirkî û siyaseta tirkî ya sereke ya siyasî bialiqe. Ji aliyê kuçeya kurdî ve di wî warî de meseleyên krîtîk kêşeya zimanê dayikê û nasnameyê, bipêşketina sosyo-ekonomîk a cihkî-herêmî, beşdariya siyasî û problemên azadiya civakî ne, lê ji aliyê kuçeya tirkî ve jî ewlehî û yekkeriya/bitûniya welêt, mijarên hîmî yên endîşeyê li xwe digirin. Gava asêbûna heyî ya der barê lihevxiştina kurdî de li pêş çav bê girtin, wek senaryoyeke çareseriyê derdikeve pêş ku dê nenavedîtiya herêmî ya îdarî û siyasî hem daxwazên kurdan bi cih bîne hem jî tirsên tirkan ên dîrokî ji holê rake.

Nenavendîtiya herêmî ya îdarî û siyasî, wekî li Spanyayê, li tevahiya welêt mîna hêmaneke pêkhatiya damezirîner a di avakirina demokrasiyê de dikare bê nirxandin. Tevî vê, derbasbûyîneke biqedeme jî dibe ku bibe mijara dabaşê. Rapor, gava nenavendîtiya herêmî ya îdarî û siyasî ji bo kêşeya kurdî wek çareseriyê dema navîn û dema dirêj a mayînde û bîstiqrar pêşniyaz dike, ji bo bidawîbûna şidetê ya di maweya kurt de, derpêş dike ku di asta bajêr de jî dê nenavendîtiyê îdarî rêveker be. Der barê vê mijarê de, bi taybetî eger rayeya birêvebirina meseleya zimanê dayikê dewrî nenavendîtekeke berfirehkirî ya îdareyên mihelî bê kirin, dibe ku çareserker be û nenavendîtiya herêmî jî dibe ku bi taqîbbûna nenavendîtiya di asta bajêr de, bi pêş bikeve.

Tevî vê yekê, di serdema me de her roja ku diçe bajarên-herêmên metropolîten hem li dinyayê hem jî li Tirkiyeyê dibin xwedî giringiyê, nenavendîtiya herêmî mijara parkirina hêza siyasî ji bilî çareserkirina lihevxiştinên ku ji ber kêşeya kurdî diqewimin, dê lê bixebite ku bi sê pirsgerêkên sereke re eleqedar bike û çareseriyê giştîgir pêşkêş bike. Ji van a pêşî demokratîkbûyîn, a diduyan geşepêdana sosyo-ekonomîk a terazdar û giştîgir û ya sisêyan jî bi rêya modernîzasyon û rasyonelîzasyonê îdareya gelemper, zêdekirina xizmetên gelemper û berhemdariya wan e.

1.

PARKIRINA HÊZÊ
Û NENAVENDÎTÎ:
DESTPÊKEKE
TEORÎK Û DÎROKÎ

Parkirina Hêzê û Nenavendîtî: Destpêkeke Teorîk û Dîrokî

Karibûna jiheqderketinê ya ji meseleyên wekî kêşeya kurdî, ku ji sed salî derbas dibe û çareserkirina wan gelekî zor e; analîzkirina meseleyê ya bi awayê bicihkirina wê ya di konteksteke dîrokî de û nêrîna li tecrubeyên ku li dem û cihên ji hev cuda derketine holê, dibe ku ji bo vê yekê bibe xwedî fonksiyona metodeke hêsaner. Li Tirkiyeyê wekî gelek meseleyan, ji bo kêşeya kurdî jî nezikîtêdaneke wiha dikare derketina ji heqê meylên wisan hêsan bike ku dibêje ev yek “xweserî me” ye û hema bibêje ev nêrîn jî li hemû tevgerên siyasî yên sereke hakim e. Ranêzîkiyeye wiha ku kêşeyê dîrokî dike û perspektîfa berawirdî ji xwe re dike bingeh, bêyî di nav nîqaşên rojane de bifetise, dê bike ku mesele di çarçoveyê berfireh de were fehmkirin û alternatîfên mihtemel ên der barê çareseriyê de jî dê bike ku bi awayekî realist bîn dîtin.

Berî ku çarçoveyên nîqaşê yên di warê nenavendîtiyê de bîn nîrxandin, ew têgiha ku dabaş li ser e, divê bê zelalkirin. Çendî têgihên birêvebirina cihkî, birêvebirina jicîhî yan jî ya nenavendîtiyê li şûna hev bîn bikaranîn jî, ew îşaret bi tenzîmkirinên ji hev cuda dikin. Ji van a pêşî, ji aliyê pêkanîna dirêjeya meheli ya îdareya navendî ve *dekonsantrasyon* e. Ev verastkirina ku di tirkî de wek “firehiya rayeyê” (Keleş 1998, 148; 2006, 21) yan jî birêvebirina jicîhî ya navendî” (Ender & İncioğlu 2013, 118) hatiye têgihîkirin, a rast ji bo çêkirina rêxistinên dernavendî yên dameziraweyên (mieseseyên) di binyeya îdareya navendî de ye, tê wateya dewrîkirina raye û berpirsiyên diyar ên li van teşkilatan. Rêxistinên dernavendî, ji aliyê wan kesan ve tîndîrîkirin ku ew ji aliyê hikûmeta navendî ve tîndîrîkirin û ew ji bicihanîna polîtîkayên ku li navendê hatine diyarkirin û biryarên ku hatine standin, berpirs in. Ji vî aliyê ve li hemberî navendê jî tu nasnameyên wan ên siyasî nîn in.

Verastkirina diduyan ku dikare wek şekilê dekonsantrasyonê bê şirovekirin, delegasyon (delegation) e. Delegasyon jî ku wek “ji bo bicihanîna hin xizmetên diyar, li dameziraweyên serbixwe yan jî rêxistinên neqilîkirina hin raye û berpirsiyan e” (Çam 2015, 22) tê îfadekirin, di zimanê tirkî de mîna “veguhastina rayeyê”, “dewra rayeyê” û “hewalekirina rayeyê” jî tê wergerandin (Ö. Bozkurt, Ergun & Sezen 1998, 262). Dameziraweyên cihkî/herêmî yên nîv-xweser ku hatine çêkirin, her çendî di nav hiyerarşîya hikûmeta navendî de cih negirin jî, li hemberî îdareya navendî berpirs in û girêdayî kontrola wê ne. Dameziraweyên herêmî yan jî rêxistinên aborî yên gelemper da ku di warên mîna jêrxane, enerjî, çandinî û veguhêziyê de projeyên xwedî pîvaneyên mezîn îdare bike, hatine çêkirin, wek nimûne dikarin werin nîşandan (Çam 2015, 22–23).

Verastkirina sêyem jî bi giştî bi têgihên *decentralization* û *devolution*ê tên terîfkirin û li zimanê tirkî jî bi awayekî belave wekî «nenavendîtî», «îdareya jicîhî» û «dewra rayeyê» tên wergerandin. A esas ev tenzîmkirin dibe mijara nîqaşên siyasî ku ev rapor wê li xwe digire. Ji bilî nenasvendîtî, cihkî û hiyerarşiya birêvebirina navendî ya li herêman, a bingehîn pêkanîna yekeyên cihkî ye ku ji aliyê qanûnan ve hatine çêkirin û ew xwedî organên kargêrî û organên biryarê yên hîlbijartî ne, ku hin rayeyên hikûmî, siyasî û malî vedihewînin. Hikûmeta navendî hin raye û berpirsiyên xwe dewrî van yekeyên birêvebirina cihkî dike yan jî bi wan re pareve dike. Li vir mijara herî giring ew e ku ew ji aliyê dameziraweyên xwedî şexsiyeta hikûmî ve tên îdarekirin ku di asta cihkî de ew ji hêla gel ve hatine hîlbijartin û li derveyî hiyerarşiya hikûmeta navendî ne. Wekî di dekonsantrasyonê de, her çendî di rewşa nenasvendîtîyê de jî hikûmeta navendî raye û berpirsiyên xwe yên diyar dewrî birêvebirina cihkî bike, ji dekonsantrasyonê cuda, hêza birêvebirinê cihkî ji lutifa hikûmeta navendî nayê. Wekî li Swîsre, Almanya û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA), li hin cihan tê dîtin ku ev yekeyên îdarî û siyasî ji birêvebirinê navendî hîn kevntir in (Keleş 2006, 22). Bi awayekî xulase, nenasvendîtî ku di vê raporê de bi mehneya nerm û berfireh hatiye tercîhkirin, ji meclisên taxan ên li asta cihkî heta ku dirêjî dewleta federe dibe, şeweyên birêvebirina cihkî yên ji hev cuda li xwe digire.

Nenasvendîtî, bi piranî wek nenasvendîtîya siyasî û îdarî/kargêriyî tê senifandin. Di nenasvendîtîya siyasî û îdarî/kargêriyî de, hêza qanûnsazî û darazê ya birêvebirinê cihkî tune ye û tenê der barê bicihanînê/birêveberiyê de hin rayeyên wê hene. Di gel vê, di nenasvendîtîya siyasî de birêvebirinê cihkî tevî hêza bicihanînê, di astên cuda de xwedî rayeyên qanûnsazî û darazê ne. Nenasvendîtî bi piranî li dewletên federe tê dîtin û ji aliyê makeqanûnê ve mafê xweseriyê ji bo yekeyên birêvebirinê yên di asta cihkî de tê dayîn (Keleş 2006, 22–23). Jixwe nenasvendîtîya siyasî, ji pêşkêşkirina xizmetên gelemper ên li birêvebirinê cihkî wêdetir, bi piranî ji bo ku normên siyasî yên mîna demokrasî, xweserî, hemwelatîti û beşdariyê bigire nava xwe, tê nîqaşkirin (Çam 2015, 23; Keleş 2006, 89–105).

Çarçoveyên Nîqaşên Têkildarî Nenasvendîtîyê

Ji wan xebatên ku li ser bûyerên li dem û cihên ji hev cihê qewmîne hatine kirin, dikare der barê nenasvendîtîyê de ji şeş çarçoveyên nîqaşê yên derketine pêş, bê behskirin:

1. Konteksta dîrokî û siyasî
2. Nîqaşên li ser demokrasîyê
3. Meseleya geşepêdanê
4. Modernîzasyon û rasyonelîzasyona birêvebirina gelemper

5. Veguherîna dewleta neolîberal
6. Çareserîya lihevaxistinê û parkirina hêzê

Konteksta dîrokî û siyasî

Nîqaşên di vê kontekstê de, balê dikişîne ser tesîra diyarker a li ser sîstema sosyo-polîtîk a heyî ya nerîta (kevneşopiya) dîrokî û siyasî ya rêxistinbûna dewleta modern a ku li cografyaya lê ye. Ji bo têgihîştina ji rewşa heyî û qewimînên mihtemel, divê pêvajoyên avabûnê yê dîrokî bîn fehmkirin û sînoren ku çêkirine jî li ber çav bîn girtin. Ji lew re nerîta dîrokî û siyasî ya der heqê rêxistinbûna dewletê de, rêxistinbûnên dewletê yê di asta cihkî yan jî herêmî de, fonksiyonên wan û sînoren wan diyar dike (Bafoil 2009b).

Di wan xebatan de yê ku bal dikêşin ser nerîta dîrokî û siyasî, bingeha rêxistinbûna dewletê cihê giring digire û cextandin li ser xwerêxistinîkirina dewleta unîter û federal tê kirin ku ew wekî dijber li şûnê tîn bicihkirin. Di rêxistinbûna dewleta unîter de, argumanên wekî fonksionîtiya li ser bingeha homojeniyê, bi awayekî wekhev û terazdar, di navbera yekeyên îdarî û siyasî de ku di bin îdareya navendî de hatine çêkirin, dabeşkirina çavkaniyan û di heman demê de li hemû birêvebirinên cihkî tetbîqkirina polîtîkayên ku di asta welêt de hatine diyarkirin, derdikevin pêş (Çam 2015, 19–20).

Xwebirêxistinîkirina dewleta federal jî xwe dispêre parkirina hêzê ku palpišta wê çarçoveya makeqanûnî ya diyarkirî ye. Wek bingehî xwebirêxistinîkirina dewleta federal, nenavendîkirî (*non-centralized*) ye û hêz di navbera gelek navendan de tê parkirin ku ew navend dewletê tînin pê. Ji vî aliyê ve nenavendîkirîtiya lêparkirina hêzê ya veavakirî ku xwe dispêrin peymanê/makeqanûnê, du prensîbên sereke yê xwebirêxistinîkirina dewleta federal pêk tînin (Elazar 1991, 34). Di gel vê, federalîzm jî verastkirinên binyadî wêdetir diçe, cext li ser tîkiliyeke nû, li ser şeweya reftara siyasî û civakî dike. (1) Şirkatiya di navbera ferdan, grûpan û hikûmetan de, (2) tîkiliyên ku xwe dispêrin hevkarîyê û şirkatiyê rasteqîne dikin û (3) mizakereya di nav partneran de, ku wek sê hîmên sereke yê parkirina hêzê tê derpêşkirin (Elazar 1995, 1–2).

Arend Lijphart, ku binyad (struktur) û performansa sî û şeş dewletan berawirdî hev dike, tesbît dike ku bi giştî dewletên unîter navendîparêz in û li wan deran jî feraseta demokrasiya piranîparêz serwer e. Di gel vê, dewletên federal jî bi piranî nenavendîparêz in û feraseta demokrasiya lihevker (mitabeqatxwaz) li wan serwer e (Lijphart 2012, 1–4).

Li encama xebatên ku li ser welatên mîna Ewrûpayê yên Rojava û Rojhilat, DYA û Kanadayê hatine kirin, kevneşopîya dîrokî û îdarî (John & Copus 2012, 29–30), bûyerên dîrokî û pêvajoyên ku di dema avakirina dewleta modern de qewimîne (Cole 2012, 308–10; Çam 2015, 21), nerîta birêvebirina cihkî û desthilata cihkî (Kymlicka 2002, 20; Bafoil & Kaya 2009, 4–5; Keleş 2006, 22; Çam 2015, 22) û şeweyên pêşwazîkirina daxwazên kêmaran (gelo di çarçoveya wekhevî û edaletê de yan jî di çarçoveya ewlehiyê de) (Kymlicka û Opalski 2012) xisûsên girîng ên din in, ku ew di çarçoveya konteksta dîrokî û siyasî de derketine pêş.

Teoriyên demokrasiyê û nenavendîtî

Nenavendîtî, bê ka biryar di kîjan astan de tînan hildan an jî ji bilî dabeşkirina rayeya di navbera otorîteyên navendî û cihkî/herêmî de, veguherînekê îfade dike (Hutchcroft 2001). Ji bo çarçoveyeke tevahîgir û giştgir, meseleya nenavendîtîyê ji tînkiliya navend-cihkiyê zêdetir divê ji gelek aliyên berfireh ve bê nîrxandin ku divê ew tiştên mîna tînkiliyên hêzê, rewşa qanûnsazî û darazê, sistema hîlbijartinê û sistema partiyên siyasî li xwe bigire (Bulpitt 1972, 299; Fesler 1965; Hutchcroft 2001, 536–66; Appleby 1945, 43–51). Der barê vê mijarê de cudahiya ku hewce ye serî lê bê xistin, modelên demokrasiyê yên pîranîparêz û lihevker in. Demokrasiya pîranîparêz xwe dispêre nîrxên mîna yekîtiya dangan, rêqabet û berberîtiyê, îcar demokrasiya lihevker jî ku wekî “demokrasiya mizakereyî” (*negotiation democracy*) (Kaiser 1997) tê binavkirin, qîmet bi nîrxên wekî giştgirîtiyê, bazar û lihevkerî dide. Gava ji aliyê nenavendîtîyê ve bê nîrxandin, modelên demokrasiya pîranîparêz hêza polîtîk di destê piraniyê de merkezî dike, lê modelên demokrasiya lihevker jî lê dixebite ku hêza polîtîk par bike, belav û sîndor bike. Wekî ku xebata Lijphart jî derxistiye holê, domokrasiya lihevker li gorî demokrasiya pîranîparêz, bi awayekî hîn aşkera xwedî karakterekî demokratîk e û hêza wê ya temsîlê jî zêde ye. Li hêla din, ji aliyê performansa îdarî ve hindik be jî, hîn serkeftîtir e (Lijphart 2012, 1–2; 255–94).

Der barê vê yekê de cudahiyeke ku tê pêşniyazkirin jî ev e: li aliyekî “aktoriya kolektîf” (*collective agency*) û “berpirsiya hevparkirî” (*shared responsibility*), li aliyê din jî aktorî û berpirsiya dabeşkirî ye (Goodin 1996, 331). Li gorî vê çarçoveya analîza xwedî du tewerewî, ku îmkân dide dabeşkirina hêzê bê fehmkirin, demokrasiya lihevker ji aliyekî ve di kabîneyê de, di qanûnsaziyê, hikûmetê û di navbera komên feydeyê de xwe dispêre hevbandoriyeke pîrpartîtî û pîraktorîyê yanî aktoriya kolektîf, ji aliyê din ve jî xwe dispêre dabeşbûna hêzê û parkirina berpirsiya li navbera wekî sazîyên yekeyên îdarî yên ji tebeqeyên cuda, dameziraweyên dewletê, dadgeha bilind a serbixwe û banka navendî (Lijphart 2012, 5). Bi îfadeyeke din, di nav aktoriya hevpar û berpirsiya hevparkirî de, ji bo dabeşkirina hêzê ya li warên tebeqeyên cuda û qadan,

cih dide wan aktorane ku ew xwedî hêza vetoyê (*veto players*) ne (Tsebelis 2002).

Der barê vê yekê de, divê behs ji nîqaşên li ser demokrasiya radîkal jî bê kirin (Laclau & Mouffe 2012; Mouffe 1993; 2005, 52; Tosun 2001, 98–147; Üstüner 2007). Modela demokrasiya radîkal çendî ku rasterast nîqaşên li ser nenavendîtiyê li xwe negire jî, ji ber ku cudahî û lihevixistinê wek pêkhatiyên avaker ên siyasetê dinirxîne, di navbera cudahiyan de hevtayîbûnê saz dike, dişan ji ber ku têkiliya di navbera van cudahiyan de bi rêya siyasetê û bi navbeynkariya damezirawe, rabêjî û kiryanan pêşniyaz dike, ku bêtê têkilî li dijî miniyê dagere bibe têkiliyêke mixalîfîyê, loma xwedî giringiyê ye. Ji lew re di rastiya xwe de, ew îşaret bi avakirina qadên siyasî dike ku bi awayekî beramber cudahî bîn naskirin û veguherîna wan jî mimkin bibe.

Divê bal li wan nîqaşan bê kişandin ku demokrasî û nenavendîtiyê bi hev re eleqedar dikin; mîna beşdarî û welatîtiya aktîf (Vera-Zavala 2006; Kahraman, Keyman & Sarıbay 1999; Genro & Souza 1999; Barber 1995, 183–200), “licihtî” (*subsidiarity*) (European Union 1992) ku yek ji prensîbên rêxistinî yê bingehîn ên Yekîtiya Ewrûpayê (YE) pêk tîne, hevkarîyê ku di salên dawî de ketiye rewşeke populer û edî li şûna têgiha îdareyê/kargerîyê tê bikaranîn (Mairate 2006; Benz & Papadopoulos 2006, 2–3; Bafoil & Kaya 2009, 3–4; Toksöz 2008; 2018, 9–17) û hevkarîyê pir-astî (Pasquier 2009; Hooghe, Marks & Marks 2001; Keating 1998; Lequesne & Le Gales 1997).

Mirov dikare derpêş bike ku nenavendîti, nemaze li welatên ku ji aliyê cografya û nifûsê ve mezin in, demokrasiyê kûr û konsolîde dike. Nenavendîti, (1) nixê demokratîk û pê re eleqedar çandêke siyasî xwedî dike. (2) Bi vê rêyê, şefafiya aîdî feydeya cihkî û pêdiviyên, dayîna hesab û dayîna bersivbariyê zêde dike. (3) Ji bo kom/nasname/cudahiyan ku hîn berê ew bi awayekî formel hatine marjînalîzekirin, kanalên pêgihîn û beşdariyê vedike, ji ber ku temsîl û xwedîlêderketinê zêde dike, meşrûtiya îdareyê xurt dike. (4) Li hemberî hikûmeta navendî, bi taybetî di mistewiya tîkane de wek mekanîzmeyêke teras û kontrolê dixebite û îstiqarê zêde dike. (5) Ji bo mixalefetê civariyên hêza polîtîk û ji bo mihraqên wan derfetan pêşkêş dike (Diamon 1999, 117–60; Aktar 2014, 13–15).

Tevî vê yekê, pênc kêmînen nenavendîtiyê hene. (1) Gava bi tena serê xwe li dabeşkirina hêz û rayeyê ya di navbera cihkî û navendê bê daxistin, di asta cihkî de dikare otorîteriyê kûr bike. (2) Gava ku bi normên demokratîk neyê xurtkirin, dikare li dijî kêmarên ku di astên cihkî û herêmî de hene, bêtoleransiya zêde bike. (3) Bi lawazkirina piştgirî û dabeşîya çavkaniyan a di navbera cihkî û herêman de, dikare newekheviyan zêdetir bike. (4) Dikare bike ku di warê xwebirêxistina dewletê û xizmetên gelemper de mezaxtin û îsrafan zêde bike. (5) Her wiha, dikare hayjêtiya

etnîkî û neteweyî hîn bêhtir teşwîq bike. Bi nenavendîtiyê re dibe ku di hemû astan de wekî pirsgirêkên qelsbûna kapasîteya dewletê, temînekirina dewambariya finansî ya birêvebirinê cihkî, diyarnekirina skaleyên optîmal ên îdareyên cihkî û nekarîna venegerandina mîrasa otorîter jî biqewimin (Diamon 1999, 117– 60; Aktar 2014, 14–16). Ji bo ku ji heqê van kemînên hanê bê derketin, hewce ye meseleya nenavendîtiyê ji têkiliya di navbera cihkî û navendê de cihêtir, di çarçoveyê hîn berfirehtir de li ser bê sekinandin. Mijarên mîna bê avabûna îdarî û siyasî ya li her cihkiyekê çawan pêk hatiye, mafên wan komên kêmarên ji hev cihê û beşdariya wan a li qada siyasî, dabeşiya kan û çavkaniyan a di navbera cihkiyan de, yekîtî, piştgirî û entegrasyona di navbera cihkiyan de, binyad û mekanîzmayên teraz û kontrolê yên hem di navbera cihkiyan de hem jî yên di navbera cihkî û navendê de û her wisan xisûsên rasyonelîzasyon û modernîzasyona rêxistinbûna dewletê, ji mijarên krîtîk ên li pêş in ku divê di meseleya nenavendîtiyê de bal li ser wan be,

Meseleya geşepêdanê û nenavendîti

Li welatên Ewrûpayê yên wekî Spanya û Îtalyayê, nîqaşên li ser herêmîbûn û nenavendîtiyê, ji bo wan daxwazên çandî û siyasî yên civatên herêmî yên diyar ku bi awayekî dîrokî berdewam bûn, tenzîmkirin hatin rojevê. Veavabûna ji nû ve ya birêxistinbûna dewletê ya li ser hîmê otonomiya herêmî, xurtkirina herêman û geşepêdana wan jî pêk anî (Colino & del Pino 2012, 380; Piattoni & Brunazzo 2012, 344–45). Ji Spanya û Îtalyayê cuda, li Fransayê ya rast nenavendîtiya herêmî li dora nîqaşên geşepêdana herêmî hat rojevê. Hewla ji bo rakirina ji holê ya newekheviya bipêşketina di navbera Parîs û herêmên din ên welêt de, dînamîka hîmî ya pêla herêmîbûnê pêk anî, ku dê heta dawîya salên 1960'î bidomiya. Partiya Sosyalîst a Fransî di sala 1982'yan de pêşengî li reforma nenavendîtiyê kir û nenavendîti bi reforma ku di salên 2003-2004'an de hat kirin, gihîşt çarçoveyê makeqanûnî. Li Fransayê herêm, esas di nav nîqaşên li ser geşepêdan û bipêşketina herêmî ya terazdar de, bi "vîzyoneke fonksiyonî" derket holê û geşe bi xwe da. Îroj "herêm bi giştî ji asteke siyasî ya ku norm û polîtîkayan li wan ferz dike zêde, asteke koordinasyonê" pêk tînin (Pasquier 2009, 39–44; 50).

Qadeke din a tecrubeyê ku dike mirov nenavendîtiyê û meseleya geşepêdanê bi hev re bifikire jî, veguherîna welatên Ewrûpayê yên Naverast û Rohhilat ên piştî dewra Sovyetê û pêvajoyên endamtiya wan a YE'yê ye. Ji tecrubeyên li van deran, bi taybetî întibaqa li polîtîkaya herêmî ya YE'yê û ji bo birêvebirina fonên binyadî yên der barê vê yekê de, nenavendîti wek ranêzikiyê birêvebirina geşepêdanê hat pejirandin û girêdayî bi parkurên dîrokî û siyasî yên welatan jî, modelên îdarî yên cuda geşe bi xwe da (Bafoil 2009b; Benz 2007, 255). Hedefên "geşepêdana dewambar" ên ku di bin

pêşewatiya Neteweyên Yekbûyî (NY) de hatine bipêşxistin, yek ji wan qewimînên girîng in ku vê yekê kiriye meseleya nenavendîtîyê di asta kurewî de bê rojevê.

Der barê nenavendîtîyê de gelek arguman hene ku ew hîn bêhtir geşepêdanê pêk tînin. Berê pêşîn bi binyadeke nenavendî hem di navbera cihkiyan/herêman de hem jî di navbera cihkiyan/herêman û navendê de bi pêkanîna teraz û kontrolê, bipêşketina cihî ya hîn terazdar mimkin dibe. Ya duyem, ji ber ku dê kêşe û pêdiviyên cihkî di binyadeke nenavendî de hîn bêhtir bi awayekî rast bîn tesbîtîkirin, dike ku derfetên midaxeleyên kartêker derkevin holê. Ya sêyem, bi nenavendîtîyê, ji bo geşepêdana cihkî mobîlîzasyonê çavkaniyên cihkî yên însanî, madî û binyad-zanînê hêsantir dibe. Ya dawî, nenavendîtî ku derfetên beşdariya cihkî û bendên aîdiyetê xurt dike, xwedîderketina li avahiyên îdarî, plan, bername û projeyan jî zêde dike. Ev rewş ji aliyekî ve pêvajoyên sepanê/tetbîqê hêsan dike ji aliyê din ve jî pêvajoyên şopan û nirxandinê xurt dike û kontrola gelemperî zêde dike; avakirina avahiyên îdarî û mekanîzmayên ku hîn şefaf û hesabdayînbar in, pêk tîne.

Modernîzasyon û rasyonelîzasyonê birêvebirina gelemper û nenavendîtî

Ji bo gihîştina hedefên siyasî (demokratîkbûyîn) û aborî (geşepêdan), avakirina birêxistinîkirina dewleteke “modern” û “rasyonel”, çarçoveya nîqaşa çarem e, ku der barê mijara nenavendîtîyê de derketiye pêş. Li gorî vê, di warê birêvebirina gelemper û pêşkêşkirina xizmetên gelemperî de nenavendîtî kartêkerî û berhemdariyê bêhtir dike. Nemaze li welatên ku xwedî nîfûs û cografyayeke mezin in, birêvebirinên navendî yên ku perspektîfeke îdarekirina ji jor ber bi jêr ve ji xwe re dike bingeh, di warê diyarkirina daxwaz û pêdiviyên gelemperî, tesbîta kêşeyan û pêşkêşkirina xizmetên gelemper de, kartêkerî û berhemdariyê temîn nake. Di gel vê, perspektîfeke ku hîn zêde qad ji aktorên cihkî re vedike, rol dide wan, giştgir û xwe dispêre “birêvebirina ji jêr de”, di warê xizmetên gelemper de kartêkerî û berhemdariyê zêde dike. Ji lew re birêvebirin ji aliyekî ve torên dîkane yên di asta cihkî, herêmî, neteweyî û navneteweyî de, ji aliyê din ve jî di her astî de torên berane yên sazîyên gelemper, ên sektora taybetî û yên dilxwaz digire nav xwe. Ji vî aliyê ve, ji bo ku di birêvebirina gelemper de kartêkerî û berhemdarî bê zêdekirin, hewce pê heye ku di navbera leyzkarên cuda yên xwedî kanên cuda yên ji van tebeqeyan de hevkarî û hevparîyeye xurt were çêkirin (Bafoil & Kaya 2009, 3–4).

Di meseleya pêkanîna modernîzasyon û rasyonelîzasyonê birêxistinîbûna dewletê de, divê mirov binê ranêzîkiya “Birêvebirina Gelemper a Nû” (*New Public Management*), ku di salên 1980’yî de derketiye pêş, xêz bike. Li gorî vê nêzikahîtdanê, teknîkên birêvebirinê yên ku li sektorên taybetî bi pêş ketine veguhastina wan a li îdareya

gelemper terîf bike, divê birêxistinbûna dewletê mîna veavabûna şirketa taybetî bê nîrxandin û sîstema îdarî-polîtîk jî pêwîst e li ser xwedî *bingeha aborî, berhênan û kartêkeriyê* jî nû ve bê veavakirin. Di birêvebirina gelemper de, hem “modernîzasyona rêxistinî” hem jî “modernîzasyona hêza kar” hewce ye (Astleithner & Hamedinger 2003, 55). A rast, li pîrî welatan, ku Tirkiye jî di nav wan de ye, di warê birêvebirina gelemper de gelek xisûsên ku van salên dawî hatine rojevê, yên mîna birêvebirina kalîteya total, birêvebirina stratejîk û plansazî, birêvebirina performansê, budçekirina li ser bingeha performansê, didin nîşandan ku stratejî û teknîkên birêvebirinê yên ku di warê sektora taybetî de bi pêş ketine, di çarçoveya “modernîzasyon” û “rasyonîzasyon”ê de sîrayet li gelemperiyê kiriye.

Birêvebirina gelemper a nû, di warê birêxistinbûna dewletê de *elastîkî û cihkîtiyê* wek du taybetmendiyên hîmî yên birêvebirina nûjen terîf dike. Li gorî vê, elastîkî dike ku întibaq li guherînên berdeyam ên di warên aborî, siyasî, çandî, teknolojîk an jî qadên jîngehî/hawîrî de yên ku di asta cihkî, herêmî, neteweyî, derneteweyî û navneteweyî de diqewimin pêk were û nediyariyên ku ew dibin sedem jî, bîn birêvebirin. Îcar, cihkîti, li dijî hawîra/jîngeha ku diguhere û pîrsgirêkên nû yên ku dertên holê, mobilîzekirina kanên cihkî, însanî, madî, binyad-zanînî, çandî yan jî yên sembolîk, tevî çareseriyên giştî, durîstkirina çareseriyên taybetmend temîn dike (Ökten, Şengezer & Hökelek 2003).

Di warê modernîzasyon û rasyonîzasyona birêxistinbûna dewletê de, konseptên ku hîn bêhtir belave û populeriya xwe didomîne, hevkarî ye. Ranêzikiya hevkarîyê ku li Amerîkayê di salên 1970'yî de, di warê sektora taybetî de cara pêşî hatiye bikaranîn û piştê jî ji aliyê yekîtiyên navneteweyî yên mîna YE, Banka Dinyayê, Rêxistina Hevkariya Aborî û Geşepêdanê (*Organization for Economic Co-Operation and Development* – OECD) û NY'yê ve li gelemperiyê hatiye veguhastin, yek ji du argumanên wê yên sereke demokratîkbûyîn, a din jî “zêdekirina kalîteya pêvajoya îdarî” ango “berhemdarî” ye (Îzci 2018).

Polîtîkayên neoliberal, veguherîna dewletê û nîqaşên li ser nenavendîtiyê

Di vê xalê de, divê mirov behs ji rexneyên ku li ser mijara modernîzasyon û rasyonîzasyona birêxistinbûna dewletê bike ku di bin navên cuda yên wekî reforma dewletê û birêvebirina reforma gelemper de hatine rojevê. Meyla belave ew e ku gava meseleya nenavendîtiyê di çarçoveya demokratîkbûyîn, geşepêdana sosyo-ekonomîk û modernîzasyon û rasyonîzasyona dewletê de hildide dest, ranêzikiya fokusbûna li ser polîtîkayên neoliberal jî wek parçeyê veguherîna dewletê ya neoliberal dinirxîne. Avahiyên îdarî û siyasî, bi awayê ku bi lîberasyona ekonomîk ve ahengdar bin, bi

şêweya binyad-piyaseyî tên liberalîzekirin ku ev yek ji aliyên aktorên mîna Fona Pereyan a Navdewletî (*International Monetary Fund - IMF*), Banka Dinyayê û OECD'yê ve bi salên 1980'yî re hatine rojevê û belavekirin (B. A. Güler 2003).

Li gorî vê nêzîkahîtdanê, bi alîkariya reformên dewletê yên ku bi politikayên neolîberal re ahengdar in, astengên neteweyî yên li pêşiya sermayeyê tên hildan. Cihkîbûyîn ku serweriya neteweyî qels dike, politikayên ji bo biçûkkirina dewletê jî îcar dewleta sosyal ji holê radike. Politikayên taybetîkirinê, ku dewleta rasterast xizmetê hildiberîne û pêşkêş dike li dewleta sererastker (regulator) dadigerîne, di bin navê beşdarkirinê de, bi binyada hevkarîyê jî tesîra pêvajoyên standina biryaran a welatîyên ku bi demokrasiya temsîlî bi pêş ketine sînordar dike û derbasî binyadeke îdarî û siyasî dibe ku sermaye di wan de diyarker e. Ji vî aliyê ve nenavendîtî, ne bi tena serê xwe wek promlematîka parkirina hêzekê/desthilatekê ya di navbera cihkî/herêmî û navendê de, jê wêdetir divê wek parçeyekî veguherînên giştî yên ku di binyada ekonomîk, siyasî û îdarî de qewimîne, bê nixandîn. (Ataay 2006; B. A. Güler 2006; 2003, 3; Sancar 2002; Stahre 2004; Uyar 2002; Şengül 2002; Devlet Planlama Teşkilatı 2000; Toksöz 2008, 10–11).

Tecrubeyên li welatên ji hev cuda, didin nîşandan ku bi rastî jî meseleya nenavendîtîyê wek parçeyekî veguherîna dewleta neolîberal bûye xwedî fonksiyon. Bi salên 1980'yî re, hem di aboriyên lîberal ên bipêşketî yên Rojava de hem jî di nav wan welatan de ku ew geşe bi xwe didin, di birêxistinbûnên dewletê de veguherîneke xwedî bingeha piyaseyî dest pê kir (Keleş 2006, 39).

Ev rexneyên hanê, tevî ku bi awayekî qismî rast bin jî, di navbera politikayên neolîberal û nenavendîtîyê de çêkirina eynîtiyê yan jî ya têkiliyeke determînîst, bipirsgirêk xuya dike. Nîqaşên rexneyî ku li ser veguherîna tevahî ya dewletê hûr dibin û bi taybetî ji ber ku balê dikêşin ser pirsgirêkên ku di qada civakî de afirandine, wek mijareke berîtiyê parastina binyadên îdarî û siyasî yên navendîparêz û tekteseyî yan jî veguherîna li van, wan mafdar nake. Ji lew re dewletên navendî û tekteseyî, bi piranî di warê siyasî de otorîteriyê, di warê sosyo-ekonomîk de bipêşketina newekhev a mekanî ya pir-astî, di warê pêşkêşkirina xizmetên gelemper de vederî, newekhevî, geşepêdana têkiliyên patronajî û neberhemdariya îdarî pêk anî.

A duyem, di wan pêvajoyan de ku dabaş li ser wan e, divê bê dupatkirin ku hikûmetên navendî û otorîter diyarker in û ev modelên ku ji derve de tên "ferzkirin" jî, wek tekteseyî nehatine sepandin. Veguherîna neolîberal a dewletê, ew pêvajo ne ku ne bêyî navendê, bi destê navendê bi xwe tên meşandin û otorîteya navendî jî diyarker e.

A sêyem, ji bo şêkilgirtina modela ku derketiye holê, konteksta dîrokî û siyasî ya her welatekî diyarker e. Wek nimûne, çendî bi pêvajoya endamtiya YE'yê re Tirkiyeyê di salên 2000'î de reforma birêvebirina gelemper bi pêş xistibe jî, gava pêvajoyên pêkhatina binyadên herêmî yên wekî guherîna qanûnên şaredariyan, Senifandina Yekeyên Herêma Statîstîkî (SYHS) û ajansên geşepêdanê bi awayekî detay bîn vekolan, dê were dîtin ku ev pêvajoya hanê, ne *desantralîzasyon* lê belê *dekonsantrasyonê* li xwe digire.

Wek dawî, bi salên 1980'yî re, polîtîkayên neolîberal ên ku nenavendîtiyê pêşbînî û destek dike, di salên 2000'î de bi qeyrana aborî re, ya ku di çapana cihanî de qewimî, nemaze li wan welatên ku bi ber bipêşketinê ve diçin, destek da navendîkirinê. Otorîteyên navendî, bi taybetî ji bo ku kanên madeyên xam ên ku li cihkî û herêman peyda dibin û ranta bajarî rasterast bi rê ve bibin, dest avêtin tenzîmên qanûnî, îdarî û sazûmanî. "Wezaretên Bajarsaziye" yên ku li Tirkiye û Brezîlyayê hatin avakirin, ji bo meyla nû ya navendîbûnê dikare wek nimûne bîn nîşandan (Toksöz 2015, 1).

Çareseriyê lihevexistinê û ji bo avakirina aştiyê nenavendîti

Li gorî Kymlicka û Opalski, ji feraseta "Ortodoks lîberal" cuda ku diparêze divê cudahiyan etno-çandî li qada taybetî bîn sînordarkirin, ranêzikiya "pluralist lîberal" ya ji bo ku cudahiyan etno-çandî li qada gelemperî xwe îfade bikin û dameziraweyî bibin, wekî şertê pêşî yê demokrasîyeke biîstiqrar û adil dinirxîne (Kymlicka & Opalski 2012, 1). Li gorî Kymlicka, ku li ser cudahiya di navbera gelên koçber û gelên xwecihî/ kêmarên neteweyî de hûr dibe, li welatên mîna Kanada, Awisturalya, Kraltiya Bîrtanya û Amerîkayê daxwazên etno-çandî yên koçberan, pirçandîti bi pêş xist. Di gel vê yekê, li cihên mîna Quebec, Porto Rîko, Katalonya û Skoçyayê, ku gelên xwecihî û kêmarên neteweyî bi awayekî terîtoriyal li wan xwedî gurahiye ne û li herêmên xwe piraniyê pêk tînin, modelên xweseriyê herêmî yan jî ferdalîzma pirneteweyî geşe bi xwe da. Li cihên ku gelên xwecihî li wan dijiyan jî, mîna li Amerîkayê xwecihî, li Kanadayê eskîmo, li Îskandînavyayê samî û li Zelandaya Nû jî maorî, formên xwebirêvebirinê (*self-government*) wek çareseriyê bi pêş ketin (Kymlicka & Opalski 2012, 6-7; Kymlicka 2002). Nemaze di nivê duyem ê sedsala 20'î de, bi devjêberdana polîtîkayên sereke yên ku li ser kêmarên neteweyî dihatin sepanandin û bi pêkanîna daxwazên etno-çandî re bipêşketina federasyonên pirneteweyî yan jî ya xwerêvebirinê, yên wek formên xweseriyê terîtoriyal, di warê konsolîdebûna demokrasîyên Rojava û rehberdana wan de, roleke giring leyîst. Bi vê ranêzikiya nû re, ne tenê kêşeya nasnameyên neteweyî yên xwedî rewşa pevçûnê hatin çareserkirin, di heman demê de li çapana welêt jî refaha aborî hat temînîkirin û azadiyên ferdî jî bi pêş ketin (Kymlicka 2002, 31).

Ji bo bidawîhatina lihevaxistinên terîtoriyal ên binyad-nasnameyî yên rajêr-dewletê, divê ku ji aliyê dewleta navendî ve parkirina hêzê wek mekanîzmayeke çareseriyê bê dîtin û endîşeyên eleqedarî cudahî/veqetîn û îrredantîzmê³ jî bi awayekî zelal ji holê bên hildan. Endamtiya li binyadên wekî YE'yê yên raser-neteweyî yan jî der barê endamtiyê de çêbûna vîzyoneke hevpar, ji aliyekî ve dikare hêsan bike ku dewlet "dev ji siyaseta ewlehiyê berde", ji aliyê din ve jî dikare bike ku grûpên kêmar jî siyasatên veqetînxwaz/cudahîxwaz bi dûr bikevin û bi vî awayî "di nav cudahiyan de yekîtiyê" pêk bîne (Kymlicka & Opalski 2012; Bafoil & Kaya 2009, 7). Di rewşên wisan de ku ev endîşe zêde bin yan jî kontekst van endîşeyan xwedî bike, pêkhatina çareseriyên xwebirêvebirinê yan jî çareseriyên federal ên pirneteweyî zehmet dibe (Kymlicka 2002, 65; Kolsto 2002). Kymlicka dinirxîne ku eger bi grûpa etnikî/neteweyî re dewleteke cîran a eqrebe hebe, ku daxwaza parkirina hêzê dike û eger kêmara neteweyî bi hêzên biyan/dewletan re bendên xurt ên wekî dîrokî girê bide, ev her du sedemên sereke dikin ku îmkânên çareseriyên dabaş li ser wan e, berteng bibin.

Li gorî qebûla gelek dewletan ku "dewrkirina rayeyê û parkirina hêzê, hêzên navendrevî xurt dike" û di gel sepanên ku xwe dispêrin vê qebûlê, lêkolînên der barê pevçûnên etno-neteweperwer de hatine kirin, didin nîşandan ku redkirina mafên xwebirêvebirinê yên kêmarên neteweyî yan jî îbtalkirina wan mafan, lihevaxistinên zêde dike, lê belê berevajiyê vê yekê verastkirinê jî bo xwebirêvebirinê, ihtimala pevçûnên ku şidetê li xwe digire hindik dike (Gurr 1993; Hannum 1990; Lapidoth 1996; Horowitz 1991, 224; Hislope 1998). Di wan rûdan de, ku kêmarên neteweyî li dayikniştimanê xwe bi awayekî aşkera piraniyê pêk tînin û bi awayekî dîrokî xwedî nerîteke xwebirêvebirinê ne, modeleke rasteqîne ya ku bibe alternatîfa otonomiya terîtoriyal an jî federalîzma pirneteweyî û dawî li pevçûnan bîne, peyda nabe (Kymlicka 2002, 69; Kolsto 2002, 210).

Lihevaxistinên terîtoriyal ên binyad-nasnameyî, bi awayekî hîmî jî têtikliyên serweriyê yên pirtebeqeyî yên di navbera grûpên etnikî/neteweyî de yên li welêt û ji cemserîbûna etnik/neteweyî yên ku ev dibin sedem, diqewimin. Têtikliyên serweriyê û cemserîbûn, kapasîteya pêkvejiyanê di navbera grûpên etnikî/neteweyî de kêr dike û li hemberî rîska lihevaxistina li nav dewletê jî hîn bêhtir bêparastin dihêle (Collier, Hoeffler & Soderbom 2004; Elbadawi & Sambanis 2000; Bates 2001).

Xebatên ku di warê çareseriyê lihevaxistinê û çêkirina aştiyê de hatine kirin, ji bo ku dawî li lihevaxistinên binyad-nasnameyî yên ku dirêj dewam dikin were, balê dikişînin

³ Fikira biyekbûna wî geli ya bi dewletekê re ye ku bihevretiya wî ya ajar û çandê pê re heye, lê ew li derveyî sînorên dewleteke din diji. Bi gotineke din, rewteka siyasî ya ku diparêze xakên welatê cîran tevî nav axa xwe bike.

ser giringiya parkirina hêzê û naskirina mafên civatê. Tê çavdêrikirin ku hikûmetên welatên ev cure lihevexistin li wan diqewimin, çar ranêzikiyên ji hev cuda nîşan didin: (1) “paqijkirin” a etnikî (2) çewsandin/pêkutî (3) dabeşbûn/veqetîn û (4) parkirina hêzê. Parkirina hêzê, tevî ku zehmetiyên politîkî bi xwe re tine jî, di nav van de vebijêrka herî maqûl e. Li gorî nêrîna Charles W. Maynes, bi qiyaskirina li demokrasiya Anglo-Amerîkan a bi binyada mafên ferdî, “demokrasiya hevcivatî” (*consociational democracy*) ku mafên civatî digire nava xwe, dikare ji bo lihevexistinên etnikî/neteweyî yên ku bûne kêşeyên kurewî/cihanî, çareseriyê pêşkêş bike (Maynes 1993). Caroline Hartzell jî di xebata xwe ya kirî de, nîşan dide ku rêkeftinên aştiyê yên parkirina hêza siyasî, aborî, leşkerî û terîtoriyal li xwe vedihewîne, hîn bêhtir mayînde ne. Parkirina hêzê/desthilatê, bi tenê îhtimala aştiyê zêde nake, her wisan mayîndebûna rewşa aştiyê jî hêsan dike. Ji lew re di çareserkirina lihevexistin û avakirina aştiyê de, sazî û damezirawe roleke krîtîk bi cih tînin û bi tenê bi sazûmanîbûna çareseriyên, aliyên ku li hev dixin dikarin ji heqê duyîleya (dîlemaya) ewlehiyê derkevin û têkiliyên civakî yên ku xwe dispêrin hevkarîyê, ava bikin (Hartzell 1999; Hartzell, Hoddie & Rothchild 2001; Hartzell & Hoddie 2003).

Li gorî daneyên Bernameya Daneyên Lihevexistinan a Upsalayê (*Uppsala Conflict Data Program*), di dewra 1975-2018’an de li parzemînên Ewrûpa, Rohhilata Navîn, Asya û Afrîkayê li bîst û sê welatan, li sî û yek bûyerên qewimî yên lihevexistina terîtoriyal ên rajêr-dewletê, ji heştê û sê rêkeftinên îmzakirî, di çil û heştê wan de verastkirinên terîtoriyal ên wekî otonomî, federasyon, serxwebûn, referendûm, parkirina hêzê ya cihkî yan jî xurtkirina birêvebirinên mehêlî cih standin. Li hêla din, gava ku rêkeftinên demkî yan qismî yan jî rêkeftinên ku bi pêvajoya aştiyê re sînordar in li derve bîn hiştin û gava li gorî vê senifandinek bê kirin, di nav heştê û sê rêkeftinan de, bi tenê hejdeh rêkeftin hemû xisûsên bidawîanîna nelihevkirinan li xwe digirin (*full agreement*). Di tevahiya van hejdeh rêkeftinan de, cih ji verastkirinên terîtoriyal re hat dayîn.⁴

Wek nimûne, lihevexistinên di navbera Dewleta Endonezya û Tevgera Açeya Azad (*Gerakan Aceh Merdeka - GAM*) de, ku bîst û neh salan domiya (1976-2005), bi naskirina xweseriya berfirehkirî ya ji bo Herêma Açehe bi dawî bû (Çiçek 2018, 109-42; Aspinall 2005, 75-84). Dîsan li Fîlîpînê, li Herêma Bangsamoroyê ku di nav koma giravên Mîndanoyê de cih digire, lihevexistinên ku ji serê salên 1970’yî de dest pê kiriye, bi îmzakirina rêkeftina sala 2014’an, a ku di navbera Dewleta Fîlîpînê û Tevgera Rizgariya Îslamî ya Moro (*Moro Islamic Liberation Front*) de pêk hat, bi dawî bûn.

⁴ Seta Daneyên Rêkeftinên Aştiyê 1976-2018, di nivenga înternetê de ji bo gihanê vekirî ye. Bnr: <https://ucdp.uu.se/downloads/index.html#peaceagreement>, dema têketinê: 01.10.2020.

Pêvajoya aştiyê, ku Tirkiye jî yek ji çar dewletên navbeynkar bû, avakirina Herêma Bangsamoroyê ya Xweser temîn kir û di warê îdarî, siyasî û aborî de jî, ji bo herême rayeyên berfireh hatin naskirin (Çiçek 2018, 75–108; Söylemez 2016, 112–24; International Crisis Group 2019). Rûdana lihevistinê ya di navbera Kraltiya Yekbûyî û Îrlandaya Bakur de jî, bi parkirina hêzê bi dawî bû. Di encama lihevhatinê de, Meclisa Îrlandaya Bakur a ku hêza wê ya qanûnsazî û îcrayê heye û îdareyeke nû ya Îrlandaya Bakur hat damezirandin (Democratic Progress Institute 2013). Li herêmên Bask û Katalonyayê yê Spanyayê jî, di warê bidawîhatina lihevistinên etnikî/neteweyî û konsolidasyona demokrasîyê de, parkirina hêzê kartêker bû (Thomas 2012, 5-21).

Pêvajoya derbasbûna li demokrasîyê, ya piştî dewra dîktatoriyê 1939-1975 ya di bin pêşewatiya General Francisco Franco de, ji bo dabînkirina daxwazên herêmi zemîneke misaîd pêk anî (Edwards 1999). Daxwazên xweseriyê, ji bilî herêmên Katalonya, Bask, Galîçya, Valensiya û Endulusê, ji bo giştîya Spanyayê wek parçeyekî avakirina demokrasîyê hat dîtin û hat destekkirin (Juberías 2013, 232). Bi awayê îdarî û siyasî binyadeke nenavendîparêz hat damezirandin û Spanya wek dewleteke herêmi ji nû ve hat veavakirin. Bi tecrubeya otonomiya berî Franko û bi derfetên ku ji ber kevneşopiya têkoşîna siyasî ya li sed salî belavbûyî hatibûn bidestxistin (Edwards 1999), Katalonya di sala 1979'an de bi qanûneke taybetî wek yek ji herêmên xweser hat avakirin. Li Katalonyayê, di asta herêmi de sistemeke parlamenter heye; birêvebirin ji parlamentoya herêmi, serokê herême û hikûmeta herême pêk tê (Edwards 1999).

Lêgerînên ji bo serxwebûnê, ku li Katalonyayê herî hindik sê qirn raboriya wê hene (Juberías 2013), nemaze bi salên 2000'î re ji nû ve zindî bûn. Di dewra 1979-2003'yan de Partiya Lihevnezbûn û Yekîtiyê (*Convergencia i Unio* - CiU) siyaseta Katalonyayê domîne kir ku ew alîgirê berfirehkirin û kûrkirina otonomiyê û xwedî meyla rastgiriya navendî bû. CiU, di hîlbijartinên 2003'yan de, ku reformekirina qanûna xweseriyê rojeva sereke ya siyasî bû, hakimiyeta xwe winda kir û koalisyona ji partiyên çep, sosyalîst û komunîst û tevgera keskan pêkhatî, cihê îdareya berê wergirt. Di vê dewrê de, li navenda Spanyayê jî, li şûna partiya rastgiriya navend Partiya Karkerên Sosyalîst a Spanyayê ya di bin pêşewatiya Zapatero de, ku ew partiya çepgiriya navend bû (*Partido Socialista Obrero Español* - PSOE) hat ser desthilatê. Qanûna nû ya xweseriyê, di encama vê guherînê de ku hem li herêma Katalonyayê hem jî li tevahiya Spanyayê ji ber qewimînên di warê konfigurasyona siyasî de pêk hatine, di sala 2006'an de hat pejirandin. (Aktoprak 2015). Qanûna nû, Katalonya wek "netewe" yek (*nation*) terîf dikir, di navbera zimanên spanyolî û katalanî de yeksaniyê çêdikir û welatîyên ku li Katalonyayê dijîn jî hînbûna wan a zimanê katalonî wek maf û berpîrsiyekê qebûl dikir. Li ser serlêdana Partiya Gel (PP), di 2010'an de Dadgeha Makeqanûnê çardeh madeyên ku pêkhateyên sereke yê qanûna nû tîne pê, li dijî

Makeqanûnê dîtin; her wiha bîst û heft madeyan jî di elehiya otonomiyê de ji nû ve şirove kirin.

Li ser biryara Dadgeha Makeqanûnê, di sala 10 Tîrmeh 2010'an de, ji milyonekî zêde mirovên ku li kuçeyên Barselonayê li hev civiyan, bi slogana "Em Netewe ne. Me Biryar Da!" ev biryar protesto kir (Catalan News 2010) û protesto li xwepêşandaneke girseyî ya alîgirên serxwebûnê dageriya (Catalan News 2014). Piştî ku teşebusên referandûma serxwebûnê yên Hikûmeta Katalonyayê di 2012 û 2013'an de hatin astengkirin, di 2014'an de li ser biryar û bangewaziya Serokê Katalonyayê Artur Mas, di Çiriya Paşîn a 2014'an de, gelpirsîyek hat kirin ku girêderiya wê tune bû. Ji 5,4 milyon hîlbijêrî, nêzikî du milyon kes tevî referandûmê bûn û bi rêjeya raserî %80'yî beşdarî serxwebûnê tercîh kir.

Deh meh piştî referandûma serxwebûnê, hîlbijartinên ku di Îlona 2015'an de çêbûn, koalîsyona ji du partiyên rastgir û du partiyên çepgir ên alîgirê serxwebûnê, kar kir (Real Instituto Elcano 2019, 24) û Parlamentoya Katalonyayê di 1'ê Çiriya Pêşîn a 2017'an de biryara çêkirina referandûma serxwebûnê da (BBC News 2018). Tevî biryara Dadgeha Makeqanûnê ya ku diyar dikir ev yek li dijî Makeqanûnê ye û midaxeleyên polîsî yên hikûmeta navendî ku bûbû sedema darizandina nêzikî hezar hesî (Generalitat de Catalunya 2017; Phillips 2019), referandûm hat kirin ku beşdariya lê xwedî rêjeya %43,03 bû û nêzikî %92,01'ê beşdarî ji bo serxwebûnê, %7,99'an jî li dijî serxwebûnê ray bi kar anî (The Independent 2017). Parlamentoya Katalonyayê, di 27 Çiriya Pêşîn 2017'an de, bi awayekî yekalî serxwebûnê îlan kir.

Hikûmeta Spanyayê heman roj li ser biryara Senatoya Spanyayê, Hikûmeta Katalonyayê ji wezîfeyê hilda, Parlamentoya wê pelast û li ser hin rayeyên birêvebirina otonomiyê biryara kontrola rasterast da. Biryar hat standin ku nêzikî du mehan bi şûn de, di 21 Kanûna Pêşîn 2017'an de li Katalonyayê hîlbijartin bûn çêkirin (BBC News 2017). Li ser vê biryara hanê siyasetkarên katalan berxwedaneke tund nîşan neda û têkoşîna ji bo serxwebûnê li demê belave kir. Li gorî hin îdiayan, gefxwarinên Madrîdê yên ji bo kirina derbeya leşkerî di vê biryarê de diyarker bûn (Phillips 2019).

Li Tirkiyeyê Nenavendîtî: Paşxaneya Dîrokî

Kêşeya kurdî însayeye sosyo-polîtîk û dîrokî ye. Di vê meseleyê de ku nêzikî raboriyeyeke dîrokî ya du sed salî ye û heta dirêji destpêka sedsala nozdehan dibe, ji bo ku mirov hemû tiştên qewimîne fehm bike û der barê dahatûyê de pêşbîniyekê bike, hewce bi nêrîna li raboriyê heye. Tiştên ku di raboriyê de qewimîne, dikin ku ji

aliyekî ve ji bo meseleyê “rêç”ekê (*path*) çêke û ji aliyekî ve jî dikin ku “pêgiriya bi rêçê” (*path dependency*) were holê. Tiştên di pêvajoya dîrokî de derketine rastê, ji aliyekî ve di konteksta wan raman, berjewendî û dameziraweyan de ku îrojê/nihayê çêdikin, ji aliyê din ve jî sînorên rêgeha mihtemel diyar dikin. Jê wêdetir, “pêgiriya bi rêçê”, “tesîra kilîdbûnê” derdixe holê û çendî der barê meseleyê de derfetên hîn baştir temîn bike jî, hepsî wan sînoran dibe ku raboriyê ew çêkirine û rê li ber nûtiyan jî digire (David 1985; Page 2006; Liebowitz & Margolis 1995; Hall & Taylor 1996).

Kêşeya kurdî ku di serdema dawî ya Împaratoriya Osmanî de derketiye holê û ji Komara Tirkiyeyê re mîras maye, gava arkeolojiya dîroka wê ya du sed salên dawî bê kirin, dê bê dîtin ku di nîqaşên li ser nenavendîtiyê de, çarçoveya/konteksta şeş nîqaşên ku li jorê hatibûn xulasekirin, xwedî giringiyê ye. Çendî ne mimkin be ku di nav vê rapora kurt de dîroka kêşeya kurdî ya zêdetirî du qirnan bi awayekî kitekit bê nîqaşkirin jî, der barê mijara nenavendîtiyê de, ji bo serwextbûneke baştir a ji nîqaşên rojane, pêwîst e ku amaje bi kêliyên şikestinên sereke yên dîrokî û xalên referansê bike.

Polîtîkayên navendîbûnê yên osmanî û serhildanên kurdan ên pêşî

Xebatên ku li ser kokên dîrokî ya kêşeya kurdî hatine kirin û rabêjîyên cuda yên aktorên siyasî yên kurdî, nîşan didin ku du şikestinên sereke yên kêliyê hene: (1) Bi tevahiya sedsala 19'an pêvajoya rojavayîbûn û modernbûnê ya osmanî û (2) di destpêka sedsala 20'î de pêvajoya avabûna Komara Tirkiyeyê. Li Împaratoriya Osmanî ku di navbera navend û cihkî/herêman de parkirineke hêzê ya balrakêş hebû, bi sedsala 19'an re, bi modernbûyîna ku modela netewe-dewletê ji xwe re dikir navend (Mardin 1973), di binyada îdarî û polîtîk de nenavendîti jî holê hat rakirin, pê re binyadeke desthilata navendparêz û homojen bi awayekî qedemeyî hat avakirin. Meseleya nenavendîtiyê, ku li dora têgîha mixtariyetê li ser dihat sekinandin û di çarçoveya meseleya kurdî û ya kêmaran de, heta Makeqanûna 1921'ê di rojevê de bû, bi Makeqanûna 1924'an re bi awayekî zêde devê wê hat girtin.

Gelek aliyên/rehendên kêşeya kurdî hene. Wekî meseleya nasnameyê, newekheviya herêmî û li paş hiştina herêmên kurdan, mexdûriyet, xwerêzdarî, heysiyet û edalet û mijarên aîdî demokrasî û welatîtiyê ku bi gurahî bal li wan tê kişandin (Çiçek 2015). Tevî vê yekê, gava ku bi bingeha meseleyê tê daketin, dikare bê angaştin ku esasê meseleyê kêşeya parkirina serweriya terîtoriyal e. Sosyolog Îsmail Beşikçi, ku der barê kêşeya kurd/Kurdistanê de yek ji referansên giring e, mijarê wek kêşeya mêtîngeha navdewletî dinirxîne (Beşikçi 1992). Di gel vê, sosyolog Mesut Yegen, ku di vî warî de navekî din ê yek ji referansên giring e, diyar dike ku pêvajoya avakirina netewe-

dewletê ya piştî împaratoriye, ev kêşe derxistiye holê (Yeğen 2006, 18–19).

Erdên kurdan bi dirêjîya sed salan di navbera dewletên osmanî û sefewiyan de, wek herêmeke tampon ma. Dewleta Osmanî, çendî ji bo ku li van axan îdareyeke rasterast (*direct rule*) ava bike pir hewl dabe jî (Hassanpour 1992; Xanî, 2020.; Şemo 2005; Aktar 2014, 24–25), mîrekiyên (mîrgehên) kurdan ku ji navendê dûr bûn û li ser hidûdan bûn, ji sedsala 16'an heta nîveka sedsala 19'an ji aliyê aborî, siyasî, hiqûqî û îdarî ve, bi awayekî ne yeknesaq⁵ wek binyadên sosyo-polîtîk ên nîv-serbixwe yên xwedî rayeyên berfireh, karîn hebûna xwe bidomînin. Bi awayekî qedemeyî dawî li statuyên mîrekiyên kurdan hat dayîn û bi taybetî di çarçoveya pêvajoya rojavayîbûn û modernbûna osmanî ya sedsala 19'an de, bi geşepêdana polîtîkayên navendîbûnê re, birêvebirina rasterast a li erdên kurdan hat serdestkirin (Özoğlu 2004, 54–67; Aktar 2014; van Bruinessen 1992, 135; O'Shea 2004, 9, 15; N. Kutlay 1997; Vali 2003). Ev serdema hanê, ku di sala 1847'an de bi hildana ji holê ya Mîrtiya Botan, ku ew mîrtiya kurdan a dawî bû û ji hêla Mîr Bedirxan ve dihat îdarekirin û bi avakirina Wilayeta Kurdistanê⁶ re, ku ew yekser bi îdareya navendî ve girêdayî bû, ji aliyê dîroka nêzik a kêşeya kurdi ve wek dewra şikestina yekem dikare bê nirxandin. Ji lew re serhildanên kurdan ên pêşî, pir berî dewra Komarê wek reaksiyona li dijî modernbûna osmanî û polîtîkayên wê yên ku di vê çarçoveyê de geş bi wan hatiye dayîn tê dîtin, ku ew heta tevahiya sedsala 19'an berdewam bûne.

Nîqaşên li ser xweseriyê yên berî Komarê û Makeqanûna 1921'ê

Berî avakirina Komara li ser bingeha tirkîtiyê, di wan nîqaşên de, hem ên li ser avakirina osmanîtiyê hem jî yên li ser civak û dewleta bi bingeha mislimantiyê, nenavendîti wek alternatîfekê hat rojevê. Fikira osmanîtiyê ya ku di dewra Mehmûdê II'yem de (1808-1839) dest pê kir û bi wekî Fermana Tenzîmatê ya sala 1839, Fermana

⁵ Ewliya Çelebî îşaret bi qanûnameyekê dîke ku mîrtiyên kurdan ên li osmanî xwedî du cure îdareyê ne: (1) Mîrtiyên kurdan (senceq) û (2) hikûmetên kurdan. Senceqên kurdan mîna senceqên din bûn û sistema tîmarê li vir jî derbasdar bû. Lê belê ji senceqên din cuda, mîrên senceqan ji derve nedihatîn tayînkirin û esilzadeyên kurd senceq îdare dikir. Mafê birêvebirina senceqê ji bav derbasî law dibû. Ji ber rewşa nebûna lawên mîrê senceqê, îcar mîrên kurdan mîrzayek hildibijart. Li deverên ku xwegihandina cografyaya wan zor e yan jî li cihên ku nêzî xeta sînor in, hikûmetên kurdan hebûn. Van hikûmetan carinan bac û leşker jî nedidan, lê bi tenê wan otorîteya osmanî nas dikir. Bnr.: (Özoğlu 2004, 56–59)

⁶ Di sala 1846'an de bianîna ser hev a Wilayeta Diyarbekir û senceqên Wan, Mûş û Hekariyan û qezayên Cizir, Botan û Merdînê Eyaleta Kurdistanê tê avakirin. Xelat, wek navenda Artêşa Anadolîyê tê diyarkirin ku ew li cihêkî navendî yê Kurdistanê bû, ji bo desteka veguhastin û lojîstîkê guncan bû û mimkin dida wê yekê ku kurdan "bi kulma hesinî" îdare bikin. Di nav heman dewrê de, ji bo karên îdarî yên Eyaleta Misûlê ji budçeya hikûmeta navendî 67.500 tê veqetandin, lê ji bo Eyaleta Kurdistanê 80.000 qiruş hatibû terxankirin.

Li gori Salnameyên dewletê yên 1847-1867'an Eyaleta Kurdistanê rasterast ji aliyê dewletê ve hatiye avakirin û birêvebirin. Eyaleta Kurdistanê di sala 1867'an de bi Eyaleta Mameretulezîz ve hatiye biyekkirin û eyaleta ku nû hatiye avakirin jî wek Eyaleta Diyarbekirê hatiye binavkirin. Ji bo zanyariyên bikitekit Bnr.: (Özoğlu 2004, 60–62; S. Bozkurt & Akpınar 2011, 93–130)

Îslehatê ya 1856'an û bi verastkirinên Qanûna Esasî ya 1876'an dewam kir ku di bingeha xwe de wehd dikir bêyî ku ferqîya ziman û dîn bike, dê di navbera tebaya osmanî de wekhevîyê pêk bîne, heta destpêka sedsala 20'î bû yek ji rewtekên karîger.

Şirkatiya siyasî ya der barê nasnameya osmanîyê de, ku cudahiye dînî û zimanî/etnikî qebûl dikir, heta sala 1912'an bi rêjeyê mezîn domiya. Şirkatiya ku Bariş Unlu wek "Peymana Osmanîyê"⁷ terfî dikir, di nav Jon Tirkan de bi du cureyî dihat xwendin. Di serî de ermenî gelên nemislîman û wekî arnawid û kurdan jî mislîmanên ne tirk, ev yek li nav çarçoveya avakirina sistemeke siyasî ya nenavendîparêz a li ser bingeha mafên kolektîf dinirxand. Berevajî vê, kadroyên ku hakimî Îtîhad û Tereqiyê (Îttihat ve Terakki- ÎTC) bûn jî, pêşbîniya rejîmeke navendî dikir ku di bin hegomeniya tirkîyê de hin mafan didan kêmarên etnik û dînî û ev kêmar jî li Meclîsê dihatin temsîlîkirin (Ünlü 2018, 101–20).

Prens Sabahaddîn, ku di warê parêziya nenavendîparêziyê de derdiket pêş, diyar dikir ew rejîmeke welê dixwazin ku "ew bi pêdivî û daxwazên wan her gelî re ahengdar e ku ew gel împaratoriya pêk tînin" û wek çareseriyê jî îşaret bi rejîmeke siyasî dikir ku ew li ser bingeha cudahiye kolektîf bû. Li gorî Prens "rizgarbûna ji navendîparêziyê, tê mehneya ku di bin îdareya giştî ya politikaya mişterek de, her kes *efendiyê qethî yê mala xwe ye (cextandin lê hatiye zêdekirin)*." Prens Sabahaddîn ku xîtabî liberalên tirkî û ermenî dikir, derpêş dikir ku daxwazên ermenîyan parçeyekî avabûna ji nû ve ya osmanî ye û ev daxwaz jî wek "di nav sînorên xweserîya îdarî ya berfireh de beşeke temamker a şertên ku fonksiyonên normal ên îdareyê pêşverû dixê bin temînatê" dinirxandin. Prens digot "qet şika min nîn e ku feydeyên xisûsî yê ermenîyan pir rihet dikarin bi feydeyên giştî yê Împaratoriya Osmanî re li hev bikin" û ji bo "destpêka serdemeke nû" bang li liberalên tirkî û ermenî dikir da ku ji bo "bipêşketina welatê hevpar" bi hev re tev bigerin (B. Koçak 2019, 184–86).

Di navbera salên 1908-1912'an de, gelek teşekulên siyasî derketin holê ku wan Peymana Osmanî ya li ser bingeha mafên kolektîfî diparast ku Prens Sabahaddîn temsîliya wê ramanê dikir,⁸ her wiha elîtên kurdî yê mîna Seyîd Ebdulqadir û Emîn Alî Bedirxan jî tevî van partiyan bûn (Özoğlu 2004, 99). Tevî vê yekê, pîraniya kadroyên ku pêşewatî

⁷ Ji sedsala 19'an bi vir ve, di dewra dawî ya osmanî û di avakirina Komara Tirkîyeyê de ji bo analîzeke berfirehtir a li ser konseptê "peyman"ê ya avakirina civak, dewlet û nasnameyê ku xwe dispêre bingeha osmanî, mislîmantî û tirkîyê, bnr.: (Ünlü 2018)

⁸ Firqeya Ehrar a Osmanî (Osmanlı Ahrar Fırkası) ku Prens Sabahaddîn ew ava kiribû, Firqeya Demokrat a Osmanî (Osmanlı Demokrat Fırkası) ku İbrahim Temo yê arnawid û Ebdulah Cewdet ê kurd ew ava kiribû, ku ev kes ji damezirînerên pêşi yê Îttihad û Tereqiyê ne, Firqeya Huriyet û İtilafê (Hürriyet ve İtilaf Fırkası) ku xeyrimislîman destek didayê, di astên cuda de mafên çandî û nenavendîyê diparastin (Ünlü 2018, 112). Der barê vê mijarê de ji bo zanyariyên bikitekit bnr.: (Tunaya 1998)

li Meşrûtiyeta II. dikir (ku ew di sala 1908'an de pêk hatibû), di nav şîrkatiya li dor nasnameya osmanîtiyê de, ji bo kesên netirk qadeke hîn sînordar pêşbînî dikir. Ev qada sînordar jî, bi rêjeyeke mezin ji ber mecbûrîtiya şertên pêwîst ên wê çaxê bû da ku bikarin rejîma Ebdilhemîd hilweşînin. Bi îfadeya Bîrgul Ayman Gulerê "Prens Sabahaddîn ji bo ku bikare yekîtiya osmanî temîn bike, usûla nenavendîtiyê wek rêxistineke ku *esasê federal vedike*, mîna çareserî dîtibû. Bervajiyê vê, tevgera Îtihad û Tereqiyê bi terciha *di çarçoveya dewra rayeyê de (cext lê hatiye zêdekirin)*, bi avakirina usûla nenavendîtiyê derketiye pêş" (B. A. Güler 2007, 13).

Yusuf Akçura, ku di nav damezirînerên Cemiyeta Îtihad û Tereqiyê de cih distand, hîn sala 1904'an di xebata xwe ya bi navê *Üç Tarz-ı Siyaset (Sê Terzên Siyasetê)* de, analîzeke "rasyonel" a siyasetên Yekîtiya Osmanî, Yekîtiya Îslamê û Yekîtiya Tirkan dikir û wek çareserî jî amaje bi Yekîtiya Tirkan dikir. Dîsan Dr. Nazîmê Selanîkî, ku yek ji damezirînerê cemiyetê û ji wan pêşewayan e di îlankirina Meşrûtiyeta II. de cih girtibû ku wê çaxê Ebdulhemîd makeqanûn cardin xistibû meriyetê û soz dabû da ku wê Meclîsê ji nû ve veke, der heqê nenavendîtiyê de ev digotin:

"Prens Sabahaddîn mir, êdî tune ye; bernameya wî ya li ser nenavendîtî, mîletên xweser û eyaletan hat terkkirin. Cemiyeta Îtihad û Tereqiyê navendîtiyê û înhîsara tirkan a li ser desthilatê dixwaze. Li Tirkiyeyê mîletên din naxwaze. Naxwaze ku Tirkiye bibe Awisturyayeke [-Macaristaneke] nû. Tirk di nav yekîtiyekê de bi dibistanên xwe, bi îdareya tirkî û sistema hiqûqê netewe-dewletekê dixwazin" (Hanioglu 2001, 260).

Di şerên Balkanan ên li navbera salên 1912-1913'an de, gelek ax û erdên mezin ji destê Împaratoriya Osmanî derketin -ku cihên wekî Makedonya, Trakyaya Rojava, bajarên giring ên mîna Selanîk jî tê de hebûn û ew der dayikniştîmanê piraniya kadroyên navendî yên Cemiyeta Îtihad û Tereqiyê bûn - vê yeka hanê kir ku bi temamî dawî li lêgerînên siyasî yên li dora nasnameya hevpar a osmanîtiyê were (Üngör 2016, 41-111; Özoğlu 2004, 69, 80). Jixwe di nav rewşa Şerê Cihanê yê Yekem de, ku ew di navbera salên 1914 û 1918'an de qewimîbû û îmkan dabû vê yekê, bi rêjeyeke mezin hebûna madî û simbolîk a gelê ermenî ji rastê hat hilanîn û axa Anadolîyê bi awayekî zêde hat mislimankirin (Dündar 2008; 2011; 2013). Piştî îcar bi kirina mibadeleya infûsê ya di navbera Tirkiye û Yûnanistanê ya di çarçoveya Rêkeftina Aştiyê ya Lozanê de, dê li erdên Anadolîyê jî bi awayekî zêde dawî li hebûna rûman bihata anîn, bi şideta dewletê dê xakên welêt ji nemislimanan bihata "paqijkirin" û "avakirina ji nû ve ya mekan, nasnameya kolektîf û nasnameya grûbê ya li ser hîmê mislimaniya ehlê sune" jî dê bi rêjeyeke mezin bihata temamkirin (Çiçek 2015, 88).

A rast Ebdulhemîdê II'yem (1876-1908), fikriyata osmanîtiyê di çarçoveya nasnameya tirk-mislman de dinirxand û bi tebîra Şerîf Mardîn mebesta avakirina cureyek "pêş-neteweperwerî" hîn di wan salan de hebû (Mardîn 1973, 176). Tevî vê yekê, wek nasnameya biyekker mislimantî bi awayekî hîn xurttir piştî şerên Balkanan hat rojevê. Di dewra navbera 1912-1923'yan de, ku dewlet di bin tehdîda tunebûnê de bû û hêza biyekker a tirkîtiyê jî sînordar bû, ji aliyê kadroyên îtihadî û kemalîst ve wek nasnameya hevpar mislimantî derket pêş (Ünlü 2018, 120–58). Di vê dewrê de meseleya nenaventîtiyê ya li ser bingeha cudahiyan kolektîfî, di konteksta biratiya mislimanî de hat rojevê.

Di çarçoveya kêşeya kurdî û nenaventîtiyê de, divê bal li ser du xalên giring bê kişandin. A pêşî, heta piştî Şerê Cîhanê yê Yekem, di nav elîtên polîtîk ên kurdî de ku bi hejmareke zêde ew girêdayî Peymana Osmanîtiyê bûn, hestên neteweperwerî xurt dibin û daxwaza Kurdistana serbixwe yan jî ya xweser zêde dibin. Cemiyeta Tealî ya Kurdistanê (*Kürdistan Teali Cemiyeti*), ku li Stenbolê di sala 1918'an de ji aliyê elîtên kurdî ve hatibû avakirin û ew kes bi piranî di nav burokrasiya osmanî de cih digirtin, navenda sereke ya vê meyla siyasî ya nû pêk dianî. Bi awayekî giştî pêşewayên/ rêberên dînî yên girêdayî kevneşopiya neqşebendîyê yên ku di bin serokatiya Seyîd Ebdilqadir de bûn alîgirê xweserî û xelife bûn, lê pêşengên ku li Rojava xwendibûn û motîvasyona wan a dînî tune bû û di bin pêşewatiya M. Emîn Alî Bedirxan de bûn jî alîgirê serxwebûnparêzî û laîkiyê bûn (H. Bozarslan 2005; Özoğlu 2004, 81–120). Di gel vê yekê, faktora ku di mobilîzasyona sosyo-polîtîk a girseya kurdî de diyarker bû, Peymana Mislimantiyê bû û tevgereke civakî ya li ser himê neteweperweriya kurdî li holê tune bû (H. Bozarslan 2005, 205; Özoğlu 2004, 123–24; Ünlü 2018, 120–58).

Xala duyem a giring jî ew bû ku di dewra 1918-1923'yan de kadroyên îtihadî û kemalîst li dijî daxwazên elîtên siyasî yên kurdî yên ji bo parkirina serweriya terîtoriyal, bal dikîşandin ser wekheviya kurd û tirkan a di çarçoveya yekîtiya îslamî û tevahiye/ bitûniyê de û daxwazên kurdan ên ji bo xweseriyê jî dipejirandin (H. Bozarslan 2005, 206–7). Wek mînak; Mîstefa Kemal di 16-17 Kanûna Paşîn 1923'yan de, li Qesra Îzmîtê gava rojnamegerên ku ji Stenbolê hatine pê re milaqet dikin û bersiva ku daye rojnameger Ahmet Yalman, vê dibêje:

" (...) ji dêla ku kurdîti bi tenê bê tesewirkirin, li porî pêwîstiya Qanûna Teşkilata Esasiya me jixwe wê bi awayekî mixtariyetên meheli çêbin. Nexwe niştecihê kîjan liwayê kurd be ew ê xwe bi awayê xweser îdare bikin. (...) Meclisa Mezin a Neteweya Tirkiyeyê, ji wekilên xwedî sehiyet hem ên kurdan hem jî yên tirkan pêk hatiye û van her du unsûran hemû menfaet û miqederatên xwe kirine yek" (Atatürk'ün Bütün Eserleri Cild 14 2004, 273–74).

Qanûna Teşkilata Esasiye ku Mistefa Kemal îşaret lê dike, yanî Makeqanûna 1921'ê sistemeke siyasî ya ku xwe li ser bingeha xweseriya wilayet û nehiyeyan pêşbînî dikir. Makeqanûna 1921'ê ji makeqanûnên 1924, 1961 û 1982'yan ên ku di tevahiya serdema Komarê de hatine amadekirin cuda, tesewireke yekîtiya siyasî li xwe vedihewîne (Demirkent 2018), hem ji aliyê amadekirin hem jî ji aliyê naverokê ve makeqanûneke nenavendîparêz e. Makeqanûna 1921'ê, berî her tiştî piştî Şerê Cihanê yê Yekem di encama pelişîna kargêriya/îdareya Stenbolê de, bi “desthilatên kongreyan”⁹ yê li cihkiyan mimkin bûye. Ji lew re Meclisa Mezin a Neteweyî, ku bi rola meclisa damezirîner rabûye, Makeqanûna 1921'ê amade kiriye û ew qebûl kiriye, palpişt a wê ev kongreyên cihkî ne. Çardeh madeyên Makeqanûna 1921'ê, ku bi tevahî ew xwedî bîst û sê made û madeyeke veser e, eleqedarî wilayet û nehiyeyan e ku mixtariyeta wan hatiye naskirin. Madeya 11'an a xweseriya wilayetan verast dike û bêyî ku der barê esasê de nîqaş li serê bibin hatiye qebûlkin, bi awayê li jêrê ye:

“Wilayet, di karên mehelî de xwedî şexsiyeta manewî (hikumê şexsiyet) û xweseriyê ye. Siyaseta derve û ya navxweyî, karên şerî, edlî û leşkerî, têkiliyên aborî yê navneteweyî, bacên giştî yê hikûmetê û wek awarte xusûsên ku ji yekê zêdetir wilayetan eleqedar dikin, li gorî pêwîstiya qanûnên ku ji hêla Meclisa Mezin a Neteweyî ve dê bînin danîn, tenzîm û îdareya karên Weqf, Medrese, Perwerde, Tenduristî, Aborî, Çandinî, Avadanî û Alîkariya Civakî di nav selehiyeta şûrayên wilayetê de ye” (Demirkent 2018).

Makeqanûna 1921'ê ku di warê siyaseta derve û navxweyî, daraz, parastin, têkiliyên navneteweyî, bacê û karên ku gelek wilayetan eleqedar dikin raye dida hikûmeta navendî; lê tenzîm û îdareya karên der barê weqf, medrese û perwerde, tenduristî, aborî, çandinî, avadanî û alîkariya civakî de ji “Şûrayên Wilayetê” re dihiştin.

Der barê Makeqanûna 1921'ê de taybetmendiyeke ku divê bal lê bê kişandin jî ew e ku piştî Rêkeftina Sevrê, hemen yekser ew hatiye çêkirin. Rêkeftina Sevrê ku di 10 Tebax 1920'î de hatiye îmkazkirin, pêşbînî dikir ku li wan xakên hanê yê ku wilayetên Trabzon, Erzirom, Wan û Bedlîsê digrtin nava xwe, dewleta serbixwe ya Ermenistanê bê avakirin û li herêma ku li başûrê wan wilayetan dimîne jî Kurdistaneke xweser bê avakirin ku der barê serbixwebûnê de mafê referandûmê jê re hatibû qebûlkin. Gava li ber çavan bê girtin ku hevdîtînen makeqanûnê yê pêşî di 10'ê Çiriya Paşîn a sala 1920'î de dest pê kiribû û di 20'ê Kanûna Paşîn a sala 1920'î de hatibû pejirandin, dikare bê gotin ku meseleya Ermenistan û Kurdistanê di Makeqanûna 1921'ê de

⁹ Der barê desthilatên kongreyên cihkî de, kongreyên ku bi awayekî gur tim tînin bilêvkin kongreyên Erzirom û Sêwazê ne. Di gel vê, Bulent Tanor dadixuyîne ku di dema 1918-1920'î de si kongre civiyayane. Ji bo nîqaşeke hîn berfêrê a der barê vê mijarê de bnr.: (Tanör 2009)

roleke damezirîner leyîstiyê û tenzîmên li ser xweseriyê jî bi awayekî hîmî wek dayîna bersiveke ji bo van meseleyan e. Jixwe du sal piştî qebûlkirina Makeqanûna 1921'ê, daxuyaniya Mustafa Kemal a ku me li jorê wek iqtîbas wergirtibû, teyîd dike ku qet nebe di warê xweseriyê de kêşeya kurdî bûye xwedî fonksiyona dînamîkeke damezirîner.

Avabûna komarê û bi Makeqanûna 1924'an avakirina birêvebirina rasterast

Di çarçoveya politikayên li ser kêşeya kurdî û kêmarên etnîk/neteweyî û dinî de, meseleya nenasendîtiyê, ku heta salên ewilî yê sedesala 19'an di rojevê de bû û ji Makeqanûna 1921'ê re jî bûbû hîm, piştî ku Dewleta Komara Tirkiyeyê di sala 1923'yan de wek dewleteke unîter a zêde navendî ava bû û di pey re jî bi qebûlkirina Makeqanûna 1924'an re, bi awayekî zêde hat girtin (H. Bozarslan 2000, 22–23). Di vê dewrê de “civaka osmanî wekî wergirtina nasnameyê û bînasnamekirin, du pêvajoyên helwestguherînê jiya. Helwestguherîna di pêvajoya yekem de ji welatparêziya osmanî çûna ber bi neteweperweriya mislimanî û di ya duyem de jî ji neteweperweriya mislimanî çûna ber bi neteweperweriya tirk ve bû” (Üngör 2016, 106). Bi avabûna Komarê re “qadeke siyasî ya vederker a etnikîrî û navendîkirî” hat çêkirin (Natali 2005, 145).

Ji aliyê darê zorê ya dewletê ve tepeserkirina serhildanên kurdan, ku ew serhildan di tevahiya sedesala 19'an û di deh salên pêşî yê sedesala 20'î de qewimîne û wekî berteka li dijî modernbûna Osmanî-Komarê û ya li dijî politikayên navendîbûnê derketibûn holê, bi Terteleya Dêrsimê 1937-38 re ku zehfî bi zîyanên can û bi darê zorê bi kirina ji cih û waran bi encam bûbû, îdarekirina rasterast li hemû Tirkiyeyê hat serdestkirin. Bi îfadeyeke din “peymanî zimnî” ya di navbera elîtên osmanî û kurd de (Mardin 1991, 108), bi avabûna Komarê re bi dawî bû. “Astengên” li pêşîya projeya entegrasyona etno-neteweperwer a dem û mekanê (K. Ökten 2004) ya li ser bingeha “Peymana Tirkîtiyê” (Ünlü 2018, 159–205), bi rêjeyeke zêde ji rastê hatin hilanîn.

Di serdema rejîma tek partiyê ya di navbera salên 1923-1950'yî de, li şûna birêvebirina awarte (îdareya urfî) ku piştî tepeserkirina Serhildana Şêx Seîd de dest pê kiribû û di sala 1927'an de bi dawî bûbû, bi avakirina otorîteyekê da ku cihê wê bigire, li herêma ku bajarên Elezîz, Ruha, Bedlîs, Colemêrg, Amed, Sêrt, Mêrdîn û Wanê bigire nav xwe, Mifetîşîya Umûmî ya I. hat çêkirin (Tuncay 1999; Keskin 2007, 155–59). Sepana Mifetîşîya Umûmî ya ku hemen piştî birêvebirina awarte dest pê kir û hema bibêje hemû cografyaya kurdan girtibû nav xwe, wek ku paşê dibe “verastkirineke îdareya giştî ku li cihên din (ên Tirkiyeyê) jî were bikaranîn” (Tuncay 1999, 179) hat fikirandin û li herêmên cuda yê mîna Trakya û Çukurovayê jî hat sepandin. Di serdema

Împaratoriya Osmanî de verastkirinên ji bo "îslah" a cografyaya kurdan, di dewra Komarê de, li salên 1925-1927'an bi îdareya urfî, li salên 1927-1952'yan bi mifetişiyên umûmî û paşê jî li salên 1987-2002'yan bi birêvebirina rewşa neasayî berdewam bûn (C. Koçak 2010, 293-94). Gava sê derbeyên leşkerî yên ku di navbera salên 1960-1980'yî de pêk hatine li pêş çav bê girtin, dikare bê angaştin ku cografyaya kurdan heta salên 2000'î bi awayekî bêyî navber, bi rejîma birêvebirina leşkerî/îdareya urfî yan jî rewşa awarte hatiye îdarekirin.

Piştî ji Împaratoriya Osmanî derbasbûna li Komara Tirkîyeyê, meseleya nenavendîtiyê bi rêjeyeke mezin li meseleya belediyeyan hat daxistin. Di sala 1920'î de, li Tirkîyeyê pazdeh wilayet û sî û şeş lîwayên (bajarên îroj) di binyeya wan de û hefdeh lîwayên serbixwe yên ku mîna wilayetan xwedî statuyê û rasterast jî girêdayî navendê bûn, hebûn. Di navbera salên 1920-1924'an de sînorên îdarî ji nû ve hatin sererastkirin û heftê û çar wilayetên nû hatin çêkirin ku ew wek mezinbûna cografî hevtayî lîwayan/senceqan bûn. Nuray E. Keskîn, ku li ser birêxistinbûna Komarê ya bingeh-xakî xebitiye, dide diyarkirin ku ji bo diyarkirina sînorên îdarî yên bajarên/wilayetan sedemên mîna "di rewşa îşxalê de rê lê were girtin da ku rêvebirin nekeve destê dijmin", "birêvebirina binyada kêmara etnik/dîni", "rêlibergirtina lihevixistin", "dabînkirina/hêvişandina sedeqeta eşîretan", "hildana bin kontrolê ya eşîretan", "pêkanîna asayîşê" diyarker bûne (Keskin 2007, 137).

Bi Makeqanûna 1924'an re, ku wê li şûna Makeqanûna 1921'ê ya nenavendîparêz sistemeke siyasî ya unîter a zêde navendîperest damezirandiye, ew wilayet hatine fesxkirin ku ew wek yekeyên hîmî yên îdarî xwedî xweseriyê û wek cureyek herêman bûn. Îcar li cihê wan bajar hatin avakirin ku wek qiyasa li rêxistina dernavendî ya îdareya navendî, ew xwedî sînorên hîn biçûk bûn. Bi avabûna Komarê re ketin rêya "navendîbûna rejîma nû ya ji aliyê aborî, siyasî û îdarî ve" (Keskin 2007, 142). Wekî ku Keskîn jî dadixuyîne "rayeya îdareyê ya di asta bajêr de, ji rêxistina dernavendî ya îdareya navendî re hatiye hiştin, îdareyên taybetî yên bajêr di bin pişkinan û çavdêriya nêz a vê mekanîzmayê de fealiyet kirine. Birêxistinbûna Komarê ya ku xwe dispêre axê, li ser reda esasa herêmê û li ser kêşana bi paş ve ya vebijêrka îdareya cihkî ya bajêr hatiye avakirin" (Keskin 2007, 119-20). Di serdema Împaratoriya Osmanî de, belediyeyên ku bi Nîzamnameya Wilayetan a Îdareya Giştî (Îdare-i Umumiye-i Vilayet Nizamnamesi) ya ku di sala 1871'ê de hatiye derxistin, bingeha wan a qanûnî hatibû çêkirin, di sala 1930'yî de bi ketina meriyetê ya Qanûna Belediyeyan re, kir ku çarçoveya sazûmanî ya sereke ya nîqaşên li ser birêvebirinên cihkî û nenavendîtiyê yên Tirkîyeyê pêk werin (Toksöz 2015). Dewra di navbera salên 1935-1957'an de, li cografyaya îdarî ya ku ji aliyê dabeşbûna îdarî ve binyad û prensîbên wê bi cih bûne, ew guherîn in ku ji verastkirinên nuqteyî pêk tên. Di navbera salên 1958-1980'yî de jî li

qedemeyên îdarî hema bibêje tu guhartinek nehatiye kirin” (Keskin 2007, 120).

Di serdema Komarê de ku meseleya nenavendîtiya siyasî bi temamî ji rojevê ketiye, binyada birêvebirina îdarî û siyasî ya navendîparêz a rapir (ekstrem) ji şaredariyan re qadeke gelek sînordar hişt. Di çarçoveya berfirehiya rayeyê de, belediyeyên ku wek dirêjeya navendê yên li cihê hatine veavakirin (Toksöz 2008, 41), di warekî sînorkirî yên mîna paqijî, zabita, îtfaiye, xizmetên park û baxçeyan, xebatên verastkirinên jorxaneyê, xizmetên civakî û xebatên çandî de hatin rayedarkirin.¹⁰ Şaredarî wek yekeyên îdarî yên cihê ku di bin wesayeta îdarî de bi kanên darayî yên pir sînordar fealiyet dikirin, heta destpêka salên 2000’î hebûna xwe domandin (Toksöz 2015, 7–8).

Derbasbûna li sistema pîrpartîtiyê, geşepêdan û “Meseleya Rojhilat”

Bi derbasbûna li sistema pîrpartîtiyê re, mijar di çarçoveya birêvebirina ji cih û geşepêdana cihê û herêmî de, bi asteke sînordar be jî careke din hat rojevê. Tevî vê yekê nîqaşên ku dabaş li ser wan e, di warên îdarî de li dor berfirehiya rayeyê sînordar ma û hîn bêhtir li ser modernîzasyon û rasyonelîzasyona birêvebirina gelemper hat sekinandin û lêhûrbûn li ser vê çêbû (Ö. Dinçer 2020, 13-14).

Di bernameya Partiya Demokrat de ku dê di sala 1950’yî de bihata îqtidarê (made 20), ji bo zêdebûna beşdariya siyasî û berhemdariya xizmetê dihat gotin ku dê birêvebirina ji cihê bê xurtkirin (Demokrat Parti 1946). Tevî vê, di kiriyariyê de li şûna deverbûnê/cihkîbûnê meyla navendbûnê xurt bû. Wek mînak di vê dewrê de, li gorî qanûnê diviya ku serokên belediyeyan ji nav meclisa belediyeyê û ji aliyê meclisê ve bihatina hilbijartin, lê li bajarên mezin ên mîna Stenbol, îzmîr û Enqereyê ew rasterast hatin tayînkirin. Dîsan, serokwezîrê wê dewrê rasterast bû midaxilê karên îmarê yên li Stenbolê (Toksöz 2008, 43; Toksöz û yd. 2009, 38).

Li Tirkiyeyê heta salên 1960’î birêvebirinên cihê ku “bi temamî di bin pişkinan û serweriya îdareya navendî de” mabûn (Kazancı 1983, 41), bi Makeqanûna 1961’ê re bi tevahî qels bûn. Di Makeqanûna 1924’an de (made 91) hatibû diyarkirin ku wê berfirehiya rayeyê ya di îdarekirina wilayetan de (*tevsi-i mezuniyet*) û parkirina wezîfe û rayeyê (*tefrik-i vezâif*) wek esas bê hildan, lê di Makeqanûna 1961’ê de (made 115) parkirina wezîfe û rayeyê hat derxistin (Aktar 2014, 39–41). Berê serokên şaredariyan ji nav meclisa belediyeyan, ku ji hilbijartiyên pêk dihat, dihatin hilbijartin, bi verastkirina di Makeqanûna 1961’ê de, bi hilbijartina rasterast hatin

¹⁰ Qanûna Belediyeyan a sala 1930’yî ya bi hejmarê 1580’yî, di internetê de ji bo gihanê vekirî ye. Bnr: <http://www.yds.gov.tr/dosyalar/1326978039-1580.pdf>, dema gihanê: 22.10.2020.

ser wezîfeyê. Vê rewşê nerîtekê da dest pêkirin ku heta dema me didome: Meclisên şaredariyan ku li îdareyên cihkî qada mizakere û lihevkerî berfireh dikir, qels bû û serok hatin hêzdarkirin. Li hêla din, makeqanûna nû rayeya danîna bacê ya şaredariyan rakir ku belediye berê bi awayekî sînordar be jî xwedî rayeya afirandina dahatê yên mîna xerc û bacan bû û ev çavkanî ji wan re dahatê pêk dianî, lê bi vî awayî pêgirîbûna wan a malî ya bi navendê re jî zêdetir kir. Tevî vê, wek bipêşketineke erênî hildana ji wezîfeyê ya serokê şaredariyan û ya meclisên şaredariyan, bi temînata darazê ve hat girêdan (Toksöz 2008, 44; 2015, 7-8).

Verastkirineke din a giring ku di salên 1960'î de meylên navendîbûnê xurt dikirin, avakirina Rêxistina Plansaziya Dewletê (RPD) ye. Di serdema Geşepêdana Plansaz de ku hakimê dewra salên 1960-1980'yî bû, planên geşepêdana neteweyî yên pênc salane, bi ranêzikiya plansaziya navendî hatin amadekirin. Di warê geşepêdana aborî û siyasî de, gava ji aliyekî ve bipêşxistina polîtîka û rayeya palansaziye navendî dibû, li aliyê din jî birêvebirin û lêparkirina çavkaniyên gelemper hîn bêhtir ketin bin kontrola birêvebirina navendî (Toksöz 2008, 44).

Di plansaziye geşepêdana neteweyî yên pênc salane ya yekem ((1963-1967) û ya duyem (1968-1972) de, gava ku ji bo newekheviya di navbera herêman de bê hildan û ji bo bipêşketina mekanî ya terazdar, armanca "bipêşketina herêmî" û nêzikahîtdana "plansaziya herêmî" wek bingeh dihatin berçavkirin (Devlet Planlama Teşkilatı 1963; 1968), bi dewra geşepêdana sêyem re dev ji vê ranêzikiyê hat berdane û polîtîkaya "deverên berênî yên geşepêdanî" hat pejirandin (Devlet Planlama Teşkilatı 1973). Wek sedema guherîna vê polîtîkayê jî bal li mehzûrên têgiha "herêm"ê hat kişandin. Li gorî vê, di vê stratejiya nû de ku dê rê li ber "*meylên berbelavebûna asta herêmî ya îdareyê* yên ku di demên borî de kariye tevahiya planê têk bide bigire û ji bo ku cihên wek deverên berênî yên geşepêdanî hatine terîfkirin, da ku berê wan bidin mebestên geşepêdana demdirêj ên di warên potansiyelên wan ên heyî de û *di nav prensîpa tevahiya neteweyî de* jî bipêşketinên aborî û civakî bîn temînkirin, wek prensîba sereke hatiye qebûlkirin (ev *cext hatine xuyakirin*)" (Devlet Planlama Teşkilatı 1973, 938).

Bûyera herî giring a ku di dewra 1960-1980'yî de meseleya nenavendîtiyê anî rojevê, hîlbijartinên sala 1973'yan e. Piştî ku mixalefetê çil û yek şaredariyên bajarên kar kir bi şûn de, lihevixistina di navbera navend û cihkiyan de zêde bû û vê yekê jî xweseriya şaredariyan û kêşeya çavkaniyên îdare û darayî anî rojevê (Toksöz û yd. 2009, 38-39). Tecrubeya "belediyevaniya civakparêz" (Kamalak & Gül 2013), ya ku di salên 1973-1977'an de li bajarên ku sosyal demokrate ew şaredarî îdare dikirin derketibû holê, hem li hemberî navendê xurtkirina cihkiyan hem jî der barê mijara belediyevaniya

alternatîf de, ku beşdariya siyasî berfireh dikir û li ser mafên aborî û civakî hûr dibû, bû referanseke giring (Şahin 2013, 342–43; M. Güler 2013). Di nav wan çil û yek şaredariyên hanê de şaredariyên Stenbol, Îzmîr, Enqere, Antalya, Mêrsîn û Qeyseriyê jî tê de, ku CHP'yê sî û sisêyên wan kar kiribûn, piştî ku ew di sala 1977'an de hat ser îdareyê, di dewra hikûmeta Ecevît de Wezareta Birêvebirinên Cihkî hat avakirin (Özaslan 2015) û teşebusên der barê xurtkirina birêvebirinên cihkî de zêde bûn. Ecevît, di bernameya hikûmetê de mebesta Wezareta Birêvebirinên Cihkî wek "ji bo hildana ji holê ya xitimîbûna îdarî û darayî ya birêvebirinên cihkî, çêkirina tenzîman da ku bi vî awayî di van birêvebirinan de kartêkerî û sazbarî zêde bibin û hêzdana demokrasiyê ya bi wê rêyê" terîf kiribû (Türkiye Büyük Millet Meclisi 2013, 5398). Di gel vê yekê, nîqaşên di vê dewrê de bêyî ku di têkiliyên navbera navend û cihkiyan de veguherîneke şayanî dîqetê çêke, bi guherîna hikûmetê û di pey re jî bi derbeya leşkerî ya 12'ê Îlonê re navbir lê ket.

Bi avabûna Komarê re mixalefeta kurdî ya ku bi şideta dewletê hat serkutkirin, piştî nêzikî bîst salên bêdengiya siyasî, di salên 1960'î de ji nû ve zindî bû. Mixalefeta kurdî ya ku wek parçeyekî siyaseta giştî ya Tirkîyeyê xwe bi rêxistin kiribû, di van salan de, mijar wek "Meseleya Rojhilat" çarçove kir (M. E. Bozarslan 1966). "Meseleya Rojhilat" jî aliyekî ve îşaret bi şideta dewletê ya li ser "Rojhilat" dikir, ji aliyê din ve cext li ser newekheviya di navbera herêman de dikir û daxwaza geşepêdana "Rojhilat" dikir (Bucak 2021, 103–7). Slogana "Ji Rojava re fabrîka û rê, ji Rojhilat re qereqol" (*Batıya fabrika yol, Doğuya karakol*) a di Mitîngên Rojhilat de, ku di navbera salên 1967–1969'an de hatibûn lidarxistin, vê siyaseta xulase dike (Bozçalı 2006; M. N. Kutlay 2006).

Bi salên 1970'yî re baskê "rastgir" ê mixalefeta kurdî tercîh kir ku di nav siyaseta tirkî ya îslamî, neteweperwer û mihafezekar de bimîne, lê belê baskê "çepgir" jî siyaseta tirkî qetîya û radîkal bû (H. Bozarslan 2012; Yeğen 2006, 174–81; Marcus 2007, 15–32; Barkey & Fuller 1998, 24–25; İmset 1993, 26–27). Di salên 1970'yî de PKK (Partiya Karkerên Kurdistanê) jî di nav de gelek partiyên kurdî hatin avakirin û teza ku "Kurdistan mêtîngeh e" bû rabêja hevpar a van partiyan ku pîrî jê derqanûnî bûn (İmset 1993, 405–43; "1971-1980 Arasında Kürt Sorunu" 1988). Nemaze bi derbeya 1980'yî re şideta dewletê ya ku gur û belave bû, radîkaliya di siyaseta kurdî de zêde kir û zemîn ji radîkaliya kirdarî re çêkir (H. Bozarslan 2000).

Makeqanûna 1982'yan, neoliberalîzm û veguherîna birêvebirinên cihkî

Bi Makeqanûna 1982'yan re, ku piştî derbeya leşkerî ya 1980'yî hatiye amadekirin, wesayeta li ser birêvebirinên cihkî hat zêdekirin û binyada navendî ya li Tirkîyeyê

gihîşt gopîtkê (Aktar 2014, 11). Mîna Makeqanûna 1961'ê, Makeqanûna 1982'an ku cextê li yekgirtiya îdareyê û li esasê birêvebirina ji navendê, birêvebirina ji cihî û berfirehiya rayeyê dikir, sê tenzîmên resen/taybetmend ên ji bo meyla navendîparêz li xwe digire. Ji van a yekem, di xala 126'an de ku îdareya navendî verast dike û cextê li "bi mebesta ku di xizmetên gelemper de berhemdarî û ahengê çêke, dikare teşkîlata îdareya navendî ku dibe ji yekê zêdetir bajarên bigire nav xwe were avakirin" dikir, ji Makeqanûna 1961'ê cudatir, bi awayê parçeyekî teşkîlata îdareya navendî pênasekirina dameziraweyên gelemper ên raserî bajarên e. Ya duyem, di xala 127'an de ku ew îdareyên mehelî verast dike, dide diyarkirin ku birêvebirina navendî der barê birêvebirinê cihkî de xwedî rayeya "wesayeta îdarî" ye. Ya dawî, hildana temînata darazê ye ku Makeqanûna 1961'ê dabû birêvebirinê cihkî (xala 116'an) û ji wezîrê navxweyî re dayîna rayeyê ye ku ew dikare organên îdareya cihkî û endamên van organên ji wezîfeyê bi dûr bixe. Jixwe sala 2016'an û piştî wê, li şaredariyên ku siyaseta kurdî ya sereke ew îdare dikirin, ji peywirê hildana şaredaran û li şûna wan tayînkirina qeyûman, bi awayekî fiêlî bêfonsiyonkirina meclisên belediyeyan, dê bi palpiştîya vê verastkirina makeqanûnî bihata kirin (Arikboğa 2020).

Piştî derbeya 1980'yî, di konteksta birêvebirinê cihkî de bipêşketineke din a giring ku divê cext lê bê kirin jî, nêzikahîtdana neolîberal e ku di polîtîka û xizmetên gelemper de serdest e. Di vê dewrê de, ku dewlet li gorî binyad-piyaseyî dageriya, li giştîya welêt mafên civakî berteng bûn, polîtîkayên civakî zeif bûn û taybetîkirin/xwemalîkirin jî zêde bûn. Dewlet ku di warê aborî û civakî de xwedî pozîsyona hilberîner bû, li aktorekî verastker û kontrolker ê navend-piyaseyî dageriya. Bi "belediyevaniya neolîberal" re ku girêdayî vê veguherînê bi pêş ket, rayeya birêvebirinê cihkî ya midexalekirina li fiyetan wekî nan û mînbûsan, ji destê wan hat standin û derbasî "sîstemeke fiyetê ya ku şertên piyaseya serbest ew diyar dikir", bûn (Toksöz 2015, 9–10). Her wisan, bi awayê paralelî veguherîna di asta navendî de gava ku ji aliyekî ve xizmetên gelemper taybetî dibin, ji aliyê din ve ji belediye ji saziyên ku xizmetan rasterast hildiberandin, li dameziraweyên ku îcar bi rêya îhaleyê xizmetan belav dikin, dageriyan. Rola belediyeyan bi dabeşkirina kanan, kontrolkirin û verastkirinan hat sînordarkirin. Gava welatî bûn mişterî û belediye jî bûn dameziraweyên ku wekî kargehên taybetî dixebitin, xizmetên gelemper ên cihkî jî bi rêjeyeke giring bûn ticarî. Şaredarî bi rayeya ku ji gelemperê/ameyê standîye û bi kan û çavkaniyan diviya li gorî feydeya gelemper bixebitiya, ketin rewşa dameziraweyên ku li ser bingeha piyaseyê rantê hildiberîne û belav dike (Çiçek 2011, 35–47, 61–66).

Di çarçoveya belediyevaniya neolîberal de, divê binê berfirehkirina rayeyên îmarê yê şaredariyan jî bê xêzkirin. Bi dewrîkirina rayeya îmarê ya li belediyeyan re, ku di hilberîna ranta bajarî de cihekî wê yê diyarker heye, ji aliyekî ve feraseta

belediyevaniya bingeh-rantiye xurt û belave bû, ji aliyê din ve jî di siyaseta cihkî de rantiye ket rewşeke aktîf (Toksöz 2015, 9–10).

Bajarbûna ku eleqedarî parkirina kanên bajarî û îdarekirina rantê ye û bi vê yekê re bi awayekî lezgîn zêde û berbelav dibe, meseleyeke din a krîtîk jî avabûna şaredariyên bajarên mezin in ku rehendên cuda yên wekî berfirehbûna cihî ya qadên bajarî, di warê pêşkêşkirina xizmetê de plansazî û zêdebûna pêdiviya koordînasyonê li xwe digire. Bi verastkirina qanûnî ya ku di sala 1984'an de bi palpiştiya Makeqanûna 1982'yan hatiye kirin, li Stenbol, Îzmîr û Enqereyê şaredariyên bajarên mezin hatin damezirandin. Belediyeya du qedemeyî bi binyada xwe ya birêvebirinê re, di serî de rayeyên îmarê gelek rayeyên aîdî belediyeyên ji qedema jêr li şaredariyên bajarên mezin veguhastin (Toksöz 2015, 8–9). Li Tirkîyeyê ku rayeyên birêvebirinê cihkî yên siyasî tune ne, di bin wesayeta îdareya navendî ya îdarî û malî ya giran de ne û xwedî çavkaniyên sînorkirî ne, bi tenzîmkirina bajarê mezin re di nav qada sînordar a cihkî de raye û çavkaniyên belediyeyên ji qedema jêr hatin sînordarkirin. Di gel vê rewşê, şaredariyên bajarê mezin, li hemberî îdareya navendî wek qadên nû yên îdarî û aktoren siyasî derketin pêş.

Şertê Xweseriya Birêvebirinê Cihkî yê Ewrûpayê

Binyada navendîparêz a ku bi Makeqanûna 1982'yan ve zêde bû, heta serê salên 2000'î jî domiya. Çendî ku veguherîneke binyadî neanîbe holê û di kardariyê de rê ji guherîneke şayanî dîqetê re venekiribe jî, divê di vê dewrê de Şertê Xweseriya Birêvebirinê Cihkî yê Ewrûpayê (*The European Charter of Local Self-Government*) mirov hilde dest ku Tirkîyeyê ew îmtiza kiriye. Ji lew re, bi taybetî piştî salên 2000'î ji aliyê biwara xurtkirina birêvebirinê cihkî yan jî ya xweseriya cihkî ve hem siyaseta kurdî ya sereke hem jî ji hêla siyaseta tirkî ya serwer ve ev şertê hanê wek çavkaniyekê hat nirxandin.

Ev belgeya ku ji aliyê welatên Rojava ve hatiye amadekirin, ku ew welat di nav endamên damezirîner ên Konseya Ewrûpayê de cih digirin û nenavendîti li wan serdest e, di 15'ê Çiriya Pêşin a 1985'an de ji îmtazkirinê re hat vekirin û di sala 1988'an de jî ket meriyetê. Şert ku bi palpišta fikira "hêvişandin û xurtkirina birêvebirinê cihkî yê xweser ên li welatên Ewrûpayê dê alîkariyê li çêkirina Ewrûpayeke ku xwe dispêre prensîpên demokratîk û nenavendîparêziyê bike", di serî de welatên Ewrûpaya Naverast û Rohilat, ji bo piraniya welatên endam di warê xurtkirina xweseriya îdarî û malî ya birêvebirinê cihkî de fonksiyona rêbereke beralîker bi cih anî. Di gel Protokola Veser, a ku di 16'ê Çiriya Paşin a 2009'an de hat qebûlkirin û di 1 Hezîran 2012'an de ket meriyetê, tenzîmên "ji bo mafê beşdariya li îcreatên

birêvebirinên cihkî” ya welatiyan jî, lê hatin zêdekirin.¹¹

Tevî vê yekê, li ser welatên endamên Konseya Ewrûpayê wesfekî girêder ê Şert nîn e. Li aliyê din, di gel ku prensîpên giştî yên der barê xweseriya îdarî û darayî de li xwe digire jî, der heqê vê mijarê de modelekê pêşkêşî welatên endam nake. Jê wêdetir, Şert bi xwe maf dide welatên endam ku dikarin ihtirazan/rezervan deynîn ser hin xalan.

Tirkiye Şertê Xweseriya Birêvebirinên Cihkî yê Ewrûpayê di 21 Çiriya Paşîn 1988’an de îmza kir. Di 9 Kanûna Pêşîn 1992’yan de Meclisa Mezin a Neteweya Tirkiyeyê (MMNT) Şert qebûl kir û di 1 Nisan 1993’yan de ket meriyetê. Tirkiyeyê çendî Şert îmza kiribe jî, lê hema bibêje rezerv daniye ser tevahiya xalên ku di warê siyasî, îdarî û darayî de ji bo birêvebirinên cihkî xweseriyê dinase yan jî wan xalên ku xweseriyên der barê van waran de berfireh dike (Aktar 2014, 99–104).

Jixwe qebûlkirina Tirkiyeyê ya Şertê Xweseriya Birêvebirinên Cihkî yê Ewrûpayê, di sepan û kirdariyê de tu guherînek pêk neanî. Ji 1982’yan heta serê salên 2000’î, ji heft tenzîmên qanûnî yên ku ji bo reforma birêvebirinên cihkî hatibûn amadekirin, tu yek jî nehat pejirandin (Aktar 2014, 45). Qanûna wilayetan a Birêvebirina Giştî (Îdare- i *Umumiye-i Vilayet Kanunu*) ku di sala 1913’an de hatibû qebûlkirin û Qanûna Şaredariyan a ku di 1930’yî de hatibû qebûlkirin, heta nîveka salên 2000’î derbasdariyên xwe hêvişandin û sînorên sazûmanî yên birêvebirinên cihkî yên li Tirkiyeyê jî diyar kirin.

Salên 90’î: Nîqaşên li ser federasyon û modela Baskê

Di salên 1990’î de ku Şertê Xweseriyê hat îmzakirin, bipêşketineke giring a din a balkêş jî ew nîqaşên li ser “eyalet”, “federasyon” û “modela Spanya/Baskê” ne, ku di çarçoveya “çareseriya navxweyî” ya der barê kêşeya kurdî de hatibûn kirin. A rast sîstema eyaletan di pey derbeya leşkerî ya 1980’yî de ji ber endîşeya ewlehiyê hatibû rojevê. Bi Biryarnameya bi Hukimê Qanûnê (BHQ) ya bi hejmara 71’ê ya 4 Çiriya Pêşîn 1983’yan ku di hejmara 1818’an a Rojnameya Fermî de hatibû weşandin, avakirina îdareyên herêman û walîtiyên herêman dihat pêşbînîkirin. Bi vê biryarnameyê, li heşt cihan herêm/eyalet dihatin damezirandin ku navenda wan Erzîrom, Amed, Edene, Qeyserî, Enqere, Qonya, Stenbol û Îzmîr bû. Tevî vê yekê, biryarnameya ku bi teklîfa Kenan Evren hatibû amadekirin, ji ber nîgeranî û fikara binyada dewletê ya unîter û ranêzikilêkirina artêşê, ji hêla hikûmetê ve hat redkirin (Köker 2017).

¹¹ Ji bo wergera tirkî ya Şertê Xweseriya Birêvebirinên Cihkî yê Ewrûpayê û Protokola Veser bnr.: (Aktar 2014, 105–8)

Ji walîtîyên herêmî cuda ku ji ber endîşeya ewlehiyê hatibûn rojevê, li salên 1990'î di çarçoveya çareserîya siyasî ya kêşeya kurdî de, hin formên ji hev cuda yên nenaventîtiyê hatin rojevê. Serokkomarê wê dewrê Turgut Ozal, di daxuyaniya xwe ya ku di 15 Çiriya Pêşîn 1991'ê de dabû Rojnameya Hurriyetê, gotibû “federasyon jî tê de divê em bikarin her tiştî nîqaş bikin”, bi vê gotina xwe hemleyeke wisan kiribû ku li Tirkiyeyê tabûyên der barê kêşeya kurdî de şikandibûn. Li gorî Cengîz Çandar, ku bi Ozal bi xwe re xebitibû, Serokkomar ne alîgirê federasyonê bû. Heta ji ber ferqa bipêşketina di navbera herêman de û ji ber ku beşeke giring a kurdan li herêman rojava dijiyan, federasyonê li ser hîmê etnîkî ji bo kurdan sûdwer nedidît. Di gel vê yekê, di hevraçanga (konteksta) çareserîya siyasî ya meseleyê de, federasyon jî tê de diparast ku divê li ser hemû vebijêrkan bê axaftin (Doğan 1994, 323–27; Çandar 2013).

Bi awayê ku kurdên Iraqê jî bigire nava xwe, ew spekulasyonên der heqê Ozal de ku dixwast kêşeya kurdî li dora modela federsayonê çareser bike, îroj jî hîn didomin. Di gel vê yekê Çandar dadixuyîne ku Ozal sîstema eyaletan diparast. Li gorî Çandar, Ozal federasyon wek “sepaneke feydedar û realist a ku li kevneşopiya îdarî û binyada heyî ya Tirkiyeyê tê” nedidît. Hal we ye xwedî wê fikirê bû ku “sîstemeke eyaletan” a ku xwe naspêre bingeha etnîkî hem realist hem ji aliyê aborî ve berhemdar bû hem jî dê alîkariyê giring li çareserîya pîrsgirêka kurdî bikira. Li gorî vê, bi sînordarkirina bajaran re herî zêde deh, dozdeh eyalet dikaribû bihatina avakirin. Ozal ku sîstema eyaletan li pêşberî raya giştî neanibû ser zimên, bi “sîstemeke serokatîyê” re, ya wekî ya DYA'yê, difikirî (Çandar 2007; 2014).

Der barê vê mijarê de hemleyeke din jî, ji hêla serokwezîra wê demê Tansu Çîler ve hat kirin. Çîler di daxuyaniya xwe de, ku di 10 Çiriya Pêşîn 1993'yan de dabû çapemeniyê, gotibû “em ê jî ji tecrubeya Spanyayê îstifade bikin”, lê serokkomarê wê dewrê Suleyman Demîrel bi gotina “çareseriyê li Spanyayê megere”, bertek nîşan dabûyê (Al Jazeera Türk 2013b). Çendî li qedemeyên raser ên dewletê der barê vê yekê de lihevhatinek tune be jî, hemleya serokwezîr a der heqê çareserîya kêşeya kurdî de, “modela herêmîbûyîna siyasî” (Marcou, Gazaryan & Syoboda 2000, 28–33) ya ku Herêma Otonom a Baskê (*Euskadi*) ew li Spanyaya ku dişibe sîstema federal lê hîn pirtir wek dewleta herêmî tê pênasekirin, anî rojevê û nîqaşeke gelemperî da destpêkirin; Spanya ji hefdeh herêman otonom pêk tê û Herêma Baskê jî yek ji wan e. Li Tirkiyeyê di destpêka salên 1990'î de, li wê wexta ku şideta ji ber kêşeya kurdî diqewimî zêde dibû û lihevixistinên ku gihîştibûn asta “şerê kêmgur”, pêşniyazên wek federasyon û otonomiya herêmî, ku di asta serokkomar û serokwezîr de hatibû bilêvkirin, referanseke dîrokî ya giring e.

Kurdistan: Herêma taybetî/xweser a dewletê

Polîtîka û sepanên ji bo avakirina binyadeke îdarî û siyasî ya navendîparêz û unîter ku ji osmaniyan dewr hatine standin û bi Komarê re ji wan geşe bi xwe daye, gava di tevahiya sedsala 20'î de domiyaye ji dewlet cografyaya Kurdistanê, ango bajar û bajarokên ku li wan deran kurd xwedî piraniyê ne, li derveyî binyadeke unîter, bi wateya "negatîf" ew wek herêmekeke taybetî/xweser îdare kir. Bi gotineke hîn aşkeratir, ji aliyekî ve gava dewlet wek binyadeke navendîparêz û unîter tê avakirin û îdîaya dewleta unîter tê kirin, li aliyê din li herêma Kurdistanê, li derveyî vê avaniyê polîtîkayên îdarî, siyasî, aborî, çandî û leşkerî pêk anîn û ji bo van jî binyadên îdarî yên xweserî herêmê ava kirin.

Li herêma Kurdistanê, ji bilî nasnameya tirkî ya çandî hebûna nasnameyeke kurdî ya çandî li derî nîqaşê ye. Tevî hemû tehde û sepanên polîtîkayên binyad-asîmilasyonî yên di berdewamiya komarê de, kurdan ji bo parastina zimanê xwe û nasnameya xwe ya çandî ku ziman kakilê vê nasnameyê pêk tîne, li ber xwe da û hewlên xwe didomînin. Di gel vê rewşê, polîtîkayên dewletê yên xweserî herêmê yên der barê ziman û çandê de, çandî li salên 2000'î di van waran de naskirina qismî û vekirina qadan a sînordar çêbûbe jî, lê bi rêjeyeke mezin karakterê xwe yê asîmilasyonîst dihêvişînin (mihafize dikin).

Di gel polîtîkayên çandê, cografyaya kurdan wek îdarî jî li derveyî binyada unîter di bin birêvebirineke taybetî/xweser de ma. Piştî serkutkirina Serhildana Şêx Seîd, nêzî du salan herêm bi îdareya urfî hat birêvebirin, di 1927'an de Mifetîşîya Umûmî hat avakirin, ku ew wek cure birêvebirina rewşa neasayî bû û ev îdare heta sala 1952'yan domiya. Bi derbeyên 1960, 1971 û 1980'yî re îdareya leşkerî ya li cografyaya kurdan dewam kir. Rojavayê Tirkiyeyê, nemaze piştî 1983'yan, ket dewra rewşeke asayî ya dîmaneyî (rolatîf), lê li herêmê di 1987'an de rewşa neasayî hat îlankirin û heta 2002'yan ev îdareya taybetî/xweser hema bibêje li tevahiya cografyaya kurdan domiya. Piştî asayîbûna dîmaneyî ya di navbera salên 2002 û 2015'an de, bi veguhastina lihevixistinê li navendên bajaran, rejîmên qeyûman ên cihkî ku di 2016'an de dest pê kiriye, ev çar sal in ku didomin.

Divê binê wesfê eskerî ya vê îdareya taybetî/xweser a li cografyaya kurdan bê xêzkirin. Dikare bê gotin ku li herêmê ji vî aliyê ve îdareya binyadên leşkerî yên li Tirkiyeyê jî -ku rêxistina polîsan jî dikare tevî vê bê kirin- bi awayekî diyar li derveyî binyada unîter dimînin.

Cografyaya kurdan bi qasî warên çandî, îdarî û leşkerî, ji hêla warê sosyo-ekonomîk

ve jî li derveyî binyada unîter ma. Ji aliyê warê sosyo-ekonomîk ve, li Tirkîyeyê binyadeke unîter a xwedî şeweyeke tek nîn e. Berevajiyê vê, bi dirêjîya dîroka Komarê re qadên sosyo-ekonomîk ên ku ji hev bi ferq bûne hatine avakirin û di pêvajoya vê avakirinê de hema bibêbêje temamî cografyaya kurdan di pozîsyona “çepera çeperê” de hat hiştin û çavkaniyên wê jî bi awayekî sistematîk li bajar û herêmên rojava hatin veguhastin. Îroj hema bibêje li gorî hemû nîşanderên sosyo-ekonomîk, hemû bajar û bajarokên ku kurd li wan piraniyê pêk tînin, herêmên herî xizan û mehrûm ên Tirkîyeyê ne. Di salên pêşîn ên Komarê de Stenbol û Îzmîr û dorhêla wan bi awayekî diyar xwedî rewşeke wisan bûn ku ji bajarên din bipêşketîtir bûn. Cudahiya bipêşketîbûnê ya şayanî dîqetê ya di navbera bajar û herêmên din de, tune bû. Bi Plansaziya Pîşesaziyê/Endustriyê ya Pênc Salane ya Yekem a 1933'yan re, hewl hat dayîn ku geşepêdana sosyo-ekonomîk li cografyayê hîn berfirehtir bê belavekirin. Lê belê di salên pey re, bi rêjeyê mezîn ev geşepêdan tenê bi aliyê rojava ve sînordar ma. Di hemû plansaziyên geşepêdanê yê neteweyî de, ku ji sala 1963'yan bi vir de tînin amadekirin, çendî cext li ser newekheviya herêman bê kirin jî, bi salên çûyî re newekheviya di navbera herêman de her ku çû zêdetir bû (Çiçek 2012; Massicard 2009).

Li vir divê behs ji Projeya Başûrê Rohilatê Anadolîyê (GAP; *Geneydoğu Anadolu Projesi*,) bê kirin. Projeya Başûrê Rohilatê Anadolîyê, ku di 1977'an de wek projeyên xwedî binyada enerjî û avdanê dest pê hatibû kirin û bi salên 1990'î re jî mîna projeyê geşepêdana sosyo-ekonomîk a herêmî jî bo raya giştî hatibû pêşkêşkirin, tesîreke şayanî dîqetê ya ji bo kêmkirina newekheviya herêmî çênêkir. Ji lew re tevî hemû rabêjî û angaştên der barê geşepêdana herêmî de jî, ew bi awayekî esasî wek projeyê enerjîyê hat dîtin. Aliyên wê yê civakî û aborî yê ku wê bikira di asta herêmî de veguherînekê çêkîra hatin îhmalkirin. Hema bibêje piştî nîv qirnî bi şûn de, projeyên enerjîyê bi rêjeyê mezîn hatin temamkirin, lê di warê pêkanîna projeyên avdaniyê de mesafeyê gelek sînordar hat kudandin. Li gorî daneyên Serokatiya Birêvebirina Geşepêdanê ya Herêma GAP'ê, li dawîya sala 2019'an %76'ê projeyên enerjîyê temam bûne û ketine fealiyetê. Bi 28,4 milyar dolarê ku bi dest ketiye, hemû veberhênanên ku ji bo Projeya Başûrê Rohilatê Anadolîyê hatine kirin, hatine finansîkirin. Her wiha însaatên %16'ê projeyên enerjîyê didome. Berevajiyê vê yekê, bi tenê %32'yê projeyên avdaniyê yê di çarçoveya vê projeyê de hatiye temamkirin. Rêjeya projeyên avdaniyê yê di merheleya avakirinê de jî bi tenê %73.¹² Jixwe daneyên rojane yê sosyo-ekonomîk vê rewşê diselmînin. Li gorî daneyên *Lêkolîna Rêzbandiya Bipêşketîbûna Sosyo-Ekonomîk a Bajar û Herêman (Endeksa*

¹² Daneyên rojane yê der barê Projeya Başûrê Rohilatê Anadolîyê de, di nivenga înter de ji gihanê re vekirî ne. Bnr.: www.gap.gov.tr

Bipêşketîbûna Sosyo-Ekonomîk/SEGE -2017) ku herî dawî di 2017'an de hatiye rojanekirin û ji hêla Wezaretê Pîşesazî û Teknolojiyê ve hatiye weşandin, hema bibêje hemû bajarên ku herêma qedemeya şeşem a ku herî kêmbi pêşketiye pêk tîne, ew wilayet in ku ji aliyê nifûsê ve kurd li wan xwedî piraniyê ne (Acar û yd. 2019).

Nexşe 1. Nexşeya Qedemeyên Bipêşketîbûnê ya Bajaran a SEGE-2017'an



Çavkanî: Salih Acar, Leyla Bilen Kazancık, Mustafa Caner Meydan & Mustafa Işık, *İllerin ve Bölgelerin Sosyo-Ekonomik Gelişmişlik Sıralaması Araştırması SEGE-2017* (Ankara: Kalkınma Ajansları Genel Müdürlüğü Yayını, 2019), 37.

Ev tabloya ku di Nexşe 1 de dixuye ne nû ye û divê bê daxuyandin ku di wan xebatan de ku ji hêla Rêxistina Palansaziye ya Dewletê ve hatine kirin jî, yê salên 2011 (Bölgesel Gelişme ve Yapısal Uyum Genel Müdürlüğü 2013), 2004 (B. Dinçer, Özslan & Kavasoğlu 2003), 1996 (B. Dinçer, Özslan & Satılmış 1996), 1982 (Devlet Planlama Teşkilatı 1982) û 1968'an, nexşeyên manendî wê cih girtine. Ev hemû nexşe diselmîn ku hema bibêje tevahiya bajar û bajarokên ku kurd li wan piraniyê pêk tînin, herêma Tirkîyeyê ya herî kêmbipêşketî ye. Xisûsa herî giring a ku balê dikişîne ev e: Dewleta ku salên dûr û dirêj meseleya kurdî ji meseleyeke etno-polîtîk wêdetir bi bipaşvemaîtî û feodalîteyê eleqedar dikir (Yeğen 2011b), der barê mijara bipêşketina sosyo-ekonomîk a herêmê de geşepêdaneke hêjayê baldariyê pêk neaniye, lê di encama sepana polîtîkayên aboriyê de wê newekheviya di navbera herêman de zêde kiriye.

Tabloya li jorê nîşan dide ku cografyaya Kurdistanê li derveyî binyada unîter a li Tirkîyeyê maye û ji bo dewletê herêmeke taybetî/xweser e. Li tevahiya serdema

osmanî, Kurdistana ku bi şêkilên mîrgeh/mîrekiyan binyadên îdarî û siyasî li xwe digirtin û bi awayê îdarî û siyasî dimeneke parçedar pêşkêş dikir, di sedsala 19'an de di somdariya polîtîkayên rojavayîbûn û modernbûnê de bi rêjeyê mezîn li cografyayêke çandî hat dagerandin. Di gel vê, bi dirêjahiya dîroka Komarê, di encama sepandina polîtîkayan de tevî sînorên çandî, ji aliyê îdarî, sosyo-ekonomîk û leşkerî ve herêmeke ku xwedî sînorên diyar e, bi destê dewletê bi mehneyêke "negatîf" hat avakirin. Binyadên îdarî yê xweserî herêmê, teşkilatên leşkerî û polîsî yê xweserî herêmê û newekheviyên sosyo-ekonomîk ên herêmî yê ku êdî kronîk bûne di nav avakirina negatîf de sînorên Kurdistanê xuyatir kirin.

Polîtîkayên navendîbûnê ku reh û kokên wan heta destpêka sedsala 19'an diçe, heta destpêka salên 2000'î jî ajot. Eger nîqaşên li ser nenavendîtiyê yê ku di pêşewatiya Prens Sabahaddîn de bi destpêka salên 1900'î re domiyên û Makeqanûna 1921'ê ku ji aliyê naverok û metoda amadekirinê ve navedîparêz e li derve bîn hiştin, di serdema modernbûyîna Osmanî-Tirkiyeyê de, dikare bê gotin ku di warê navendîparêziyê de berdewamiyek heye.

Nîqaşên li ser nenavendîtiyê yê di salên 1990'î de, di salên 2000'î de li hin pêngavên berbiçav û teşebusan dageriyan. Di beşa piştî vê de, Pêvajoya Çareseriyê ya 2013-2015'an wek navend li ber çav tê hiştin û nîqaş û sepanên piştî salên 2000'î yê li ser nenavendîtiyê jî, di çarçoveya hewlên aştiya siyasî de yê bi mebesta kêşeya kurdî, tê vekolan.

2.

PÊVAJOYA
ÇARESERYÊ
2013-2015 Û
NENAVENDÎTÎ

Pêvajoya Çareseriyê 2013-2015 û Nenavendîtî

Salên 2000î di meseleya kurdî de şikestinên giring derdibire. Der barê bidawîbûna lihevixistin û çêkirina aştiyê de çendî di salên 1990î de hin temas bûbin jî, lê teşebusên esasî di 15 Sibata 1999'an de bi qefaltina pêşewayê PKK'ê Abdullah Ocalan û bi teslîmkirina wî ya li Tirkîyeyê dest pê kir. Bûyereke din a giring ku dike sala 1999'an bibe kêliya şikestinê, teqila lêketineke nû ya pêvajoya emdambûna YE'yê ye, ku di çarçoveya kêşeya kurdî de rêya guherînên radikâl vekirîye. Dîsan, di kirina hilbijartinên cihkî yên di 18 Nîsan 1999'an de partiya kurdî ya sereke Partiya Demokrasiya Gel (DEHAP) cara ewil li îdareya taybetî ya bajar û şaredariyan bû şirikê desthilata cihkî. Vê tecrubeyê heta ku di 2016'an de politîkaya qeyûman bikeve kirdariyê, bêyî qutbûnê li gelek bajarên bi berfirehî domand (Çiçek 2017). Di salên 2000î de qewameke din a giring ku di çarçoveya kêşeya kurdî de rê li ber guherînên radikâl vekir jî, bêyî guman di sala 2002'yan de bi tena serê xwe hatina ser desthilatê ya AK Partiyê ye. Ev rewş hem di têkiliyên hêzê yên li Enqereyê hem jî di qada kurdî¹³ de bû sedema guherînên radikâl.

Tevî qewamên ku di qada siyaseta Tirkîyeyê de çêdibin, şikestinên radikâl ên ku di jeopolîtîka kêşeya kurdî de tîn holê, kirin ku bi tevahî çarçoveya meseleya kurdî ya Tirkîyeyê biguhere. Heta nîvê pêşî yê salên 2000î dînamîka sereke ya ku meseleye kurdî çarçove dikir,¹⁴ pêvajoya endambûna Tirkîyeyê ya YE'yê bû. Di salên 2003 û 2005'an de, şûna vê çarçoveyê, bi avabûna Hêrêma Kurdîstana Iraqê (HKI) re, ku bi awayekî "nîv-dewlet" (Özdemirkiran 2013) e û bi gihîştina wê ya îstîqrara dîmaneyî re, "jeopolîtîk"ê cih girt (Çiçek 2015, 292–312). Li vê şikestina yekem a ku di hev kêşeya jeopolîtîka kêşeya kurdî de hatibû holê, Rojava¹⁵ lê taqîb kir ku di 2012'an de li herêma kurdan a Sûriyeyê bi awayê *de facto* hatibû avakirin. Tesîra jeopolîtîkê ku ji 2003'yan

¹³ Ez konseptên "qada kurdî" (*espacekurde*) yan jî "sehaya kurdî" (*spherekurde*) ji Jean-François Pérouse bi deyn werdigirim û bi kar tînim. Ev konsept bal dikişînin ser sînorên cografî, çandî, aborî û politîk ên mobilîzasyona kurdan a ku guherbar û herikoyî ye (Perouse 2005).


¹⁴ Ez konseptê çarçovekirinê (*frame*) ji Erving Goffman bi ker werdigirim. Li gorî Goffman dewlet, rêxistinên politîk, tevgerên civakî, pêşewayên politîk, aktorên kolektîf ên wekî medyaya rewteka sereke bi çarçovekirinê "şemayên şirovekirinê" pêşkêşî kes an jî grûpan dikin û bi rêya watedarkirin û organîzekirina tecrubeyan û bi rêberiya li kiryanan jî îmkana "niştekirin, îdrakkirin, pênasekirin û kodkirinê" ya bûyer û teşekulan pêşkêşî dikin (Goffman 1974).

¹⁵ Rojava, di kurdî de tê wateya "xerb"ê. Li nav aktîvistên politîk ên kurdî, di zîmanê wan ê berbelav ê tercîhkirî de, ji bo parçeyê cografîyaya Kurdîstanê yê ku di nav sînorên Tirkîyeyê de maye *Bakur*, ji bo parçeyê li nav Iraqê *Başûr*, ji bo parçeyê li nav Îranê *Rojhilat* û ji bo parçeyê li Sûriyeyê jî *Rojava* tê gotin. Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD), gava şerê navxweyî yê Sûriyeyê didomiya, di sala 2012'an de ji bo yekîtiya birêvebirinên kantonan ku bi awayê *de facto* ew îlan kiribûn, ev têgihîkirina ku ji raboriyê heta roja me dihat bi kar anî û ji bo pênasekirina herêmên kurdan ên li Sûriyeyê jî binavkirina "Rojava" bi kar anî. Piştê çendî navên wekî "Bakurê Sûriyeyê" û "Bakur û Rohilâtê Sûriyeyê" yên ji hev cuda hatibin bikaranîn jî, hîn jî Rojava hem ji aliyê kurdên Sûriyeyî ve hem jî ji aliyê kurdên li derveyî Sûriyeyê ve, bi awayekî berbelav tê bikaranîn.

bi vir de didome, îroj hîn jî dînamîka sereke ya ku kêşeya kurdî ya Tirkiyeyê çarçove dike, ew e.

Di dewra 1999-2015'an de, ji bo ku lihevxiştina bi kurdan re bi dawî bibe û mesele çareser bibe, pêvajoya sê diyalogên/mizakereyên sereke çêbû: (1) Pêvajoya Îmraliyê 1999-2004, (2) Pêvajoya Osloyê 2008-2011, (3) Pêvajoya Çareseriyê 2013- 2015. Pêvajoyên Îmralî û Osloyê ji raya giştî re bi awayekî vekirî nehatin meşandin. Bervajiyê vê yekê, Pêvajoya Çareseriyê 2013- 2015 bi awayekî dîmaneyî bi agahdarkirina gelemperiyê hat birêvebirin. Wekî di şêkil 1'ê de jî dixuye, dabeşiya demî û cihî ya windahiyên giyanî yên ku ji ber lihevxiştina kurdî qewimîne, tesîra pêvajoyên ku debaş li ser wan e, bi awayekî aşkera dide nîşandan. Di binbeşên jêrê de, ev her sê pêvajoyên diyalogê, tevî qewam û bipêşketinên derî van pêvajoyan, li ber çav tînin girtin û li ser nîqaşên têkilî nenavendîtiyê û parkirina hêzê yên ku hatine kirin, tê sekinandin.

Şêkil 1. Dabeşiya demî û cihî ya windahiyên giyanî yên ku ji ber lihevxiştina kurdî qewimîne (1989-2019)



Çavkanî: UCDP - Uppsala Conflict Data Program (uu.se), dema gihanê: 12.02.2021.

Nîşe: Grafîka li jorê ya di şêkil de, windahiyên giyanî yên li gorî salan, nexşeya li jêrê jî dabeşiya cihî ya windahiyên giyanî nîşan dide.

Pêvajoya Îmraliyê (1999-2004) û Teza “Komara Demokratîk”

Pêvajoya diyaloga pêşî ya têkildarî meseleya kurdî, di dema darizandina Ocalan de dest pê kir. PKK bi angaştê ku li herêma axa kurdan a li Tirkîye, Îran, Iraq û Sûriyeyê digirt nav xwe “Kurdîstana serbixwe, yekbûyî û demokratîk” ava bike bi rê ketibû, ji dawiya salên 1980'yî bi şûn de dev ji armancên xwe yên avabûnê berda û ji bo ku meseleyê di nav sînorên siyasî yên heyî yên Tirkîyeyê de çareser bike, dest bi lêgerînên nû kir.¹⁶ Bi girtina Ocalan re ev lêgerînên hanê leztir bûn. Ocalan di Pêvajoya Îmraliyê de ji bo çareserîya kêşeya kurdî teza “komara demokratîk” pêşkêş kir. Di nav hiqûqa YE'yê de demokratîkbûna Komarê û naskirina mafên zimanî û çandî yên kurdan ku ew “hêmana damezirîner” a Komarê ne, ruhiyeya pêşniyaza “komara demokratîk” pêk dianî (Öcalan 1999; 2001).

Taybetmendiya herî girîng a ranêzikiya “komara demokratîk”, ew çarçove bû ku ji bo meseleya kurdî pêşkêş dikir. Teza digot “Kurdistan mêtîngêh e”, ku berî 1970'yî ji aliyê Dr. Şivan (Sait Kırmızıtoprak) ve hatibû rojevê (H. Bozarslan 2012) û bi nivê duyemê salên 1970'yî re, PKK jî tê de, ji bo piraniya rêxistinên kurdan bûbû teza sereke (Îmset 1993, 405–43), bi awayekî esasî kêşeya kurdî wek meseleyeke serweriya terîtoriyal çarçove dike. Nîqaşên li ser federasyon û modela Baskê yên di salên 1990'î de jî, di nav sînorên siyasî yên heyî de lêgerîna parkirina serweriya terîtoriyal îfade dike. Berevajiyê vê Ocalan di teza xwe ya “komara demokratîk” de, di vê îdiaya parkirina serweriya terîtoriyal dibihurî û diangaşt ku kêşeya kurdî “meseleyeke demokrasiyê” ye û modela ku pêşkêş kiriye, digot hem wek normatîf hîn baştir e hem jî fonksiyonel e. Li gorî Ocalan, dîroka kêşeya kurdî ya du qirnên dawî “daye xuyakirin ku kêşeya kurdî bi ranêzikiyên neteweperweriya burjûva û xweserîxwaz a feodal nikare bê çareserkirin” (Öcalan 2001, 159). Modelên parkirina serweriya terîtoriyal ên mîna federasyon û otonomiyê, modelên wisan in ku binyadên civakî yên paşverû yên wekî feodalîte û eşîretparêziyê xwedî dikin. Ev model çawan ku rê li ber bipêşketinên nîrxên demokratîk digirin her wisan ji ber cudahiyan zimanî yên navxweyî yên kurdan û ji ber ku bi rêjeyê mezin nifûsa wan li bajarên metropolên Tirkîyeyê dijî, di pratîkê de ne mimkin e (Öcalan 1999).

Ocalan, di nîqaşên xwe yên ku di çarçoveya teza “komara demokratîk” de kirine, etîf bi axaftinên Mustafa Kemal ên di salên 1920'î de yên li ser mixtariyetê (otonomiyê) dike û xweserîyê di asta birêvebirinê cihê de jî wek modeleke çareserîya nûjen

¹⁶ Rêberê PKK'yê Abdullah Ocalan di roportaja xwe de, ya ku dabû Mehmet Ali Birand û di 16 Hezîran 1988'an de li Rojnameya Milliyetê hatibû weşandin, derbiri ku ji bo çareserîya siyasî amade ne. Lêgerînên ji bo “çareserîya navxweyî” ku piştî hilweşîna Sovyetan zêde bûn, bi agirbestên yekalî yên di demên 1993, 1995, 1998 û 1999'an de domiyên. Der barê vê mijarê de, ji bo analîzeke hîn bêhtir bikitekit bnr.: (Çiçek 2016; 2018)

dinirxîne. Tevî vê yekê, di wan nîqaşên xwe de, ku di wan de li ser rêyên çareserîya kêşeya kurdî radiweste, giringiyê navendî etîfî meseleya îdareyên cihkî nake, wek tiştêkî hîmî li ser teza “komara demokratîk” hûr dibe, ku wê di navbera kurd û tirkan de “yekîtiya demokratîk” pêk bîne (Öcalan 1999).

Di siyaseta tirkî de, ji bo pêşniyaza “komara demokratîk”, pûtepêdaneke şayanî dîqetê lê nehat dayîn. Kadroyên kemalîst ên serdest ên dewrê, ku bi Ocalan re li Girtîgeha Îmraliyê di ser burokasiya ewlehiyê re hevdiştin pêk dianîn, ne ji bo warê demokratîkbûnê ne jî ji bo naskirina mafên zimanî û çandî siyaseteke watedar hilberand. Li hêla din, li ser bangewaziya Ocalan, da ku pêşiya pêvajoya aştîyê vekin, PKK'yê di 1999'an de hema bibêjê nêzî temamiya hêzên xwe yê çêdar derxistin derveyî sînorên Tirkiyeyê, lê piştî xweveavakirina ji nû ve ya pênc salî,¹⁷ bi hinceta ku dewletê der barê aştîyê de gav neavêtiye ragihand ku ji 01 Hezîran 2004'an ve pêvajoyê rawestandîye û hêzên xwe yê çêdar ji nû ve di nav Tirkiyeyê de bi cih kirin. Jixwe lihevixistinê ku heta 2004'an hema bibêje bi tevahî sekinîbûn, cardin dest pê kir û heta destpêka Pêvajoya Osloyê 2008'an bi awayekî ku zêde dibû dewam kir.

Teza “komara demokratîk”, bi qasî siyaseta tirkî, li derveyî siyaseta kurdî ya sereke, di nav tevgerên siyasî yê kurdan de jî giringî pê nehat dayîn. Komên siyasî yê kurdî bi piranî bi ranêzîkiya rexneyî nêzikahî di teza “komara demokratîk” dan. Ji bilî vê, gelek grûpan ev tez wek “xîyaneta li doza Kurdistanê” nîrxand. Jixwe di vê dewrê de, ew tezên ku PKK ji bo doza azadiya neteweyî ya kurdan bifetisîne ji aliyê Rêxistina Saloxgeriya Neteweyî ya Tirkî (MÎT) ve hatiye damezirandin û Ocalan jî ji bo dewletê dixebite, li qada gelemper bi dengîniyê hîn bêhtir hatin bilêvkirin.¹⁸ Di gel grûpên siyasî yê kurdî yê ji hev cuda, hin navên di nav PKK'yê de jî helwesta politik a nû ya Ocalan wek “xîyanet” nîrxand û ew wek “tevgereke li dijî şoreşê” pênase kir (Pir 2001).

Şikestina yekem a jeopolîtîk: Li Iraqê damezirîna dewleta kurdî ya federe

Gava Pêvajoya Îmraliyê didomiya, qewameke nû çêbû ku ji bingehe ve tesîr li meseleya kurdî ya li Tirkiyeyê dikir û dibû xala referansê ya nû. Piştî midaxeleya leşkerî ya DYA'yê ya 2003'yan a li Iraqê, rejîm guherî û kurd di encama têkoşînê xwe yê siyasî û leşkerî de ku bi dehan salan ajot, hem di asta navendî hem jî di ya herêmî de daxilê

¹⁷ Li ser qefaltina Ocalan, di nav PKK'yê de li biwarên nasnameya îdeolojîk û politik, têkildarî meseleya kurdî armancên politik, navgîn û rêbazên têkoşînê û di warê veavabûna sazûmanî de guherînên giştî çêbûn. Wek parçeyekî van guherînan navê PKK'yê jî guherî. PKK'yê ku di nav wê dewrê de navên ji hev cuda bi kar anîn, bi navê Koma Civakên Kurdistanê - KCK li komplekseke rêxistinê dageriya. Ji bo têkildarî nîqaşên li ser wan guherînan bnr.: (Akkaya & Jongerden 2011; 2012; Çiçek 2016).

¹⁸ Ji bo portala nûçe-analizê ku ev nêrin tê de bi gurahî tîn derbirin bnr.: www.nerinaazad.com, dema gihanê 21.11.2020.

avakirina rejîma nû bûn. Serokê Yekîtî Niştimanî Kurdistan – YNK'yê Celal Telebanî bû serokdewleta Iraqê û Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê – PDK'ê Mesûd Barzanî jî bû serokê Herêma Kurdistanê ya Iraqê (HKI) ku xwedî statuya dewleta federe ye û di çarçoveya rejîma nû de hat damezirandin.

Bi avabûna HKI'yê re, di parametreyên sereke yê kêşeya kurdî ya Tirkiyeyê de guherînên radiqal çêbûn. Li Iraqê şîrîkbûna kurdan a bi dewletê re û di çarçoveya parkirina serweriya terîtoriyal de jî destpêkirina wan a ku xwe îdare bikin, hem ji aliyê dewleta tirkî û siyaseta wê ve hem jî ji aliyê grûpên siyasî yên kurdî yên cuda yên li Tirkiyeyê ve, bû sedema çêbûna çarçoveyê nû. Ji aliyê dewleta Tirkiyeyê û siyaseta wê ve, endîşeya beqayê ya ku ji ber meseleya kurdî diqewime zêde bû, lê ji aliyê siyaseta kurdî ve hem di asta normatîf hem jî di ya mobîlîzasyonê de çavkaniyê nû çêbû. Berî her tiştî HKI ji bo kurdên li Tirkiyeyê bû xwedî rewşa nuqteya referansê. Xwişk û birayên wan hemen li wî aliyê sînor serweriya xwe ya terîtoriyal ava kir, lê ew li vir jî mafên xwe yên perwerdehiya zimanê dayikê mehrûm in, xwedî mafên beşdariya siyasî ya sînodar in, ku ev jî îdareya zêde navendîparêz diqewime û di nav mehrûmiya sosyo-ekonomî ya kronîkbûyî de dijîn. Kurdî bû zimanê fermî yê yekem ê herêma û bû duyemîn zimanê fermî yê Iraqê, piştî xizaniya ku demên dirêj ajot bi şûn de, bipêşketineke lezgin a sosyo-ekonomîk pêk hat. Vê referansa nû ji welatîyên elelade yên ku ne endamên partiyeke siyasî yan jî komekê ne, heta bi siyaseta kurdî ya sereke, ji HUDAPAR'ê heta bi siyasetharên di nav AK Partiyê de tesîr li gelek kesan kir. Jixwe di dewra 2003-2005'an de ku bi awayekî dîmaneyî HKI gihîşt îstîqrarê ev jeopolîtîka nû ya kêşeya kurdî ket şûna pêvajoya endambûna YE'yê û li dînamîka sereke ya ku kêşeya kurdî ya Tirkiyeyê çarçove dîke, dageriye.

Di gel ku HKI'yê çarçoveyê zanînî (kognîtîf) û normatîf pêşkêş dîke jî, ji bo gelek grûpên kurd bû kan û çavkaniya motîvasyon û rewatiyê. Jê wêdetir, HUDAPAR jî tê de, tevî gelek komên siyasî yên kurdî, wekî civaka sîvîl, medya, aborî di gelek warên cuda û di astên cuda de, di nav grûpên kurdî de îmkânên temasa derîsînor û şîrîkatîyê çêkirin û ji bo îtirazên kurdan ên cuda yên li Tirkiyeyê fonksiyona çavkaniyê nû ya sazûmanî û organîzasyonî anî cih.

Wekî ku dê di beşên di pey re de jî bê dîtin, HKI'yê ji bo zêdebûna îtirazên kurdan ên li Tirkiyeyê alîkariyên giring pêşkêş kirin. Nemaze ji bo kurdên dîndar û mihafezekar ku ji siyaseta sereke ya kurdan re xwedî mesafe ne, texeyuleke nû ya kurdîtiyê pêşkêş kir û li Tirkiyeyê jî qada siyasî ya tewere-nasnameyî ya kurdî berfireh kir. Di gel texeyula kurdên mihafezekar, ji bo grûpên siyasî yên kurdî yên ku federasyonê diparêzin çavkaniyên nû yên normatîf, stratejîk û sazûmanî pêşkêş kirin û alîkarî li pîrînebûna (pluralbûna) dîmaneyî ya siyaseta kurdî kir.

Bandora herî giring a HKI'yê li ser siyaseta kurdî ya sereke bû. Siyaseta kurdî ya sereke, ku di navbera 1999-2004'an de çarçoveya kêşeya kurdî bi projeya "komara demokratîk" ava dikir, piştî avakirina HKI'yê li dora têgihên "konfederalîzma demokratîk" û "xweseriya demokratîk" çarçoveyeke nû pêk anî. Bi puxteyî, teza "komara demokratîk" ku di navbera salên 1999-2004'an de serdest bû, hemû formên serweriya terîtoriyal ên mîna otonomî, federasyon an jî serxwebûnê veder kirin û meseleya kurdî jî di asta Tirkîyeyê de wek demokratîkbûneke giştî û meseleya naskirina mafên zimanî û çandî bi çarçove kir. Berevajiyê vê, konfederalîzma demokratîk û xweseriya demokratîk her wisan kêşeya kurdî jî demokrasîyê wêdetir wek meseleyeke statuya siyasî" jî nû ve hat nirxandin û bi awayê ku daxwazên parkirina serweriya terîtoriyal a xwedî formên cuda li xwe bigire, wek projeyeke serîvekirî hat parastin. Bêguman ev guherîna ku di siyaseta kurdî ya sereke de, di asta normatîf de qewimî, bi tena serê xwe nabe ku li avakirina HKI'yê bê îrcakirin; lê belê tevî vê yekê, heta ku avakirina serweriya terîtoriyal a kurdên Iraqê li ber çav neyê girtin jî nayê fehmkirin.¹⁹

Li ser vê yekê, divê bê diyarkirin ku HKI çareseriya aştiyane ya kêşeya kurdî ya li Tirkîyeyê bi awayekî biîstiqrar destek dike (Cumhuriyet 2014; Gazete Duvar 2019). Serokê HKI'yê Mesûd Barzanî ku di çarçoveya Pêvajoya Çareseriyê de, li 17 Çiriya Paşîn 2013'an bi beşdariya Şivan Perwer ku di avakirina nasnameya kurdî de cihekî wî yê giring heye, tevî serokwezîrê wê dewrê Recep Tayîp Erdogan li Amedê mitîng kiribû û bang li kurdan kiribû ku destekê bidin pêvajoya aştiyê, yek ji kêliyên herî giring ê vê destekê bû.²⁰ Bêguman têkiliyên siyasî û civakî yên di navbera Tirkîye û kurdên Iraqê de, sedemeke herî giring a vê yekê ye. Tevî vê, dînamîka esas lêgerînên ji bo danîna têkiliyên baş ên siyasî û aborî ne, ku HKI dixwaze bi Tirkîyeyê re çêke. Ji lew re lihevixistina kurdî, ji aliyekî ve dike ku têkiliyên Tirkîyeyê bi HKI'yê re sînardar bibin, ji aliyê din ve jî hebûna PKK/KCK'yê ya li nav axa HKI'yê û operasyonên Tirkîyeyê yên dersînor ên ku ji sala 1983'yan ve didomin, ji bo HKI'yê dibe sedema çêbûna kaneke bêstiqrariyê. A rast, têkiliyeke rasterast bi seyra meseleya kurdî ya li Tirkîyeyê û di navbera têkiliyên wê û yên HKI'yê de heye. Tirkîye, ji 2007'an bi vir de dest pê kir ku têkiliyên xwe yên bi HKI'yê re asayî bike û geşe bi wan bide. Di vê dewrê de, Pêvajoya Oslo'yê 2008-2011 û di çarçoveya Pêvajoya Çareseriyê 2013-2015

¹⁹ Ji bo nîqaşên berfireh ên li ser Herêma Kurdistanê ya Iraqê û guherînên radikâl ên ku di hev kêşeya jeopolîtîka kêşeya kurdî de piştî sala 2012'an bi avakirina Rojava re derketine holê û der barê tesîra van a li ser kêşeya kurdî ya Tirkîyeyê bnr.: (Çiçek 2015; 2018)

Ji bo analîzeke wek dînamîkeke nû ya jeopolîtîkê ya taybet bi tewereya dewleta tirkî, bnr.: (Yeğen 2020b; 2020a)

²⁰ Axaftina ku Barzanî li Amedê kiriyê, di nivênga înternetê de ji bo gihanê vekirî ye. Bnr.:

<https://tv.haberturk.com/tv/gundem/video/iste-mesud-barzaninin-diyarbakirdan-verdigi-turkce-mesaj/104213>, dema gihanê 20.02.2021.

de lêgerînên ji bo dawîlêanîna lihevixistinên kurdî zêde bûn. Dîsan, bi dawîlêhatina Pêvajoya Çareseriyê 2013-2015 re, gava ku tundiya lihevixistina kurdî zêde dibû, pêwendiyên Tirkiyeyê yên bi HKI'yê re xera bûn.

Teşebusa AK Partiyê ya reforma birêvebirina gelemper (2003-2007)

Gava Pêvajoya Îmralityê dewam dikir, wek ku di jeopolîtîka kêşeya kurdî de çêbû, di navenda siyaseta Tirkiyeyê de jî şikestineke giring çêbû. AK Partiyê ku kevneşopîya siyasî ya xwedî referansa îslamî dewr wergirt, di hilbijartina giştî ya 03 Çiriya Paşîn 2002'yan de serkeftineke mezin bi dest xist û bi tena serê xwe hikûmet ava kir. AK Partiyê ku veguherîna birêvebirina gelemper hilda nav berfîtiyên xwe yên siyasî, di 2003'yan de pêşnimayeke qanûnê ya ji bo reformeke giştî a birêvebirina gelemper amade kir (Ö. Dinçer 2020, 27). Pêşnimaya qanûnê, hemen piştî kutabûna Pêvajoya Îmralityê, di 15 Tirmeh 2004'an de, bi Qanûna Prensîpên Hîmî yên Birêvebirina Gelemper û Der Barê Veavakirina Wan a Ji Nû ve ya bi hejmarê 5227'an, li meclisê hat qebûl kirin. Reforma birêvebirina gelemper ku AK Partiyê ew anîbû rojevê, armanc dikir ku tevahiya verastkirinên qanûnî yên têkildarî îdareya taybetî ya bajar û şaredariyan îbtal bike û sistemeke nû ya birêvebirinê gelemper çêke (Toksöz û yd. 2009, 42). Ev qanûna hanê ku li ser xizmetên gelemper û berhemdariya wan hûr dibû û veguherîneke tevahî pêşbînî dikir, di gel nêrînên berevajiyê vê yekê (B. A. Güler 2003; Ö. Dinçer 2020), ji aliyê nenavendîtiyê ve guherîneke radîkal pêşkêş nedikir. Tevî vê, verastkirina li ser bingeha "hevkarî" yê bi dupatên mîna beşdarîti, jicîhîti, bingehhildana maf û azadiyên mirovan, di xizmetên gelemper de edalet û nekirina cudahiya hin resenatî li xwe digirtin (Ö. Dinçer 2020, 20–26; Ö. Dinçer & Yılmaz 2003, 29).

Tekildarî pêşnimaya qanûnê ya ku kirina reforma birêvebirina gelemper ji xwe re dikir mebest, taybetiya herî ging a ku dive binî bê xêz kirin, beşdarnekirina li pêvajoyê ya siyaseta kurdî ya sereke ye (Massicard 2009). Rawêjkarê serokweziriyê Omer Dinçer ku li pêvajoyê pêşewatî dikir, ji bo ku qanûn hem ji aliyê esas (naverokê) hem jî ji aliyê usûlê (pêvajoyê) ve bibe xwedî wesfekî demokratîk, dide diyarkirin ku wan beşdarîti ji xwe re wek esas dîtiye û ji partiyên siyasî heta civaka sivil, ji burokrasiya sivil û leşkeriyê heta bi darazê, ji derdorên cuda xebatên manendî civîn, komxebat, atolye çêkirine. Tevî vê yekê, di gel ku di nav aktorên ku pêşnimaya qanûnê bi wan re hatiye mizakerekirin CHP, serokatiya erkana giştî, dameziraweyên darazê, civaka sivil û medya hebûye jî, lê siyaseta kurdî ya sereke tune bûye (Ö. Dinçer 2020, 40–94).

Gava ku verastkirin ji aliyê esas ve bê vekolan, tê dîtin ku binyada unîter û ya navendîparêz dihatin parastin, tevî vê di çarçoveya berfirehiya rayeyê de rayeyên

îdarî û erk û berpirsiyên birêvebirinên cihkî jî dihatin zêdekirin. “Wesayeta îdarî” ya birêvebirina navendî ya li ser îdareyên mehelî (îdareya taybetî ya bajêr, belediye, gund) ku Makeqanûna 1982’yan ew anîbû, dihat parastin û verastkirina ku rayeya midaxelekirina li birêvebirinên cihkî dida Wezaretê Navxweyî, di nav teklîfa qanûnê de hebû. Hema bibêjin tevahiya xizmetên gelemper ji birêvebirina navendî re dihatin hiştin. Li gorî pêşnimayê: Dad, parêzî, ewlehî, îstixbarat, têkiliyên derve û polîtîka derve, maliye, xezîne, bazirganiya derve, gimruk û verastkirina eleqedarî piyaseyan, di asta neteweyî de amadekirina plansaziyên aborî, civakî û fizîkî, temînkirina tetbîqa bername û projeyên ji bo hildana cudahiyan bipêşketîbûnên di navbera herêman de, perwerdehiya neteweyî, diyanet, ewlehiya civakî, tapo û kadastro, nifûs û welatîbûn, birêvebirina rewşa lezgîn û parêziya sivil û erk û xizmetên têkildarî weqfan dê ji hêla îdareya navendî ve bihatina birêvebirin.

Di gel van yekan, pêşniyaza qanûnê reseniyên ku heq dikin bal li wan bên kişandin jî, li xwe digirtin. Ji van a pêşîn, verastkirina “giştî” û “taybetî” ye ku di nav sedemên vetokirina serokomarê wê dewrê Ahmet Necdet Sezer de cih digire. Berevajî ranêzikiya kevneşopî, teklîfa qanûnê erk û rayeyên birêvebirina navendî wek “taybetî” diyar dika û rayeyên mayî jî bi awayekî “giştî” ji birêvebirinên cihkî re dihiştin. A duyem, prensîpa jicîhîtiyê ku di qanûnên berê de jî hebû, di nav prensîpên hîmî yê avakirin û xebitîna birêvebirina gelemper de cih digirt. Li gorî vê, “...erk, raye û berpirsî ji wê yekeyê re tê dayîn ku ew ji wan kesên ji xizmetê feydedar dibin, herî guncan û herî nêz e.” Jixwe bi madeyên demkî yê yekem û duyem re erk û rayeyên rêxistinên dernavendî tevî avahî, navgîn, pêdivî, malên guhêzbar û neguhêzbar, deyn û vexwaziyên wan, texpîsatên budçeyê û kadroyên wan ên Wezaretê Tenduristiyê, Wezaretê Çand û Tûrîzmê, Wezaretê Jîngeh û Daristanan, Wezaretê Çandî û Karên Gundan, Wezaretê Pişesazî û Bazirganiyê, Gerînendetiya Giştî ya Xizmetên Civakî û Dameziraweya Hêvişandina Zarokan û yê Gerînendetiya Ciwan û Sporê bi piranî li îdareya taybetî ya bajaran, qismen jî li şaredariyan dihatin dewrêkirin. Ji van bi awayê herî dawî, di çarçoveya berfirehiya rayeyê de ji hin wezaretan re jî di asta herêmê de, ku ji çend bajaran pêk tê, îmkana xwebirêxistinê dihat pêşkêşkirin.

Bi awayekî esasi, teşebusa reformê ya ku mijara dabaşê ye, qada birêvebirinên taybetî yê bajêr ku walî serokê birêvebirinê ye fireh dikir û bi awayê qismî jî şaredariyan xurt dikir, wekî ku rayedarên AK Partiyê jî bal dikişînin serê, “li binyada unîter tehdîteke herî biçûk” (Ö. Dînçer 2020, 87–88) jî nedikir. Bi îfadeya Omer Dînçer ku mîmarê pêvajoyê bû, ji birêvebirina navendî, li birêvebirina cihkî “dewrêkirina rayeyê di çarçoveya xizmetê de hatibû pêşbînîkirin, ne xwedî wesfekî siyasî û îdarî bû. Ji vî aliyê ve bêrîtîyên welatê me jî dabîn dikir” (Ö. Dînçer 2020, 94). Tevî van hesasiyetên ku di çarçoveya kêşeya kurdî de hatiye rojevê û pir aşkera ye têkildarî nenavendîtiyê

û parkirina hêzê ye, teşebusa reformê di gel astengên makeqanûnî rastî tirûşîyeke (miqaweteke) civakî, siyasî, burokratîk û darazî hat (Ö. Dinçer 2020, 37–93; Toksöz û yd. 2009, 42); pêşî ji aliyê serokkomarê wê demê Ahmet Necdet Sezer ve hat vetokirin, di pey re bi biryara îbtalê ya Dadgeha Makeqanûnê ji rojevê ket. Sedema pêwîstker a vetoya Serokkomar cext li ser nerîta unîter û dewleta navendî dikir.²¹

AK Partiyê teklîfa qanûnê ji ber tirûşên siyasî û darazî bi paş ve kişand, ku vê teklîfê bi veguherîna birêvebirina gelemper bi awayekî tevahî armanc dikir, di sala 2004 û 2005'an de hem Qanûna Îdareya Taybetî ya Bajaran hem Qanûna Şaredariyan hem jî Qanûna Şaredariyên Bajarên Mezin guhartin. Tevî vê, ji ber tirûşa siyasî û darazî ya ku Serokkomarî, Dadgeha Makeqanûnê û CHP'yê nîşan daye, di teklîfên qanûnan de, ku dabaş li ser wan e, revîzyon hatin kirin. Madeyên ku di Qanûna Îdareya Taybetî ya Bajar û Qanûna Şaredariyan de cih digirin û birêvebirinên cihkî wek "yekeyên birêvebirinê yê rayedarên giştî" pênase dike, ji her du qanûnan jî derxistin. Vê verastkirinê; erk, raye û xizmetên xwedî wesfê mişterek ên cihkî, ku bi qanûnan nedane damezirawe û saziyeke din a gelemper, ji birêvebirinên cihkî re dihatin hiştin. Dîsan li ser serlêdana CHP'yê, madeya raye dida şaredariyan, ku dikare dameziraweyên perwerdehiyê yê berî dibistanê veke, ji hêla Dadgeha Makeqanûnê ve hat îbtalkirin (Aktar 2014, 48– 49).

Ev verastkirinên qanûnî yê mijara dabaşê, di têkiliyên navbera navend û cihkî de guherînek çênekir. Tevî vê yekê, hem Qanûna Şaredariyên Bajarên Mezin a bi mêtûya 10 Tîrmeh 2004 û bi hejmara 5216'an hem Qanûna Şaredariyan a bi mêtûya 03 Tîrmeh 2005 û bi hejmara 5393'an hem jî Qanûna Îdareya Taybetî ya Bajaran a bi mêtûya 22 Sibat 2005 û bi hejmara 5302'yan, îdareya meheli ya eleqedar wek "şexsê hikumî yê gelemper ê ku xwedî xweseriya îdarî û darayî ye" pênase kir û der barê mijara xweseriya birêvebirinên cihkî de jî verastkirineke giring li xwe vedihewand.

Yekeyên herêma statistîkî û ajansên geşepêdanê

Verastkirineke din a giring ku di çarçoveya birêvebirina gelemper de hatiye rojevê û di pêvajoya ahenga bi YE'yê re, da ku di asta herêmî de hewcehiyên birêvebirinê dabîn bike hatiye kirin. Senifandina Yekeyên Herêma Statistîkî (SYHS) ya sê qedemeyî û ji bo bîst û şeş herêmên qedemeya II. avakirina ajansên geşepêdanê ne.

Li ser biryara Heyeta Wezîran a 2002'yan, "...civandina statistîkên herêman, bipêşxistina wan, kirina analîza sosyo-ekonomîk a herêman, diyarkirina çarçoveya

²¹ Sedema pêwîstker a vetoya Serokkomar Ahmet Necdet Sezer, di nivenga internetê de ji bo gihanê vekirî ye. Ji bo zanyariya bikitekit bnr.: <https://www.tccb.gov.tr/basin-aciklamalari-ahmet-necdet-sezer/1720/6352/5227-sayili-kamu-yonetiminin-temel-ilkeleri-ve-yeniden-yapilandirilmasi-hakkinda-kanun,dema%20gihan%2015.11.2020>.

polîtîkayên herêmî û bi mebesta pêkanîna binkeya daneyan a statîstîkî ya berawirdbar a li gorî Sîstema Statîstîkî ya Herêmî ya YE'yê, di asta welêt de pênaseya SYHS'yê" hat kirin. Heştê û yek bajarên Tirkiyeyê wek herêma qedemeya III. hatin diyarkirin. Bajar hatin grûpkirin û qedemeya II. li bîst û şeş herêman û dîsan ev herêmên qedemeya II. hatin grûpkirin û dozdeh herêmên qedemeya I. hatin çêkirin (Bnr.: Vesper 4).²²

Piştî senifandina herêmî ya sê qedemeyî, ji bo her bîst û şeş herêmên qedemeya II. ajansên geşepêdanê hatin avakirin. Bi qanûna xwedî hejmara 5449'an ku di 25 Kanûna Paşîn 2006'an de hat pejirandin, ji bo ajansan jêrxaneyên pêwîst hatin çêkirin. Verastkirina qanûnî ya mijara dabaşê jî wekî yên berê leqayî tirûşên civakî û darazî hat (Massicard 2009). Di îtirazan de ku ji aliyê CHP, Baroya Stenbolê, Yekîtiya Jûrên Endazyar û Avahîsazên Tirkî (YJEA; TMMOB) hatibûn kirin, nerazîbûna ji ber "dijatiya li binyada unîter", "berjewendiyên neteweyî" û "amadehiya ji bo sîstema eyaletan" derdiketin pêş. Wek nimûne, sernavê daxuyaniya ku Baroya Stenbolê kiribû ev bû: "Qanûna Ajansên Geşepêdanê, li dijî binyada me ya unîter û berjewendiyên me yên neteweyî ye" (Kolcuoğlu 2006). Jixwe ji ber serlêdanên îtirazkirinê ku TMMOB'yê serî li Dadgeha Kargerîyê ya Bilind xistibû û CHP'yê jî li Dadgeha Makeqanûnê xistibû, verastkirina qanûnî ya têkildarî ajansên geşepêdanê, ancax di 2008'an de hat temamkirin.

Mijareke din a giring a der barê vê yekê de, ku divê bal lê bê kişandin jî ew e ku têgiha "herêmî" ji navê ajansan hatiye derxistin. "Mehzûrên" têgiha "herêmê" ku di salên 1970'yî de di têgihên "geşepêdana herêm" û "plansaziya herêmî" de dibihurîn, li salên 2000î jî nû ve hatin derpêşkirin û navê "ajansa geşepêdana herêmî" ku di pêşnimaya pêşî ya teklîfa qanûnê de hebû, ji ber tirûş û berhilistiyên behsjêkirî wek "ajansa geşepêdanê" hat guhartin (Massicard 2009).

Berevajî hemû îtiraz û angaşên "dijatiya li binyada unîter" ku çepgiriya netewekar pêşewatî li wan dikir, ajansên geşepêdanê hem ji aliyê şeweya amadekirinê ve hem jî ji aliyê naverokê ve verastkirineke navendîparêz e. Ev qanûna hanê, bêyî ku daxwaz û bendewariyên cihkiyan, nêrîn û pêşniyazên wan li ber çav bînin girtin û bêyî beşdariya aktorên cihkî, bi metodeke "ji jor ve" hat amadekirin (Massicard 2009). Gava verastkirina kirî ji aliyê esasî ve bê tiwêjandin, tê dîtin ku ew ji ber daxwaza cihkîkirin û herêmîkirina geşepêdanê ya ku pêvajoya YE'yê mecbûrî dikir hatiye bipêşxistin, lê tevî vê yekê ew bersiveke wisan e ku navendîparêziyê jî nû ve hildiberîne. Ji lew re

²² Ji bo kitekitên têkildarî senifandinê bnr.: <https://www.resmigazete.gov.tr/eskiler/2002/09/20020922.htm>, dema gihanê 13.11.2020.

ajansên geşepêdanê, ji binyadeke wisan dûr in ku ew di bin pêşengiya aktorên cihkî û herêmî de, îdareyeke geşepêdanê dabîn dikin. Ajans ku wek rêxistinên herêmî yên Rêxistina Plansaziya Dewlê hatine aşopîkirin û ji aliyê walîtîyên bajarên ku ew di nav de ne tînan koordinekirin, rasterast di bin kontrola birêvebirina navendî de ne. Gava ji aliyê darayî ve tînan vekolan jî, ew sazîyên wisan in ku ji potansiyela fînansekirina veberhênanê cihkî dûr in û xwedî kanên pir sînordar in. Eger were xulasekirin, ajansên geşepêdanê bi cureyekî “dekonsantrasyona herêmî” verastkirineke wisan e ku kapasîteya îdarî ya birêvebirina navendî ya di asta herêmî de xurt û hêzdar dike.

Pêvajoya Osloyê (2008-2011) û Nîqaşên Li Ser Xweseriya Demokratîk

Nêzikî çar sal û niv bi şûn de, piştî bidawîbûna Pêvajoya Îmraliyê, destpêkirina Pêvajoya Osloyê ya di meha Îlona 2008'an de divê wek teşebusa diyalogê ya sereke ya duyem a ji bo çareseriya kêşeya kurdî wek not bê hildan. Di Pêvajoya Osloyê de, ku heta 14 Tîrmeh 2011'an domiya, ji Pêvajoya Îmraliyê cuda, nûnerên dewletê yên di bin pêşewatiya MÎT'ê (Rêxistina Saloxgeriya Neteweyî) de, ne tenê bi Ocalan re di heman demê de bi Koma Civakên Kurdistanê (KCK) re, ku ew wek peyrewê PKK'yê hatibû damezirandin, rasterast civiyên û hevdiinên pêk anîn. Pêvajoya Osloyê bi hevdiinên veşarî dest pê kir û di 29 Tîrmeh 2009'an de, ji aliyê Wezîrê Karên Navxweyî yê wê dewrê Beşîr Atalay ve bi navê “Vebûyîna Demokratîk” ji raya giştî re hat ragihandin (Habertürk 2009). Detayên hevdiinên ku serokwezîrê wê demê R. Tayîp Erdogan (Derviş 2012) jî teyîd kiribûn, îroj jî ji bo raya giştî ne vekirî ne. Tevî vê rewşê, li gorî angaştên KCK'yê temasên pêşî di Îlona 2008'an de bi navbeynkariya aliyê sêyem dest pê kir û heta meha Hezîrana 2011'an bêyî qutbûnê dewam kir (Çimen & İnce 2013).

Reform: Ji bo çareseriya kêşeya kurdî demokrasi û mafên çandî

“Vebûyîna Kurdî”, di pêvajoya ku bi navê “Projeya Yekîtiya Neteweyî û Biratiyê” de dihat yadkirin, di daxuyaniyên hikûmeta AK Partiyê de yên ku vebeyn çapemeniyê, ji bo çareseriya meseleyê cext li demokratîkbûyîna dihat kirin. Atalay ku yek ji aktorên herî giring ên pêvajoyê bû, di 13 Çiriya Paşîn 2009'an de li Meclisa Mezin a Neteweya Tirkîyeyê (MMNT) di rûniştina der barê vebûyîna demokratîk de, li ser navê hikûmetê xaftin kiribû, diyar kir ku du mebestên giring ên pêvajoyê hene: “Du armancên hîmî yên vebûyîna demokratîk hene ku bi hev re pêwendîdar in: a yekem bidawîanîna terorê ya duyem jî bilindkirina standardên demokrasiya me ye (Türkiye Büyük Millet Meclisi 2009). Di daxuyaniyên rayedarên hikûmetê de bi awayekî esasî berfirehkirina mafên ferdî û azadiyan dihat dikirandin. Der barê mijara mafên siyasî yên kolektîf û çandî de, ku dibe wê qad ji meseleya nenavendîtiyê re veke, tu vebûyînek nehat kirin. Li rûniştina ku li Meclisê hat kirin, Omer Çelik li ser navê hikûmetê bersiv

da rexneyên CHP û MHP'yê (Partiya Tevgera Neteweperest) ku digotin dê pêvajo neteweyeke cuda biafirîne, daxuyand ku vebûyîna demokratîk projeyeke dewletê ye û bal kişand ser wê yekê ku "tu car destûr nadin binyadeke ku di nav federasyon an jî binyada unîter de, were mehneya xweseriyê" (Türkiye Büyük Millet Meclisi 2009).

Nirxandinên Omer Dînçer ên der barê mijarê de, ku ew mîmarê teşebusa reforma birêvebirina gelemper a 2003-2007'an e, dide nîşan ku perspektîfa der heqê nenavendîtîyê ya baskê herî reformîst ê di nav AK Partiyê de jî, bi berfirehkirina rayeyên birêvebirinên cihkî ve sînodar e (Ö. Dînçer 2020, 99–100):

"(Di birêvebirina gelemper de) yek ji encamên neyînî yên herî giring ji ber temamnêbûna veavabûna ji nû ve jî, hatina rojevê ya daxwazên 'xweserîya demokratîk' e. BDP'yê û siyasîmedarên kurdên ku destek didin wê, 'xweserîya demokratîk' xwast. Ev daxwaz ji ber ku nenavendîtîya siyasî li xwe vedihewand, ji bo yekkerîya welêt talûkeye mezin e. Hal we ye Projeya Reforma Birivebirina Gelemper, ku statukoyê bi endîşeya binyada unîter xera dike ew asteng kir, eger di xizmetan de nenavendîtî pêk bianiya, dê pêşî li van cure daxwazan bihata birîn (cext lê hatine zêdekirin)."

Di heqê mijara parkirina hêzê ya di navbera îdareya navendî û yên cihkî de, dikare bê gotin ku lîmîten raser ên AK Partiyê Şertê Xweseriyê yê Birêvebirinên Cihkî yê Ewrûpayê ye. Beyannameya Hilbijartinê ya AK Partiyê, ku ji bo hilbijartinên giştî yên 12 Hezîran 2011'an hatibû amadekirin, ku hemen berî kutabûna Pêvajoya Osloyê pêk hatin, di beşa "Demokrasiya Bipêşketî" de, li bin navê "Îdareya binyad-welatî û encamî" tê diyarkirin ku bi şêkilê ahengdarî Şert be, birêvebirinên cihkî dê bikin xwedî rewşa tam rayedar (Adalet ve Kalkınma Partisi 2011, 27).

Bi awayê ku bi balkêşana maf û azadiyên ferdî re ahengdar be, li Pêvajoya Osloyê di çarçoveya mafên zimanî û çandî de du gavên giring hatin avêtin: Di 01 Kanûna Paşîn 2009'an de kanala dewletê ya bi kurdî ya pêşî TRT-6 (ku piştê navê wê bû TRT Kurdî) dest bi weşanê kir. Di 11 Îlon 2009'an de jî Desteya Hîndekariya Bilind (YÖK) li Zanîngeha Mêrdînê ya Artûqlûyê biryara vekirina "Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê" da. Li Enstîtuyê ji bilî ziman û wêjeya kurdî dê bikarîna bernameyên lîsansa bilind ên ji bo ziman û wêjeya ereb, fars û suryaniyan jî bihatina meşandin. Desteya Hîndekariya Bilind piştê bi biryara ku di 26 Kanûna Paşîn 2011'an de standibû, daxwaza heman zanîngehê ya ji bo vekirina Beşa Ziman û Wêjeya Kurdî ku wê bikare bernameya lîsansa bilind a çar salan pêşkêş bike, qebûl kiribû.²³

²³ Ji bo kronolojiyê ku dewra 1978-2017'an a lihevexistina kurdî li xwe digirt, bnr.: (Çiçek 2018, 315–52)

Tevî ku hikûmeta AK Partiyê di çarçoveya demokratîkbûyînê de ji bo berfirehkirina mafên zimanî û çandî, teşebusên wekî TRT-6, Enstîtuya Zimanên Zindî û vekirina Bernameya Lîsansê ya Ziman û Wêjeya Kurdî kir jî, lê em nizanin ku KCK'yê çi daxwaz kirine. Di gel vê KCK'yê ji 2007'an ve ji bo çareserîya meseleyê dest pê kiribû daxwaza "xweserîya demokratîk" dianî ser zimên û vê daxwazê bi berdewamiya Pêvajoya Osloyê re rabêjîya KCK'yê, ya Partiya Civaka Demokratîk (DTP) ku partîya kurdî ya legal a sereke ye û ya peyrewa wê Partiya Aştî û Demokrasiyê (BDP) pêk dianî. Li hêla din, yek ji du bûyerên krîtîk ên ku pêvajoyê qedand, îlana xweserîya demokratîk bû ku Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) ew di 14 Tîrmeh 2001'an de ragihand.

Xweserîya demokratîk an jî nenavendîtiya herêmi

Daxwaza xweserîya demokratîk çendî bi 2007'an re hatibe formulêkirin û ji raya giştî re hatibe pêşkêşkirin jî, lê ew xwe dispêre nîqaşên heta sala 2004'an. Ocalan di navbera salên 2004 û 2007'an de ji bo çareserîya kêşeya kurdî du têgihên nû avêtin rastê: Konfederalîzma demokratîk û xweserîya demokratîk (Akkaya & Jongerden 2014). Her du têgih jî, îlhama xwe ji xebat û têgihên damezirînerê tevgera civakî ya ekolojîyê Murray Bookchin²⁴ girtibûn û hatibûn bipêşxistin. Bookchin, bi awayekî xulase texeyula civakeke "avakera ji nû ve, ekolojîk, komuntern û etik" pêşkêş dîke û ji bo rêxistinên civakî yên hiyerarşik ên heyî ku dibin sedemên qewimîna kêşeyên ekolojîk û civakî, wek alternatîf birêxistinbûneke civakî ya konfederal li ser bingeha xwebirêvebirin û demokrasiyên rasterast, pêşniyaz dîke (Çiçek 2016, 376). Ocalan, ku demokratîk konfederalîzm wek ne-dewlet terîf dîke û wê wek xwe-rêxistina civakî dinirxîne, ji bo kurdan jî wê wek teşekuleke siyasî û civakî pênase dîke ku ew dikare yekîtiya kurdan pêk bîne, ku kurd li nav serwerîya siyasî ya çar welatan dijîn. Li gorî vê, wê bi konfederalîzma demokratîk "dewlet+demokrasi" bê temînkirin; kurd bêyî ku têkilî sînoren siyasî yên heyî bibin, dê bi dewletê re hebûna xwe ya siyasî û civakî berdewam bikin. Konfederalîzma demokratîk ku li ser yekîtiya kurdên li nav sînoren çar dewletan dijîn hûr dibû, lê xweserîya demokratîk bi awayekî esasî-çendî ku Ocalan derdibe erêb, fars û tirk jî dê bikarin vê modelê bikar binin- ji bo kurdan li Tîrkiyeyê (û piştî 2012'an li Sûriyeyê)²⁵ birêxistinbûneke konfederal a ji jêr ve ku xwe dispêre civatên (meclîsên) cihkî û herêmi, ifade dikir (Çiçek 2014).

Ocalan di nirxandinên xwe yên der barê mijara konfederalîzma demokratîk û xweserîya demokratîk de, xweserîya demokratîk ne tenê wek xwe-birixistinkirina ku xwe dispêre meclîsên cihkî, lê heman demê di konteksta veavakirina ji nû ve ya li

²⁴ Der barê vê mijarê de ji bo xebatên hîn bikiekit bnr.: (Bookchin 1996; 2010)

²⁵ Modela xweserîya demokratîk ku Ocalan ew bi pêş xistiye, dê di sala 2012'an de îlham bida teşekula idarî û siyasî ya di bin pêşengîya Partiya Yekîtiya Demokratîk a kurdên sûriyeyî de û dê qada sepanê ji xwe re bidita. Ji bo nîqaşên bikiekit ên der barê vê mijarê de bnr.: (Duman 2016; Taştekin 2016)

ser bingeha îdarî û siyasî ya dewletê bi kar anî. Daxuyaniya pêşî ya li ser vê mijarê, di hevdîtana 04 Gulan 2005'an de ku bi parêzeran re kir û di çarçoveya "reforma Komarê" û di çarçoveya sîstema nîv-serokatîyê de, ku ji kongre û meclisên nûneran pêk tê û xwedî du meclisan e, pêşniyaz kir ku divê Tîrkiye li ser bingeha bîst û pênc herêman ji nû ve bê veavakirin:

"Hewce bi reforma Komarê heye. Ji bo ku vê nîqaş bikin ez dibêjim. Li şûna Meclisa Mezin a Neteweya Tîrkiyeyê, ez du organan pêşniyaz dikim. (...) yek, ez Senatoya Komarê pêşniyaz dikim. (...) Yek jî manendî nîv-serokatîyê û hikûmeta ku serokatî wê hildibijêre. (...) Meclisa Nûneran a xweserî Tîrkiyeyê. Li Tîrkiyeyê 81 bajar hene. Ya rast ez ji bo Tîrkiyeyê 25 herêm, ku 7 eyalet jê kurd û 18 jî cihên ku nifûsa tirkên li wan gurtir e, bêyî nasnameyên din red bike, li ser veavakirinekê fikirîm. Wê parlamentoyên van ên birêvebirina cihê hebe. (Parêzer: *Hinekî wekî dewleta bajêr a Atînayê*). Belê, hinekî dişibê. Bi awayekî mîna sîstema eyaletan a li Almanyayê. 81 bajar bêmehne ye. Bergindeke wê ya watedar a çandî, civakî nîn e. (Parêzer: *Ji aliyê aborî ve jî barekî giran bi xwe re tîne*.) Rast e. Dibe ku Kongreyeke Nûneran a xwe dispêre herêman cihê be."

Li vir xisûsa balkêş ew e ku pêşniyaza Ocalan a ji bo veavakirineke îdarî û siyasî ya ku xwe dispêre bîst û pênc herêman a bi awayê 7+18 û ya bîst û şeş herêman ji qedemeya II'em ku di sala 2002'yan de hatiye çêkirin, dişibin hev. Ji lew re di nav bîst û şeş herêman de, bajarên ku kurd li wan di rewşa piraniyê de ne, di nav heft herêman de hatin senifandin. Ev rewş tîne bîra mirov ku dibe di çarçoveya Senifandina Yekeyên Herêma Statîstîkî de, ev verastkirin di hevdîtinên navbera Ocalan û rayedarên dewletê de hatibe rojevê.

Modela xweserîya demokratîk a ku ji aliyê Ocalan ve hatiye bipêşxistin, piştê ji hêla siyaseta kurdî ya legal a sereke ve hat pejirandin û di qada siyasî de hat parastin. Ev model cara pêşî di kongreya avakirina KCD'yê de ku li Amedê di 26-28 Çiriya Pêşîn 2007'an de pêk hat, ji raya giştî re hat pêşkêşkirin. Di encamnameyê de etîf li amadehiyên makeqanûneke nû hat kirin û ji bo "demokratîkbûyîna Tîrkiyeyê û çareserîya aştiyane ya kêşeya kurdî" projeya xweserîya demokratîk hat pêşniyazkirin. Li gorî KCD'yê "xweserîya demokratîk, ku tê wateya xwe-birêvebirina demokratîk, tijîkirina nava Komara Demokratîk e" (Bianet Bağımsız İletişim Ağı 2007). Ev modela ku binyadeke nenavendî ya îdarî û siyasî pêşniyaz dike, xwe naspêre nasnameya etnîkî û senifandina cografî ji xwe re bingeh dibîne, di encamnameya KCD'yê de wiha tê terîfkirin:

"Di vê modela îdarî de nenavendîparêzî tê xebitandin ku bajarên di navbera wan de bi awayekî gur pêwendîya sosyo-kulturî û aborî heye li xwe digire û

mecliseke herêmî ya ku bi awayê dişibe meclisên bajêr ên giştî û bi hîlbijartinê tê ser kar, li ser navê hikûmeta navendî karên derveyî, xizmetên maliye û parêziyê û xizmetên emniyet û edaletê yên ku dê ji aliyê navendî û birêvebirinê herêmê ve bi hev re bîna meşandin ne tê de; di warên xizmetên mîna perwerdehî, tenduristî, çand, xizmetên civakî, çandinî, deryavanî, pişesazî, avadanî, jîngeh, tûrîzm, telekomunikasyon, ewlehiya civakî, jin, ciwan, sporê de dê berpîrs be. (...) Ev teşekul, xweseriya ku xwe dispêre federasyon an jî etnîsîteyê îfade nake; teqwiyeke îdarî ya nû ya demokratîk e ku di navbera birêvebirina navendî û bajarên de hatiye qedemekirin. Her yek ji herêman dê navekî wê yê taybetî yan jî bi navê bajarê herî mezin ê ku di nav sînorên rayeya meclisa herêmê de ye, bê binavkirin. Xulase, Meclisên Herêman ên ku dê li Tirkiyeyê bîna avakirin – dibe ku hejmara wan 20-25 be- teşekuleke siyasî û îdarî ya modern û demokratîk e ku dê ew karên di navbera Meclisa Mezin a Neteweya Tirkiyeyê û bajarên de hêsan bikin û dê bikin ku beşdariya gel a li birêvebirinê hîn zêde bibe.”

Gelo modela Îtalya yan jî Spanyayê?

Modela KCD'yê ya xweseriya demokratîk cureyeke nenavendîtiya herêmî ya siyasî û îdarî pêşkêş dike ku modela dewleta herêmî” ya li ser binyada unîter û li Îtalya û Spanyayê wekî niv federe tê nirxandin, tîne bîra mirov (Colino & del Pino 2012; Piattoni & Brunazzo 2012; Toksöz û yd. 2009). Li Spanyayê di sala 1975'an de piştî mirina Francisco Franco, di çarçoveya derbasbûyîna li demokrasîyê de, di makeqanûna nû de, ya ku di 1978'an de hat qebûl kirin, wek bergînda daxwazên otonomî û serxwebûnê yên gelên bask, katalan û Galîçayê, cure dewleteke herêmî hat damezîrandin ku xwe dispart hefdeh “civatên otonom.” Di makeqanûna nû de cext li hemû gel, çand, nerît, ziman û dameziraweyên Spanyayê dihat kirin û mafê xweseriyê yê herêman hat naskirin. Li gorî xala duyem a Makeqanûnê, “Makeqanûn yekîtiya Neteweya Spanyol (*Spanish Nation*) a nebelavbar û welatê hemû spanyolan ê hevpar û nedabeşbar ji xwe re wek bîngeh werdigire; neteweyan (*nationalities*) û otonomiyên/xwe-birêvebirinê (*self-government*) herêman ên ku wan ew pêk anîne û piştgirîya di navbera hemûyan de, dinase û garantî dike.” Li gorî Makeqanûnê, zengîniya ku formên zimanî yên cihêreng ên Spanyayê ew pêk anîye, mîraseke çandî çêdike ku bi taybetî divê rêz lê bê girtin û hêvişandin. Spanyolî (*Castilian*) û zimanên din ên Spanyayê jî dê bibin zimanê fermî yê civatên otonom. Taybetiyeke din a giring a modela li Spanyayê ew e ku xweseriyê monoton pêşbîni nake û li gorî reseniyên her herêmê, modelên otonomiyê yên ku cihêreng dibin li xwe vedihewîne. Jixwe li Spanyayê ji bo hemû herêman tek qanûnek nehat derxistin, her herêmeke otonom bi qanûneke resen/orijînal hat avakirin. Tevî vê yekê herêm di astên cihêrengbûyîna de xwedî xweseriya îdarî û siyasî bûn.

Li Îtalyayê ku ew dewleteke unîter e, binyadeke îdarî û siyasî ya ku xwe dispêre bîst herêmên xweser, heye. Wekî li Spanyayê, li Îtalyayê jî birêvebirinên herêmî ne tenê îdarî her wisan xwedî xweseriya siyasî ne jî. Ji lew re tevî rayeya birêvebirinê ya herêman, çendî ku hatibe sînardarkirin jî, rayeya wan a qanûnsaziyê heye. Li Îtalyayê ku wek dîrokî kevneşopiyêke unîter û navendîparêz lê heye, bi Makeqanûna 1947'an pênc²⁶ jê bi statûya taybetî, wek yekûn bîst herêmên xweser hatin çêkirin. Di gel vê, çêbûna pazdeh herêmên xweser ên giştî, piştî 1977'an pêk hat. Dîsan li salên 1990 û 2000'î, verastkirinên qanûnî hatin çêkirin ku statûya herêman xurt dikir. Îroj li Îtalyayê binyadeke îdarî û siyasî ya nenavendîparêz heye ku ji belediye, bajar, bajarên metropolîten û herêman pêk tê. Li gorî Makeqanûnê, tevahiya van çar pêkhateyan (belediye, bajar, bajarên metropolîten û herêm) teşekulên xweser in.²⁷

Modela xweseriya demokratîk a ku ji hêla KCD'yê ve hatibû pêşkêşkirin ku ji bîst, bîst û pênc herêman pêk dihat, ji aliyê nenavendiya herêmî ve dişibe birêvebirina li Spanya û Îtalyayê. Li nav binyada unîter, daxwaza damezirandina herêmên xweser dike. Tevî vê yekê, herêmên otonom ji modela li Spanya û Îtalyayê wek cudahî, ne ku xwe dispêre nasnameyên etnîk/neteweyî lê *bi tenê* xwe dispêre yekeyên cografîk. Ji vî aliyê ve wekî ku bişibe yên li bask, katalan û Galîçyayê yan jî mîna pênc herêmên xwedî statûya taybetmend ên li Îtalyayê, herêmeke kurdî ya ku cografyaya çandî ji xwe re dike bingeh, pêşbînî nake. Bi grûpkirina heştê û yek bajarên heyî, çêkirina herêman li xwe digire. Dîsan, di verastkirina li Spanya û Îtalyayê de, herêmên otonom ên ku ji hev cihêreng dibin tîna damezirandin, lê modela xweseriya demokratîk a KCD'yê ji bo temamiya Tirkiyeyê herêmên xweser ên yeknesaq pêşniyaz dike.

Nediyariyên xweseriya demokratîk

Projeya xweseriya demokratîk ku KCD'yê ew bi raya giştî re pareve kir, pişt re di Kongreya Neasayî ya Partiya Civaka Demokratî (DTP) ya 27 Çiriya Paşîn 2007'an de, bi navê "*Belgeya Helwesta Siyasî ya Partiya Civaka Demokratî ya Der Barê Çareseriya Kêşeya Kurdî û Demokratîkkirina Tirkiyeyê de*" hat teferûatkirin û qebûlkirin.²⁸ Di gel vê, di salên pey re ji aliyên aktorên cihê yên wekî Ocalan, KCK, KCD, Partiya Aştî û Demokrasiyê (BDP), metnên cuda yên ku ne xwedî tevahiyeke ne û hev nagirin, hatin weşandin.²⁹ Her wisan, li ser mijarê nûnerên cihê û navendî yên partiyên kurdî

²⁶ Ev pênc herêm ev in: (1) Friuli-Venezia Giulia, (2) Sardinia (Sardûnya), (3) Sicily (Sicilya), (4) Trentino-Alto Adige/Sudtirolo û (5) Valle d'Aosta.

²⁷ Ji bo analîzeke kurt û berawirdî ya li ser binyada îdarî-siyasî ya Spanya û Îtalyayê bnr.: (Toksöz û yd. 2009)

²⁸ Ev belge di nivenga internetê de ji gihanê re vekirî ye. Bnr.: <https://www.hurriyet.com.tr/gundem/dtp-siyasi-tutum-belgesi-7661752>, dema gihanê 20.11.2020.

²⁹ Ji bo analîza bikitekit a van metnan bnr.: (Yeğen 2011a; 2011c, 93-100; Güler 2015, 230-325; Ersanlı & Bayhan 2012).

yên sereke (BDP/DBP³⁰, Partiya Gelan a Demokratîk (HDP) xweseriya demokratîk bi şeweyên ji hev cuda şirove kirin (Çiçek 2015). Ev cihêrengî bi domana demê re, têkildarî nediyariyên xweseriya demokratîk, bûn sedemên zêdebûna rexneyan.

Nediyariyên xweseriya demokratîk di bin pênc sernavan de dikarin bîn civandin. A pêşî, xweseriya demokratîk ji aliyekî ve di navbera îdareya navendî û îdareyên cihkî/ herêman de parkirina hêzê wek pêşniyazeke reforma îdarî û siyasî pêşkêş dikir, ji aliyê din ve jî ew wek “modela xwe-birêxistinkirinê” ya siyaseta kurdî ya sereke hat pêşkêşkirin ku wê reformeke wiha li xwe venedihewand û ji dewletê bêhtir xîtabî civakê dikir. Nediyariya duyem jî meseleya astê pêk tîne. Der barê vê mijarê de astên wekî bîst, bîst û pênc herêm, bîst û şeş herêmên ajansên geşepêdanê, heft herêmên cografîk ên heyî, pazdeh herêm, heştê û yek bajar û herêmeke tenê ya kurdî hatin bilêvkirin. Nediyariya sêyem jî wesfê wan cografyayan e ku xweseriya demokratîk xwe dispart wan. Çendî bi awayekî piranî senifandineke sosyo-ekonomîk û çandî ya ku xwe nedispart cografyayên etnîk/ neteweyî derdiket pêş jî, lê xweseriya demokratîk di salên 2010’an de hem ji aliyê Ocalan hem jî KCD’yê ve wek “Kurdistana xweser” hat pêşkêşkirin. Nediyariya çarem jî, erk û raye ne. Wek nimûne, modela ku KCD’yê di 2007’an de ew aşkera kir, tê de parastin û têkiliyên bi derve re ji qada rayeya hikûmeta navendî re dihatin hiştin, lê di sala 2010’an de ku Pêvajoya Osloyê didomiya, di modela xwe ya aşkerakirî de diyar kir ku xweseriya demokratîk “Civaka Kurdistanê ji hêla siyasî, hiqûqî, xweparêzî, civakî, aborî, çandî, ekolojî û dîplomasiyê ve di heşt rehendan de xwe bi rê xistin dike û îradeya siyasî û avakirina Kurdistana demokratîk û xweser ji xwe re dike armanc (Yeğen 2011a, 1–2). Lê di hîlbijartinên 12 Hezîran 2011’an de, ku hemen piştî bidawîhatina Pêvajoya Osloyê li dar ketin, di beyannameya³¹ hîlbjartinê ya Bloka Ked, Demokrasî û Azadiyê de, ku Partiya Aştî û Demokrasiyê (BDP) pêşengiya wê dikir, modela nenavendîtiyê ya li ser bingeha bîst, bîst û pênc herêman ku wan xwe nedispart cografyayên etnîk/neteweyî, cih girt. Herî dawî, divê binê nediyariya der barê mijara satuya siyasî de bê xêzkirin. Modelên pêşkêşkirî, çendî carcaran îşaret bi statuyên hiqûqî yê ku nenavendîtiya cihkî û herêmî îfade dikin, bike jî lê car caran jî etîf bi statuyên konfederal dikir ku warên wekî parastin û dîplomasiyê li xwe digirtin û xwe dirêjî derveyî sînor dikir (Paker 2011).

Nediyariyên der barê xweseriya demokratîk de, ji hêlekê ve nîşan dide ku li ser

³⁰ Partiya Aştî û Demokrasiya (BDP), ku partiya kurdî ya sereke bû û di 2008’an de hatibû damezirandin, di Hezîrana 2014’an de tevî Partiya Gelan a Demokratîk (HDP) bû. Di Tirmeha 2014’an de îcar navê xwe wek Partiya Herêmên Demokratîk guhart û li partiyekê herêmî dageriya.

³¹ Beyannameya Hîlbjartinê di internetê de ji gihanê re vekirî ye: Bnr.: <http://www.ertugrulkurku.org/haberler/emek-demokrasi-ve-ozgurluk-bloku-secim-beyannameyi/>, dema gihanê: 20.11.2020.

proyeyê baş nehatiye xebitandin û ne ew modela tekane ye ku li serê lihevkerin çêbûye. Ev rewş, ji ber ku siyaseta kurdî ya sereke hem ji aliyê siyasî, zimanî û çînî ve tevgerike koalîsyonî ye ku komên civakî yê cuda digire nav xwe, hem jî ji ber ku ji rêxistineke tek bêhtir cure kompleksêke rêxistinane e ku li cografyayeke derî sînor mobilîze bûye. Ji aliyê din ve, ev rewş dibe wisan bê şirovekirin ku “xweseriya demokratîk pêvajoyeke dînamîk e ku ji aliyê teoriyê ve û di pratîkê de neqediyaye û tamam nebûye” (Gürer 2015, 8). Dîsan ev nediyariya mijara dabaşê, dibe ku bi awayekî zanebûn hatibe tercîhkirin da ku ji mizakereyê re derî vekirî bê hiştin. Ji lew re di siyaseta kurdî ya sereke de vekirîbûna ji şiroveyên cuda re, îmkana didê ku cudahiyên di binyeya xwe de yê mîna zimanî (kîrmanckî, kurmançî), dîni (elewî, sunî-mîslîm, êzîdî), çînî (çînên jêr û çînên navîn) û cudahiyên cografîk (wekî Serhed, Dêrsim, Diyarbekir û Hekarî) bi rê ve bibe û bikare mixalefeta civakî ya ku xwe dispêrê cihêrengiyê bike yek û mobilîze bike (Çiçek 2015).

Çendî dubendiya reforma îdarî-siyasî û ya xwebirêxistinê di warên mîna pîvane, yekeya cografî, raye û berpirsî, statuya qanûnî de nediyariyan li xwe bigire jî, xweseriya demokratîk di çar mijarên sereke de bi awayekî dîmaneyî çarçoveyê hîn zelal pêşkêş dike: (1) Bi awayekî makeqanûnî naskirina kurdan, (2) ji bo hîlberandina ji nû ve ya nasnameya çandî ya kurdî polîtîkayên nasnameyî yê pluralîst û perwerdehiya bi zimanê dayikê, (3) bi awayê ku mafê xwebirêvebirina kurdan temîn bike û hemû Tirkîyeyê bigire nav xwe nenavendîtiya cihkî yan jî herêmî û wek ya dawî jî (4) demokrasiyê beşdar a radîkal ku xwe dispêre meclîsên tax, bajarok, bajar û herêman (Çiçek 2012; 2014; Yeğen 2011c).

Helwesta mixalefetê

Teklîfa xweseriya demokratîk a siyaseta kurdî ya sereke, ji aliyê grûpên kurdî ve, ji komara demokratîk cuda, tevî ku bi awayekî rexneyî be jî bi erênî hat pêşwazîkirin. Li Tirkîyeyê li derî siyaseta kurdî ya sereke, ji tewereya du mixalefetên sereke dikare bê behskirin. Ji van a yekem partî û grûpên neteweperwer ên kurdî yê xwedî ranêzîkiya sosyalîst, komunîst, sosyal demokrat an jî lîberal in. Di salên 2000î de komên ku ev xet temsîl dikir ev in: Partîya Maf û Azadiyan (HAK-PAR) a ku ji nerîta sosyalîst tê, Partîya Demokrasiya Beşdar (KADEP) a xwedî meyla lîberal demokrat û Tevergera Şoreşgerên Demokrat ên Kurdî ya ku xwedî xeta neteweperwera klasîk e. Ev grûpên ku tesîra wan a civakî sînordar e û di salên 2000î de bi xwebirêxistinê kirina ji nû ve derketibûn holê, ji partî û rêxistinên kurdî yê salên 1980'yî bûn, wan bi awayekî esasî ji bo çareseriya meseleya kurdî federasyon diparast ku vê dikaribû di navbera kurd û tirkan de parkirina serweriya terîtoriyal mimkin bikira. Ev grûpên ku bi piranî bi awayekî rexneyî û bimesafe nêzikatî di siyaseta kurdî ya sereke dida,

xweseriya demokratîk wek çareseriyeke navberê ya ku dê çareseriya federatîf hêsan bike dinirxand. Jixwe di salên 2000î de, di navbera BDP û wan partî û grûpên kurdî yên xwedî xeta netewerper de ku wan rexneyên tûj li siyaseta kurdî ya sereke digirtin û xwe ji temasa bi wan re dûr didan, di hilbijartinên giştî yên 12 Hezîran 2011'an de îtifaq hat çêkirin (Çiçek 2015, 247).

Wek a duyem jî divê ku ji grûpên kurdî yên xwedî referansa îslamî bê behskirin. Ranêzikiya serdest a vê grûpê, ku bi piranî di nav AK Partiyê de tên temsîlkirin, cihkîbûn (mehelîbûn) e. Tevî vê yekê, teşekulên mîna Komeleya Mistezafan (*Mustazaflar Cemiyeti*, ku di 2013'an de bû HUDAPAR) ku ji aliyê kadroyên berê yên Hizbulahê ve hatiye damezirandin û Cemaeta Zehrayê, ji nenavendîtiya siyasî heta bi federasyonê vebijêrkên ji hev cuda veder nakin. Rexneyên esasî yên piraniya grûpên kurdên xwedî referansa îslamî yên der barê xweseriya demokratîk de, ji daxwaza xweseriyê ya ji bo kurdan bêhtir, li ser awayê şekilê xweseriyê yê siyaseta kurdî ya sereke bû. Tevî grûpên ku wan federasyon diparast, divê li pêş çav bê girtin ku elitên ekonomîk ên kurdî ji rexneyên şayanî diqetê pêşkêş kirin. Puxteya van rexneyan ew bû ku siyaseta kurdî ya sereke bi xweseriya demokratîk di bin serweriya xwe de li dû çêkirina binyadeke ku xwe dispêre aboriyeke girtî ku ji aliyê siyasî ve jî otorîter û tekparêz e (Çiçek 2015, 141– 81).

Der barê xweseriya demokratîk de, rexneyên bingehîn ji MHP û CHP'yê hatin. MHP'yê, Pêvajoya Osloyê wek "lêferzkirineke nû ya Sevrê" pênase kir ku dê welêt ber bi parçekirinê ve bibe û bi tundî li dijî pêvajoyê rabû. Li gorî vê, Tirkiye bi meseleya beqayê re rû bi rû ye û gotinên wekî "komara demokratîk" û "mafên çandî yên ferdî" di rastiye de îfadeyên lêgeriyana "avakirina dewleteke cihê" ye. Bi vî awayî, li ser maf û azadiyên ferdî naskirina cudahiyan û bifermîkirina vê ya hikûmetê, dê bi şekilê qedemeyî welêt ber bi dabeşkirinê ve bibe. Li gorî MHP'yê ku hemû alternatîfên der barê nenavendîtiya siyasî yan jî îdarî de li derî nîqaşê dihêle, ji bilî tirkî qebûlkirina zimanan a li qada gelemperî bi xwe jî, li dijî yekîtiya neteweyî tehdîd e. Kêşe, di rastiya xwe de, "azadbûyîna ferdî" ye ku ji xizaniyê, feodalîte û terorê diqewime. Loma jî kêşe tevî têkoşîna bi terorê re, divê bi tedbîrên civakî û aborî bê helkîrin (Türkiye Büyük Millet Meclisi 2009).

Wekî MHP'yê, CHP jî li dijî Pêvajoya Osloyê derket û hikûmeta AK Partiyê bi "kirina mizakereya bi terorê re" û bi teşwîqkirina "jihevveqetîn"ê sûcdar kir û mixalefeteke rûxîner meşand. Di hevdîtînen Meclîsê de serokê giştî yê partiyê yê wê gavê Deniz Baykal, pêvajoya vebûyîna demokratîk wek pêvajoya derxistina holê ya neteweyêke din û pêkanîna parçekirina neteweyî nirxand. CHP'yê jî mîna MHP'yê derî bi temamî li meseleya nenavendîtiya îdarî yan jî siyasî girtin û li dij rabû ku divê dewlet ji xeynî

tirkî qad ji zimanên din re veneke. Li gorî CHP'yê mirov dikarin nasnameyên xwe yê etnîkî derbibin û bi navbeynkariya rêxistinên civaka sivil geşe pê bidin û bi zimanê xwe yê dayikê biaxivin. Lê belê, dewlet mecbûr e der barê nasnameyên etnîkî de “kor” be, nabe ku bi zimanê dayikê perwerdehiyê bide. Ji lew re li gorî CHP'yê kêşeya kurdî di esasê xwe de kêşeyeke ekonomîk û civakî ye û pêwîst e hikûmet di van waran de li ser reforman hûr bibe (Türkiye Büyük Millet Meclisi 2009).

CHP, ku wê di meseleya nenavendîtî û zimên de helwesteke tund wergirt, piştî guherîna serokê wê yê giştî bi şûn de, bi awayekî qismî nerm bû û mîna AK Partiyê wê jî aşkera kir ku dibe şerha li ser Şertê Xweseriya Birêvebirinê Cihkî yê Ewrûpayê hatiye danîn bê hildan. Serokê nû Kemal Kiliçdaroglu, di çarçoveya Hilbijartinê Giştî yê 11 Hezîran 2011'an de, li mitînga ku li Colemêrgê hatibû lidarxistin, di axaftina xwe de ragihand ku dê wek partî şert mîna şekilê xwe yê heyî, qebûl bikin (Habertürk 2011).

Pêvajoya Osloyê, roja 14 Tîrmeh 2011'an bi awayekî sernekeftî bi dawî bû. Analîza sernekeftîbûna pêvajoyê li derveyê çarçoveya vê xebatê ye. Di gel vê yekê, xisûsek heye ku divê ji aliyê nenavendîtîyê ve bal lê bê kişandin: Yek ji du bûyerên ku pêvajo bi dawî kir û heman roj qewimîn, xistina kemînê ya tabûra komando ye ku li Farqîna Amedê pêk hat û di encama lihevixistinê de jî sêzdeh leşker û heft endamên KCK'yê jiyana xwe ji dest da, ya din jî îlana xweseriya yek alî ya ji hêla KCD'yê ve bû ku ev rêxistina sîwanî ya siyaseta kurdî ya legal e. KCD'yê, li dema ku ev mijara dabaşê ye, di encama kirina civîna nesayî de, bi boneya ku dewlet xwe nêzî çareserkirina kêşeya kurdî nake, ragihand ku wan “Kurdistana Xweser a Demokratîk îlan kiriye û ji bo “di metna Makeqanûna Demokratîk de ku hewce ye bi ruhê Meclisa 1921'ê bê amadekirin û bi kirina nîqaşan bigihîje encamê, divê Xweseriya Demokratîk wek statuya gelê kurd bê naskirin”, bangewaziyek kir (Evrensel 2011).

Pêvajoya Çareseriyê (2013-2015), Demokrasiya Cihkî û Li Rojava Xweseriya Demokratîk

Piştî bidawîbûna Pêvajoya Osloyê, lihevixistinê ji nû ve dest pê kir û di nav maweya hefdeh mehên heta Pêvajoya Çareseriyê de, nêzî hezar kesî di lihevixistinê de ku her diçû gur dibûn, jiyana xwe ji dest da. Pêvajoya Çareseriyê bi awayekî cuda ji pêvajoyên Îmralî û Osloyê, ku ew veşarî dihatin meşandin, bi şeweyêke dîmaneyî ji raya giştî re bi awayekî vekirî hat meşandin (Bayramoğlu 2015, 51). Pêvajoyê, di 03 Kanûna Pêşîn 2013'an de bi ziyareta Ocalan re, ya ku ji aliyê delegasyonê ji siyasatmedarên kurdî ve pêk hatibû, dest pê kir. Bangewaziya Ocalan, a ku digot dema bidawîhatina têkoşîna çekdar hatiye, nêzikî du meh û nîvan bi şûn de, di 21 Adar 2013'an de, li pîrozbahiyên Newroza Amedê, ku bi sed hezaran kes beşdarî lê kiribû,

bi raya giştî re hat parevekirin. Heta dezgehên medyayê yê rewteka sereke mesajên Ocalan bi awayê zindî li hemû Tirkîyeyê ragihandin. Bi Heyetên Mirovên Aqilmend re, ku ew di dema pêvajoyê de hatibûn çêkirin, civînên ku li heft herêman di asta bajaran de hatibûn lidarxistin, qismen be jî hat temînkirin ku pêvajo bibe ya civakê, nêrîn û pêşniyazên gel li gorî astên diyar hatin wergirtin û ew li hikûmetê hatin ragihandin. Jê wêdetir, hin verastkirinên hiqûqî yê der barê pêvajoyê de jî hatin kirin û "Qanûna Der Barê Bidawîna Terorê û Xurtkirina Yekkeriya Civakê de" ya bi hejmara 6551'ê di 16 Tîrmeh 2014'an de hat qebûlkirin (Çiçek 2018, 184–86).

Di Pêvajoya Çareseriyê de, li ser çar warên sereke lihevhatin nehat pêkanîn û piştî diyalogên ku nêzikî du sal û nîvan domiyabûn, Pêvajo di pey hîlbijartinên 7 Hezîran 2015'an re bi awayekî sernekeftî bi dawî bû. Ew warên ku li ser wan lihevhatin çênebûn ev in: (1) Teşekul û mekanîzmayên ku divê ji bo çareserkirina lihevexistinê û lihevhatinê bîn damezirandin û dê kî beşdarî li wan bikin, (2) rojeva mizakereyê û çarçoveya reforman, (3) metoda jiçekkirina KCK'yê, maweya vê yekê û verastkirinên qanûnî yê têkildarî rewşê, (4) rehenda derî sînora meseleya kurdî, nemaze jî birêvebirina xweseriya demokratîk a ku li ser esasê kantonan li Rojava hatiye çêkirin (Çiçek 2018, 186–87).

Helwestên nakokdar ên aktorên siyasî yê kurdî

Gava ji aliyê nenavendîtiyê ve li ser Pêvajoya Çareseriyê bê rawestandî, tê dîtin ku Ocalan, KCK, partiya kurdî ya legal a sereke BDP (DBP) û HDP'yê, ku di sala 2014'an de li avakirina wê pêşengî kiribû, tevî daxwaza xweseriya demokratîk a ku di Pêvajoya Osloyê de hatibû ser zimên, pêşniyazên cuda yê wekî demokrasiya cihkî û xurtkirina birêvebirinê cihkî pêşkêş kirin. Van aktorên ji aliyekî ve helwestên hevnegr ji aliyê din ve jî helwestên ku dibin sedema çêbûna nakokîyan, nîşan dan.

Ocalan ku hema bibêje wî ew hemû model û têgih bi pêş xistibûn û siyaseta kurdî ya sereke der barê çareseriyê kêşeya kurdî de ew diparastin, di warê parkirina hêza siyasî de Şertê Xweseriya Birêvebirinê Cihkî yê Ewrûpayê wek bingeh hilda, ku ev şert di asta sînardar de nenavendîtiya îdarî pêşbînî dike û der heqê vê mijarê de jî tu wesfekî wî yê girêder nîn e. Di vê çarçoveyê de, ji nenavendîtiya ku rayeya wê ya qanûnsaziyê heye, di warên wekî aborî, dîplomasiyê û xweparêziyê de xwedî îdîa ye û ji vî aliyê ve nêzî çareseriyên federatîf e, alternatîfên cuda anîn rojevê. Di gel vê Ocalan di nav Pêvajoya Çareseriyê de çareseriyê meseleya kurdî ya nîhayî ji têkoşîna siyasî re dihişt û ji bo jiçekkirina PKK'yê û bidawîhatina lihevexistinan jî, parast ku di nav pêvajoyê de demokratîkbûnê de ya li çapana welêt, bi xurtkirina birêvebirinê cihkî ev yek dê qîm bike.

Di hevdîtina pêşî de ku Ocalan di 03 Kanûna Pêşîn 2013'an de bi BDP'yê re kir, daxuyand ku di çarçoveya pêvajoyê de dê pêşî rewşa lihevnextistinê bê pêkanîn û di pey re jî dê pêvajoya reforma makeqanûnî û qanûnî bê destpêkirin û di çarçoveya reforman de parkirina hêza siyasî jî anî rojevê. Ocalan der barê vê yekê de, ji aliyekî ve etîf bi Şertê Xweseriya Birêvebirinên Cihkî yê Ewrûpayê kir ji aliyê din ve jî behsa rayeya qanûnsaziyê û xweseriya ekonomîk kir ku bi awayekî dihat mehneya nenavendîtiya siyasî ya berfirehkirî: "Ez perwerdehiya zimên nîqaş jî nakim. Dê mafê qanûnsaziyê û xweseriya aborî hebe. Dê rezervên li ser Şertê Xweseriya Birêvebirinên Cihkî werin hildan." Li hêla din, di hevdîtina 23 Sibata 2013'an de, got ku "Eger em li ser xweseriya demokratîk îsrar bikin, ew tê mehneya sabotekirinê" û diyarkir ku Şertê Xweseriya Birêvebirinên Cihkî yê Ewrûpayê wê bes be: "Kurd wê xwe azadane îfade bikin û bi rê ve bibin. Eger em niha qanûnê ferz bikin dê alerjiyeke mezin çêke. Dibe ku piştî ev bibe. Mesela Şertê Xweseriya Birêvebirinên Cihkî yê Yekîtiya Ewrûpayê. Jixwe eger şerha li ser vê rakin, mesele bi awayekî pir hel dibe" (Öcalan 2015, 14, 22, 26).

Ocalan, li ser rexneyên vê nêzikahîtdana wî ku eksî çapemeniyê bûbûn û digotin wî dev ji serxwebûn, federasyon û xweseriyê berdaye, di hevdîtina bi heyeta BDP'yê re, ku di 03 Nîsan 2013'an de kiribû, wek bersiv gotibû ku wî dev ji tu tiştî bernedaye, derbiribû ku ew mijarên dabaş li ser wan e, mijarên têkoşîna siyasî ne û berêti jî demokratîkbûyîn e (Öcalan 2015, 56–57). Li ser mijara parkirina hêza siyasî jî di çarçoveya "Tirkiyeya Demokratîk" de reforma îdareyên cihkî pêşniyaz kir. Li gorî Ocalan "divê di warên aborî, ewlehiya cihkî, perwerdehî, çand, tendûristî û hwd. de mafê gotinê yê meclisên cihkî hebe. A bi vî awayî perwerdehiya bi zimanê dayikê jî çareser dibe." Ocalan ku parkirina hêza siyasî di çarçoveya reforma birêvebirinên cihkî de dinirxîne, xweseriya demokratîk jî ji wateya bikaranîna wê ya di Pêvajoya Osloyê de cuda ji nû ve bi awayê "birêxistinbûna civaka sîvîl a kurdan" terîf kir. Di Pêvajoya Osloyê de, xweseriya demokratîk dihat wateya xwe-birêxistinîkirineke sîvîl a ku xwe dispêre birêxistinbûna ji jêr ve û bi awayê nenavendîtiya îdarî û siyasî ya li ser esasê bîst, bîst û pênc herêman li xwe digire, dihat bikaranîn. Her wiha Ocalan di pêşnimaya çareseriyê de ku pêşkêşî dewletê kiribû û paşê wê zemîna çarçoveya çareseriyê ya deh madeyî pêk anîbû, ku di hevdîtina Dolmabaxçeyê de ji raya giştî re hatibû aşkerakirin, teklîfa çêkirina heşt komîsyonan kir³² û xweseriya demokratîk di çarçoveya "Komîsyona Civaka Sîvîl" de hilda dest (Öcalan 2015, 93–94):

"Komîsyona Civaka Sîvîl: Kêşeya kurdî, dê ne bi awayê çareseriyê ku dewletê par bike, yanî dê dewletê neke rewşeka federe. Kurd dê di nav dewletê de xwe

³² Ew komîsyon ev in: (1) Komîsyona Hiqûqê, (2) Komîsyona Sosyo-ekonomîk, (3) Komîsyona Mîsaqa Milî, (4) Komîsyona Azadiya Jinan, (5) Komîsyona Ekolojîyê, (6) Komîsyona Civaka Sîvîl, (7) Komîsyona Ewlehiyê û (8) Komîsyona Lêgerîna Heqîqetan û Şopane.

bi şekilê civaka sivil bi rêxistin bikin. Ez cara pêşî ji we re dibêjim: Em dê civakê bikin halê sivil û zor bidin dewletê ku çareseriyê pêk bîne. MHP, nijadperestî filan, ev tev asteng in. Em dê qada sivil hem demokratîk hem jî xurt bikin û tenteneya neteweperest bêtesîr bihêlin. Ne li ser parçeyekî dewletê, em dê kurdan wek civakake sivil a demokratîk bi rêxistin bikin. Xweseriyê demokratîk jî di nav vê de ye.”

KCK'yê, ji Ocalan cudatir, ji birêxistinbûna civaka demokratîk wêdetir xweseriyê demokratîk di çarçoveya wek civakê qebûlkirina kurdan û mafê birêvebirina xwe bi xwe de nirxand. KCK'yê “Pakêta Demokratîkbûyînê” (Türkiye Gazetesi 2013) ya hikûmeta AK Partiyê, ku di 30 Îlon 2013'an de aşkera kir, bes nedît û di çarçoveya “Deklarasyona Çareseriyê Demokratîk de ku 10'ê Çiriya Pêşîn a 2013'an weşand, ji bo Pêvajoya Çareseriyê bigihîje serkeftinê, sê daxwaz derpêş kirin û ji van daxwazan yek jê jî xweseriyê demokratîk bû (Demokrat Haber 2013):

“Şertên bingehîn ên çareseriyê kêşeya kurdî ya wek naverok hene. Heta ev daxwazên bingehîn neyên bicihanîn, ew tiştên ku ji bo teferûatê tîn axaftin û tîn kirin, bêmehe ne. Ev daxwazên hîmî, parametre û şertê kifş in. Ev bi awayê ku ji hev nayên qetandin, tevahiyekê îfade dikin. A yekem: hildana bin temînata makeqanûnî û qanûnî ya hebûna kurdan, nasnameya wan û çanda kurdî, bi nasnameya kurdî re naskirina azadiya raman û birêxistinbûnê. Ya duyem: Li gorî pêwistiya wek civakê pejiwandina kurdan, qebûlkirina xwebirêvebirinê yanî ya xweseriyê demokratîk. A sêyem: ji ber ku ew wek gelê xwastin bi jenosîda çandî bê tune kirin, di her astê de qebûlkirina perwerdehiya bi zimanê dayikê ye.”

Dikare bê gotin ku di Pêvajoya Çareseriyê de, xweseriyê demokratîk di navbera Ocalan û birêvebirina KCK'yê de kêşeyek pêk aniye. Ji lew re piştî daxuyaniya ku mijara dabaşê ye, di 14 Çiriya Pêşîn 2013'an de, di wê hevdîtinê de ya ku bi heyeta BDP'yê re hatiye kirin, li ser bibîrxistina daxwazên KCK'yê Ocalan bersiv da û got ku “Ez giringî bi heşt rehendên neteweya demokratîk didim. Bila ew (birêvebirina KCK'yê) jî li ser wan hûr bibin. Ev ne zêde zanistî ne, giringî bi wan nadim (Ocalan 2015, 158). Li ser vê, birêvebirina KCK'yê ji aliyekî ve ji raya giştî re radigihand ku ew çarçoveyên ji hêla Ocalan ve hatine pêşkêşkirin pesend dikin (Al Jazeera Türk 2013a; Agos Gazetesi 2015), ji aliyê din ve berdewamî bi anîna ser zimên a daxwaziya xweseriyê demokratîk da. Jixwe piştî Pêvajoya Çareseriyê ku di pey hilbijartinên 07 Hezîran 2015'an de bi awayekî sernekeftî bi dawî bû, KCK'yê bi îlankirinê xwebirêvebirinê re bi fiêlî berê xwe da avakirina xweseriyê demokratîk. Wek mînak; Endamê Desteya Birêveberiyê ya KCK'yê Murat Karayılan, di 26 Îlon 2015'an de ji Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) re mesajek şandibû, ku wê demê Kongre li Brukselê civiya, di mesaja xwe de îlana xweseriyê demokratîk wek “pêvajoya avakirina Kurdistana azad” nirxand

(Amerika'nın Sesi (VOA) 2015).

Di Pêvajoya Çareseriyê de BDP-HDP, li gorî Ocalan û KCK'yê xwedî roleke hîn sînordar bû. BDP-HDP, ku bi awayekî bingehîn di navbera Ocalan û KCK'yê de ragihanê/danûstandinê pêk dianî, her wisan ji bo pêvajoyê, alîkarî li çêkirina rizaya civakî kir. Nebû (yan jî nekarî bibûya) aktorek ku seyra pêvajoyê diyar bike. Siyaseta kurdî ya sereke xweseriya demokratîk, wekî li Pêvajoya Osloyê, hem wek xwe-birêxistinê hem jî wek nenavendîtîbûyîna îdarî û siyasî hilda dest.

Der barê xweseriya demokratîk de gava helwesta BDP-HDP'yê bê analîzkirin, xisûsa ewil a ku divê bal lê bê kişandin damezirandina HDP'yê û veguherîna BDP'yê ye. BDP ku heta Nîsana 2014'an qada temsîlê ya siyaseta kurdî ya sereke bû, li ser pêşniyaza Ocalan cihê xwe ji HDP'yê re hişt ku di 15 Çiriya Pêşîn 2013'an de hatibû avakirin û di kongreya xwe ya sêyem de navê xwe wek *Demokratik Bölgeler Partisi-DBP* (Partiya Herêmên Demokratîk) guhart. HDP, ku siyaseta kurdî ya sereke bi grûpên mixalîf ên têvel re ew pêk anîbû û pêşewatî lê fikir, li çapana Tirkiyeyê xebatên siyasî dimeşandin, lê Partiya Herêmên Demokratîk (DBP) avakirina xweseriya demokratîk ji xwe re kir wek bingeh û li ser cografyaya kurdan hûr bû. Jixwe di hîlbijartinên cihkî de ku di 30 Adar 2014'an de çêbûn, siyaseta kurdî ya legal a sereke li cografyaya kurdan bi namzedên BDP'yî ket pêşbaziya hîlbijartinan û li aliyê rojavayê Tirkiyeyê jî destek da namzedên HDP'yê.

DBP, ku wê ji xwe re avakirina xweseriya demokratîk kiribû mîsyon, pêkhatiya wê ya pêşeng HDP'yê daxwaza xweseriya demokratîk dewam kir û li çapana Tirkiyeyê anî ser zimên. Di hîlbijartinên cihkî yê 30 Adar 2014'an de, HDP modela "birêvebirina xweseriya demokratîk a cihkî û herêmî" parast û di beyannameya xwe ya hîlbijartinên cihkî de bi revîzyonên biçûk cih da modela nenavendîtîya li ser bingeha bîst, bîst û pênc herêman ku di Pêvajoya Osloyê de ji ew hatibû derbirîn (Halkların Demokratik Partisi 2014a).

HDP'yê daxwaza birêvebirina xweseriya demokratîk a cihkî û herêmî, di hîlbijartinên 7 Hezîran 2015'an de jî, ku hemen berî kutabûna Pêvajoya Çareseriyê hatin lidarxistin, berdewam kir. HDP'yê di beyannameya hîlbijartinê de, li jêr sernavê "Xweseriya Demokratîk û Demokrasiya Cihkî" cih da mijarê û çarçoveyeke ku dişibiya ya berê, pêşkêş kir (Halkların Demokratik Partisi 2015).

Di gel ku li ser xweseriya demokratîk di navbera helwesta Ocalan û DBP-HDP'yê de cudahî hebûn jî, ew çarçoveya ku Ocalan parêziya wê fikir di hevdîtînan bi hikûmeta AK Partiyê re, di dema Pêvajoya Çareseriyê de bû çarçoveya sereke. Li

gorî vê, ji bo çareseriyê kêşeya kurdî, dê ji aliyekî ve xurtkirina birêvebirinên cihkî bihata temînkirin ji aliyê din ve jî dê qada civaka sivil bihata berfirehkirin. Ji vî aliyê ve, li şûna çarçoveya “xweseriyê demokratîk a ku di Pêvajoya Osloyê de hem wek xwebirêxistinê hem jî wek nenavendîtiya îdarî û siyasî ya di asta herêmî de dihat bikaranîn, xurtkirina birêvebirinên cihkî û berfirehkirina qada civaka sivil cih girt, ku dikare bê gotin ew dihat wateya nenavendîtiya îdarî ya li çapana cihkî (heştê û yek bajar). Xweseriyê demokratîk, wek ku bi meseleya “xwebirêxistinê” ve sînordar be, ji nû ve hat pênasikirin ku ev yek di qada civaka sivil de xwe dispirt birêxistinbûna ji jêr ve.

Di Pêvajoya Çareseriyê de, li Ofisa Serokweziriyê ya li Dolmabaxçeyê, di 28 Sibata 2015'an de piştî diyaloga ku nêzî du salan di navbera Heyeta Îmraliyê û nûnerên hikûmetê de domiya, hat daxuyakirin ku li gorî çarçoveyekê li hev hatine. Di civîna çapemeniyê de ku vê lihevhatinê vedibeyand, madeya duyem a metna çarçoveyê³³ ya xwedî deh madeyî ya ku Ocalan amade kiribû, ji bo mijara xurtkirina birêvebirinên cihkî û berfirehkirina qada civaka sivil hatibû veqetandin û “pênasekirina rehendên neteweyî û cihkî ya çareseriyê demokratîk” li xwe vedihewand. Ocalan, dihevdiştina nêzikî sê hefte berî vê daxuyaniyê de, diyar kiribû ku ji ber “hildana ber çav a hin hesasiyetan” li şûna xweseriyê demokratîk têgiha “demokrasiya cihkî” bi kar aniye û derpêş kiribû ku dê berê Tirkiyeyê bidin demokrasiya cihkî (Öcalan 2015, 410). Ranêzikiya “demokrasiya cihkî”, paşê ji hêla siyasîmedarên ku di nav Heyeta Îmraliyê de cih girtine jî hat teyîdkirin. Wek mînak, Hatîp Dicle derpêş kir ku di Pêvajoya Çareseriyê de bi dewletê re li ser têgiha demokrasiya cihkî li hev kirine (Eskin 2015). Dîsan, li gorî îdîaya Îdrîs Baluken, “Di Pêvajoya Çareseriyê de, verastikirinên qanûnî yên ku rayeyên di asta navendî de didin cihkiyan, ku wan li bal Wezareta Karên Navxweyî ew anîbûn merheleya dawî” hatin amadekirin. A rast, amadehiya van her du qanûnên ku Baluken amaje bi wan dike, Ocalan di 26 Nîsan 2014'an de, di hevdiştina ku bi Heyeta Îmraliyê re kiribû, anîbû ser zimên (Öcalan 2015, 284).

³³ Ev deh madeyên ku wek Mitabeqata Dolmabaxçeyê vebiyabû raya giştî ev bûn: (1) Pênaseya siyaseta demokratîk û naveroka wê, (2) pênasekirina rehendên neteweyî û cihkî yê çareseriyê demokratîk, (3) teminatên qanûnî û demokratîk ên welatîtiya azad, (4) têkiliya siyaseta demokratîk a bi dewlet û civakê re û sernavên ji bo sazûmanibûyîna van, (5) rehendên sosyo-ekonomîk ên pêvajoya çareseriyê, (6) di pêvajoya çareseriyê de bi şekilê ku pergala gelemper û azadiyan biparêze, hildana dest a têkiliya demokrasî û ewlehiyê, (7) çareseriyên qanûnî yê pirsgerêkên jin, çand û ekolojîk û teminatên ji bo van yekan, (8) der barê têgiha nasnameyê, pênase û naskirina wê de bipêşxistina feraseta pluralîst û demokratîk, (9) bi kriterên demokratîk terfîkirina komara demokratîk, welatê hevpar û neteweyê, di nav sistema pluralîst û demokratîk de jî hildana bin garantiyên qanûnî û makeqanûnî, (10) makeqanûneke nû ya ku van hemû hemleyên demokratîk û veguherînan wek armanc ji xwe re xwemalî dike.

Dimenên civîna Dolmabaxçeyê di nivenga internetê de ji gihanê re vekirî ne. Bnr.: (Al Jazeera Türk 2015)

“Di meseleya kurdî de ji bo teşebusa çareseriyê du ling hene: 1- Li gorî Şertê Birêvebirinên Cihkî yê Ewrûpayê, dê qanûneke birêvebirinên cihkî bê derxistin. Divê şerhên ku li ser Şertê Xweseriya Birêvebirinên Cihkî yê Ewrûpayê hatine danîn bên hildan. 2- Divê qanûna civaka sivil a demokratîk bê derxistin ku hebûna KCD'yê bi xwe eleqedar dike û di ser Qanûna Komeleyan a heyî re ye. Divê vê wek parlamentoya civaka sivil a demokratîk sererast bikin. Heta ez nimûneyekê bidim û rave bikim. Berî TBMM'yê Komeleyên Midefaya Hiqûqê (*Müdafa-i Hukuk Cemiyetleri*) hebûn. KCD di pozîsyona Komeleya Midefaya Hiqûqê de ye. *Meseleya kurdî li ser van her du qanûnan digihîje çareseriyê*” (cext lê hatiye zêdekirin).

Ji bilî DBP-HDP'yê, pozîsyona partî û grûpên mixelif ên kurdî ya der heqê parkirina hêzê ya di Pêvajoya Osloyê de, di wexta Pêvajoya Çareseriyê de jî dewam kir. Bi xulase, partî û komên kurdî yên di xeta lîberal, çep-sosyalîst û komünîst de û tevgerên neteweperwer ên xwedî referansa îslamê mîna Înîsiyatîfa Îslamî ya Kurdistanê ya Ji bo Heq, Edalet û Huriyetê (Azadî), federasyon parast û daxwaza xweseriya demokratîk jî wek ku “çareseriya nihayî” hêsan bike mîna gava ewilî nixand. Lê kurdên ku di warê siyasî de bi piranî di nav AK Partiyê de û yên ku di nav grûpên siyasî de mîna tevgerên xwedî referansa îslamî yên hîn radîkal cih digirt, wekî HUDAPAR'ê, wan cihkîbûyîn û di warê îdareyên meheli de jî xwebirêvebirina kurdan parast.

Çendî di navbera Pêvajoya Osloyê û Pêvajoya Çareseriyê de berdewamiyek hebe jî, divê binê du guherînên giring bê xêzkirin. Ji van a yekem, pluralîstbûyîna siyasî ya di nav kurdan de ye. Di pey Pêvajoya Osloyê re, gelek partiyên kurdî ava bûn. Ji van partiyên gelek jê ji desteka girseyê bêpar û bi tenê li çend bajaran birêxistî bûn. Di gel vê yekê, avabûna van partiyên xwedî xetên cuda mîna sosyalîst, komünîst, lîberal, bireferansa îslamî û neteweperwer, tê mehneya pluralîstbûyîna qada siyasî. Partiya Azadî û Sosyalîzmê - ÖSP (Çiriyê Pêşîn 2011), HUDAPAR (Kanûna Pêşîn 2012), Azadî (Hezîran 2012), Partiya Demokrat a Kurdistanê -Bakur (PDK-Bakur, Nîsan 2013),³⁴ Partiya Demokrat a Kurdistanê - Tirkîye (PDK-T, Nîsan 2014), Partiya Kurdistanî (PAKURD, Gulana 2014), Partiya Azadiya Kurdistanê (PAK, Çiriyê Pêşîn 2014) ev partî ne ku di vê dewrê de hatine damezirandin. Di Gulana 2016'an de Partiya Sosyalîst a Kurdistanê - PSK, di Gulana 2018'an de Partiya Însan û Azadiyê (PÎA) û di Hezîrana sala 2019'an de jî bi partîbûyîna Hereketa Azadî, Ji bo Dad, Bawerî û Azadiyê Partiya Azadiyê li van partiyên zêde bûn.

HUDAPAR, Partiya Azadiyê û Partiya Însan û Azadiyê (PÎA) ku di xeta siyasî

³⁴ PDK-Bakur, ku berê fealiyeta îlegal dimeşand, di Kongreya xwe ya 10'em a Nîsana 2013'an de rêbaza xebata qanûnî, aşkera û rewya pejrandiye.

ya xwedî referansa îslamî de ne, lê tevahiya partiyên mayî yên ku bi pêşengiya kadroyên sekuler û yên ku bi piranî ji kevneşopîya wan partiyên siyasî yên berî 1980'yî hatibûn damezirandin dihatin, hatin avakirin. HUDAPAR ji bo çareserîya meseleya kurdî der barê parkirina hêza siyasî de, fikira ku divê birêvebirinên cihkî bên xurt û hêzdarkirin û hemû birêveberên cihkî jî ji aliyê gel ve bên hîlbijartin diparêze (HÛDAPAR 2012). Li gorî Partiya Azadiyê "Kurd daxwaza dewletê dikin, ev dewlet herî baş bi kîjan awayî mimkin be ji bo tercîhkirina wê tu zerar nîn e. Ji yekîtiya umetê heta bi federasyonê, ji neteweyê heta bi konfederasyonê rêya dewletê heye" (Hareketa Azadî 2014). Partiya Însan û Azadiyê fikira ku "Mafê kurdan ê xweserî, federasyon û serxwebûnê yê bi tercîha wan heye û mafê diyarkirina çarenûsê yê ji aliyê gelê kurd bi xwe ve jî, divê bi tenê ji biryar û pesendkirina wan re bê hiştin" diparêze (Îslamî Analiz 2017).

Partiya Maf û Azadiyan (HAK-PAR) ku di sala 2002'yan de hatiye avakirin û partiya pêşî ye ku mixalefetê li kevneşopîya DBP-HDP'yê dike, "Mafê bi xwe diyarkirina çarenûsê yê neteweyan ji bo çareserîya kêşeya kurdî bi awayekî prensîbî dipejirîne. Ji bo çareserîya kêşeyê, bi terzekî demokratîk û federal ê ku li ser hîmê wekhevîya kurd û tirkan ji nû ve hatiye veavakirin, diparêze (Hak ve Özgürlükler Partisi 2013). Partiya Demokrasiya Beşdar (KADEP) jî wekî HAK-PAR'ê federasyon parast. Li gorî KADEP'ê kurd xwedî mafê diyarkirina qedera xwe ne û çareserîya kêşeyê jî "sîstema federal a azadîparêz, pluralîst, beşdar, laîk û demokratîk e" (Katılımcı Demokrasi Partisi, 2006).³⁵

Piştî kutabûna Pêvajoya Osloyê hemen bi şûn de, di nav partiyê avabûyî yên sekuler de Partiya Azadî û Sosyalîzmê - ÖSP (di Çiriya Paşîn 2018'an de li Partiya Komunîst a Kurdistanê - KKP'yê dageriya) tesbîta "Di mercên heyî de wek hedefa nêzik bi beşdariya gelan a xwedî şertên wekhev çareserîya federal ji xwe re dike armanc. Wek stratejîk jî serxwebûnê diparêze" dike (Kürdistan Komünist Partisi 2011). PSK diyar dike ku mafê kurdan ê tayînkirina qedera xwe, dibe ku bi şekilê cudabûn û federasyona xwedî du neteweyî çêbe û tevî vê yekê jî tercîha wan li ser "federasyoneke demokratîk e" (Kürdistan Sosyalist Partisi 2020). Li gorî PAK'ê, "Hedefa dewletekê ya li Kurdistanê bi awayê ku ji bo destkeftiyên herî biçûk têkoşînê jî li xwe bigire, federasyoneke wekhev û xwedî du dewletan, dibe ku konfederasyon an federe yan jî dewleteke konfederal be û dibe ku bi şekilê dewleta serbixwe jî pêk were" (Kürdistan Özgürlük Partisi 2014). PDK-T jî ku diangêje ew kevneşopîya Mele Mistefa Barzanî dişopînin, mafê diyarkirina çarenûsê diparêze û ji bo kurdên li Tirkiyeyê jî derpêş dike ku dibe ev yek bi şeweya xweserî, federasyon

³⁵ KADEP di mêjûya 2016'an de bi biryara kongreyê xwe fexs kir û tevî PDK-T'yê bû (Kürdistan 24 2016).

an jî serbixwebûnê be (BBC News Türkçe 2017b).

Partiya duyem PDK-Bakur a ku îdia dike ew jî rêbaza Mele Mistefa Barzanî taqîb dike, çendî cext li ser mafê kurdan ê tayînkirina qedera xwe bike jî, lê serxwebûnê diparêze: “Çareserîya partiya me, bi vekişîna mêtîngeran a ji welatê me û wekî peymanên navneteweyî jî dipejirînin, di nav rewşeke azad de li bin çavdêriya civaka navneteweyî kirina plebîsîta self-determinasyonê ye. Partiya me ku tercîhê ji gelê Kurdistanê re dihêle, helwesta xwe ji bo serxwebûnê werdigire” (Vengma 2017). PAKURD ku bi piranî di nivenga girîmanekî (vîrtual) de çalakiyan dike û wek cure e-partiyek e, mîna PDK-Bakur mafê kurdan a avakirina dewletê û serxwebûnê diparêze (Demir 2020).

Li warê siyasî ya kurdî, ji Pêvajoya Osloyê cuda guherîneke din a duyem jî çêbû. Di Pêvajoya Çareseriyê de, hewlên ji bo “yekîtiya neteweyî” ya di nav komên siyasî yên kurdî de zêde bûn û di navbera nerîta DBP-HDP’yê û partiyên kurdî de teşebusên şirkatiyê pirtir bûn. Hemen berî kutabûna Pêvajoya Osloyê, di hîlbijartinên giştî de ku di 12 Hezîran 2011’an de hatin kirin, di navbera HDP’yê û HAK-PAR, KADEP û TŞDK’yê de hewlên “yekîtiya neteweyî” pêk hatin, piştî “Konferansa Kurdistanê ya li Tirkîyeyê” ku di navbera 17-18 Îlon 2011’an de li dar ket û “Civîna Yekîtiyê ya bi Aqilê Hevpar” a ku di 10 Adar 2012’an de çêbû, ew taqîb kir. Hem grûpên sekuler hem jî yên xwedî referansa îslamî beşdarî van civînan bûn (Çiçek 2015, 247).

Li ser pêşniyaza Ocalan, di 15-16 Hezîran 2013’an de, di çarçoveya Pêvajoya Çareseriyê de, li Amedê “Konferansa Yekîti û Çareseriyê ya Bakurê Kurdistanê” hat kirin. Konferansa ku HAK-PAR beşdar nebû û HUDAPAR jî nehatibû vexwendin, di gel nûnerên DBP -DTK’yê grûpên sekuler ên mîna KADEP, ÖSP û TŞDK’yê; Cemaeta Zehrayê, Platforma Öze-Dönüşê, Grûpa Diyalogê ya Dicle-Firatê, grûpên xwedî referansa îslamê wekî Mazlum-Der’ê; saziyên civaka sivil ên ku li herêmê derketine pêş, navên ji camîaya sermayeya kurdî yên xuyanî û nûnerên kêmarên neteweyî û dînî yên ji herêmê beşdar bûn. Di encamnameya konferansê de hat diyarkirin ku Pêvajoya Çareseriyê tê destekkirin û hat derpêşkirin ku “Bêyî statuyeke Kurdistanê dê kêşeya kurdî bi awayekî nihayî çareser nebe.” Li gorî prensîpa ku pêkhateyê konferansê li serê hevpar bûbûn, “Gelên Kurdistanê xwedî maf in ku ew bi tercîha xwe statuya (wekî xweserî-federasyon û serxwebûnê) diyar bikin” û ev maf “divê bi tenê ji biryar û pesenda gelê Kurdistanê re bê hiştin” (Star 2013).

Hewlên ji bo yekîtiya neteweyî yên li nav kurdan, bi awayekî qismî be jî eksî hîlbijartinên giştî yên 7 Hezîran 2015’an jî bû. Di hîlbijartan de ku hemen berî kutabûna Pêvajoya Çareseriyê pêk hatin, DBP û DTK, ÖSP, Komeleya Kurdî ya

Şoreşger û Demokrat (DDKD) û Tevgera Azadî, “Îtifaqa Hilbijartinê ya Kurdistanê” çêkir û wan biryar da ku bi HDP’yê beşdarî hilbijartinan bibin. Îtifaqa Hilbijartinê “Ji bo Kurdistanê statu, perwerdehiya bi zimanê dayikê, fermîbûna zimanê kurdî û hildana bin garantiya makeqanûnî ya nasnameya kurdî” wek daxwazên sereke diyar kirin (Özgürlük ve Sosyalizm Partisi 2015). Li aliyê din, KADEP, PAK, PAKURD, PDK-Bakur û PDK-T’yê tercîha xwe kir ku li derveyî îtifaqê bimînin. PAK’ê der barê vê yekê de daxuyanî da û ragihand ku “Tu partî yan jî namzedê ku li maf û azadiyên kurdan ên neteweyî û demokratîk nebe xwedî, di bernameya xwe ya partî û hilbijartinê de cih nede van, dê neyê destekkirin” û tevî hilbijartinê nebû (Îlke Haber 2015). HUDAPAR û HAK-PAR’ê ku wê gavê PSK’yê jî di nav wê de cih digirt, wek partî wan tercîh kir ku bi tena serê xwe beşdarî hilbijartinê bibin.

Bi puxteyî, di Pêvajoya Çareseriyê de partiyên kurdî yên li derî BDP-HDP’yê, bi piranî li ser mijara parkirina hêzê cext li mafê diyarkirina qedera xwe ya kurdan kir û wan daxwaza naskirina statuya Kurdistanê kir.

Ji bo vê statuyê, bi awayekî giştî otonomî-federasyon-serxwebûn wek sê formên sereke bên cextandin jî, serxwebûn mîna îdealek di şertên heyî de wek çareseriyaya reel modela çareseriyê ya federatîf a ku xwe dispêre du miletan/neteweyan derket pêş. Di nav van partiyan de, awarteya tek HUDAPAR e ku wê xurtkirina îdareyên meheli û bi hilbijartinê hatina ser kar a hemû birêveberên cihê diparastin.

Azadiya derbirinê ya AK Partiyê û politikayên wê yên ku di mafên çandî de asê bûne

AK Partiyê eynî wekî di Pêvajoya Osloyê de, di Pêvajoya Çareseriyê de jî çarçoveya reformê wek demokratîkbûyîn pêşkêş kir û parkirina hêza siyasî jî di çarçoveya xurtkirina birêvebirinê cihê de hilda dest. Di gel vê, reformên ku di somdariya pêvajoyê de hatin kirin, di çarçoveya demokratîkbûyînê de berfirehkirina mafê îfade û birêxistinbûnê û di qada gelemperî de bikaranîna zimanê kurdî, bi naskirina mafên çandî yên ferdî yên xurtker, sînorkirî ma.

AK Partiyê bi berdewamiya Pêvajoya Çareseriyê re daxwazên ji bo xweseriyê li derve hiştin û tim cext li ser xurtkirin û hêzdarkirina birêvebirinê cihê kir. Sereşewermendê Serokwezîriyê Hatem Ete, Hatîp Dicle teyîd kir û derpêş kir ku bi dersên ji Pêvajoya Osloyê hatine derxistin, Pêvajoya Çareseriyê dest pê kiriye û xweserî di Pêvajoya Çareseriyê de cih negirtiye. Ete ku Ocalan jî teyîd dike, daxuyand ku xweserî dikare bibe mijara têkoşîna siyasî ya piştî bêçekkirinê (Yeni Asya 2015). Alîkarê Serokwezîr Yalçın Akdoğan jî bi wesîleyên cuda derbirî ku di çarçoveya Pêvajoya Çareseriyê de xweserî nîn e, AK Partî dê vê qebûl neke

(Hürriyet 2015a). Serokwezîrê wê demê Ahmet Davutoglu, ku li ser nîqaşên der barê xweseriyê de wek bersiv peyivî, pozîsyonên Ete û Akdogan teyîd kirin û dupat kir ku xweserî di Pêvajoya Çareseriyê de nîn e û lê dê reformên AK Partiyê yên ji bo birêvebirinên cihkî bidomin (Al Jazeera Türk 2014). Ranêzikiya hikûmeta AK Partiyê ya der barê vê mijarê de, du sal bi şûn de vebiyîya çarçoveya lihevkerinê ku di civîna Dolmabaxçeyê de ji raya giştî re hat ragihandin. Metna deh madeyî ya Ocalan ku hat xwendin, parkirina hêza siyasî wek “rehenda cihkî ya çareseriyê demokratîk” hat çarçovekirin û Alîkarê Serokwezîr Yalçın Akdogan ku li ser navê hikûmetê daxuyanî da, bêyî behs ji birêvebirinên cihkî yan jî mijara xweseriyê bike, amaje bi pêvajoya demokratîkbûyîne kir ku dê tê de maf û azadiyên bingehîn bèn berfirehkirin (Al Jazeera Türk 2015).

Hikûmeta AK Partiyê di 30 Îlon 2013'an de, li gorî tetbîqê “pakêta demokratîkbûyîne” pêşkêşî raya giştî kir. Di çarçoveya pakêta de mijarên mîna avakirina heyeta têkoşîna li dijî cudahîkeriyê û wekhevîtiyê, hildana nav somdariya Kanûna Cezayî ya Tirkî ya rêzgirtina li terzê jîyanê, li dameziraweyên gelemper hildana qedexeya li ser serpoşê (turbanê), berfirehkirina mafê civîn, xwepêşandan û meşê, hêvişandina daneyên kesîdeyî, ji nîqaşê re vekirina sîstema hîlbijartinê û daxistina baraja hîlbijartinê, di partiyên siyasî de mimkinkirina rewşa hevserokatîyê, ji bo ku partiyên siyasî bikarin alîkariya xezîneyê bistînin daxistina %7 baraja heyî li %3'yan û hêsankirina endambûna li partiyên siyasî cih girtin. Her wiha, di nav çarçoveya naskirina mafên çandî de, li dibistanên taybetî vekirina pêşiya perwerdehiya bi ziman û zaravayên cuda, hildana astenga li pêşiya wergirtina navên berê yên gundan, li dibistanên seretayî bidawîanîna li sepana (tetbîqa) sonda xwendekaran û naskirina mafê kirina propagandaya bi ziman û zaravayên cuda ya partiyên siyasî jî di nav pakêta reformê de hebûn (Türkiye Gazetesi 2013). Dîsan, di meha pêşîn a pêvajoyê de, li 23 Kanûna Paşîn 2013'yan, di çarçoveya mafên çandî de, mafê parastina bi zimanê dayikê yê devkî li dadgehan hat naskirin (Hürriyet 2013). Di çarçoveya Pêvajoya Çareseriyê de, bipêşketina herî giring a hêjayî nîqaşê ya di konteksta nenavendîtiyê de, çêkirina qanûna bi hejmara 6360'î bû ku der barê şaredariyên bajarên mezin de pêk hat. Qanûna mijara dabaşê, piştî kutabûna Pêvajoya Oslayê û hemen berî ku Pêvajoya Çareseriyê ji raya giştî re bê ragihandin, bi awayekî mihtemel li dema ku temasên veşarî didomiyan, di 12 Çiriya Paşîn 2012'an de hat qebûlkirin. Bicihanîn û sepana wê di sala duyem a Pêvajoya Çareseriyê de, bi kirina hîlbijartinên cihkî yên 30 Adar 2014'an re dest pê kir. Vê verastkirina qanûnî ku di sîstema birêvebirina cihkî ya Tirkiyeyê de guherîneke giring çêkir, bi berdewamiya Pêvajoya Çareseriyê re nebû mijara nîqaşêke giring an jî mizakereyê. Bi verastkirina kirî re hejmara bajarên mezin ên li Tirkiyeyê ji şazdehan derxistin siyî. Berfirehkirina sînorên belediyeyan li sînorên bajarên, ku berê bi awayekî

awarte li Stenbol û Qocaeliyê dihat sepandin, hat destpêkirin ku li tevahiya sî bajarî jî bê sepandin. Berê şaredarî bi tenê li qad û warên bajarî berpirs bûn, lê bi qanûna nû re li sî bajarên mezin, hemû gund li taxan dageriyan û hem şaredariya bajarê mezin hem jî şaredariyên bajarokan bi qasî qadên bajarî jî qadên çolterî/gundewar jî hatin berpirskirin. Li sî bajarên mezin, îdareyên taybetî yê bajaran hatin fesxkirin û rayeyên wan ên têkildarî xizmetên şaredariyan li şaredariyên bajarok û bajarên mezin hatin veguhastin. Her wisan, rayeyên mîna bipêşxistina çandinî û ajeldariyê û geşepêdana gundewarî jî li belediyyan hatin veguhastin. Çendî verastkirina qanûnî bi tenê ji heştê û yek bajarî sî bajarî bigire nav xwe jî, li gorî daneyên Dameziraweya Statîstîkê ya Tirkîyeyê, ji sala 2020'î ve ji yekûna nifûsê ya 83,6 milyonî 65,2 milyon, yanî nêzikî %78,36 jê li van bajaran dijiyan.

Bi qanûna nû li sî bajarên mezin, çendî rayeyên şaredariyan û qada wan a rayeyê bi qasî hêjayî balkişanê zêde bûbe jî, lê li her bajarê mezin serî li rêya "navendîkirina cihkî" (Toksöz 2015, 11) hat xistin û pozîsyona şaredariyên bajarokan a li hemberî şaredariya bajarê mezin hat zêdekirin. Her wisan, çendî rayeya şaredariyan û qada wan a rayeyê hat berfirehkirin jî, li gorî vê yekê çavkaniyên wan nehatin zêdekirin û pêgiriya wan a malî ya bi îdareya navendî re jî hat mihafezekirin. Li gorî daneyên Serokatiya Îdareya Dahatê³⁶, yekûna para ku ji dahatên giştî yê budçeyê li şaredarî, şaredariyên bajarên mezin, îdareyên meheli yê ku ji Birêvebirinên Taybetî yê Bajaran pêk tê, tê veguhastin, di navbera salên 1985 û 2001'ê de nêzikî %15-16 bû, di navbera 2002-2008'an de daket %12 û piştî 2008'an jî daket %11.5'an. Bi qanûna xwedî hejmara 6360'an re, ku di sala 2014'an de ket meriyetê, çendî qada rayeyê ya bajarên mezin zêde bû jî, rêjeyên ku ji budçeya giştî û dahata bacê distendin, sabit man.

Qanûna bi hejmara 6360'î, her çî qas rayeyên şaredariyan û qada wan a rayeyê berfireh bike û bi awayekî qismî îdareyên meheli xurt bike jî, lê madeyên wisan li xwe vedihewandin ku hêza birêvebirina navendî ya li cihkî zêde dikir û ji vî aliyê ve dihat mehneya îfadeyên verastkirinên dekonsantrasyonê. Der barê vê yekê de mijara herî giring a ku divê binî bê xêzkirin "Serokatiya Şopana Veberhênanê û Hevahengiyê" ye, ku di binyeya walîtiyan de hatiye damezirandin. Bi vê binyata nû re, hemû xebatên veberhênanê yê cihkî ku ji aliyê îdareya Taybetî ya Bajaran ve dihat meşandin, ku organê biryarê bi hîlbijartinê dihat ser kar, di binyeya walîtiyan de hat navendîkirin ku ew dirêjeyên birêvebirina navendî yê li dernavendê bûn. Yekeya mijara debaşê her wiha bi "... wezaret û saziyên din ên îdareya navendî û sazî û dameziraweyên gelemper ên din ên li bajêr her cure veberhênan, çêkirin,

³⁶ Ev dane ji gihanê re vekirî ne. Bnr.: https://www.gib.gov.tr/sites/default/files/fileadmin/user_upload/VI/GBG/Tablo_10.xls.htm, dema gihanê: 05.12.2020.

sexbêrî, tamîr û alîkariyên ku dê li bajaran bikin û meşandin û şopandina van hemû kar û miemeleyên ku ji bo van pêwîst e” hat rayedarkirin (Îçişleri Bakanlığı 2014). Dîsan, wekî ku Fikret Tokgoz jî bale dikişîne serê, hem finansa geşepêdanê hem jî ji bo serederîkirina bi qeyranên darayî re, ew meyla navendîbûnê, ji nû ve, ku li gelek cihên dinyayê dihat dîtin, li Tirkiyeyê jî çêbû. Di wexta Wezareta Geşepêdanê, Wezareta Jîngeh, Daristan û Bajarsaziyê, Wezareta Malbat û Polîtîkayên Civakî de, ku di sala 2011’an de hatin avakirin, ew verastkirin bû, ku wê kir midaxeleya hikûmeta navendî ya li cihkiyan zêde bibe (Toksöz 2015, 10–11).

Hikûmeta AK Partiyê, meseleya xweseriyê li derveyî Pêvajoya Çareseriyê hişt û parkirina hêza siyasî jî wek xurtkirina birêvebirinên cihkî bi çarçove kir. Tevî vê yekê, bi temamî derî li nîqaşên têkildarî mijarê negirt. Tê dîtin ku AK Partî nemaze di çarçoveya sîstema serokatîyê de, sîstema eyaletan ku berê ji aliyê Kenan Evren û Turgut Ozal ve jî hatibû bilêvkirin, hildide dest. Wek mînak, di mehên pêşî yê Pêvajoya Çareseriyê de, Serokwezîr Erdogan ku di 29 Adar 2013’an de beşdarî weşana hevpar a Kanal D û CNN Turk’ê bû, derbirî ku di nav Dewleta Osmanî de eyaletên Kurdistan û Lazistanê hebûne, divê kes ji vê netirse û îroj li gelek welatên bipêşketî sîstema eyaletan geşbûna aborî dilezîne û demokrasiye jî xurt û hêzdar dike (Son Dakika 2013).

CHP: Ji aştîya civakî re belê, ji Pêvajoya Çareseriyê re na

CHP’yê Pêvajoya Çareseriyê destek nekir. Di gel vê yekê, li daxwazên “aştîya civakî” yê ji bo çareserkirina kêşeya kurdî xwedî derket. Pêvajoya Çareseriyê ya ku di navbera hikûmeta AK Partiyê û Ocalan de bi rê ve diçû, wek “pêvajoyeke bazarkirinê” ya ku ji kontrola beşdariya civakî re girtî ye, nirxand. Wek mekanîzmaya çareseriyê ya alternatîf, îşaret bi Meclisê kir û pêşniyaz kir ku bila di binyeya Meclisê de “Komîsyona Mitebeqata Civakî” bê çêkirin û hemû partî jî beşdarî lê bikin. Her wisan, parastina wê yekê kir ku divê koma “Mirovên Aqilmend a girêdayî Komîsyona Mitebeqata Civakî bê avakirin û ev grûp bi awayê ku ji pêşniyaza AK Partiyê cuda be, bila ji sazî û dameziraweyên gelemper, sektora taybetî, civaka sivil ên li derveyî meclisê û ji gel nêrîn û ramanan wergirin û wan bînin veguhêzin meclisê (T24 2013).

Helwesta CHP’yê ya der heqê Pêvajoya Çareseriyê de, ji hêla Serokê Giştî yê CHP’yê ve di civîna çapemeniyê de hat parevekirin ku civîn li Stenbolê hatibû lidarxistin û gerînendeyên giştî yê rojnameyan beşdar bûbûn. Di vê civînê de hem nêrînên partiyê yê li ser Pêvajoya Çareseriyê hem jî yê der barê çareserîya meseleya kurdî de ji raya giştî re hatin ragihandin. Li gorî Kiliçdaroglu;

“CHP alîgirê lêgeriyan'a çareseriyê, yê aştiya civakî û piştgiriye ye. Dixwaze ku hemû welatîyên me di nav hizûr, ewlehî, yekîtî û piştgiriye de bi awayekî wekhev bijîn. Lê der barê 'pêvajoya bazarkirinan' de, ku ew ji hêla AK Partiyê ve tê meşandin û naveroka wê nayê aşkerakirin, endîşeyên me yên cidî hene ku gelê me ji wan endîşeyan pareve dike. CHP aştiyeke civakî ya mayînde dixwaze. Lê AKP dixwaze ku hesasiyetên welatîyên me yên kurd ji bo mexsedên xwe yên siyasî bike alet. CHP li dû lêgeriyaneke çareseriyê demokratîk, civakî û dewambar e ku bikare tevahiya welatê me ya cografîk û neteweyî û ewlehiya wê bihêvişîne. Lê AKP li dû lêgeriyaneke maceraperst û ketina bin teahudên wisan e ku dê tevahiya welêt û ewlehiya wê bixe talûkeyê. Li gorî CHP'yê adresa çareseriyê Meclisa Mezin a Neteweya Tirkîyeyê (TBMM) ye. Li gorî AKP'yê jî adresa çareseriyê Ocalan e. CHP li gorî xwasteka gel, dixwaze bi lihevkerinê bike. Lê AKP di nav hewldana lêferzkirinê de dibêje **'ez ê bikim, ez ê wê jî bi merîfeta mirovên aqilmend bi xelkê bidim qebûl kirin'** û di nav hewldana lêferzkirinê de ye” (*cextkirindi metnê original de hene*) (T24 2013).

Di heman civînê de, li gorî Kiliçdaroglu, ku derpêş kir der heqê çareseriyê kêşeya kurdî de nexşerêyeke AK Partiyê tune ye û Pêvajoya Çareseriyê jî ji bo hîlbijartina dike amraz, mafên kolektîf ên ku Ocalan anîne ser zimên jî “nîşaneke pêşî ya veqetîna ji hev a civakî ye” û “...maf û azadiyên ferdî xercên demokrasîyê, wekheviyê û binyata dewleta unîter in.” Li gorî CHP'yê, “kêşeya kurdî meseleyeke wisan e ku ji demokrasîya kêr, ji bînpêkirina mafan û newekheviyan diqewime. Wezîfeya berênî ew e ku divê ev zemîn ji holê bê rakirin û bi mafê ferdî û yeksaniyê pêşîya azadiyan bê vekirin û hizûr, refah û şadiya welatîyên me bê temînkirin” (T24 2013).

Di Pêvajoya Çareseriyê de, pêşniyaza herî giring a ku li ser parkirina hêza siyasî ji CHP'yê hat, hildana şerhên li ser Şertê Xweseriyê yên Birêvebirinên Cihkî yê Ewrûpayê bû ku hatibûn danîn û wê jî pêşîya verastkirinê têkildarî nenavendîtîyê vedikir. Di dewra Pêvajoya Osloyê de, Serokê Giştî yê CHP'yê Kemal Kiliçdaroglu li mîtînga Colemêrgê ku di çarçoveya hîlbijartinê 11 Hezîran 2011'an de li dar xistibû, derbirî ku dê rezervên li ser Şert hilînin û dîsan di 5'ê Îlona 2014'an de, di kongreya CHP'yê de ev rabêjiya xwe dubare kir (Anadolu Ajansı 2014).

Bandora rabêjiya MHP'yê ya li ser derdora çep û sosyalîstan

MHP'yê wekî Pêvajoya Osloyê di pêvajoya Çareseriyê de jî rabêjiya xwe ya “Sevreke nû” domand. Serokê Giştî yê MHP'yê Devlet Bahçelî, di Sibata 2013'an de, derpêş kir ku AK Partiyê di gerewa destekkirina derbasbûyîna li sîstema serokatîyê de daxwaza xweseriyê qebûl kiriye (Cumhuriyet 2013). Bahçelî îdîa kir ku AK Partiyê

“projeya dabeşbûnê” dewr girtiye, dê efûya siyasî derxe û rêya xweseriyê veke (Sözcü 2014). Li gorî MHP’yê “rehendên cihkî û neteweyî yên çareseriyê demokratîk” ku li Dolmabaxçeyê hatine bilêvkirin, projeyê ji bo avakirina xweseriyê ye û dewleta neteweyî tê armanckirin (Cumhuriyet 2015).

Rabêjiya “Serokatîyê bide, xweseriyê bistîne” ku Bahçelî anî ser zimên, piştî bi awayê ku bandorê li ser derdora çep û sosyalîstên li Tirkîyeyê jî bike, deng veda. Bi taybetî di hevdîtînen Ocalan û Heyeta Îmraliyê de, rabêjiyên destekker ên Ocalan ên li ser sîstema serokatîyê ya bi terzê DYA’yê³⁷ ev helwest xurt kir. Di gel vê, îcar daxuyaniyên Hevserokê Giştî yê HDP’yê Selahattîn Demîrtaş ên wekî HDP sîstema serokatîyê destek nake û der barê vê yekê de bazarê nakin (Evrensel 2014b) û dîsan gotina ku di 17 Adar 2015’an de, di axaftina civîna grûpa xwe ya meclîsê de, ku deng li Erdogan kir û got “Em ê te nekin serok” û ev rabêjî yek ji kêliyên krîtîk ên piştî kutabûna Pêvajoya Çareseriyê tê hesabandin, ji aliyê gelek kesan ve bi “tesîra çepê tirkan a li ser HDP’yê” hatin girêdan (Karaca 2015). Ev ranêzikî, îroj jî ji ber têkiliya ku HDP’yê bi siyaseta çep re daniye û di rexneyên li ser siyaseta “Tirkîyeyîbûnê” de, derdikevin pêş (A. F. Işık 2020).

Şikestina duyem a jeopolîtîk: Li Rojava damezirîna “Xweseriyê Demokratîk”

Di somdariya Pêvajoya Çareseriyê de, meseleyê din a giring ku divê li ser mijara parkirina hêza siyasî bê sekinandin, şerê navxweyî yê Sûriyeyê ye ku di Adara 2011’an de dest pê kir û di meha Tîrmeha 2012’an de jî li Rojava wek *de facto* xweseriyê demokratîk hatibû damezirandin. Lê belê gava Pêvajoya Çareseriyê bi şertê ku “xweseriyê demokratîk li der bê hiştin” hatibû destpêkirin û der barê mijara parkirina hêza siyasî de jî bi awayekî zêde li ser “demokrasiya cihkî” hatibû lihevkerin, li Rojava xweseriyê demokratîk bi awayê *de facto* hat damezirandin.

Gava şerê navxweyî yê Sûriyeyê didomiya, baskên çekdar ên Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Yekîneyên Parastina Gel (YPG) û Yekîneyên Parastina Jinan (YPJ), di 19 Tîrmeh 2012’an de li bajarên Kobanî, Efrîn û Dêrikê îdare bi dest xistin. Bajarên din li van bajarên taqîb kir û Rojava ku ji sê kantonên xwedî navendên Kobanî, Cizîr û Efrînê bû, bi awayê *de facto* hat avakirin. Di navbera 21 û 29’ê Kanûna Paşîn a 2014’an de, bi dorê li kantonên Cizîr, Kobanî û Efrînê “xweseriyê demokratîk” hat îlankirin (Evrensel 2014a). Rêxistina Dewleta Îslamê ya Iraq û Şamê (DAÎŞ) di mehên payîza 2014’an de êrîş bir ser Kobaniyê, lê di dewra qewitandina hêzên wê de ya bi desteka

³⁷ Ocalan fikir û nêrînen xwe yên li ser mijara sîstema serokatîyê, di hevdîtînen xwe yên 23 Sibata 2013, 11 Kanûna Paşîn 2014 û 26 Nîsan 2014’an de, ku bi Heyeta Îmraliyê re kirin, anîn ser zimên. Bnr.: (Öcalan 2015, 27, 219, 284)

Hêzên Koalîsyona Navneteweyî ya di bin pêşewatiya Amerîkayê de, xuyabariya Rojava ya li qada navneteweyî û desteka lê, bi qasî ku bi raboriyê neyê qiyaskirin, zêde bû. Ew herêmên xweser ên *de facto*, ku dabaşa mijarê ne, di 17 Adar 2016'an de, bi navê "Federasyona Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê" bi yek bûn (BBC News Tûrkçe 2016).

Rojava, ku yek ji dînamîkên sereke ye û bûye sedem Pêvajoya Çareseriyê dest pê bike, di heman demê de bû yek ji wan sedemên herî giring ên bidawîbûna sernekeftî ya Pêvajoya Çareseriyê jî (Çiçek 2018, 181–208; 268–76; Çiçek & Coşkun 2016). Ocalan di nameya xwe de ku ew di pîrozbahiyên Newroza Amedê de ji raya giştî re hat ragihandin, kêşeya kurdî di konteksteke dersînori de hilda dest. Got ku "Ji pêvajoya berxwedana çekdar derî li pêvajoya siyaseta demokratîk ve dibe" û kurd û tirk wek "du hêzên stratejîk ên bingehîn ên Rojhilat Navîn" nîrxandin û ji bo avakirina "modernîteyêke modern û pergala demokratîk" a li Rojhilata Navîn û Asyaya Pêşîn, ew vexwendin da ku pêşengiyê bikin (Euronews Tûrkçe 2013). Ocalan, paşê di 21 Tîrmeh 2013'an de, di hevdîtina xwe de ku bi Heyeta Îmraliyê re kir, got ku "Çareseriyê li Tirkîyeyê ya li Sûriyeyê, çareseriyê li Sûriyeyê jî ya li Tirkîyeyê ye" (Öcalan 2015, 111) û bal kişand ser giringiya meseleya Rojava. Jixwe di çarçoveya Pêvajoya Çareseriyê de, di navbera hikûmeta AK Partiyê û PYD'yê de temas hat çekirin û Hevserokê PYD'yê Salih Muslim bi berdevamiya pêvajoyê çend caran çû Enqereyê û bi rayedarên Wezareta Karên Derveyî re hevdîtin pêk anîn. Muslim ku cara pêşî di Tîrmeha 2013'an de çû Tirkîyeyê, ziyareta wî ya dawî nêzikî heftiyek berî civîna Dolmabaxçeyê, di 22 Sibata 2015'an de çêbû (Zaman 2013; Tanış 2016).

Ocalan diyar kir ku wê israra li ser daxwaza xweseriyê pêşiya Pêvajoya Çareseriyê bixitimîne, loma jî pêşniyaz kir ku bila kurd li Sûriyeyê wekî li Swîsreyê kantonan ava bikin û "herêmên xweser ên demokratîk" çêkin (Öcalan 2015, 120, 179). Li hemberî helwesta neyînî ya hikûmeta AK Partiyê ya der barê Rojava de got ku "Li nav dewleta navendî ya Sûriyeyê em dê kurdan tu car nehelînin. Ev jî xeta me ya sor e", binê giringiya ku dida meseleya Rojava xêz kir. Jixwe ji bo çareserkirina meseleya kurdî ya li Tirkîyeyê, ew modela "xweseriyê demokratîk" a ku di navbera salên 2005-2007'an de geşe pê dabû, piştî 2012'an li herêma kurdan a li Sûriyeyê berceste bû (Duman 2016; Taştekin 2016).

KCK rasterast tevî avabûna Rojava bû. PYD û YPG ku pêşewatî li avakirina xweseriyê demokratîk a li Rojava dikir, Ocalan wek rêber dibîne; her wisan wek îdeolojîk û polîtîk jî nîrxên normatîf ên KCK'yê parî dikin. Dîsan, gelek endamên KCK'yê hem yê sûriyeyî hem jî yê tirkîyeyî îroj, qedemeyên birêvebirinê jî tê de, di nav PYD û YPG'yê de cih digirin (International Crisis Group 2016; Duman 2016, 80–81). Jê wêdetir, KCK'yê û baskê wê ye çekdar, bi awayekî fêlî li Rojava cih stand. Li gorî Fermandarê

Giştî yê Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) Mazlûm Kobanî, wekî gelek hêzên kurdî bi hezaran kurdên ku PKK'yê ew perwerde kiribûn li ser bangewaziya wan hatin Rojava û şer kirin. Ji van bi sedan jiyana xwe ji dest da, hinek ji wan veqetiyên, hinek man, gelek jê jî beşdarî jiyana sivil bûn.

DBP-HDP hem di asta fikirî hem jî di asta mobilîzasyonê de, li Rojava xweseriya demokratîk parast. Gava ku Kobanî di bin êrişê DAÎŞê de bû, HDP hem ji raya giştî ya li Tirkîyeyê hem jî ji raya giştî ya navneteweyî re daxuyanî da û rexne li Tirkîyeyê girt ku ew ji bo "berastengkirina çêbûna herêmeke kurdî ya xweser" politikayê dimeşîne û bang kir ku divê xwedî li xweseriya demokratîk a li Rojava bê derketin. Li gorî HDP'yê, "Divê li Rojava, sîstema xweser a demokratîk ku ji bo dahatûya demokratîk a hemû Rojhilata Navîn temînat e, bê destekkirin. Îroj êdî kurd bi hemû hêzên xwe ve li ser sehneya dîrokê ne û her politikaya ku kurdan li derve dihêle, ji niha ve derbasdariya xwe winda kiriye" (Halkların Demokratik Partisi 2014b).

DBP-HDP'yê, ji bo Rojava, girseya xwe ya li Tirkîyeyê tim mobilîze kir. Di bûyerên 6-8ê Çiriya Pêşîn de, ku piştî êrişê DAÎŞ'ê ya li ser Kobaniyê qewimîn, ev mobilîzasyon hema bibêje li hemû bajarên kurdan belave bû. Di van bûyerên hanê de, ku piştî bangkirina Ocalan bi dawî hatin, li gelek bajaran kuçe û kolan ji hêla protestokeran ve hatin îşxalkirin û hikûmetê kontrola xwe ji dest da. Li çapana herêmê, nimûneyeke hîn serttir a ji protestoyên Geziyê rûda û di encama bûyeran de çil û şeş kesan jiyana xwe ji dest da (Însan Hakları Derneği 2014). Jixwe ev kiryarên ku wek bûyerên Kobaniyê jî tên zanîn, bû sedema yek ji nuqtayên şikestinên sereke ya bidawîhatina Pêvajoya Çareseriyê ya sernekeftî.

Rojava, desteka piraniya partiyên kurdî yê li derî DBP-HDP'yê stand. Piraniya partiyên kurdî yê li Tirkîyeyê, rexne li PYD'yê girt û argumanên wekî ku siyaseta wê ya navxweyî ya li Rojava tekparêz e, têra xwe ne giştgir e, partiyên kurdî yê din ên li Sûriyeyê veder kirine, tehdeyê li wan dike û ne federasyonê lê xweseriyê diparêze derpêş kirin. Tevî van rexneyan jî wan destek kir ku divê kurdên Sûriyeyê li ser axa xwe birêvebirinên xwe çêkin. Rojava, di gel helwestên cuda yê partiyên kurdî, di dema Pêvajoya Çareseriyê de bû parçeyekî teşebusên "yekîtiya neteweyî ya kurdî." Wek nimûne, di "Konferansa Yekîti û Çareseriyê ya Bakurê Kurdistanê" de, ku li ser banga Ocalan di 2013'an de civiya, xwedî li Rojava hat derketin û bangewaziya yekîtiya neteweyî û îtifaqê hat kirin: "Konferansa me diyar dike ku ew bi şoreşa gelî re ye ku li parçeyê Rojava (Sûriyeyê) bi hêza xwe û bi siyaseta xwe ya resen pêk hatiye. Di şexsê Konseya Bilind a Kurdî de, girîngî pê dide ku yekîti û îtifaqa xwe bi rêjeyeke mezin dabîn bike (Star 2013).

Eger bi kurtasî were gotin, avabûna xweserîya demokratîk a li Rojava, di hev kêşeya jeopolîtîk a kêşeya kurdî de bû sedema şikestina duyem. Di 2003'yan de avabûna HKI'yê û bi awayekî dîmaneyî gihîştina wê ya îstîqrarê, jeopolîtîk ket rewşa dînamîka sereke ku meseleya kurdî çarçove dike. Rojava, piştî avabûna HKI'yê tesîra pêla duyem çêkir. Di gel vê, bandora Rojava ya li ser kêşeya kurdî ya li Tirkîyeyê, ji ber çend sedeman li gorî HKI'yê hîn xurttir bû. Berî her tiştî, divê bal li nêzîkiya îdeolojîk, polîtîk û rêxistinî yên di navbera siyasîyên kurdî yên sereke yên li Tirkîyeyê û Sûriyeyê bê kişandin. Di dema avakirina HKI'yê de, siyaseta kurdî ya sereke ya li Tirkîyeyê ku hema bibêje neketibû nav hewldaneke hêjayî dîqetê, ji bo Rojava hemû îmkânên xwe seferber kirin. A duyem, ji HKI'yê bi awayekî cuda, kurdên Rojava wekî piraniya kurdên li Tirkîyeyê bi heman zaravayê kurdî *kurmançî* dipeyivin. A sêyem, hewce pê heye ku binê cografyayê bê xêzkirin. Dirêjahiya sînorê ku di navbera beşa cografyaya Kurdistanê ya li Tirkîyeyê û ya li Iraqê dimîne 384 km, lê ev dirêjahî li beşa ku li Sûriyeyê dimîne 911 km ye. Her wiha, xeta sînor a yekem ku bi awayekî pir zêde çiyayîn e, xeta duyem a sînor deşt e. Wek pêwendîya bi ziman û cografyayê re, ya çarem têkiliyên aborî, civakî û çandî yên di navbera kurdên Tirkîyeyê û yên Sûriyeyê de, bi qiyasa li gorî yên Iraqê di sedsala dawî de hîn bêhtir xurt bûn. Herî dawî, tesîra ku Rojava di qada navneteweyî de çêkir, ji ya HKI'yê zêdetir çêbû. Nemaze, piştî êrîşa DAÎŞ'ê ya li ser Kobaniyê, bi taybetî der barê rewş û têkoşîna kurdên Sûriyeyê de, lê tevî vê bi giştî der heqê rewş û têkoşîna hemû kurdan de, zanînbarî, eleqe, sempatî û desteka li qada navneteweyî, bi qiyasa li gorî demên borî gelek zêde bû. Kêşeya kurdî ku piştî avabûna HKI'yê jî bi rêjeyeke mezin wek kêşeyeke navxweyî ya Tirkîyeyê dihat dîtin, îroj ket rewşeke wisan ku ji sînoran derbas bûye û hêzên emperyal ên mîna DYA û Rûsya bi xwe jî daxilê wê bûne.

Bandora Rojava bi tenê li ser kurdan û tevgerên siyasî yên kurdan çênebû; bi qasî dewleta tirkî û hikûmeta AK Partiyê, ji kûrahî ve tesîr li partiyên mixalefetê jî kir. Li Tirkîyeyê hem burokrasiya sivîl û leşkerî hem jî partiyên sereke, li Sûriyeyê çêbûna herêmeke xweser an jî federal wek kêşeyeka beqayê dît û wan polîtîkayên xwe li ser astengkirina çêbûna herêmeke wisan ava kirin. Dewleta tirkî û hikûmeta AK Partiyê çendî îdîa bikin ku ew ne li dijî destkeftiyên kurdan ên li Sûriyeyê ne û mesele pirsgirêka "korîdoreke terorê" ye jî, lê daxuyaniyên ku tên dayîn derxist holê ku endîşeya bîngêhîn wekî ya ji bo HKI'yê, li Sûriyeyê jî "çêbûna îdareyê kurdî" ye.

Hemen piştî destpêkirina Pêvajoya Çareseriyê, hikûmeta AK Partiyê derbirî ku ew ê bikarin bi PYD'yê re têkilî daynin. Lê belê, ji bo vê jî sê şertên ku hatibûn derpêşkirin yek jê "li herême çênêkirina rewşa fiêlî" bû. Wezîrê Karên Derve yê wê demê Ahmet Davutoglu, di daxuyaniya xwe ya 10 Nîsan 2013'an de ev şert wiha bi rêz kirin: "1- Dê li cem rejîmê cih negire, 2- heta çêbûna parlamentoya ku dê gelê Sûriyeyê bi hîlbijartinê

wê bîne ser kar, dê emire waqîî neke (ango dê bi afirandina rewşa fiêlî ji xwe re hêremekê çêneke û ranegihîne), 3- dê li Tirkîyeyê destek nede terorê” (Yeni Şafak 2013). Li hêla din serokwezîrê wê dewrê Erdogan , pozîsyona Tirkîyeyê bi gotinên hîn aşkeratir bi lêv kir. Di 15 Hezîran 2015’an de, ku Pêvajoya Çareseriyê hema bibêje ber bi dawîhatinê ve diçû lê hîn bi aşkerahî behsa jê nedihat kirin, bajarokê Girê Spî (Tel Ebyad) ket bin kontrola YPG-YPJ’yê, wek cografîk jî Kobanî û Cizîr bûn yek û xurtbûna îhtimala yekbûna bi herêma Efrînê re çêbû, Erdogan ev daxuyanî da: “Li vir ez deng li hemû milletê xwe dikim, deng li hemû dinyayê dikim. Em ê tu car destûr nedin ku li bakurê Sûriyeyê, li başûrê me dewletek were çêkirin. Ez dixwazim ku ev yek bê zanîn. Berdêla wê çi dibe bila bibe em ê têkoşîna xwe bidomînin” (Gazete Vatan 2015). Erdogan piştî ku Pêvajoya Çareseriyê qediya, di 7 Sibata 2016’an de, di bersiva xwe de ya li ser pîrsa rojnamegeran, gawekî din jî bi pêş de çû û got ku Tirkîye “xetaya li Iraqê kiriye” dê li Sûriyeyê neke û bi awayekî aşkeratir daxuyand ku endîşeya hîmî ya Tirkîyeyê ji pêşewatiya PYD’yê bêhtir hebûna herêmeke kurdî ya xweser an jî federe ye: “Min nedixwast li Sûriyeyê bikevim wê xetaya ku li Iraqê ketibûnê. Ez bi tezkereya 1’ê Adarê re bûm. Ew ên li dij bûn, ev negotin. Hinekan jî kulîsên veşarî kirin. Eger bi tezkereya 1’ê Adarê Tirkîye li Iraqê bûya, rewşa Iraqê dê ne wiha bûya” (Karar 2016).³⁸

Ev helwesta polîtîk a Tirkîyeyê vebehiya sehayê jî. Hikûmeta AK Partiyê li temamiya sînorê Suriyeyê yê xwedî 911 kîlometreyî ku şeş bajaran digire nava xwe, di Nîsana 2014’an de dest bi lêkirina dîwarên bi bilindiya çar metreyî kirin ku hîn Pêvajoya Çareseriyê didomiya. Dîsan, Tirkîyeyê veto danî ser beşdarbûna birêvebirina Rojava da ku ew nekeve civînên hevdiîtinên Cenevreyê ku Neteweyên Yekbûyî pêşewatî lê dikir û ya Astanayê ku Rûsya, Îran û Tirkîye pêşîkêşîya wê dikir. Piştî bidawîbûna Pêvajoya Çareseriyê, artêşa Tirkîyeyê tevî Artêşa Sûriyeya Azad (ASA) ket erdên Sûriyeyê û li van deran birêvebirinên fiêlî çêkirin.

MHP’yê jî destek da polîtîkayên hikûmeta AK Partiyê yên li ser Rojava. Bi taybetî piştî 15 Tîrmeh 2016’an bi şûn de, bi îtîfaqa ku bi AK Partiyê re çêkir, bi awayekî temamî bû şîrikê çêkirina van polîtîkayan. Ji aliyê din ve, CHP’yê li gorî sala pêşî ya Pêvajoya Çareseriyê, der barê Rojava de mixalefeteke sert nemeşand. Mesela, li ser êrişa DAÎŞ’ê ya Kobaniyê, pêşniyaz kir ku divê Tirkîye leşker bişîne Kobaniyê ku eqrebayên welatîyên Tirkîyeyê lê dijîn û wek partî- çendî hinek parlamenterên CHP’yê raya belê da jî- destek neda tezkereya hikûmeta AK Partiyê ku di 2. Çiriya Pêşîn de pêşkêşî meclîse kiribû da ku leşker bişînin Sûriye û Iraqê. Li gorî CHP’yê, mebesta tezkereyê ne DAÎŞ lê rejîma Esad bû (BBC News Tûrkçe 2014). Rexneya bingeîn a CHP’yê ya li

³⁸ Tezkereya bi sernavê “Li gorî xala 29’an a Makeqanûnê, dayîna rayê ya ji bo şandina Hêzên Çekdar ên Tirkî li welatên biyanî û li Tirkîyeyê hebûna hêzên çekdar ên biyanî” ku di 1 Adar 2003’yan de li Meclîsa Mezin a Neteweya Tirkîyeyê hatibû redkirin, ji bo 5 mehan mayîna 62. 000 personelên leşkerî yên biyanî verast dikir.

politikaya AK Partiyê ya der barê Sûriyeyê de, li ser wê mijarê bû ku digot AK Partî li herêmê siyaseteke dînî û mezhebî dimeşîne. CHP tim bang li AK Partiyê kir ku divê bi Esad re têkiliyan normalîze bike (Milliyet 2013).

Ev helwesta mixalefeta nerm a CHP'yê, paşê li destekkirina hikûmeta AK Partiyê dageriya. Di nîqaşên li ser tezkereyê ya 2015'an de, CHP'yê derpêş kir ku AK Partiyê di parçebûn û dabeşbûna Iraq û Sûriyeyê de roleke mezin leyîstiya. Ji ya berê bi awayekî cuda, tezkereya nû, ji ber argûmanên ku ne bi tenê PKK'yê DAÎŞ'ê jî ji xwe re dike armanc û ji bo ku wekî li Pirsûsê (Sirûcê) êrişên DAÎŞ'ê tekrar nebin, destek kir (Hürriyet 2015b). Dîsan li ser vê tezkereyê, tam destek da ku Tirkiye di Tebaxa 2016'an de bikeve herêma Cerablûsa Sûriyeyê û birêvebirina fiêlî pêk bîne. Li gorî Alîkarê Serokê Giştî yê Berpîrsê Têkiliyên Derve yê CHP'yê Ozturk Yılmaz, ketina Tirkiyeyê ya Cerablûsê û li wir bi awayekî fiêlî çêkirina birêvebirinê, nekir ku tenê DAÎŞ jî sînoran dûr bimîne, di heman demê de asteng kir ku herêmên Cizîr û Kobaniyê jî bi Herêma Efrînê re nebin yek (Milliyet 2016). Kiliçdaroglu jî der barê heman mijarê de daxuyanî da û derpêş kir ku hikûmet dereng maye "li Sûriyeyê operasyon bike." Bi awayekî puxteyî, bi îfadeya Sînan Bîrdal CHP "Ji mixalefeta şermoke ya midaxeleya Sûriyê ber bi desteka şermoke, ji wir jî ber bi pozîsyona teza operasyona leşkerî ve çû ku ka gelo dibe ew bi awayekî serkeftî pêk were." (Bîrdal 2016).

Di vê beşê de, ew tiştên ku di wexta Pêvajoya Çareseriyê de qewimîne, ji aliyê teşebusên aştiyê ve di çarçoveya nenavendîtiyê de li ser hatin sekinandin. Wek encam, hewce ye ku bal li ser çend mijaran bê kişandin. A pêşîn, der barê mijara nenavendîtiyê û parkirina hêza siyasî de hat dîtin ku di xeta Ocalan, PKK/KCK û DBP-HDP'yê de daxwazên wan ên guherbar hene.

A duyem, partî û grûpên kurdî yên li derveyî siyaseta kurdî ya sereke, wan bi piranî federasyon parast. Van grûpan ku destek nedida teza "komara demokratîk", modela xweseriya demokratîk destek kir ku li gorî wan ew wek çareseriyê navberê dikare "çareseriya nîhayî" ya kêşeya kurdî hêsan bike.

A sêyem, AK Partiyê ji sala 2002'yan bi vir de bi awayekî dîmaneyî siyaseteke seqamgir û hevgerî meşand û destek neda daxwazên li ser xweseriyê ku dibe bihata mehneya nenavendîtiya siyasî. Berevajiyê vê yekê, di çarçoveya berfirehkirina rayeyê de, cihkîbûyîn û xurtkirina birêvebirinên cihkî parastin.

A çarem, CHP û grûpên ku wê ew temsîl dikirin, heta Pêvajoya Çareseriyê 2013-2015'an der barê kêşeya kurdî û nenavendîtiyê de, bi awayekî gelek zêde bi roleke neyînî rabû. CHP ku ji aliyekî ve li dijî van pêvajoyên diyalog û mizakereyan derdiket, ji

aliyê din ve li hemberî wan hemû teşebusan rawestiya ku dibû wan teşebusan derî li nenavendîtiyê vekira. Di salên dawî de ew rabêjiya wê ya der heqê hildana şerha li ser Şertê Xweseriya Birêvebirinên Cihkî yê Ewrûpayê de, wek bipêşketineke tek a der barê vê mijarê de dikare were qeydkirin.

A pençem, bi awayekî giştî MHP li dijî hemû teşebusên ji bo çareserkirina kêşeya kurdî rabû. Gavên sînordar ên reformê jî wek teşebusên “Sevra nû” nixandî.

A dawî, divê binê jeopolîtîkê bê xêzkirin. Jeopolîtîk bi salên 2000’î re bû dînamîka sereke ya diyarker ku kêşeya kurdî “çarçove dike.”

Jeopolîtîka kêşeya kurdî, nemaze jî rewşa Rojava, piştî Pêvajoya Çareseriyê hîn bêhtir tesîrdar bû. Dewra piştî sala 2015’an ku meseleya Rojava bû dînamîka sereke ya diyarker, di beşa piştî vê de tê nixandî û li serê tê sekinandin.

3.

JÎ PÊVAJOYA

ÇARESERIYÊ HETA

ÎROJ:

RESANTRALÎZASYON

Û

DEKONSANTRASYON

Ji Pêvajoya Çareseriyê Heta Îroj: Resantralîzasyon û Dekonsantrasyon

Piştî ku Pêvajoya Çareseriyê li dawiya hîlbijartinên 7 Hezîran 2015'an qediya bi şûn de, lihevxiştina bi tundiyêke mezin dest pê kir. Ji raboriyê bi awayekî cihê, lihevxiştin bi piranî li qadên bajarî çêbûn. Wekî li kutabûna Pêvajoya Osloyê, bi awayekî fiêlî xweserî hat îlankirin. Yekîneyên çekdar di bin navê “xweparêzî”yê de, beşdarî li wan îlanên bi navê “xwebirêvebirin”ê bûn. Bersiva dewletê ya li pêkanîna yekîneyên çekdar ên li navendên bajaran û îlankirina xweseriyê ya bi awayekî fiêlî, gelek sert bû. Piştî lihevxiştinên li bajaran, mekanê lihevxiştina kurdî guherî û bi şêweyêke bîngêhîn ber bi Rojava ve çû. Hemen piştî kutabûna lihevxiştin, bûyereke duyem qewimî ku li Tirkîyeyê tesîra zelzeleya siyasî çêkir. Di pey teşebusa derbeya leşkerî ya 15 Tîrmeh 2016'an de, Rewşa Neasayî hat ragihandin û di vê maweya hanê de ku nêzikî du salana domiya, binê civariya demokratîk a sînordar a Tirkîyeyê, hat xepirandin û kolan.

Di vê beşê de, dewra piştî Pêvajoya Çareseriyê ya 2013-2015'an ku sernekeftî bi dawî bû, li ser qewimîna “ketina bi paş ve” ya li ser mijara nenavendîtî û parkirina hêza siyasî, tê rawestandî. Bi têkçûna pêvajoyê re li cihkiyan îlankirina xweseriyên demokratîk, reaksiyonên ku dewletê û hikûmeta AK Partiyê dane vê yekê, qeyûmên ku li şaredariyan hatine tayînkirin, referandûma serxwebûnê ya li HKI'yê, midaxeleyên leşkerî yên ku Tirkîyeyê li Rojava kirine û îdareyên ku wê bi awayekî fiêlî li wir çêkirine, sernavên nîqaşê yên vê beşê pêk tînin.

Îlanên Xwebirêvebirinê û Lihevxiştinên li Bajaran

Gava ku ji aliyê nenavendîtîyê ve pêvajo bê nîrxandin, mijara ku pêşî bal lê bê kişandin ev e: Bi dawîhatina Pêvajoya Çareseriyê re, wekî ku di dawiya Pêvajoya Osloyê de jî bû, “xweserîya demokratîk” hat îlankirin. Tevî vê, wekî ji Pêvajoya Osloyê cuda, xweserîya demokratîk ne ji aliyê KCD'yê û bi awayê herêmî, lê li bajar û bajarokan ji hev cihê, ji hêla meclisên gel ên cihkî ve hat ragihandin ku ew meclis bi awayekî *de facto* hatibûn çêkirin. Ji awayê Katalonyayê cuda, ne li şûna meclisên belediyyan ku hatine hîlbijartin û xwedî meşrûiyeta demokratîk in, lê “meclisên gel ên cihkî” yên ku ne xwedî wesfê temsîlê ne û bi hejmareke sînorkirî kes di wan de cih digirin, derketin pêş. Di vê pêvajoyê de, di serî de şaredariyên bajarên mezin ên mîna Amed, Mêrdîn û Wanê divê bi bîr bê xistin ku li yazdeh bajarokan, belediyyên bajar û bajarokan di bin îdareya DBP-HDP'yê de bûn. Li Katalonyayê rêbaza referandûmê hatibû tercîhkirin ku îradeya gel û tercîha gel xuyabar dikirin û ji beşdariya

hemû civakê re vekirî bû, lê îlankirinên xwebirêvebirinê bi rêbaza “daxuyaniyên çapemeniyê” hatin kirin, ku ew di asta bajarok de bi beşdariya hejmareke sînorkirî bûn.

Di îlankirina xweseriya demokratîk de, mijareke din a giring ku bal dikişand ser xwe ev bû: Yekîneyên çekdar ên ku di bin pêşewatiya milîtan û milîsên KCK’yê de hatibûn çêkirin, li gelek cihan bi navê “xweparêzî”yê di wexta “îlankirinên xwebirêvebirinê” de hebûn. Li Katalonyayê hem di wexta organîzasyonê referandûma serxwebûnê de hem jî di wexta wan bûyeran de ku piştî wê qewimîn, bêşidetî yek ji taybetmendiyên herî giring bû. Di gel ku piraniya siyasetmedarên pêşengî li referandûmê kiribûn hatin girtin û şideta polîsan jî katalanan bi şeweyeke guncanî dîroka xwe, têkoşîneke bêyî ku serî li tundûtûjîyê bidin tercîh kir. Lê li Tirkiyeyê li hemû bajarokên ku xweserî li wan hatibû ragihandin, lihevexistin û pevçûn çêbûn. Li hin deveran jî bi mehan dewam kir.

Dewleta Spanyayê û hikûmeta wê ya navendî, bi rêya daraz û rêbazên polîsî bersiv da referandûma serxwebûnê ya Katalonyayê, lê belê dewleta tirkî ya di bin rêberiya hikûmeta AK Partiyê de, bi operasyonên leşkerî û polîsî bersiv da çêkirina yekîneyên çekdar ên li navendên bajaran û îlankirinên xweseriyê yên fiilî. Lihevexistin û ragihandina xweseriyê yên ku di Tebaxa 2015’an de li Gimgima (Vartoya) Mûşê dest pê kir, li bajarên Amed (bajarokên Sûr û Farqînê), Mêrdîn (Nisêbîn, Kerboran û Dêrik), Şirnex (Şirnex navend û bajarokên Cizîr, Silopya û Hezexê) û Colemêrgê (bajarokê Geverê) belav bûn. Li gorî reqemên fermî, di navbera demên 24 Tîrmeh 2015 û 23 Gulan 2016’an de, ku lihevexistin û lêkdan gurtir bûn, 2 hezar û 583 jê li nav welêt 2 hezar 366 li derveyî welêt, tevî hev 4 hezar 949 endamên KCK’yê jiyana xwe ji dest da. Di van lihevexistinê hanê de îcar 483 kesên ji hêzên ewlehiyê (polîs, leşker û gundparêz) jiyana xwe ji dest da (Hürriyet 2016b). Li gorî rapora Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê (TÎHV) di navbera 16 Tebax 2015 û 16 Tebax 2016’an de “**Li 9 bajar û herî hindik 35 bajarokan**, ku bi awayekî fermî kariye bê tesbîtkirin **herî hindik 111 bêmawe û tevahiya rojê**, îlankirina qedexebûna derketina kuçeyan pêk hat.” Her wiha mafên tenduristî û jiyane yên herî bingeîn ên “**herî hindik 1 milyon û 671 hezar kesî** yên ku li van herêman dijîn, hatin îhlalkirin” (*cextkirin di metna orjînal de hene*). Li gorî rapora vê weqfê, ji ber qewimîna van lihevexistinan heftê û neh jê zarok, heftê û yek jê jîn, sî kes jê di ser şêst salî re, herî kêm 321 sivîl jiyana xwe ji dest da (Türkiye İnsan Hakları Vakfı 2016). Li gorî daneyên Bernameya Daneyên Lihevexistinan a Upsalayê, ku li gelek deverên dinyayê pevçûn û lihevexistina dişopîne û wan hildide bin qeydan, di sala 2015 û 2016’an de nêzikî du hezar kesî jiyana xwe ji dest da (Research 2019).

Di vê demê de, ji bilî ziyana can, kavilbûn û wêranîyên bajaran ên pir mezin jî çêbûn.

Bajarê dîrokî Sûr a li navenda Amedê, navenda bajarê Şirnexê û bajarokên Cizîr, Silopya û Hezex, bajarokê Mêrdînê Nisêbîn û bajarokê Colemêrgê Gever, ew cih bûn ku lihevexistin herî zêde li wan deran gur bûn, ziyana can û giyanî li wan deran pir çêbû û bajar û bajarok li wir kaviyê û wêran bûn (Türkiye Mühendis ve Mimar Odaları Birliği 2019). Li gorî daneyên NY'yê di navbera 355 hezar û nîv milyonî de kes bi darê zorê ji cih û warên xwe hatin kirin (Office of the United Nations High Commissioner For Human Rights 2017, 14).

Lihevexistinên ku li navendên bajaran gur bûn, di gel ku nêzikî salekê domiyên û bûn sedema ziyana can, jicihkirina bi darê zorê, bi zêdehiyê mezîn a kavilkirina bajarî, ne di çapana Tirkîyeyê de ne jî di qada navneteweyî de, reaksiyoneke hêjayî bal û dîqetê çênebû. HDP û DBP li îlankirinên xwebirêvebinê bûn xwedî û li pişt wan man. Li wê dema ku lihevexistin didiomiyên, di 26-27 Kanûna Pêşîn 2015'an de, KCD'yê civîneke berfireh li dar xist û di encamnameya civînê de daxuyand ku "em dixwazin naveroka xweseriya demokratîk dagirin û ji raya giştî re deklare bikin ku berê KCD'yê pêşkêşî raya giştî kiribû û HDK, DBP û HDP'yê jî ew hildabû bernameya xwe" û deklareyoneke çardeh madeyî weşand. Di vê deklareyonê de pêşniyaza nenavendîtiya herêmî ya li ser bîst, bîst û pênc herêmên cografîk bi revîzyoneke biçûk, ji nû ve hat pêşkêşkirin (Sözcü 2015b).

Serokê Giştî yê CHP'yê Kılıçdaroglu got "li cihê ku Komara Tirkîyeyê heye, xwebirêvebirin tune ye" û li dijî pêşniyaza xwebirêvebirin û xweseriya herêmî ya Kongreya Civaka Demokratîk derket. Tevî vê, CHP'yê daxuyand ku ew xurtkirina birêvebirinê cihkî ji xwe re dike armanc (Halk TV 2015). Li hêla din, CHP'yê derpêş kir ku ji ber pozîsyona hikûmeta AK Partiyê di Pêvajoya Çareseriyê de wergirtiye, li navendên bajaran lihevexistin çêbûne û rexne li sepanên jicihkirina bi darê zorê girt û bang li hikûmetê kir ku divê li wexta "têkoşîna bi terorê re" di nav hiqûqê de bimîne (Milliyet 2015). Lê MHP'yê destek da operasyonên leşkerî û polîsî yê hikûmeta AK Partiyê ku li bajaran didan meşandin. Serokê Giştî Bahçelî, pêşniyazên Kongreya Civaka Demokratîk û Partiya Gelan a Demokratîk (HDP) ên li ser xwebirêvebirin û xweseriyê, wek daxwazeke nijadperest a ku dixwaze dewletê parçe bike, nîrxand û bang kir ku kesên ev teklîf kirine divê bîst cezakirin û duçarî meiyêdeyan bîst hiştin (Hürriyet 2016a).

Lihevexistinên bajarî, di serî de ji hêla Yekîtiya Ewrûpayê (YE) û welatên endam ve, li qada navneteweyî jî nebû sedema çêbûna reaksiyoneke hêjayî balkêşiyê. Dema ku lihevexistin berdewam dikir, YE'yê jî aliyekê ve bal kişand ser li mafdariya endîşeya ewlehiyê ya Tirkîyeyê, ji aliyê din ve jî giringî pê da ku "divê midaxele di nav çarçoveyê diyarkirî de bê hiştin û ji tesîrên wê yê li ser nifûsa cihkî jî divê

xwe dûr bigirin.” Bang li rêberên siyasî kir ku li pêvajoya aştîyê vegerin (T24 2015). DYA'yê ji aliyekî ve banga çareseriya siyasî dikir ji aliyê din ve jî bal dikişand ser wê yekê ku divê di operasyonên leşkerî yên berdewam de sîvîl bîna mihafezekirin û tevger divê li gorî berpirsiya hiqûqî bin. Berdevkê Karên Derveyî yê DYA'yê John Kirby, di daxuyaniya xwe de, ya têkildarî mijarê ev gotin: “Ji bo ku ji hemû tirkî re edalet û aştîyeke mayînde bîne, em hêvî dikin ku di navbera hikûmeta tirkî û PKK'yê de pêvajoyeke polîtîk bê destpêkînin. Em tê digihîjin ku pêwîst e Tirkîye tedbîrên ewlehiyê wergire. Lê belê ji bo parastina sîvîlan û anîna cih a berpirsiyên xwe yên hiqûqî jî, divê tedbîrên hewce wergire” (Sözcü 2015a).

Teşebusa Derbeya 15'ê Tîrmehê, Rewşa Neasayî û Tayînkirina Qeyûman

Gava ku tesîra lihevixistinê li bajaran dewam dikir, di 15 Tîrmeh 2016'an de li Tirkîyeyê teşebusa derbeya leşkerî çêbû. Teşebusa kirina derbeyê, bi desteka meclis û welatîyên sîvîl, ji aliyê hikûmetê ve hat astengkirin. Di gel wê, di 20 Tîrmeh 2016'an de Rewşa Neasayî hat îlankirin û ku du salan domiya, civariya demokratîk a ku bi awayekî sîvîl hebû, bi rêjeyê giring ji holê hat hilanîn. Hikûmeta AK Partiyê ku derfetên Rewşa Neasayî bi kar anîn, bi şîrkatiya siyasî ya ku bi MHP'yê re danîbû, li warên mîna siyasî, civaka sîvîl, medya û akademyê kes û saziyên mixalîf ji xwe re kir hedef û ew krîmînalîze kirin, warên wan ên civakî bi rêjeyê giring berteng kirin. Li hêla din, li tevahiya wan warên hanê kontrol û îdareya hikûmeta navendî çêkirin.

Di vê dema du sal ajotî de, pêncî û heft întihar û mirinên gumandar ên eleqedarî Biryarnameyên bi Hikûmeta Qanûnê (BHQ) pêk hatin. Her wiha, tevî hev 70 hezar û 689 kes hatin girtin ku di nav wan de 209 rojnameger, dozdeh parlamenter û nod û pênc şaredar hebûn. Di vê dema hanê de her wisan 6 hezar û 81 jê akademîsyen, bi tevahî 135 hezar û 856 kes ku ew jî bi piranî xebatkarên Wezareta Perwerdehiya Neteweyî, Wezareta Karên Navxweyî û Midiriyeta Emnîyetê bûn, ji wezîfeya gelemperî hatin avêtin. Dîsan, 22 hezar û 474 kesên ku li dameziraweyên taybetî yên hîndekariyê dixebitîn, îzîna wan a xebatê hat îbtalkirin û 24 hezar û 490 mamosta jî bi awayekî demkî ji kar hatin dûrxistin (Devrimci İşçi Sendikaları Konfederasyonu 2018, 5). Ji bilî van, sî kanalên televizyonê, sî radyo, çil û heft rojname, şeş ajansên nûçeyan, hejdeh kovar û bîst û neh weşanxane tevî hev 160 dezgehên medyayê hatin girtin. Di çarçoveya BHQ'yê de çil û heşt saziyên tenduristiyê, 2 hezar û 271 saziyên mamosteyan, 848 wargeh û pansiyonên xwendekaran, 360 navendên kurs û etudan, 139 weqf, hezar û 412 komele, pazdeh zanîngeh û nozdeh sendika jî hatin girtin û dest li ser malhebûna wan hat danîn. Dîsan 942 şirket ku yekûna nîrxê wan ê piyaseyê 60 milyar TL û herî hindik 45 hezar kes di wan de dixebitî, li Fona Teserûf, Mewduat û Sîgortayê (TMSF) hat dewr kirin (Altuok 2018).

Di dema Rewşa Neasayî de, der heqê nenavendîtî û parkirina hêza siyasî de, çûyîneke berepaş a mezin çêbû. Hema bibêje li hemû belediyeyên ku di bin birêvebirina DBP-HDP'yê de bûn, qeyûm hatin tayînkirin. Di çarçoveya vê sepanê de ku dabaş li ser e, serokên belediyeyan jî peywirê hatin hildan û pirî jê hatin girtin. Li şûna wan, jî aliyê hikûmeta navendî ve, bi piranî jê walî û qeymeqamên li bajar û bajarokan, memûr hatin tayînkirin. Her wisan, meclisên belediyeyan jî wek *de facto* hatin bêfonksiyonkirin û şaredarî bi temamî jî aliyê burokratan ve hatin îdarekirin. Bi gotineke din, şaredariyên bajar û bajarokan, li wan wisan hat kirin ku her yek jî wan bû departmaneke girêdayî walîtî û qeymeqamiyan.

Bi Biryarnameya bi Hikûmê Qanûnê ya xwedî hejmara 674 a ku di 1 Îlon 2016'an de hat weşandin, Qanûna Belediyeyan a bi hejmara 5393 hat guhartin û rê li ber wê yekê hat vekirin ku şaredar û endamên meclisa belediyeyê dikare jî aliyê Wezaretê Karên Navxweyî ve jî wezîfeyê bîst hildan û li şûna wan qeyûm bîst tayînkirin. Bi kirina verastkirina qanûnî, jî bo hildana jî erkê ya şaredar an jî ya endamên meclisê, lidarxistina vepirsîn û tehqîqatê ya "ji ber sûcên hewandin û alîkarîkirina bi teror û terorîstan re" wek şert bes hat qebûlkirin. Her wiha, li şaredariyên ku qeyûm li wan hatin tayînkirin, lihevciwîna meclisa belediyeyê bi banga serok ve hat bestin û meclisên belediyeyên eleqedar, bi awayekî fiilî hatin fesxkirin (Resmî Gazete 2016).

Piştî vê biryarnameya hanê, wekî ku li Spanyayê hikûmeta navendî dawî li mafên otonomiyê yê Katalonyayê anî, hikûmeta herêmî jî wezîfeyê hilda û parlamentoya herêmî fesx kir, li Tirkiyeyê jî hikûmeta AK Partiyê hema bibêje qeyûm avêtin ser hemû şaredariyên di bin îdareya DBP-HDP'yê de. Ji 1 Îlon 2016'an ve, jî 102 şaredariyên ku di bin birêvebirina DBP-HDP'yê de bûn, li nod û pênc şaredariyan serokên hilbijartî jî erkê hatin hildan. Di nav van de, tevî şaredariyên bajarê mezin Amed, Mêrdîn û Wanê, şaredariyên heft bajarok, şêst û sê bajarok û bîst û du beldeyan hebûn. Di vê demê de her wisan 300 mixtar jî jî erkê hatin hildan û li şûna wan qeyûm hatin erkdarkirin. Di nava wan de hevserokên şaredariyên bajarên mezin ên Amed, Mêrdîn û Wanê jî tê de, nod û sê hevserokên şaredariyan û bi sedan endamên meclisên şaredariyan di heman demê de hatin girtin (Halkların Demokratik Partisi 2019, 20). Ji wê dewra ku qeyûm hatin tayînkirin bi vir de hevserokên HDP'yê Selahattîn Demîrtaş û Figen Yuksekdağ jî tê de, hejdeh parlamenter jî hatin girtin. Ji van heft parlamenter û gelek serokên şaredariyan ku Hevseroka Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê Gultan Kişanak jî di nav wan de ye, hîn jî di girtigehê de ne.

Li Katalonyayê hiştina li aziyê ya mafên xweseriyê, mawedar bû. Roja ku hikûmeta herêmî jî wezîfeyê hat hildan û parlamento hat belavkirin, teqwîma nû ya hilbijartinê jî hat diyarkirin û di nava du mehan de hilbijartin hatin kirin. Parlamentoya

Katalonyayê ku partiyên alگیرên serxwebûnê tê de piranî bi dest xistibû û hikûmeta Katalonyayê ya ku nû pêk hatibû, dest bi wezîfeyê kir. Berevajiyê vê, li Tirkîyeyê piştî ku qeyûm hatin tayînkirin bi şûn de, teqewîmeke nû ya hîlbijartinê nehat çêkirin û memûrên ku hatibûn tayînkirin, heta dema hîlbijartina asayî wan berdewamî bi îdarekirina şaredariyan da. Piştî sepana qeyûman a ku nêzikî sî mehî domiya, di hîlbijartinan de, ku di 31 Adar 2019'an de hatin kirin, tevî şaredariyên bajarên mezin ên Amed, Mêrdîn û Wanê li pênc bajar, çil û pênc bajarok û li dozdeh beldeyan, namzetên HDP'yê hîlbijartinên şaredariyan kar kir. Di gel vê yekê, ji 19 Tebax 2019'an ve berdewamî bi tayînkirina qeyûman hat dayîn. Ji nav şêst û pênc şaredariyên di bin birêvebirina HDP'yê de, qeyûm tayîni ser çil û heşt şaredariyan hat kirin ku jê sisê şaredariyên bajarên mezin, pênc şaredariyên navenda bajêr, sî û du yên bajarokan û heşt jê jî şaredariyên beldeyan bûn. Her wiha sî û heşt hevserokên şaredariyan hatin girtin. Ji van hefdeh jê hîn jî girtî ne. (Halkların Demokratik Partisi 2020a, 7; 2020b, 7).

Li Tirkîyeyê rexneyeke hêjayî balkêşiyê ya li ser sepanên qewûman çênebû. Hikûmeta AK Partiyê, atmosfera ku lihevexistîna li bajaran çêkiribû û derfetên Rewşa Neasayî nirxand û bêyî rastî berxwedaneke cidî bibe, karî ku sepanên qeyûman berdewam bike. Tevî vê yekê, divê em li qelemê bixin ku qeyûm tenê li bajar û bajarokên ku li wan lihevexistin çêbûbûn nehat tayînkirin. Piştî hîlbijartinên 31 Adar 2019'an, di dewra duyem a qeyûman de, ji mixalefetê bi awayekî sînordar be jî îtiraz zêde bûn. Destpêkirina lêpîrsîna qeyûman a berî hîlbijartinê û çar meh di pey hîlbijartinan de hildana ji erkê ya şaredaran bêyî ku ew bikevin nav îcreateke cidî, kir ku îtiraz zêde bibin (Deutsche Welle 2019). Di gel vê, ev îtirazên hanê ji wê rewşê dûr bûn ku bibin sedema pesta li ser AK Partiyê û tenê bi serdanên sembolkî û daxuyaniyan ve sînordar man.

Eger ew çar mehên di navbera Adar û Tebaxê de li der bê hiştin, birêvebirin û sepana qeyûman ku mafê kesên ê dikare hîlbijêre û bê hîlbijartin ji holê radikir, ji Îlona 2016'an bi vir ve dewam dike. Gava li pêş çav bê girtin ku li cografyaya kurdan piraniya hîlbijêran di navbera HDP û AK Partiyê de dabeş bûye jî, lê hema bibêjin temamiya birêvebirinên cihkî hîlbijartî û/yan jî tayînkiriyên AK Partiyê bi rê ve dibin. Li Herêmê, di vê dema hanê ya zêdeyî çar mehan de, dikare li qelem bê xistin ku birêvebirina tekpartiyê yan jî birêvebirina partî-dewletê didome.

Wekî li Katalonyayê hildana ji ser erkê ya hikûmeta herêmî û fesxkirina parlamentoya herêmê, sepana qeyûman jî li qada navneteweyî rastî bertekiyeke cidî nehat. Aktorên mîna YE û DYA'yê li dijî sepana/tetbîqa qeyûman derbirin ku ew "nîgeran" in. Berdevka Polîtîkaya Derveyî û Nûneriya Bilind a Ewlehiyê ya YE'yê Maja Kocijancic, di daxuyaniya xwe ya nivîskî de, hildana ji erkê ya serokên belediyeyan

wek “rêzgirtina li encamên hîlbijartinên demokratîk ên 31 Adarê, ji nîqaşê re vedike û dibe sedema bîngeha endîşeyan” nîrxand (Deutsche Welle 2019). Li hêla din, Berdevka Wezareta Karên Derveyî ya Amerîkayê Morgan Ortagus, di brîfînga rojane ya çapemeniyê de, li ser pîrseke der barê vê mijarê de, bersiva ku “hildana ji wezîfeyê ya rayedarên hîlbijartî û li şûna wan anîna tayînkiriyên, her tim tiştêkî endîşeder e” da (Sputnik Tûrkiye 2019).

Sistema Serokatîyê ya Xweserî Tirkan û Vegerîna li Otorîteriyê

Polîtîka û sepanên qeyûman, li Tirkîyeyê bi qonaxa demê re wek îdarîtiyeke nû, feraseta nû ya siyasî û teknîkeke îdareyê ya nû belave û berfireh bû. A rast, wekî nîqaşên ku di beşên borî de ji nîşan da, di navbera polîtîka û sepanên dewletê ku yên der barê meseleya kurdî û qada kurdî de hatin sepandin û di ya formasyona rejîma siyasî ya Tirkîyeyê de tîkiliyeke dîrokî heye. Ew polîtîkayên ku li cografyaya kurdan hatine sepandin, dikare bê derpêşkirin ku li Tirkîyeyê di warê avakirina rejîma siyasî de xwedî fonksiyoneke ceribandina pêş an jî ya laboratuwarê ye. Di navbera Mifetîşiyên Umûmî, ku li navbera 1927-1952'yan, li herêma kurdan hatine tetbîqkirin û wekî cureyekî îdareya urfî bûn û ya însakirina rejîma tek partî û konsolidasyonê de, tîkiliyeke rasterast heye. Wekî Mifetîşiyên Umûmî ku li herêma kurdan dest bi wan hatiye kirin û piştî re bi demê re li Trakya û Çukurovayê jî hatin sepandin, di çapana Tirkîyeyê de encam û vebeyînen van polîtîkayên qeyûman jî çêbûn.

Bi derbasbûna li sîstema serokatîyê re ya *a la turca* ku mîna “Sîstema Hikûmetê ya Serokkomariyê” jî tê binavkirin, bi awayekî asta siyasî û sepana qeyûman berfireh bû. Hikûmeta AK Partiyê di salên Rewşa Neasayî de, hêza birêvebirina navendî ji nû ve çêkir û di vê dewrê de ji nû ve cureyeke navendîtiyê (*recentralization*) pêk hat. Li aliyê din, îcraya ku li navendê xurt bû, ji Enqereyê belav bû û kapasîteya pîr-îdareyê zêde kir. Bi gotineke din, Tirkîye di salên Rewşa Neasayî de hem *resantralîzasyon* hem jî *dekonsantrasyonê* pevne jiya. Kapasîteya midaxeleya li qada siyasî û civakî ya birêvebirina navendî, ji navendê li cihê, li hemû rûxara welêt belav û zêde bû. Nîqaşên li ser verastkirina qanûnî ya rê li ber tayînkirina qeyûman a li saziyên civakî vedikir û li Zanîngeha Bogazîçiyê bi tayînkirina “rektorê qeyûm” re dest pê kir, nemaze divê ji vî aliyê ve li qelem bîn xistin.


Bi sîstema serokatîyê ya *a la turca* re, vî îdaretiya nû kir ku birêvebirina navendî her tiştî diyar bike, meclîsê bêfonsiyon bike, kanalên beşdariyê yên mixalefeta civakî bigire, hîlbijartî na lê tayînkirî bibin serwer û mekanîzmayên dayîna hesaban û mekanîzmayên teraz û kontrolê ji holê rake, tesîr li gelek war û qadan kir. Ev

tesîr bêguman, herî zêde di dema pandemiya Kovîd 19'ê de xuya bû. Hem di asta navendî hem jî di asta cihkî de civaka sivil û mixalefet bi rêjeyeke zêde ji birêvebirina pandemiye hatin vederkirin. Daneyên eleqedarî şewbê, bi awayekî gelek sînorkirî bi civakê re hatin parevekirin. A herî giring jî, hikûmeta navendî ku qeyûm avêtin ser şaredariyên bajarên mezin ên Amed, Mêrdîn û Wanê, li bajarên mezin ên mîna Stenbol, Îzmîr û Antalyayê bi awayekî rasterast midaxele li çalakîyên berhevkerin û belavkerina alîkariyan kir ku van belediyeyan di çarçoveya têkoşîna bi pandemiye re dabûn destpêkirin û wê çalakîyên alîkariyê navendî kirin û rasterast ew hildan bin kontrola xwe. Wek encama vê navendîbûna nû û sistema birêvebirinê ku ber bi cihkiyan ve belave bû, di dema pandemiye de, hesabên şaredariyên bajarên mezin ên Stenbol û Enqereyê hatin qerimandin/sekinandin (Gazete Duvar 2020), belavkerina nan a ji hêla Şaredariya Bajarê Mezin a Mêrsînê ve, bi awayekî rasterê dihat kirin, hat astengkirin (Sözcü 2020), dîsan fealiyetên aşxaneyê Şaredariya Bajarê Mezin a Eskişehirê ku bîst û pênc salî bû, hatin sekinandin (Evrensel 2020).

Li salên 2000'î, di pêvajoya endamtiya YE'yê de, bi alîkariya pêkhatina reforman çendî bipêşketinên hêjayî balkêşiyê yên ji bo demokratîkbûyîna çêbûbin jî, lê meylên destpêkirina otorîterbûnê bi Rewşa Neasayî re bi şeweyeke dramatîk zêde bûn. Di Endeksa Demokrasiyê de, ya ku ji hêla *The Economist Intelligence Unit* ve hatiye amadekirin, Tîrkiye li sala 2019'an di skalaya 1-10 de bi puanê 4,09 di nav 167 welatan de li rêza 110'an cih girt û wek "rejîma melez" a li kenarê rejîma otorîter, di navbera rejîma otorîter û demokrasiya biqisûr de hat senifandin.³⁹ Lê hal we ye Tîrkiye li salên 2000'î, ji rejîmeke melez ber bi demokrasiyê ve di nav bipêşketinekê de bû. Tîrkiye bi 5,76 puanî di warê standardên demokratîk de, di sala 2012'an de gihîşt rewşa herî baş û wek "rejîma melez" a nêzî demokrasiya biqisûr hat senifandin. Destpêkirina kêmketina wê ya di rêzbendîya standardên demokratîk de ya 2013'an, nemaze bi 2014'an re ket rewşeke dramatîk û di sala 2016'an de puanê Tîrkiyeyê daket 5,04'î. Bi 2016'an re bipaşketina duyem dest pê kir û di sala 2017'an de bû 4,88, di sala 2018'an de daket 4,37'an û di 2019'an de jî bi puanê 4,09'an nêzî nuqteya wan welatan bû ku ew di kategoriya rejîmên otorîter de ne (The Economist Intelligence Unit 2020, 18).

³⁹ Di Endeksa Demokrasiyê de dewlet di skalaya navbera 1-10 de heta 4 puanan wek "otorîter", ji bo puanên di navbera 4.0-5.9'an de mîna "rejîma melez", ji bo puanên di navbera 6.0-7.9'an de "demokrasiya biqisûr" û ji bo puanên di navbera 8.0-10.0 de jî wek "demokrasiyên tam" tên senifandin.

Şekil 2. Endeksa demokrasiyê ya berawirdiya Tirkîyeyê 2006-2019



Çavkanî: Bi bikaranîna daneyên *The Economist Intelligence Unit (2020)* hatiye amadekirin.


Ji aliyê parametreyên ku di hesabkirina endeksa demokrasiyê de tên bikaranîn, gava li rewşa Tirkîyeyê bê nihartin, tê dîtin ku di skaleyê 1-10'an de, di warê "pêvajoya hîlbijartinê û pluralîzmê" de 3,08, di warê "fonksiyoniya hikûmetê" de 5,00, di warê "beşdariya siyasî" de 5,00, di warê "çanda siyasî" de 5,00 û di warê "mafên sîvîl" de jî 2,25 wergirtine (*The Economist Intelligence Unit 2020,12*). Wekî tê dîtin, Tirkîye ku çawan jî aliyê fonksiyoniya hikûmetê, beşdariya siyasî û çanda siyasî ve xwedî wesfekî rejîma melez a tîpîk e, bi taybetî di warê "pêvajoya hîlbijartinê û pluralîzmê" û "mafên sîvîl" de xwedî wesfekî rejîma otorîter e.

Xebateke din a giring ku veguherîna demokratîk a li welatan dişopîne, Endeksa Veguherînê ya Bertelsmann (*Bertelsmann Transformation Index - BTI*) e, ku ew jî bipaşketina dramatîk a li Tirkîyeyê di salên dawî de çêbûye teyîd dike. Li gorî BTI'yê, asta demokrasiyê ya Tirkîyeyê ku li gorî skaleyê 1-10'an di navbera salên 2006-2008'an de xwedî nirxê 7,05 bû, di navbera salên 2010-2012'an de bi 7,65'an gihîşt nuqteya herî jor. Ev nirx di 2014'an de daket 7,55 û di sala 2016'an de jî daket 7,25'an. Tevî vê bipaşketinê, di endeksa 2016'an de Tirkîyeyê cihgirtina xwe ya di nav kategoriya welatên xwedî "demokrasiya biqisûr" de dewam kir. Di sala 2018'an de, di warê statuya demokrasiyê de bipaşketineke dramatîk lê qewimî daket 5,55'an û ket kategoriya

“demokrasiyên biqisûr ên xwedî asta bilind.” Ev bipaşketin di sala 2019 û 2020’î de jî domiya. Tirkîyeyê sala 2020’î jî tê de, bi puanê 4,92’yan di nav 137 welatan de di rêza 77’em de cih girt û ew di nav kategoriya welatên xwedî “otokrasiya mitedil” de hat senifandin. Bipaşketina Tirkîyeyê ya di warên siyasî, aborî û îdarî de, di Şekil 3’yan de bi awayekî balkêş xuya dibe (BertelsmannStiftung 2020).

Şekil 3. Veguherîna Tirkîyeyê ya di warên siyasî, aborî û hevberêvebirinê de, berawirdiya wan a 2012-2020’î

Çavkanî: BertelsmannStiftung, “Transformation Atlas,” https://atlas.bti-project.org/1*2020*CV:C TC:SELTUR*CAT*TUR*REG:TAB, dema gihanê: 09.01.2021.



Not: Xeleka di hundir de daneyên 2020’î vedibeyînin. Rengê mor “veguherîna politîk”, rengê şîn “veguherîna aborî” û rengê kesk jî “veguherîna hevberêvebirinê” derdibe. Di gel vê yekê, xeleka derve ya sor jî, rewşa Tirkîyeyê ya sala 2012’an nişan dide ku wê gavê standardên wê yên demokrasiyê herî bilind bûn.

Di BTI’yê de endeksa veguherîna siyasî li gorî pênc parametreyan tê hesabandin:

(1) entegrasyona siyasî û civakî (political and social integration), (2) îstiqrara dameziraweyên demokratîk (stability of democratic institutions), (3) raseriya hiqûqê (rule of law), (4) beşdariya siyasî (political participation) û (5) dewletîti (stateness).

Gava sala 2012’an, ku statuya wê ya demokrasiyê herî bilind bû û ya 2020’î li hev bê qiyaskirin, tê dîtîn ku di pênc waran de bipaşketineke balkêş çêbûye. Tevî vê yekê,

bipaşketina herî mezin di warên îstiqrara dameziraweyên demokratîk û raseriya hiqûqê de qewimiye. Li gorî daneyên 2020'î, Tirkîyeyê di warê dewletîtiyê de 7,0, di warê beşdariya siyasî de 5,8, di warê raseriya hiqûqê de 3,5, di warê îstiqrara dameziraweyên demokratîk de 3,0, di warê entegrasyona siyasî û civakî de jî 5,3 puan wergirtine. Bi gotineke din, Tirkîye ku di warê dewletîtiyê de xwedî wesfê wan welatan e ku li wan demokrasiya biqisûr heye, di warê beşdariya siyasî û entegrasyona siyasî û civakî de jî, di nav demokrasîyên biqisûr ên xwedî radeya herî zêde de cih digire. Îcar di warê raseriya hiqûqê û îstiqrara dameziraweyên demokratîk de, xwedî wesfê otokrasiya mitedil e (BertelsmannStiftung 2020).

Şikestinên Jeopolîtîk: Rojava û Hêrêma Kurdistanê ya Iraqê

Piştî bidawîbûna Pêvajoya Çareseriyê ya bi awayê sernekeftî, qewimîna lihevxitina li bajaran û destpêkirina Rewşa Neasayî ya di pey re, li Tirkîyeyê meyleke otorîteriyê xurt bû û di dînamîkên jeopolîtîk ên kêşeya kurdî de jî guherînên giring çêbûn. Li Iraqê û Sûriyeyê mobilîzasyonên leşkerî û sosyo-polîtîk ên kurdan û tesîrên wan ên ku li qada herêmî û navneteweyî pêk hatin, bûn dînamîkên sereke yê eleqedarî kêşeya kurdî ya Tirkîyeyê ku wan dewra piştî Pêvajoya Çareseriyê diyar kir. Di vê dewrê de ew guherînên ku di hev kêşeya jeopolîtîk a kêşeya kurdî de derketin holê, ji aliyê AK Partiyê û şîrkên wê yê koalîsyonê ve hatin amrazîkirin û di avakirina rejîma otorîter de wek kan û çavkaniyek hat bikaranîn.

Rojava: Cihê lihevxitinê yê nû


Rojava ku di Pêvajoya Çareseriyê de wek parçeyekî diyalog û mizakereyê li ser hatibû sekinandin, di dema Rewşa Neasayî de bû cihê pevçûn û lihevxitina kurdî. Îdareya AK Partiyê ji aliyekî ve bi siyasî û sepana qeyûman li ser hemû şarederiyên di bin birêvebirina HDP'yê de bi destê walîtî û qeymeqamiyan ve bi awayekî rasterast îdare û kontrola navendî çêkir ji aliyê din ve jî ji bo ku li Herêma Rojava bi forma xweserî yan jî federe serweriyeke kurdan a terîtoriyal çênebe, hemû hêz û kanên xwe seferber kirin.

Tirkîyeyê, bi berdewamiya xeta sînorê Sûriyeyê, ji Tebaxa 2016'an ve sê caran bi awayê leşkerî midaxeleya Herêma Rojava kir û bi hêzên Artêşa Sûriyeya Azad (ASA; paşê bi navê Artêşa Neteweyî ya Sûriyeyê [ANS] ji nû ve hat veavakirin) re, ku bi piranî ji komên cîhadker pêk dihat, li xakên Sûriyeyê bi fiêlî bi cih bû. Tirkîye ku di navbera Tebaxa 2016'an û Sibata 2017'an de bi hêza xwe ya leşkerî li herêma Cerablûs û Babê bi cih bû û li navbera Efrînê ku ew yek ji sê navendên sereke yê Rojava û li rojavayê Çemê Ferêt dimîne û di navbera Kobanî û Cizîrê de ku ew jî li rojhilatê

Çemê Ferêt dimînin, herêmên tampon çêkirin û li Rojava rê li ber teşebusên ji bo pêkanîna tevahiya cografî girt. Di navbera Kanûna Paşîn û Adara 2018'an de jî, piştî lihevexistinên ku bi mirina bi hezaran mirovî û jicîhkirina zêdeyî 100 hezar kesî bi encam bûn, ket herêma Efrînê. Di pey re, di mêjûya 9-23 Çiriya Pêşîn a 2019'an de, li bajarên ku dikevin navbera Kobanî û Qamişloyê, li Girê Spî (*Tel Abyad*) û Serê Kaniyê (*Ras Al-Ayn*) û herêma ku dikeve navbera van her duyan bi cih bû (Bnr.: Nexşe 2).

Li wexta ku midaxeleyên leşkerî didomiyên, li Herêma Rojava di gel îdareya leşkerî, teşebusên ji bo avakirina birêvebirina îdarî û siyasî jî berdewam kir. Li Rojava ku ji sê kantonan pêk tê, di 17 Adar 2016'an de "Federaqsyona Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê" hat îlankirin û ji hêla meclisa damezirîner ve makeqanûn hat amadekirin. Di 22 Îlon 2017'an de hilbijartinên hevserokên komunan, di 1 Kanûna Pêşîn 2017'an de jî, di serî de Cizîr, Ferat û Efrîn, li sê herêman endamên meclisên belde, bajarok û kantonan hatin kirin. Piştî ku Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) di navbera salên 2017 û 2018'an de kontrola herêmên Reqa û Dêrezorê, ku bi piranî ereb li wan dijîn, bi dest xistin, qada di bin kontrola Federasyona Demokratîk a Bakurê Suriyeyê de ber bi başûr ve bi asteke hêjayî kişîna bal û dêhnê fireh bû. Jixwe wek encama vê guherînê di 6 Îlon 2018'an de navê herêmê ji aliyê Konseya Demokratîk a Sûriyeyê ve bi "Birêvebirina Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê" hat guhartin.

Nexşe 2. Rewşa dawî ya li şerê navxweyî yê Sûriyeyê (2021)



Çavkanî: Syrian Civil War Map - Live Map of the Syrian Civil War, dema gihanê: 11.01.2021.

Not: Herêmên sor di bin kontrola hikûmeta Sûriyeyê de, herêmên zer jî di bin kontrola Birêvebirina Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûryê de ne, ku kurd lê pêşewatiyê dikin. Li herêmên qehweyî jî kontrola hevpar a hêzên hikûmeta Sûriyeyê û yên Birêvebirina Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê heye. Herêmên şîn jî Tirkîye tevî hêzên cîhadker ên ku ew wan destek dike, bi rê ve dibe. Herêma kesk jî îcar Heyet Tehrîr el-Şam, Eniya Rizgariya Neteweyî û komên cîhadker ên cuda ku Tirkîye destekê dide wan, bi rê ve dibin. Li qada keskê vekirî jî ew komên xwedî desteka DYA'yê lê serwer in.

Herêma Kurdistanê ya Iraqê û referandûma serxwebûnê

Di gel rûdanên ku li Rojava çêbûn, di 25 Îlon 2017'an de li Herêma Kurdistanê ya Iraqê (HKI) referandûma serxwebûnê pêk hat û di çarçoveya kêşeya kurdî de, der barê parkirina hêza siyasî de ev jî qewameke jeopolîtîk a giring a din bû ku tesîr li Tirkîyeyê kir. Di demeke wisan de Li HKI'yê referandûma serxwebûnê hat lidarxistin ku li Tirkîyeyê îdareyên şaredariyan jî, ku ew aliyê îdarî, siyasî û darayî ve di bin wesayetê de bûn û xwedî hêzeke sîncordar bûn, di encama polîtîka û sepanên qeyûman de bi temamî jî holê hatin rakirin. Li Kurdistanê jî 4,6 milyon hîlbijêrî nêzikî %72'yan wan beşdarî referandûmê bû û bi rêjeya %92,73 hîlbijêr ji bo serxwebûna Kurdistanê raya "Belê" da (Rudaw 2017).

Li qada navneteweyî ji Referandûma Sexwebûnê ya Kurdistanê re jî destek çênebû, ku hema bibêje bi Referandûma Serxwebûnê ya Katalonyayê re di heman rojan de pêk hatibû. Ji bilî Îsraîlê tu welat destek neda referandûmê. Ji hêzên navneteweyî yên mîna DYA, Rûsya û YE'yê daxwaz çêbûn ku referandûmê taloq an jî îbtal bikin, dîsan Neteweyên Yekbûyî ragihand ku dê di referandûmê de tu rolekê wernegire. Îran, li ser banga hikûmeta navendî ya Iraqê li dergehên sînoran têtetin û derketin qedexe kirin û qada hewayî li balafirên ku ji HKI'yê radibûn, girt. Her wiha bi artêşa Iraqê re li ser xeta sînor tetbîqata leşkerî kir (Çiçek 2015, 276–81; BBC News Türkçe 2017a).

Li hêla din, Tirkiyeya di bin pêşewatiya AK Partiyê de ku ji bo nehêla li Rojava herêmeke xweser an jî federe çêbe, hemû çavkaniyên xwe seferber kirin, wekî Îranê bi awayekî tund li dijî Referandûma Serxwebûna Kurdistanê rabû. Tirkiyeyê referandûm wekî “meseleya ewlehiya neteweyî” (Anadolu Ajansı 2017) nirxand û lê xebitî ku bi gefên siyasî, aborî û leşkerî referandûmê bide sekinandin. Hêzên Çekdar ên Tirkî hefteyek berî referandûmê, di 18'ê Îlonê de bi hêzên leşkerî yên Iraqê re li sînor tetbîqat kir. Du roj bi şûn de kampên PKK'yê yên li HKI'yê yên li deverên Zê, Ava Şîn-Basyan, Metîna û Garê bi balafirên şer bombabaran kirin. Du roj berî referandûmê, tezkere li Meclisa Mezin a Neteweya Tirkiyeyê (MMNT) hat qebûl kirin ku tê de raye dida hikûmetê ku ji bo du salan dikare leşker bişîne Sûriye û Iraqê (Euronews Türkçe 2017). Her wiha roja ku referandûm hat kirin Serokkomar Erdogan ragihand ku Deriyê Xabûrê yê sînor ê di navbera Tirkiye û HKI'yê de bi awayekî yekalî hatiye girtin (Kekilli 2017). Biryara ku Tirkiyeyê qada xwe ya esmanî li balafirên ku ji HKI'yê radibin girtiye jî da pey biryara navborî (Dünya 2017). Di vê demê de her wisan wekî midaxeleya leşkerî ya Tiriyeyê tevî Iraq û Îranê ya li HKI'yê û miyêdeyên aborî yên wekî bi tevahî girtina Deriyê Sînorê Xabûrê, sekinandina sewqiyata petrolê ya Xeta Boriya Kerkûk û Ceyhanê û projeyên din ên enerjîyê û sînardarkirina ticaret û veberhênanên Tirkiyeyê yên li Herêmê, hatin rojevê (Özçelik 2017).

Piştî 2003'yan avabûn û bipêşketina Herêma Kurdistanê ya Iraqê, li Tirkiyeyê tesîreke diyarker li formasyona kêşeya kurdî kir û bû xwedî fonksiyona kaneke giring, lê PKK/KCK û PYD'yê bi argumanên wekî neguncanbûna demê, pêknehatina itifaqa neteweyî, temambûna serdema netewe-dewletê destek neda referandûma serxwebûnê. Berevajiyê vê yekê HDP'yê daxuyand ku “ji ber prensîba diyarkirina çarenûsa xwe ya gelan; em dê her cure destek û piştgiriye bidin gelan” û desteka xwe aşkera kir. Tevî vê yekê ku HDP'yê ji bo Rojava çavkaniyên xwe yên sazûmanî û mirovî mobilîze kiribûn, di dema referandûma serxwebûnê de helwesteke aktîf wernegirt. Li aliyê din HUDAPAR jî tê de, partiye kurdî yên din, referandûma serxwebûnê destek kir (Aydın 2017).

Çendî ji hikûmeta navendî ya Iraqê, ji Tirkiye û Îranê tehdîtên leşkerî, siyasî û aborî hatin û bang ji hêzên kurewî yên mîna DYA, YE û Rûsyayê hatin da ku referandûm bê taloq an jî ibtalkirin jî, Referandûma Serxwebûna Kurdistanê hat kirin. Piştî referandûmê nêzikî sê hefteyan, di 16 Çiriya Pêşîn 2017'an de artêşa Iraqê û hêzên Heşdî Şabî ketin Kerkûkê. Di nav çend rojan de, bêyî ku pevçûn û lihevxiştineke şayanî diqetê biqewime, hêza leşkerî ya HKI'yê *pêşmerge* ji hemû herêmên nîqaşdar vekişiya û birêvebirina HKI'yê kontrola nêzikî %40'ê erda ku berê îdare dikir ji dest da (Çiçek 2018, 276–81). Di dema referandûmê de, qeyranên aborî û siyasî yên ku di navbera hikûmeta navendî ya Iraqê û HKI'yê de derketibûn holê, îroj jî bi temamî nehatine helkirin.

Jeopolîtîka Kurdistanê û zêdebûna endîşeya Tirkîyeyê ya ji ber beqayê

Guherînên radîkal ên ku di jeopolîtîka Kurdistanê de qewimîne, endîşeya Tirkîyeyê ya der barê beqayê de zêde dike (Altun 2017; Özçelik 2017; Kekilli 2017). Ji lew re di van bîst salên dawî de li başûrê Tirkîyeyê du Kurdistan hatin avakirin ku ew hîn nikare hunerwariyêke siyasî nîşan bide da ku pê kêşeya xwe ya kurdî çareser bike û dewam dike meseleyê wek "kêşeya teror û ewlehiyê" bi nav dike ku ev meseleya hanê ewlehiya wê ya neteweyî tehdît dike. Yek ji van dewleteke federe ye ku li pey serxwebûnê ye, ya din jî ku bi awayekî *de facto* xweser/federe li dû lêgeriyana xweseriya/federasyona fermî ye. Bi gotineke hîn aşkeratir, li başûrê Tirkîyeyê, li Iraq û Sûriyeyê der barê çareseriya kêşeya kurdî de du "modelên erebî" bi pêş ketin û geşe bi xwe didin.

Meseleya kurdî ya Tirkîyeyê jî çî qas diçe mezin dibe. Partiyên kurdan ên sereke ku îroj HDP temsîla wan dike, di dewra 1991 û 2014'an de, wek navengîn li heşt bajarên kartêkeriya xwe nîşan dida û di hilbijartinan de ji banda % 6,5'an derbas nedibû, lê HDP bi Pêvajoya Çareseriyê ya 2013-2015'an re bi lez mezin bû û gihîşt banda %11-13'an. Hejmara bajarên ku vê kevneşopiya siyasî lê karîgeriya xwe nîşan dida, ji heştan gihîşt bîst bajarî. Di lidarxistina van hilbijartinên dawî de, HDP'yê li yazdeh bajarên, ku di nav wan de şaredariyên bajarên mezin ên Amed, Mêrdîn û Wanê jî hebûn, %50 û jê berjortir ray standin. Ji bilî vê li yazdeh metropolan jî, ku bajarên mîna Stenbol, Îzmir, Antalya, Mêrsîn û Edene di nav wan de hebûn, bi asta ku bandorê li encamên hilbijartinan bikin (%5-17) desteka hilbijêran wergirt (Çiçek 2017).

Tirkiye berteka ku da Rojava, yeka mîna wê gava ku HKI'yê hatibû damezirandin jî, dabû. Di gel vê yekê, têkiliyên wê yên bi HKI'yê re ji sala 2007'an ve li zemîneke dostane dageriyan û hem di warê siyasî hem jî di warê aborî de bi herêmê re têkiliyên baş hatin danîn (Öğür, Baykal & Balcı 2014, 43–45; Özdemirkiran 2013). Li pey bidawîhatina Pêvajoya Çareseriyê, Tirkîyeyê hem li Rojava hem jî li HKI'yê, lêgeriyana kurdan a ji bo avakirin û berfirehiya serweriya xwe ya terîtoriyal, wek kêşeyêke beqayê hilda dest.

Pênc sedem dikarin bên rêzkerin bê çima li Tirkiyeyê guherînên ku di jeopolîtîka kêşeya kurdî de rûdane, wek kêşeyeke beqayê ya ku “ewlehiya neteweyî” tehdît dike tê nirxandin. A pêşî, piştî Herêma Kurdistanê ya Iraqê li herêma Rojava çêbûna serweriyê kurdan a terîtoriyal, hem ji bo kurdên li Tirkiyeyê hem jî ji bo kurdên li çar aliyê dinyayê, fonksiyoneke kana normatîf a nû bi cih tîne. Modelên îdarî û siyasî yên ku li Sûriye û Iraqê pêk tîne, ji bo kurdên Tirkiyeyê jî “nuqteyê referansê” çêdike. Di pey van qewam û rûdanan de, dê ji bo siyaseta Tirkiyeyê ne hêsan be ku bikare kêşeyê bi mafên çandî yên takekesî û bi cihkîbûna/mehelîbûna îdarî ya sînorkirî çareser bike û bi rê ve bibe.

A duyem, Rojava û HKI'yê bi tenê ne xwedî fonksiyona çavkaniyê normatîf in. Di heman demê de di asta sazûmanî û rêxistinî de jî çavkaniya mobilîzasyonê ne. Wek mînak; piştî Pêvajoya Çareseriyê ku Tirkiyeyê berê xwe da amrazên şidetê da ku kêşeya xwe ya kurdî bi rê ve bibe û di gel ku HDP bi amrazên darazî û şideta polîsan bi awayekî *de facto* girtiye jî, tê dît ku HDP'yê hêza xwe ya li banda %11-12'î hêvişandiyê (Cumhuriyet 2020). Der barê vê mijarê de, ji aliyekî ve dikare ji reaksiyonên li dijî vê şidetê ku dibin xwedî fonksiyon bê beskirin, ji aliyê din ve jî dikare ji tesîra motîveker a deskeftiyên kurdan ên li Rojava û HKI'yê bê qalkirin. Dîsan, di serî de li welatên Ewrûpayê û DYA'yê, mobilîzebûna kurdan a li çar aliyên dinyayê roleke sereke leyîst ku zêdebûna xuyabariya meseleya kurdî li qada navneteweyî çêbe. Her wiha divê bal lê bê kişandin ku Rojava û HKI, ji bo kurdên mixalif ên li Tirkiyeyê bûn xwedî fonksiyoneke stareyê. Siyasetkar û aktîvistên kurdî, ku berê ji ber şideta polîsî û darazî berê xwe dida Ewrûpayê, îroj tevî Ewrûpayê hem li Rojava hem jî li HKI'yê bi cih dibin.

A sêyem, kêşeya kurdî ya Tirkiyeyê û meseleya Rojava, bi rêjeyê zêde bi yek bûye. Ji lew re Rojava ku di dema Pêvajoya Çareseriyê de parçeyekî diyalog û lihevkerî bû, piştî têkçûna pêvajoyê, bû cihê sereke yê lihevexistinê di navbera Tirkiye û PKK/KCK'yê de. Wekî di beşên borî de jî binê wan hat xêzkerin, li gorî qiyasa li Herêma Kurdistanê ya Iraqê bandora Rojava ya li kêşeya kurdî ya Tirkiyeyê û bandora wê ya li kurdên Tirkiyeyê ya mobilîzeker, hîn zêdetir bû. Nîqaşên siyasî bi xwe yên ku li Tirkiyeyê li dora bûyerên Kobaniyê didomin, bi tena serê xwe vê biyekbûnê diselmîne.

A çarem, bi meseleya Rojava û pêkhatina referandûma serxwebûnê ya li Kurdistanê re, xuyabariya meseleya kurd/Kurdistanê ya li qada navneteweyî ku li raboriyê nikare bê qiyaskirin, bi awayekî pir zêde bû. Nemaze, midaxeleyên leşkerî yên Tirkiyeyê li Rojava, kir ku eleqeya navneteweyî ya mijara dabaşê ji kurdên Sûriyeyê bêhtir here ser hemû kurdan. Li salên dawî, zêdebûna hejmara nûçeyên di organên medyaya navneteweyî de yê têkildarî mijara kêşeya kurdî ya Tirkiyeyê, bi tena serê xwe qîm

dike ku ev eleqe bê fehmkirin.

A dawî jî, hêzên emperyal ên mîna DYA û Rûsyayê, rasterast bûn wek parçeyekî kêşeyê. DYA'yê jixwe destek pêşkêşî avakirina HKI'yê ya li sala 2003'yan kir û ev nêzikî bîst salan e ku têkiliyên bi kurdan re danîne didomîne. Li hêla din, bi şerê navxweyî yê Sûriyeyê re, wesfê rehenda kêşeya kurdî ya navneteweyîbûyî guherî. Li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyeyê hem hebûna hêz û binkeyên DYA'yê hem jî yên Rûsyayê, di navbera Birêvebirina Xweser û rejîma Esad de kirina navbeynkariyê ya Rûsyayê, bi berdeamiya sala 2020'î hewlên DYA'yê yên ji bo anîna cem hev a partiyên kurdî yên Rojava û çêkirina pêşewatiyeke siyasî ya hevpar, gihîştina rehenda navneteweyîbûyîna kêşeya kurdî dide nîşandan.

Ev xalên li jorê gava li ber çav bînin girtin, ew guherînên ku li Rojava û HKI'yê çêbûne, dikare bê gotin li Tirkiyeyê, ku ew nikare qabiliyeta çareserkirina kêşeya xwe ya kurdî bi rêyên siyasî nîşan bide, dibe sedema otorîterbûyîna. Jê wêdetir, ji ber zêdebûna endîşeya beqayê, dikare bê derpêşkirin ku şansê veguherîneke eleqedarî parkirina hêza siyasî ya ji bo çareseriyê kêşeya kurdî kêmtir dibe. Tevî wê yekê, li başûrê welêt ew “modelên erebî” yên ku der barê çareseriyê kêşeya kurdî de, ya ku ev meseleyeke dersînor û herêmî ya kurd/Kurdistanê ye pêk tînin, dibe ku di çarçoveya nenavendîtiya îdarî û siyasî de zorê bide Tirkiyeyê da ku ji bo çareserkirina kêşeya kurdî reformeke nû û “modela tirkî” çêke. Di rewşa heyî de, ev afirandinên maliyêtên zêde yên siyasî, aborî û dîplomatîk ên li hundir û derve, nîşan didin ku ev siyasî ne dombar e. Ya jê giringtir, bi siyaseta heyî ya li ser bîngeha “beqa”yê, çendî di maweyeke kurt de ji bo siyasî û dewleta tirkî hin “destkeftî” wekî ku bi dest ketibin bixuyin jî, di maweyeke navîn û dirêj de ihtimala ku kêşeya kurdî bi “maliyeteke” hin girantir derkeve pêşîya Tirkiyeyê xurttir dibe. Dewra 1999-2004'an ku di warê kêşeya kurdî de daxwazên parkirina hêza siyasî bi paş ve hatibûn kişandin û rewşa nû, gava li hev bînin berawirdkirin, xuya ye ku ji aliyê Tirkiyeyê ve “maliyêtên siyasî” yên meseleyê her diçe zêdetir dibin. Navneteweyîbûna meseleya kurdî, midaxilbûna hêzên emperyal ên mîna DYA û Rûsyayê li kêşeyê, nîşaneyên herî giring a xurtbûna wê ihtimalê ye. Ya dawî û herî giring, çîroka dîrokî ya kêşeya kurdî, siyaseta “teror û ewlehî”yê û amrazên sepanê yên ku xwe dispêrin tundiyeke, nîşana wê yekê ne ku ji bilî bipaşdeavêtina meseleyê û zêdekirina ziyanan, tu fonksiyoneke wê nîn e. Azmûnên kurdên Iraq û Sûriyeyê diselmînin ku dahatûya wê siyaseta bêfonksiyon tune ye.

Di wê û her du beşên berê de, ji serdema dawî ya Împaratoriya Osmanî heta roja me ya îroj dînamîkên der heqê mijara parkirina hêza siyasî û nenavendîtiyê de, bi perspektîfeke dîrokî û berawirdî hatin analîzkirin. Li beşa piştî asteng û îmkân, çavkanî û firsendên ku di pêvajoya avabûna dîrokî de çêbûne li ber çav tînin girtin û ji

bo ku der barê kêşeya kurdî de, di maweyeke kurt de aştiya siyasî û di maweyên navîn û dirêj de jî çareseriyê mayînde û biîstiqrar bê dabînkirin, pêşniyaz tîn pêşkêşkin.

4.

PARKIRINA HÊZÊ
Û NENAVENDÎTÎ:
ASTENG, DERFET Û
VEBÎJÊRK

Parkirina Hêzê û Nenavendîtî: Asteng, Derfet û Vebijêrk

Gava ji Osmanî heta Komarê, ji Makeqanûna 1921'ê heta roja îroj pêvajoya dîrokî li pêş çav bê girtin, der barê parkirina hêza siyasî û nenavendîtîyê de gelo vebijêrkên li pêş Tirkiyeyê çi ne? Wexta sepanên li dem û cihên cuda li pêş çav bînin girtin, ji bo çareseriyê lihevxiştîneke terîtoriyal a binyat-nasnameyî wekî ya kêşeya kurdî, gelo parkirina hêza siyasî û çareseriyê nenavendîparêz a îdeal çi ye? Dîsan, di şertên heyî de, di çarçoveya çareseriyê kêşeya kurdî û aştîya siyasî de gelo senaryoya reel dibe ku çi be?

Di vê beşê de, kontekstên nîqaşê yê tîkildarî parkirina hêza siyasî û nenavendîtîyê û paşxaneyê dîrokî ya kêşeya kurdî li pêş çav tînin girtin û hewla gerîna li bersiva pirsên li jorê tînin kirin. Di vê hevraçangê (kontekstê) de, li ser astengên sereke yê ku dibe li pêşîya bipêşketinê ji bo parkirina hêza siyasî ya mihtemel hebin, tînin sekinandin. Her wisan, derfet û firsendên mihtemel ên ku dibe bibin sedema pêkhatina vê yekê, tînin nîrxandin. A dawî, asteng û derfetên heyî jî li ber çav tînin girtin û cih ji parkirina hêza siyasî û modela nenavendîtîyê re ya mihtemel tînin veqetandin, ku dibe ji bo kêşeya kurdî çareseriyê mayînde dabînin bikin.

Teza bîngehîn a ku tînin derpêşkirin ev e: Li Tirkiyeyê di maweya kurt û navîn de senaryoya gengaz nenavendîtîya îdarî ya berfirehkirî ye. Çareseriyê wiha, dibe ku dawî li lihevxiştîna kurdî bîne û jiçekkirina PKK/KCK'yê pêk bîne. Di gel vê, ji bo çareseriyê mayînde hewce bi nenavendîtîya îdarî û siyasî ya herêmî heye.

Asteng

Gava nîqaşê li beşên berê li pêş çav bînin girtin, li Tirkiyeyê der barê parkirina hêza siyasî û nenavendîtîyê de dikare were gotin ku pênc astengên bîngehîn hene. Asteng ev in: Endîşeya ewlehiyê ya dîrokî û rabêjiya beqayê, nerîta dewlet û siyaseta zêde navendîparêz, newekheviya herêmî û navendîbûna/kombûna çavkaniyên aborî, sîbera lihevxiştîna kurdî ya li ser nenavendîtîyê, sînorên siyaseta tirkî ya tîkildarî kêşeya kurdî û amrazîkirina kêşeya kurdî.

Endîşeya ewlehiyê ya dîrokî û rabêjiya beqayê

Bêguman der barê mijara parkirina hêzê û nenavendîtîyê de, endîşeya ewlehiyê ya dîrokî û endîşeya beqayê, astenga herî mezin pêk tînin. Di serdema dawî ya osmanî de

ji destçûna ax û erd, bingeha van endîşeyan tîne pê. Vê dewra hanê ku di kevneşopiya siyaseta tirkî û dewleta tirkî de kêliya şikestinê çêkiriye, bi berdewamiya dewra Komarê re di formasyona dewlet û siyaseta de fonksiyona xala referansê ya diyarker aniye cih.

Îtiraza kurdî û mobilîzasyona wê ya sosyo-polîtîk, ku berî avabûna Komarê dest pê kiriye û eger bêdengiya siyasî ya dîmaneyî ya di navbera 1940-1960'î de li derve bê hiştin, di dirêjiya sedsala 20'î de berdewamî bi xwe daye, kiriye ku ev endîşeya beqa û ewlehiya di siyaseta tirkî û dewleta wê de serwer e, zindî bimîne. Rehendên lihevixistinên ku ji sala 1984'an ve berdewam in û encamên ku afirandine, ev endîşeya hanê hîn bêhtir mezin kir.

Dikare bê gotin ku ew endîşeya beqayê ya di siyaseta û dewleta tirkî de, bi guherînên dramatîk ên ku li salên 2000'î di hev kêşeya jeopolîtîka kêşeya kurd/Kurdistanê de qewimîne, bêhtir bû. Ji lew re, hem ji ber avabûna dewleta federe ya kurdî ya li Iraqê û hewlên ji bo pêkanîna serxwebûna wê, hem jî li Sûriyeyê li herêma Rojava bi awayekî *de facto* derketina holê ya herêma xweser/federe û hewlên lêgeriyane yên ji bo fermîkirina wê, kirin ku endîşeya ewlehiyê ya dîrokî û nîgeraniya ji ber beqayê zêdetir bibe. Li Tirkiyeyê, di van salên dawî de mezînbûna siyaseta kurdî ya sereke bi awayî şayanî diqetê, li herêmeke ku nêzikî bîst bajaran digire nav xwe hebûna mobilîzasyoneke wê ya xurt a sosyo-polîtîk, dîsan li metropolan xwedîbûna wê ya li hêzeke wisan ku dikare tesîr li formasyona siyasî bike, di nav van pênc salên dawî de kir ku ev endîşeya beqayê hîn pirtir zêde bibe û bipişpişe.

Li vir divê ji nifûs û cografyayê jî bê behskirin. Di gel hemû dînamîkên li jorê, mezîniya nifûsa kurdan a li Tirkiyeyê, tevî koça wan a gur a li metropolan, hîn jî pêkanîna nifûsê ya li erdên xwe yên dîrokî, vê endîşeya beqayê xwedî dike. Bi ser de, cografyaya ku nifûsa kurdan lê gur bûye, di nav cografyaya Tirkiyeyê de cihekî giring digire. Li cografyayên wî aliyê sînorên Tirkiyeyê, li Iraq, Sûriye û Îranê jî jiyîn û hebûna kurdan rewşê hîn cidî dike. Bi awayekî kurtasî, dînamîkên demografîk û cografîk ên ku hema bibêje ne mimkin e bi mihendîsiya dewletê bîn birêvebirin, bi berdewamî endîşeya mayîndetiye/beqayê ya dîrokî ya siyaseta û dewleta tirkî xwedî dike.

Nerîta dewlet û siyaseta zêde navendîparêz

A duyem, divê ku bal li nerîta dewlet û siyaseta zêde navendîparêz bê kişandin. Eger nîqaşên li ser nenavendîtiyên yên di destpêka sedsala 20'î de û Makeqanûna 1921'ê ya di şertên şer de li derve bîn hiştin, li Tirkiyeyê nerîteke dewleta zêde navendîparêz heye ku ji destpêka sedsala 19'an ve dest pê kiriye û ji dema avabûna Komarê

heta salên 2000î domiyaye. Li salên pirpartîtiyê, di çarçoveya modernîzasyon û rasyonîzasyonê îdareya gelemper de çendî xurtkirina birêvebirinên cihkî hatibe rojevê jî, lê nîqaş û gengeşî li ser nenavendîtiyeke rasteqîne bêhtir, di çarçoveya berfirehiya rayeyê de li ser xurtkirina rêxistinên cihkî yên îdareya navendî hatine kirin û lêhûrbûn ji bo vê yekê pêk hatiye.

Li salên 2000î, çendî di çarçoveya reformên YE'yê de bi ûcba xurtkirina birêvebirinên cihkî reform hatin kirin jî, lê belê bi awayekî esasî di çarçoveya berfirehkirina rayeyê de rayeyên birêvebirina navendî dan birêvebirinên taybetî yên bajarên ku ew di bin îdareya walîtiyan de ne. Di vê demê de, bi awayekî qismî rayeyên îdarî yên şaredariyan jî hatin berfirehkirin. Her wiha xweseriya îdarî û darayî ya birêvebirinên cihkî jî di nav verastkirinên qanûnî de cih girt. Tevî vê, nemaze wezaretên ku piştî 2010'an hatine damezrandin û bi verastkirinên di asta wezaretan de, îcar bi asteke şayanî dîqetê warê birêvebirinên cihkî hat bertengkirin. Xulase, di vê dewrê de ranêzikiya serdest, ne nenavendîtî lê xurtkirina kapasîteya îdarî ya li cihkiyan a navendê û ji aliyê belavetiyê ve jî dekonstrasyon bû.

Bi awayê ku bi nerîta dewleta navendîparêz re ahengdar be, li Tirkiyeyê nerîteteke siyasî ya zêde navendîparêz serdest e. Partiyên kurdî yên sereke jî tê de, ku daxwaza nenavendîtiyê dikin, hema bibêje temamiya partiyên siyasî, ew damezirawê û qad in ku vê nerîta birêvebirina navendî ya rapir ji nû ve hildiberînin. Divê neyê paşçavkirin ku çendî partî bi feraseteke nenavendîparêz di veguherîna dewletê de xwedî roleke krîtîk in jî, lê ji ber ku xwedî kevneşopiyeyeke navendîparêz in, ew bi xwe jî astengekê pêk tînin.

A dawî, bi sîstema serokatîyê ya xweserî tirkan re, meylên navendîparêz ên ku hem di rêxistinbûna dewletê hem jî di siyasî de serdest in, xurttir bûne.

Newekheviya herêmî û navendîbûna/kombûna kanên aborî

Li Tirkiyeyê kêşeya newekheviya herêmî ya kronîkbûyî û bi awayê sînorkirî kombûna kanên aborî ya li navendê, astengeke şayanî dîqetê li pêşiya parkirina hêzê û nenavendîtiyê tine pê. Ji lew re yek ji fonksiyonên sereke yên siyasî jî, birêvebirin û parkirina kanên madî û sembolîk e. Ji vî aliyê ve, di navbera parkirina hêza siyasî û navendîbûn û lêparkirina newekhev a kanên madî û sembolîk de, têkiliyeye rasterast heye.

Li Tirkiyeyê, ji ber ku dibe parkirina hêza siyasî û nenavendîtî bê mehneya lêparkirina kanên aborî yên li hin bêhtir navendan û di navbera hîn zêdetir aktorên de, aşkera

ye di warê birêvebirina kanan/çavkaniyan de ew aktor û binyatên ku li gorî nerîta navendîparêz şêkil girtine dê veguherîneke wiha tercîh nekin. Li aliyê din, newekheviya herêmî û rewşa kombûna kanan li herêmên rojava yê mîna bajarên mezin Stenbol, Îzmîr, Qocaelî û Bûrsayê ku bi qasî dîroka Komarê kevn e, dê ji bo veguherîna pêvajoyê ne tiştekî hêsan be. Berevajîkirina meyleke wiha ya dîrokî û sepana polîtîkayeke ku bikare dabeşkirina kanan a bi awayekî terazdar a mekanî dabîn bike, dê zor û dijwariyên şayanî dîqetê li xwe bigire.

Sîbera kêşeya kurdî ya li ser birêvebirina nenavendîtiyê

A çarem, divê bal li sîbera kêşeya kurdî ya li ser parkirina hêza siyasî û nenavendîtiyê ya li Tirkiyeyê bê kişandin û binî bê xêzkin. Parkirina hêza siyasî û nenavendîti, çareserîya lihevixistinên terîtoriyal ên xwedî bingeha nasnameyî hêsan dikin; lê belê bi tenê li vê meseleyê nabe bê daxistin. Ji lew re bipêşketina demokrasîyê eleqedarî ya meseleyên sereke ye; ji holê rakirina newekheviyên herêmî û bipêşketina mekanî ya terazdar, rasyonelîzasyon û modernîzasyona birêvebirina gelemper û parkirina hêza siyasî û nenavendîti.

Li Tirkiyeyê, ji bo helkirina kêşeyên ku di van her sê waran de diqewimin, dê parkirina hêza siyasî û nenavendîti fonksiyoneke giring binin cih. Tevî vê yeka hanê, kêşeya kurdî ya Tirkiyeyê ya sedsalî, dike ku di nîqaşên li ser parkirina hêza siyasî û nenavendîtiyê de ev her sê meseleyên mijara dabaşê nexuya bibin û rê li ber digire da ku ev mesele li dest neyên hildan û neyên nîqaşkin. Ji bilî vê, di nîqaşên eleqedarî meseleyê de, mesele bi cografyaya kurdan û bi kêşeye kurdan sînorkirî tê dîtin û wisan li ser tê sekinandin.

Di avakirina rejîma otorîter de amrazîkirina kêşeya kurdî

Di vê nuqteyê de ya dawî hewce pê tê dîtin ku sînorên dîrokî û rojane yê siyaseta tirkî ya sereke yê der barê kêşeya kurdî de û ranêzîkiya wê ya amrazîkirina kêşeyê bê nirxandin. Li ser vê meseleyê mijara herî giring ku divê binî bê xêzkin ev e: Li Tirkiyeyê di formasyona rejîmê de meseleya kurdî xwedî roleke krîtîk e. Ji destpêkirina salên pêşî yê Komarê heta roja me ya îroyîn kêşeya kurdî di avakirina otorîteriyê, berdewamkirin û konsolidasyona wê de wek kaneke fonsiyonel û zengîn hat bikaranîn. Ji vî aliyê ve siyaseta tirkî ya sereke gava vê rejîma otorîter ava dikir divê mirov diyar bike ku kêşeya kurdî jî ji xwe re amrazî dikir. Qada kurdî, li Tirkiyeyê bû warê bingehîn ê hilbirîna şideta dewletê û kevneşopiya sazûmanî ya ku xwe dispartê û warê sepanê. Di gel vê, qada kiryarîya hêmanên rejîma otorîter bi tenê li sehaya kurdî nema û ji herêmê belavî hemû Tirkiyeyê bû. Bi berdewamiya dîroka

Komarê, nimûneya vê rewşê ya dawî, ku em bûn şahidên mînakên wê yên cur bi cur, bêyî şik û guman politîkayên qeyûman û sepanên wan in. Tayînkirina qeyûman li wan şaredariyan ku ew di bin desthilatiya siyaseta kurdî ya sereke de bûn, wekî di dema pandemiya Kovîd 19'ê de ji hat dîtin, zemîn xweş kir ku midaxele li xebatên şaredariyên bajarên mezin ên mîna Stenbol, Enqere, Mêrsîn û Eskîşehîrê jî bikin. Dîsan, di sala 2020'î de ji derve li Zanîngeha Bogazîçiyê qeyûm hat tayînkirin ku bi vê yekê re rabêjiya "rektorê qeyûm" hat rojevê û verastkirina ji bo tayînkirina qeyûman a li ser rêxistinên civaka sîvîl, nîşan dide ku şeweya îdarekirinê ya di warê kurdî de, awayê îdarekirina giştî jî dişewîne.

Wekî di warê îdarî û siyasî de, dikare bê gotin ku meseleya kurdî di warê sosyo-ekonomîk de ji hatiye amrazîkirin. Di ekonomiya kapîtalîst de ku xwe dispêre prensîpa bipêşketina newekhev a pirtebeqeyî, newekhevî tim di nav welatan de, di nav welêt de herêm, di nav herêmê de bajar û di nav bajaran de jî bajarok û taxan de tê hilbirandin. Bi awayekî giştî ev newekhevî ji herêmên kêmbipêşketî bi transfera kanan li herêmên bipêşketî kûrtir dibe. Di vê bipêşketina newekhev de, bi nasnameyên etnîk/neteweyî, dînî/mezhebî û newekheviyên zayendiya civakî roleke fonsiyonî dileyizin û gelek caran jî ev newekheviyên pirane rastî hev tên. Bi gotineke hîn aşkeratir, di aboriya kapîtalîst de, di warê avakirina têkiliyên çînayetî de cudahiyan xwedî bingeheên etnîk/neteweyî, dînî/mezhebî û zayendiya civakî wek çavkaniyek dibin xwedan fonsiyon. Di çarçoveya kêşeya kurdî de gava tabloya sosyo-ekonomîk a Tirkiyeyê bê vekolan, tê dîtin ku rewşeke manend heye. Loma ji vî aliyê ve, kevneşopiya dîrokî ya der barê pêvajoya çêkirina çînî (sinifî) ya bi palpiştiya nasnameyên etnîk/neteweyî de û aktor û teşekulên ku di vê dewrê de pêk hatine, li pêşiya veguherîneke siyasî, sazûmanî û civakî ya li hêla ters dibin asteng ku şayanî dîqetê ye.

Sînorên siyaseta tirkî ya sereke yên eleqedarî kêşeya kurdî, çareseriyê li ser binyata parkirina hêza siyasî û nenaventîtiyê ya kêşeyê zor û dijwar dike. Der barê mijarê de, herî hindik di sê waran de sînor hene ku bihartina ji wan zor e. Ji van a pêşî ew sînorên fikirî û entelektuelî ne. Somdariya meseleyên etnîk/neteweyî, ew dînamîkên wan ên ku derketine holê û di warê formasyon û çareseriyê de civariyeke fikirî û entelektuelî ya ku helkirina meseleye temîn bike têra xwe sînordar e. Siyaseta tirkî ya sereke bi awayekî giştî ji bo meseleyên nasnameyî yên etnîk/neteweyî û dînî/mezhebî, bi taybetî texeyula wan a ji bo çareseriyê meseleya kurdî, asoyeke berfireh pêşkêş nake. Kêşeyên binyat-nasnameyî û meseleya nenaventîtiyê, bi taybetî mîna welatên Ewropayê ku li wan welatan demokrasiya lîberal û sosyal serwer e, bi rêjeyeke girîng hatin çareserîkirin. Di vê mijarê de, ji aliyê ramanî ve civariyeke hêjayî dîqet û balê çêbû. Tevî vê yekê, li Tirkiyeyê ne nerîta siyasî ya rastgir a sekuler ne jî nerîta

siyasî ya rastgir a îslamî ya mihafezekar, ne xwedî civariyeke ramanî û îdeolojî û wê formasyonê ne ku wekî meseleya kurdî bikarin ji bo meseleyên etnîk/neteweyî rêyên çareseriyê pêşkêş bikin.

Siyaseta tirkî ya sereke, wek pêwendiya bi sînorên ramanî û entelektuelî re, ji hêla siyasî ve jî xwedî sînorên wisan e ku bihartina ji wan ne hêsan e. Li Tirkiyeyê der barê mijara parkirina hêza siyasî û nenavendîtiyê de, civariya nîqaşa siyasî û pêşniyazên li ser çareseriyê yê şayanî balkêşiyê pêk nehatiye. Nîqaşên têkildarî meseleyê, heta îroj, ji modernîzasyon û rasyonelîzasyonê birêvebirina gelemper wêdetir nêçûne. Heta roja îroj ji hêla partiyekê ve parkirina hêza siyasî û demokratîkbûyîn, bipêşketina sosyo-ekonomîk, bipêşveçûyîna mekanî ya terazdar û dabeşbûna kanan/çavkaniyan, pêşniyazên çareseriyê siyasî yê ku di heqê lihevexistinê binyat-nasnameyî de eleqeyê saz dikin, ji civakê re nehatine pêşkêşkirin û gengeşkirin. Eger nîqaşên li ser federasyonê yê di salên 1990'î de û piştî 2010'an jî bi awayekî qismî nîqaşên sînodar ên têkildarî sîstema eyaletan li aliyekî bîst hiştin, dikare bê gotin ku di vî warî de valahiyeke mezin heye. Jixwe tam ji ber vê valahiyê, ew reforma birêvebirina gelemper ku di dema 2004-2007'an de hatibû rojevê, çendî di esasê xwe de konsantrasyon û berfirehkirina rayeyên şaredariyan bi awayekî sînodar derdibirî jî, lê siyaseta rastgir a sekuler ev wek dabeşbûn û parçebûnê, siyaseta rastgir a îslamî ya mihafezekar a xwedî projeyê jî, ew wek şoreş pêşkêş kir.

Di gel sînorên di warê ramanî û entelektuelî û yê di warê siyasî de, divê binê sînorên li asta mobîlîzasyonê civakî jî bîst xêzkirin. Bi qasî partiyên siyasî û tevgeran, mobîlîzasyonên siyasî û civakî yê ku alîgirên wan xwe dispêrin wan jî, der barê meseleya kurdî de parkirineke hêza siyasî û nenavendîtiyê ya li ser bîngeha çareseriyê zor dike. Ji lew re di encama pêvajoyên mobîlîzasyonên siyasî de ew ên ku bi palpiştiya salan çêbûne, hema bibêje di nav hemû alîgirên partiyên siyasî de çandeke siyasî pêk hatiye ku politikayên nasnameyî yê pluralîst û parkirina hêza siyasî red û veder dikin. Ji vî aliyê ve bi qasî qada ramanî û entelektuelî û qada siyasî, dikare bê gotin ku di qada civakî de jî kapasîteya ku çareseriyê nenavendîparêz a bihêla "çîroka" meseleya kurdî ya sedsalî bê îdrakkirin û derfet bide parkirina hêza siyasî, têra xwe çênebûye.

Dameziraweya siyasî dikare li teşebusên ji bo bihartina ji sînorên der barê kêşeya kurdî de pêşewatî bike. Di gel vê, siyaseta tirkî ya sereke ne xwedî hilberîna ji bo çareseriyê ye û ya rast meseleya kurdî amrazî dike. Ev ranêzikî carinan wekî ku bixwaze lihevexistina kurdî bi rabêjiyên aştî û diyalogê sekan bike tê holê, lê carinan jî bi rabêjiyên "teror û ewlehiyê" wek şideta dewletê tê himatê. Ya rast her du siyasat jî ne çareserkerina meseleyê, lê ji bo hêvişandina têkiliyên hêzê yê li Enqereyê yan jî

sazkirina wan a ji nû ve hildide navendê. Pêvajoyên diyalog û çareseriyê yên ku piştî 1999'an pêk hatin û piştî ew dewrên vegerîna li şidetê, wek nimûneyên tîpîk ên aqilê amrazî dikarin bên nirxandin.

Der heqê vê xalê de, xisûsa herî giring ev e: Ev ranêzikî di tevahiya siyaseta tirkî ya sereke de serdest e. Der barê kêşeye kurdî de, ku hema bibêje nêzikî du qirnan temenê wê heye û ji aliyê mirovî û darayî ve jî bûye sedema ziyanên mezin, îroj nebûna modeleke çareseriyê ya tu partiyeke siyaseta tirkî ya sereke, vê argumanê teyîd dike. Di serî de meseleya mafên zimanî û çandî ku xisûsên wekî perwerdehiya bi zimanê dayikê û zimanê fermî dihewîne; verastkirinên îdarî-siyasî yên wekî xurtkirina birêvebirinên cihkî û nenavendîtîyê; meseleya şidetê ku rehendên wê yên wekî jiçekkirin, verastkirina artêş û polîsan a ji nû ve, jicihkirina bi zorê, windahî, rarûbûna bi raboriyê re û derxistina holê ya heqîqetan hene; der heqê parametreyên sereke yên meseleya kurdî de tu partiyeke tirkî ya sereke nîn e ku pêşniyazeke wê ya çareseriyê ya sistematîk hebe.

Derfet, Çavkanî û Firsend

Ew astengên ku li jorê hatin hejmartin, didin nîşandan ku pir zor e li Tirkiyeyê verastkirineke nenavedîparêz a siyasî û îdarî çêbe ku parkirina hêza siyasî pêk bîne. Lê tevî vê yekê derfet, çavkanî û firsend jî hene ku ew dikarin bibin sedema xwe xelaskirina ji van zorahî û dijwariyan. Ew nîqaşên ku di beşên berê de hatine kirin eger li pêş çav bîn girtin, herî hindik binê heşt derfet/kan û firsendan dikare were xêzkirin:

1. Civariya dîrokî ya der barê nenavendîtîyê de
2. Azmûna birêvebirina cihkî û herêmî ya ku di warê konteksta birêvebirina gelemper de derketiye holê
3. Reformên piştî 2000'î yên têkildarî îdareya cihkî û herêmî
4. Firsenda modernîzasyon û rasyonelîzasyonê ya di birêvebirina gelemper de
5. Firsenda bipêşketina sosyo-ekonomîk û mezinbûyîna mekanî ya terazdar
6. Nexşeya siyasî ya Tirkiyeyê û pêwîstiya bi birêvebirina nenavendîtîyê
7. Pergala Birêvebirinê ya Serokkomariyê û wek hêzeke teraz û pişkinanê birêvebirinê cihkî
8. Di navbera partiyan siyasî yên sereke de mitebeqata der barê xurtkirina birêvebirinê cihkî de

Civariya dîrokî ya der barê nenavendîtiyê de

Civariya dîrokî ya ku der barê mijara parkirina hêza siyasî û nenavendîtiyê de heye, li Tirkîyeyê ji bo veguherîna siyasî û îdarî îmkana pêşî pêk tîne. Ji bo vê mijarê hewce pê heye ku bal li ser sê kanên giring bê kişandin. A ewilî, îroj çendî ku daxwazên ji bo xweseriyê yan jî rabêjiya “Kurdistan”ê wekî ku di nav siyaseta tirkî ya serwer de nayên qebûl kirin bê nixandî jî, di serdema osmaniyan de xweseriyên kurdan ên di asta cihkî de ku heta nîveka sedsala 19’an domiyane, wek mîraseke giring a îdarî û siyasî heye. Siyaseta tirkî ya sereke û tevahiya partiyên, çendî ku li kevneşopiya osmanî bibin xwedî jî, lê ew xwe li nedîtina vê mîrasa hanê ya di nav vê nerîtê de datînin. Tevî vê yekê jî, di Pêvajoya Çareseriyê 2013-2015’an de, bibîrxistina serokwezîrê wê demê Recep Tayîp Erdogan a li ser sistema eyaletan a li nav osmanî, amajepêkirina bi hebûna eyaletên Kurdistan û Lazistanê, dide nîşandan ku tecrubeyên dîrokî dibe ku wek çavkaniyek bîn nixandî.

A duyem, nemaze li destpêka sedsala 20’î divê bal li nîqaşên der barê nenavendîtiyê de bê kişandin ku Prens Sabaheddîn pêşengî li wan fikir. Nîqaşên ku wê demê hatine kirin, hem ji aliyê civariya ramanî û entelektuelî ya der barê meseleyê de hem jî ji ber ku nimûneya birêxistinbûna siyasî û mobilîzasyonê ya ku xwe dispêre vê rabêjiyê pêşkêş dike, çavkaniyeke giring pêk tîne.

Wek a dawî, Makeqanûna 1921’ê wek mîraseke dîrokî ya giring li rastê ye. Ji bo ku meseleya kurdî bi awayekî mayînde çareser bibe, pêdivî bi pergaleke siyasî ya nû û bi peymaneke civakî heye. Ji ber vê rewşê, divê not bê hildan ku meseleya kurdî kêşeyêke makeqanûnî ye. Makeqanûna 1921’ê, ku di salên avakirina Komarê de hatiye amadekirin û xudmixtariya (xweseriyê) wilayetên li xwe digirt, ji vî aliyê ve dibe ku ew bibe xwedî fonksiyona çavkaniyeke giring.

Azmûna birêvebirina cihkî û herêmî

Li Tirkîyeyê azmûna birêvebirina cihkî û herêmî ya ku bi berdewamiya dîroka Komarê çêbûye, çavkaniyeke din a giring e. Der heqê vê mijarê de hewce ye ku hem ji birêvebirinên cihkî ku ew ji wilayet, îdareya taybetî ya bajarna, şaredarî û mixtariyan pêk tê hem jî ji teşkilatên cihkî û herêmî yê wezaretan bê behskirin.

Azmûna birêvebirina cihkî û herêmî ya li Tirkîyeyê, bi awayekî esasî li ser prensîpa dekonstrasyonê şêkil girîtiye. Îdareya gelemper a cihkî û herêmî dirêjeyên birêvebirina navendî pêk tînin. Di gel vê, kapasîteya cihkî û herêmî ya ku kevneşopiya îdareya sedsalî ew derxistiye holê, ji bo binyateke nenavedîparêz a îdarî û siyasî jî

çavkaniyeke fonksiyonî pêşkêş dike. Ji vî aliyê ve dekonsantrasyon, ji bo derbasbûna li binyateke nenavendîparêz zemîneke guncan çêdike. Wek nimûne, eger walî bên hîlbijartin û wek şaredariyan walîtî ji hêla hîlbijartiyên ve bê îdarekirin, dibe ku li ser veguherîna birêvebirina wilayetan a heyî di asta bajêr de sistemeke nenavendîtiyê were damezirandin.

Li ser vê mijarê divê ku binê tecrubeya şaredariyan jî bê xêzkirin. Azmûna şaredariyan a sedsalî, ji bo parkirina hêza siyasî û nenavendîtiyê çavkaniyeke giring e. Tevî wesayeta birêvebirina navendî ya siyasî, îdarî û malî, hem ji bo cihkîbûyîn û civakîbûyîna siyasî hem jî ji aliyê çêbûna hêzeke terazîker a li dijî îdareya navendî, ji bo pergala demokratîk a Tirkiyeyê binyateke giring a sazûmanî û nerîtekê temsîl dike. Loma ji ber vê yekê, li Tirkiyeyê palpiştî sereke ya reformeke ji bo nenavendîtiyê, şaredarî ne.

Teşebusên reformên birêvebirina gelemper

Teşebusên reforma îdareya gelemper û encamên wan teşebusan ku bi salên 2000'î re hatin rojevê û bi verastkirinên cur bi cur domiyên, der barê mijara parkirina hêza siyasî û nenavendîtiyê de îmkaneke/çavkaniyeke din a giring e. Di navbera 2004-2007'an de naskirina îdareyên taybetî yê bajaran û xweseriya îdarî û siyasî ya şaredariyan, xisûseke din e ku divê bal lê be. Çendî li Tirkiyeyê xweseriya birêvebirinê cihkî di qada siyasî de hema bibêje wek tabuyekê tê nixandî jî, di çarçoveya reforma îdareya gelemper de hem xweseriya îdarî û darayî ya birêvebirinê taybetî yê bajaran hem jî yê şaredariyan hat naskirin û ev yek di nav qanûnên qebûlkirî de cih girt. Her çendî sînorên vê xweseriya hanê berteng bin jî, lê di nav hiqûqa birêvebirinê cihkî de cihgirtina vê xweseriya îdarî û darayî referanseke giring e.

Avakirina ajansên geşepêdanê yê ji bo herêmîkirina sê qedemeyî û bîst û şeş herêmên qedemeya duyem ku di çarçoveya birêvebirina gelemper de derketine holê, wek derfeta din a giring dikare bê nixandî. Ev verastkirinê mijara dabeşê, çendî di çarçoveya prensîpa dekonsantrasyonê de wek yekeyên girêdayî îdareya navendî bên veavakirin jî, lê der barê mijara plansaziya sosyo-ekonomîk de kapasîteyê îdarî ya hêjayî dîqetê pêk anî. Vê kapasîteyê jî aliyekî ve di asta herêmî de ji bo nenavendîtiyê îdarî derfet pêşkêş dike ji aliyê din ve jî firsêd dide ku di navbera nenavendîtiyê parkirina hêza siyasî û her wisan di navbera bipêşketina sosyo-ekonomîk, dabeşkirina kanan/çavkaniyan û bipêşketina mekanî ya terazdar de têkilî bê danîn.

Wek a dawî jî divê binê qanûna xwedî hejmara 6360'yî, ku di 2014'an de ket meriyetê

û qanûna ku binyata şaredariyên bajarên mezin diguherîne, bê xêzkirin. Tevî hemû sînora û kêşeyên wê, bi awayekî dîmaneyî jî be, verastkirina ku ji bo xurtkirina şaredariyên metropolîten ên li sî bajarên mezin hatin kirin, ku zêdetirî jî çaran sisêyê nifûsa Tirkiyeyê li wan dijî, li Tirkiyeyê nemaze di asta herêmi de dikare zemînekê jî nenaventîtiyê re çêke.

Firsenda îdareyeke gelemper a modern û rasyonel

Li dinyaya me ya îroj ku guherîn û nediyariya berdeyam lê serdest e, sistêmên hilberîn û mezaxê çêşiddar û cihkî dibin, lezgînî û elastîkî giring dibin, avakirina îdareyeke gelemper a rasyonel û modern a ku feydeya gelemper hildide navendê pêwîsttir dibe. Çawan ku pêvajoya pandemiyê ya Kovîd 19'ê jî nîşan dide, ew binyatên ku hêz û raye li wan navendî dibin, tam berevajî îdîayan, jî pêşkêşkirina xizmeteke gelemper a çalak û berdara dîr e. Loma jî ber tesbîta kêşe û pêdiviyana a bi awayê rast û lezdar; plansaziyeke giştgir û elastîkî, sepana li ser bingeha mobilîzasyona pir-çavkanî, sistema şopan û venêrinê ya ku xwe dispêre beşdariya welatî û civaka sivil hewce bi birêvebirineke gelemper a nenaventîparêz heye.

Reformeke giştgir a nenaventîtiyê ku ji bo cudahiyên cihkî hesas e, di serî de kûranên (hewzeyên) avê, cografîyayên fîzîkî, guherbariyên aborî, civakî û demografîk li pêş çav digire, dê îdareya gelemper modernîze û rasyonelîze bike û binyateke çalak û berdara a di warê pêşkêşkirina xizmetan de derxe holê. Teşebuseke wiha ya ji bo reformê dê firsendên başkirina pêvajoyên plansaziya cihkî û herêmi, pêkanîna aheng û tevahiyê ya di wexta pêvajoyên tetbîqê de û birêvebirineke çavkaniyan a başkirî ya malî, însanî û xwedî zanyariyê, pêşkêş bike.

Firsenda bipêşketina giştgir û mekanî ya terazdar

Di warê sosyo-ekonomîk de kevneşopiya birêvebirina navendîparêz a sedsalî, ku ji aliyekî ve bipêşketinê sînodar dikir jî aliyê din ve jî di navbera bajar û herêman de newekheviyeke qirase derxist holê. Jixwe di vî terzî de ku li tu welatekî bipêşketî yê civaka Rojava nayê dîtin, li Tirkiyeyê jî 1975'an bi vir de zêdeyî sî milyon kesî jî bo jiyanê hîn baştir jî cihên xwe yên li wan dijiyan, bar kir devereke din, ku bi pîranî ew bajarên metropol bûn. Ev nîşan dide ku ji yekûna nifûsê %40' û jî nîvî zêdetir jî nifûsa kesên temen mezin koç kiriye (Ağirdir 2020, 274–78). Ev tablo bi tena serê xwe jî serneftîbûna îdareya navendîparêz a di warê bipêşketina aborî û civakî de diselmîne.

Parkirina hêza siyasî û nenaventîti, dikare ji bo Tirkiyeyê firsenda bipêşketina mekanî ya terazdar pêşkêş bike. Cihkîbûyîn û herêmbûyîna di warê birêvebirina

aborî û civakî de berî her tiştî di warê diyarkirina polîtîkayên sosyo-ekonomîk de dê başbûneke hêjayî dîqetê pêk bîne. Ji lew re, ji binyateke îdarî ya zêde navendîparêz cuda, lê di rewşeke wisan de ku birêvebirinên cihkî û herêmî xurt in pêdiviyên li cih bi awayekî rast û lezgîn dên bên diyarkirin, bi qasî derfet û çavkaniyan bi awayekî rast dê kêmasî û asteng bên analîzkirin û bi awayekî lezgîn jî dê întîbaq li şertên ku diguherin bê kirin. Li şûna ku polîtîkayên sosyo-ekonomîk û plansaziyên hemû bajar û herêman li Enqereyê bên diyarkirin, li her cihkî û herêmê diyarkirina polîtîka û amadekirina plansaziyan dê çareserîya kêşeyan û bipêşketina sosyo-ekonomîk rihet bike. Di binyateke wiha de, fokusbûna îdareya navendî ya li kêşeyên hevpar û di navbera bajar û herêman de pêkanîna teraz û hevahengiyê dê hêsantir bibe.

Bi qasî pêvajoyên diyarkirina polîtîkayê û plansaziyê, birêvebirin û mobîlîzasyona çavkaniyên mirovî, madî û binyat-zanyarî jî dê di îdareyeke gelemper a nenavedîparêz de bibe xwedî rewşeke hîn çalak û berdardar. Ji lew re bi qasî pêvajoyên diyarkirina polîtîkayê û plansaziyê dê pêvajoyên sepanê jî baş û xweş bibin. Di rewşa heyî de kanên bajar û herêman, li bajar û herêmên di bin bandora qada wan bajarên de yên mîna Stenbol, Enqere, Îzmir, Antalya û Edene-Mêrsînê tên veguhastin (Keyman û yd. 2017, 21–23; O. Işık 1995). Di pey 1980'yî re, çendî li van navendan bajarên wekî Eskîşehîr, Qeyserî, Qonya û (Xazî)Entebê zêde bûbin jî (Keyman û yd. 2017, 195–203), lê bipêşketina newekhev a mekanî bipêşketineke giştî asteng dike û dibe sedem ku çavkaniyên din ên li herêmên lipaşmayî yên welêt bi têra xwe neyên nirxandin. Her cihkî, kêşe, pêdivî û çavkaniyên xwe yên heyî ji Enqereyê baştir dizane. Loma ji vî aliyê ve nenavendîtî dê mobîlîzasyona çalaktir a hîn zêde, çavkaniyan dabîn bike. Her wiha, ji navendê veguhastina pêvajoyên biryar û sepanê li cihkî û herêman jî dê şopan û kontrola van pêvajoyan hêsan bike.

Nenavendîtî, di qada civakî û aborî de jî xwedî potansiyela çêşiddarî û reqabetê ye. Ji lew ra tabloya sosyo-ekonomîk a bajar û herêman, di asta balkêşiyê de jî xwedî cudahiyan e. Wek nimûne, Stenbol li aliyekî bi dîmena xwe ya kurewî ya bajêr ji hemû bajarên mayî yên Tirkiyeyê cihê ye, li aliyê din jî di nav bajarên din de cudahiyan wê yên hêjayî dîqet û balkêşiyê hene (Ağrıdır 2020, 86–87). Enqere, di warê sektora xizmetê û hilberandina teknolojiyê de bajarekî bipêşketî ye. Antalya jî di warê tûrîzm û çandiniyê de geşe bi xwe dide. Li hêla din, li Eskîşehîrê jî hilberîna xwedî dahata bilind û çalakiyên lêgerîn û bipêşxistinê kom bûne. Dîsan li bajarên mîna Qonya, Qeyserî û Entebê di warê pîşesaziya îmalatê de mesafeyê şayanî dîqetê pêk hatiye. Di gel vê li xeta Edene-Mêrsînê tevî çandiniyê sektora lojîstîkê jî bi pêş ketiye. Li Wanê bazirganiya wî aliyê sînor li pêş e (Keyman vd. 2017). Ji bo mezînbûyîneke giştî a ku van hemû cudahiyan li pêş çav digire, di warê birêvebirina aborî û civakî de hewcehî bi mekanîzmeyeke biryarê ya cihkîbûyî û çêşiddarbûyî heye.

Bêguman îdareyeke gelemper a nenavendîparêz dê bandora xwe ya herî giring di warê belaviya bipêşketina mekanî ya sosyo-ekonomîk de nîşan bide. Bi binyateke nenavendîparêz re ya ku xweseriya darayî li xwe digire, qet nebe dê bikare pêvajoya transfera çavkaniyan a di navbera herêman de bide sekinandin. Di navbera çavkaniyên ku ji bajar û herêman hatine bidestxistin û di yêr xerckirinên gelemper de, ku li van devran hatine kirin, dikare terazek bê temînkirin. Her wiha, ji bajar û herêmên bipêşketî dikare bi awayekî “terazîker” veguhastina çavkaniyan li bajar û herêmên lipaşmayê bê kirin da ku newekheviya dîrokî ji holê bê rakirin. Meyleke wiha, dê ne bi tenê rê veke ku di warê perwerdehiyê de lîse û zanîngehên baş an jî di warê tenduristiyê de nexweşxaneyên xwedî tesîsatên tam ne bi tenê li Stenbol, Îzmîr û Enqereyê çêbin, dê bike ku li hemû herêman ev yek pêk were. Di vê mijarê de, li tevahiya heştê û yek bajarî nebe jî, lê belê li her sî bajarên mezin di warê wesfên xizmetên gelemper de başkirin û xweşkirinek dikare bê dabînkirin. Dîsan, wekî pandemiya Kovîd 19'ê, di rewşa krîzan de li hemberî şertên cihkî yên ku cihêreng dibin an jî di rewşên felaketan de mîna erdhejê, pêwîstî bi pêvajoyên elastîkî, lezgîn û birêvebirina ji cih heye. Loma birêvebirineke gelemper a ku bi feraseteke nenavendîparêz hatiye xurtkirin û cihkîkirin, tevî rewşên asayî, di rewşa krîzan de jî dê hîn çalaktir bibe.


Nexşeya siyasî ya Tirkîyeyê û pêwîstiya bi birêvebirina nenavendîtiyê

Ji aliyê nenavendîtiyê ve nexşeya siyasî ya Tirkîyeyê jî çavkaniyeke giring pêşkêş dika û ji bo pluralîstbûna siyasî û da ku bigihîje avaniyeke reqabetkar, firsendên şayanî dêhn û balê derpêş dika. Xebatên hîlbijartinê nîşan didin ku Tirkîye ji aliyê siyasî ve herêmî bûye û cografîyayên siyasî yên cuda çêbûne. Bi ser de cudabûnên ku di warê siyasî yên cografîyayan de qewimîne, bi awayekî dîmaneyî îstiqrarê nîşan didin.

Lêkolîna bi navê *Türkiye Seçim Atlası: 1950-2009* (Atlasa Hilbijartinê ya Tirkîyeyê: 1950-2009) ku ji aliyê Murat Guvenç û Hasan Kîrmanoglu ve hatiye kirin, nîşan dide ku cografîyaya siyasî ya li Tirkîyeyê li ser du tewereyan şêkil girtiye. Ji van a yekem meseleya kurdî ya din jî newekheviyên sosyo-ekonomîk e. Encamên hîlbijartinê yên nêzikî şêst salan nîşan dide ku Tirkîye li ser van her du tewereyan, li sê cografîyayên sereke dabeş bûye: (1) Cografîyaya kurdan ku wek Herêma Rojhilat û Başûrê Rojhilatê Anadolîyê hatiye binavkirin, (2) Herêma Anadolîya Hundirîn û Herêma Deryaya Reş ku wek Anadolîya Navîn û Bakurê Rojhilatê Anadolîyê hatine binavkirin û ya dawîn jî (3) Herêma Marmarayê û qeraxê peravê ku mîna Marmara, Anadolîya Rojava û Başûrê Rojavayê Anadolîyê hatine binavkirin. Li gorî êncamên lêkolînê, li cografîyaya siyasî ya yekem bi giranî yên serbixwe, li cografîyaya siyasî ya duyem partiyên li “rastê navend rastê” û li cografîyaya sêyem jî partiyên “navend çep” û “navend rast” xwedî

alîgirên civakî yên xurt in (Bkz.: Şekil 4) (Güvenç & Kirmanoğlu 2009, 124–25).

Şekil 4. Cografyayên siyasî yên Tirkîyeyê û meylên politik (1950-2009)



Xebatên ku ji aliyê KONDA'yê ve di navbera salên 2011-2020'î de hatine kirin jî, senifandineke mîna ya cografyayên siyasî pêşkêş dike (Ağrıdır 2020, 206–21). Li gorî vê, cografyayên siyasî yên Tirkîyeyê ji aliyekî ve li gorî meseleye kurdî ji aliyê din ve jî li gorî asta bipêşketina sosyo-ekonomîk şekil digirin. Li aliyê beşa rojavayê welêt, di navbera asta bipêşketina sosyo-ekonomîk û cudahiyan nasnameyî yên sekuler/ dîndar-mihafezekar de korelasyonêk tê dîtin. Li Tirkîyeyê li ser teweriyên mijara dabaşê, bi awayekî serkî ku were gotin, sê cografyayên siyasî yên sereke hene. Ji van a yekem cografyaya kurdan, a duyem Herêmên Marmara, Ege, Egeya Navîn û Deryaya Spî û ya sêyem jî Herêmên Anadoluya Naverast û Deryaya Reş e. Di warê şekilgirtina nexşeya siyasî ya cografyaya kurdan de dînamîka sereke cihêwaziya kurdî/tirkîtiyê ye û ev cografya ji aliyê sosyo-ekonomîk ve jî herêma herî dezavantaj a welêt e. Li hêla din herêma duyem ji aliyê sosyo-ekonomîk ve herêma herî biavantaj e û bi awayekî pîranî siyaseta sekuler lê destek werdigire. Berevajiyê vê yekê, cografyaya siyasî ya sêyem ji aliyê sosyo-ekonomîk ve bi qiyasa li gorî herêma yekem xwedî avantaj e, lê belê bi qiyasa li gorî herêma duyem herêmeke dezavantaj li xwe digire û bi awayekî bîngêhîn xwedî wesfêkî dîndar/mihafezekar e. Li gorî xebatên KONDA'yê, li xeta peravê ya Tirkîyeyê bi awayekî zêde CHP û bi şeweyeke qismî ÎYÎ Partî lê serdest e, li cografyaya kurdan îroj partiyên kurdan ên sereke ku HDP temsîla wan dike, herî zêde

xwedî desteka civakî ne. Îcar li herêmên Anadolîya Naverast û Deryaya Reş AK Partî û MHP herî zêde rayan distînin.

Xebatên ku hatin kirin, çendî nîşan bidin ku wek sosyo-ekonomîk, çandî û siyasî Tirkîye ji sê cografyayên sereke pêk tê jî, lê divê bal lê bê kişandin ku di nav her yekî ji wan de jî cihêtî û cihêrengî hene. Di navbera Îzmîr û dorhêla wê ku li xeta peravê dimîne û ya Hêrêma Antalyayê de, hem ji aliyê siyasî hem çandî hem jî ji aliyê sosyo-ekonomîk ve ferqên girîng hene. Xeta Edene-Mêrsînê jî xwedî dîmeneke din e. Dîsan li Herêma Anadolîya Naverast li bajarên wekî Eskîşehîr, Enqere, Qonya û Qeyserî, Enteb û Trabzonê her bajarek bi xwe jî xwedî cudahiyan mihîm in. Heman rewş, li cografyaya kurdan ji bo metropolên wekî Amed, Ruha, Mêrdîn û Wanê û li herêmên di bin tesîra qada wan de jî derbasdar e. Loma ji vî aliyê ve gava li Tirkîyeyê yekeyên ku nenavendîtîbûyîn xwe bispêre wan bîr diyarkirin, ne tenê ev her sê cografyayên siyasî yên sereke, divê di heman demê de cudahiyan di navbera van her sê herêman de jî li pêş çav bîr girtin.

Gava li tevahiya Tirkîyeyê avaniyeke nenavendîparêz bê avakirin, vîzyonên siyasî yên cuda dikarin li cihê û herêman bi awayekî hîn çalak cihgir bibin. Ev rewş dê bike ku siyaseta cihê û pluralîze bibe û dibe ku alîkarî li xurtkirina reqabeta siyasî jî bike. Her wiha nenavendîtî dikare bike ku di nav domana demê de partî cihê bibin û alîkarî li veguherîna siyaseta demokratîk bikin. Ji lewre li Tirkîyeyê siyaseta bi rêjeyê gelek zêde li navendê tê kirin. Di wexta hîlbijartinê cihê de jî reqabeta li navbera partîyan di esasê xwe de li çapana neteweyî li ser meseleyên siyasî teşe digire. Yê din, wek partîyên siyasî û dameziraweyên ku çanda siyasî ya zêde navendîparêz û binyat-pêşewayî ew hîlberandine, dibin xwedî fonksiyon. Ji vî aliyê ve nenavendîtî dikare bike ku li Tirkîyeyê siyaseta û partîyên siyasî cihê bibin û di navbera siyaseta û jiyana rojane de jî pêwendiyê xurt çêke.

Wek hêzeke teras û pişkinanê birêvebirinê cihê

Nenavendîtî dikare mekanîzmayên teras û pişkinanê xurt bike û li Tirkîyeyê alîkarî bi avakirina cudabûna şiyanan/karînan û parkirina hêza siyasî bike. Bi awayekî esasî li Tirkîyeyê mekanîzmayên teras û pişkinanê, ji aliyê tîkiliyan di navbera qanûnsazî, bicihanîn û darazê de tîr nixandî. Lê hal we ye qadên zanîngeh, medya û aboriyê, tevgerên civakî û wekî rêxistinên civaka sîvîl avanî û aktor jî li demokrasîyên ku xweş dixebitin, parçeyên sîstema teras û pişkinanê ne.

Li aliyê din, ew mekanîzmayên ku li jorê hatin hejmartin, mistewiya berane ya sîstema teras û pişkinanê derdibin. Ji aliyê mehneya rasteqîn ve ji bo ku parkirina

hêzê û pêkanîneke teraz û pişkinanê ya biberanber, divê di rêxistinbûna dewletê de jî di mistewiya asoyî de teraz û pişkinanek were pêkanîn. Avaniyeke nenavendîparêz dê di mistewiyeke asoyî de derfet bide ku hêzeke aborî, siyasî û çandî ya cihkî derkeve holê da ku navendê teraz û kontrol bike. Her wiha, bi xurtbûna birêvebirina cihkî re dê derfet bide wê yekê ku di mistewiya berane de jî di navbera birêvebirinên cihkî û herêmî de teraz û pişkinanekeke beranber çêbe.

Avakirina mekanîzmayên teraz û pişkinanê, çendî kêşeyeke dîrokî be jî nemaze ji sala 2017'an bi vir ve bi Sîstema Birêvebirina Serokkomariyê re ku di sepanê de ye, bêhtir bû xwedî giringiyê.

Ji vî aliyê ve nenavendîtî ji bo ku Tirkiye ji pêvajoya konsolidasyona otorîter derkeve ku di van salên dawî de ketibûyê û demokrasiyê damezirîne, xwedî giringiyê ye.

Wek dawî, divê di nav mixalefetê de bal li çêbûna mitabeqata der barê "sîstema parlamenter a xurtkirî" de bê kişandin. Nîqaşên li ser guherîna sîstemê, hem ji bo veavakirina ji nû ve ya siyasî hem jî ji bo ya îdareya gelemper bi feraseteke nenavendîparêz, firsendeke giring pêşkêş dibe. Tevî vê, ji ber ku ev nîqaşa hanê bi tenê li pêkanîna cudabûna şiyanan a di navbera qanûnsazî, bicihanîn û darazê de û li xurtkirina parlamentoyê nayê îrcakirin, giring e. Ev nîqaşên hanê yên li ser sîstemê, ji ber ku mekanîzmayên avaniyên ji bo teraz û pişkinanê yên ku dê li ser mistewiyeke berane û tîkane bîn avakirin li xwe digire, dê firsendeke giring pêşkêş bike da ku Tirkiye ji meyla otorîterbûnê derkeve û cardin berê xwe bide demokrasiyê.

Mitebeqata siyasî ya der barê xurtkirina birêvebirinên cihkî de

Di nav partiyên mixalefetê de, bi qasî giringiya meyla lihevkerina li ser mijara sîstema parlamenter a xurtkirî, mijara din jî ew mitabeqata li ser xurtkirina birêvebirinên cihkî ya di navbera partiyên siyasî yên sereke de ye. Çendî li ser modeleke berbiçav lihevkerinek tune be jî, lê bi taybetî ji ber ku partiyên mixalif der barê vê mijarê de xwedî vîzyoneke siyasî û rabêjiyeke hevpar in, ev yek der barê babeta nenavendîtîyê de îmkaneke giring pêşkêş dibe.

Wekî ku di beşên berê de jî bal lê hat kişandin, HDP birêvebirinên xweser ên cihkî û herêmî diparêze. CHP jî dadixuyîne ku dê şerhên li ser Şertê Xweseriya Birêvebirinên Cihkî yê Erûpayê hilne û dê bi awayê ku li gorî vê yekê be, birêvebirinên cihkî bîn xurt û hêzdarkirin.

Partiyên mixalefetê yên din jî reforma îdareyên cihkî diparêzin. ÎYİ Partî ku di bin rêberiya Meral Akşener de li Çiriyê Pêşîn a sala 2017'an hat avakirin û her ku diçe

zêdebûna alîgirên wê balê dikişîne ser xwe, gava cara pêşî ket hilbijartinê cext li ser “demokrasiya cihkî” kir û wek “hedefa berêtiyê divê ku pêdiviyên xizmetê yên gel ji aliyê yekeya xizmetê ya herî nêzik ve bê bicihanîn” pêşkêşî raya giştî kir. ÎYÎ Partî “Qanûna Îdareyên Meheli” û verastkirina ji nû ve ya îdareyên cihkî wehd dike. Vê wehda hanê bi demokrasî û modernîzasyon û rasyonelîzasyona birêvebirina gelemper re eleqedar dike (ÎYÎ Partî 2018, 33).

Partiya Saadetê jî diyar dike “ji bo ku demokrasî cihgir bibe, rejîmeke siyasî ya beşdar û pluralist pratîze bibe, divê ku sîstema îdareyê li gorî îhtiyacan biguhere” û reforma birêvebirina cihkî pêşniyaz dike. Partiya Saadetê ku reforma birêvebirina cihkî bi qasî demokrasîyê bi rasyonelîzasyon û modernîzasyona îdareya gelemper re eleqedar dike, li gorî partiyên din dixwaze ku hîn zêdetir raye ji bo birêvebirinên cihkî bîn naskirin. Ew cext û balkêşana ku di bernameya Partiya Saadetê de heye ku tê de dibêje “wezîfeyên îdareya navendî yên ku li derî xizmetên giştî û mecbûrî yên mîna parastin, polîtîkaya derve, edalet, ewlehiya navxweyî, bac û koordînasyona xizmetan dimînin, dê bi bernameyê diyarkirî li bajar û birêvebirinên cihkî bîn dewrîkirin”, bi qiyasa li partiyên sereke yên tirkî der barê nenaventîtiyê de çarçoveyê reformê ya hîn bipêşketî derpêş dike (Saadet Partisi 2019, 35).

Partiya Dahatûyê (*Gelecek Partisi*) ku di Kanûna Pêşîn a sala 2019’an de bi pêşewatiya Ahmet Davutoglu hat avakirin, wekî ÎYÎ Partî û Partiya Saadetê bi sedemên demokratîkbûyîn û rasyonelîzasyona birêvebirina gelemper, reforma birêvebirinên cihkî diparêze. Li gorî Partiya Dahatûyê hem ji bo bipêşketina demokrasîyê hem jî ji bo geşepêdana aboriyê hewcehî bi “birêvebirineke demokratîk a tam a gelemper û birêvebirina ji cih” heye. Li gorî partiyê “ji bo birêvebirineke navendî ya dewambar a bisihet û berdara cihkîbûyîneke çalak û birêvebirina ji cihî, ji pêwîstiyên acil ên Tirkiyeyê ne.” Ji ber vê yekê, divê “di çarçoveya demokratîk û ranêziyêke rasyonel de” îdareya gelemper were reformekirin û birêvebirinên cihkî bîn xurtkirin (Gelecek Partisi 2019, 51–53).

Partiya Demokrasî û Pêşveçûnê⁴⁰ (*Demokrasi ve Atılım Partisi* - DEVA Partisi) ku di bin rêberiya Alî Babacan de hat damezrandin jî bi argumanên demokrasî û rasyonelîzasyona birêvebirinên gelemper dide diyarkirin ku divê birêvebirinên cihkî bîn hêzdarkirin. Li gorî Partiya DEVA’yê “ji bo ku çavkanî li cihê xwe û bi awayê berdara û çalak bîn bikaranîn, temsîla demokratîk bê bipêşxistin û cihgirkirina çanda demokratîk, xurtkirina birêvebirinên cihkî mecbûrîtiyek e. Ji bo hêzdarkirina

⁴⁰ Nota wergêr: Ev nav ji hêla partiyê bi xwe ve wek navê kurdî/kurmançî tê bikaranîn, loma me ji wisan ew tercîh kir. Lê bi ya me li şûna “atılma” tirkî ya di navê partiyê de divê “bipêşketin” be, Ji ber ku “bipêşveçûn”, çûna ber bi pêş de ye, lê “bipêşketin” hewla geşepêdanê li xwe digire ku tê wateya hemle û atakê jî.

îstiqrara aborî û siyasî ya welatê me, divê ku di warê birêvebirinên cihkî de gavên rast bên avêtin” (DEVA Partisi 2020, 30).

Nenavendîtî: Ji Aştiya Kurdî Zêdetir

Di heqê mijara parkirina hêza siyasî û nenavendîtîyê de, gava hem kontekstên nîqaşan û referansên dîrokî hem jî asteng û derfet, çavkanî û firsend ku li jorê hatin xulasekirin, bi hev re li dest bên hildan û nirxandin, gelo li Tirkiyeyê vebijêrkên mihtemel dibê ku çi bin? Wexta rewşa heyî li pêş çav bê girtin, du vebijêrkên sereke dixuyin: (1) Di asta bajêr de nenavendîtîya îdarî û (2) di asta herêmî de nenavendîtîya îdarî û siyasî. Vebijêrka yekem dikare lihevxiştina kurdî bi dawî bîne. Lê tevî vê yeka hanê, ji bo ku ji kêşeyê re çareseriyêke giştgir û mayînde bê dîtin, vebijêrka duyem wek tercîheke hîn rasyonel derdikeve pêş.

Ji bo bidawîhatina lihevxiştina kurdî nenavendîtîya îdarî

Nenavendîtîyê îdarî ya ku raye û berpirsiyên wê bên zêdekirin û di asta bajêr de birêvebirinên cihkî yên ku ji aliyê îdarî û darayî ve bên xurtkirin, dibê ku di maweyêke kurt û navîn de lihevxiştina kurdî bi dawî bîne û kêşeya tundiya di meseleya kurdî de çareser bike.

Di rewşa heyî de li ser mijara nenavendîtîyê mitabeqateke siyasî hatiye dabînkirin. AK Partî çendî bi Sistema Birêvebirina Serokkomariyê re berhêlî konsolidasyona otorîter bûbe jî, lê di berdewamiya dîroka Komarê de ya ku li salên 2000'î pêşengî li teşebusên herî giring ên ji bo reformên birêvebirina gelemper kir, ew e. Li hêla din, îroj temamiya hemû partiyên mixalîf ên sereke, bi sedemên demokrasî û rasyonelîzasyona îdareya gelemper der barê mijara xurtkirina birêvebirinên cihkî de, mitabiq xuya dikin.

Li qada kurdî jî dikare ji lihevkişîna wiha bê behskirin. Di nav partiyên kurdî de wek cihkîbûyîn, xweserî û federasyon di serî de sê meylên sereke xuya dibin. Kurdên ku ji aliyê AK Partiyê ve mobilîze dibin, bi rêjeyêke mezin destek didin cihkîbûyînê. Li hêla din, partiya kurdî ya sereke HDP jî nenavendîtîyê heta bi herêmeke xweser a Kurdistanê ya biyekkirî xweserîya demokratîk a ku ji hev cuda û ji şiroveyan re vekirî ye, diparêze. Partiyên kurdî ku bi salên 2000'î re hatine avakirin, bi piranî federasyonê diparêzin û bi hejmareke sînordar partî jî alîgirên serxwebûnê ne. Ew ên ku Kurdistanê xweser, federe yan jî serbixwe diparêzin, çendî îdareyêke nenavendî ya di asta cihkî de wek çareserîya nihayî nebînin jî, lê destek didinê.

Der barê vê mijarê de wek a dawî divê cih ji helwesta Ocalan û KCK'yê re, ya

eleqedarî mijarê, were dayîn. Gava helwesta Ocalan a piştî 1999'an û pêşniyazên ku ji bo çareseriyê pêşkêş kirine, ku tesîra wî li ser HDP û KCK'yê heye, bi tevahî bîn nirxandin; dikare bê gotin ku nenavendîtî dikare çekberdana KCK'yê û xalîkirina ji şidetê ya meseleya kurdî temîn bike. Ocalan ku ji sala 1999'an bi vir de pêşniyazên çareseriyê yên li dora konseptên "komara demokratîk", "xweserîya demokratîk" û "demokrasiya cihkî" de pêşkêş kirine û dîsan herî dawî di wexta Pêvajoya Çareseriyê de ew mitebeqata devkî ya ku li mijara xurtkirina birêvebirinên cihkî pêk hatibû û teşebusên amadehiyên têkildarî verastkirinên qanûnî, vê yekê teyîd dikin.

Dikare bê gotin ku helwesta KCK'yê hîn bêhtir ne diyar e. Di pêvajoya sê diyalogên mezin ên di navbera salên 1999-2015'an de, li gorî qiyasa li Ocalan, KCK'yê der barê mijara daxwazên siyasî de ranêziyeke hîn maksîmalîst nîşan da. Tevî vê yekê jî, bi awayekî esasî pêşniyazên Ocalan qebûl kirin. Di vê nuqteyê de dikare bê gotin ku eger pêvajoya diyalog û mizakereyê ya ku ne fermî be jî, bi awayekî fiêlî naskirina Rojava li xwe bigire dikare KCK'yê bi bedêla nenavendîtîya îdarî îqna bike ku li Tirkiyeyê dev ji çekan berde. Çarçoveyeke wiha qet nebe di qada civakî de dikare memnûniyeke şayanî dîqetê çêke û zorê bide KCK'yê ku xwe ji çekan bike.

Raye, berpîrsî û çavkaniyên nû yên ku nenavendîtîya îdarî ji birêvebirinên cihkî re temîn bike, mijareke giring a nîqaşê ye. Der barê vê mijarê de pêwîstî bi nîqaş û mizakereyên biteferuat heye. Di gel vê, perwerdehiya bi zimanê dayikê û ji birêvebirinên cihkî re hiştina rayeyên ku îmkân dide tevî tirkî xizmetên gelemper bi kurdî jî bîn kirin, ji bo bidawîanîna şidetê ya der barê meseleya kurdî de xwedî giringiyeke krîtîk e. Ji lew re îroj hem partiyên kurdî yên xwedî xetên cuda yên siyasî hem jî piraniya zêde ya civaka kurdî ku der barê wê de mitabîq bûne, hema bibêje daxwaza yekane meseleya zimanê dayikê ye (Ağirdır 2020, 304). Naskirina mafê perwerdehiya bi zimanê dayikê û kirina xizmetên gelemper a pîrzimanî dikare di asta bajêr de bi nenavendîtîyeke îdarî bê çareserkirin.

Ji bo çareseriyê seqamgir û giştgir herêmên/wilayetên xweser

Nenavendîtîya di asta bajêr de, dibe ku der barê meseleya kurdî de dawî li şidetê bîne. Li hêla din, ji bo ku dawî li lihevexistina terîtoriyal a li ser bingeha nasnameyî bîne, wekî meseleya kurdî, ku raboriyêke wê ya du sed salî heye û wêraniyên mezin li dû xwe hiştine, bigihîje çareseriyêke mayînde û giştgir, hewce bi nenavendîtîyeke îdarî û siyasî ya herêmî heye da ku bikare parkirina hêza siyasî mimkin bike. Modela dewleta herêmî ya li Spanya û Îtalyayê, ji vî aliyê ve ji bo çareserkirina kêşeya kurdî wek referansên bingehîn dikare bê nirxandin. Çareseriyêke wiha dibe ku piştî nenavendîtîyeke îdarî ya li çapana bajêr, bi pêş bikeve. Tevî vê yeka hanê,

nenavendîtiya herêmî ya mîna li Spanyayê, dibe ku wekî pêkhateyeke damezirîner a derbasbûna li demokrasîyê jî pêk were.

Eger têgih û referansê dîrokî yên der barê nenasvendîtiyê de li pêş çav bîn girtin, nenasvendîtiyeke îdarî û siyasî ya herêmî ku xwe dispêre yekeyên cografî dê ji bo kêşeya kurdî çareserîyeke seqamgir û giştgir pêşkêş bike. Ji bo vê mijarê herî hindik binê çar argumanên sereke dikare bîn xêzkirin. A ewilî, nenasvendîtiya herêmî ku dê ji aliyekî ve daxwazên kurdan ên nasname û beşdarîkirina li jiyana siyasî pêşwazî bike li aliyê din jî dê endîşeya beqaya dîrokî ya siyaseta tirkî ya serdest û dewletê ji holê rake. Di avaniyeke îdarî û siyasî de ku raye û berpirsiyên wekî qadên perwerdehî, tenduristî, çand, veguhastin, aborî û jîngehê ji birêvebirinê herêmî re hatine hiştin, dê kurd ji aliyekî ve nasnameyên xwe yên zimanî û çandî bihêvişînin û li nîfşên dahatûyê veguhêzînin, li aliyê din jî dê bigihîjin derfetên ku bi wan bikarin jiyana xwe ya sosyo-ekonomîk biserûber û sererast bikin. Bi ser de, ji Kurdistaneke biyekkirî bêhtir, parkirineke îdarî û siyasî ya li ser bingeha yekeyên cografî dê endîşeya beqaya dîrokî ya siyaseta Tirkiyeyê û ya dewletê ji holê hilîne. Di bîst salên dawî de ew rûdan û qewamên ku li Iraq û Sûriyeyê qewimîne, loma kir ku endîşeya beqayê zêdetir bike, ku ev rewş nabe bê piştguhkirin. Ji lew re, ji vî aliyê ve divê pêşniyazên çareserîyê ve endîşeyê li pêş çav bigire û wê ji holê rake. Di rewşeke wisan de ku KCK ji çek hatiye kirin û meseleya tundiyê jî bi tevahî ji holê hatiye hilanîn, dibe ku ev endîşe kêmbibe.

A duyem, ji herêmeke kurd/Kurdistaneke ya biyekkirî bêhtir, modeleke birêvebirina herêmî ya ku ji çend herêman pêk tê, ji bo kevneşopîya dîrokî pirtir guncan e. Di serdema osmaniyan de cudahiyên di navbera kurdan de yên zimanî, mezhebî/dînî, aborî û cografîk, bûn sedem ku kurd birêvebirinê parçeyî ava bikin. Ev cudahiyên hanê, îroj ne bi tenê li nav kurdên li Tirkiyeyê, di heman demê de li nav kurdên li Iraq, Sûriye û Îranê jî bi awayekî xurt didomin. Di nav siyasatên kurdî yên neteweperwer ên serwer de, çendî rabêjiya ku Kurdistan hatiye parçekirin bi awayekî xurt bê qebûlkirin jî, tê dîtin ku ew berê wek avaniyeke siyasî ji Kurdistaneke biyekbûyî bêhtir xwedî îdareyên parçeyî bûye. Tecrubeya raboriyê, îroj jî bandora xwe ya li ser binyata civakî dewam dike. Wek navendên (mihraqên) sereke yên mekanî Wan, Bedlîs, Dêrsim, Colemêrg/Hekarî, Amed, Mêrdîn, Cizîr û Ruha ku hem ji aliyê cografî hem jî ji aliyê civakî û çandî ve cihêreng bûne, em îroj jî dikarin şopên tecrubeyên raboriyê li wan bişopînin ku ew ji bajarên sereke ne.

A sêyem, nenasvendîtiya herêmî dike ku li Tirkiyeyê meseleya verastkirina ji nû ve ya binyata siyasî û îdarî tevî kêşeya kurdî bi meseleyên siyasî, aborî û îdarî ku li giştîya welêt diqewimin eleqedar bike. Sînardarkirina parkirina hêza siyasî ya bi kêşeya kurdî yan jî ranêziyeke ku li vê meseleyê tê îracakirin, bi piranî kêşeyê dixwe nav hev kêşeya

windahî/qazancan an jî yên windakirî/qazanckirî ku ev jî xwedî rîskekê ye. Loma ev rewş jî nahêle ku kêşe bi awayekî giştgir û bi sikûnetê bê nîqaşkirin. Brevajiyê vê yekê, nenavendîtiya herêmî çareseriyê lihevxiştineke terîtoriyal a li ser bingeha nasnameyê ya mîna kêşeya kurdî, li tevahiya welêt herî hindik bi sê kêşeyên bingehîn re eleqedarbûnê çêdike. Ji van a pêşî demokratîkbûyîn, a duyem mezinbûyîna giştgir û terazdar û ya sêyem jî rasyonelîzasyon û modernîzasyona îdareya gelemper e. Loma ji vî aliyê ve ev modela mijara dabeşê derfeta çêkirina hev kêşeyêke giştgir û somdar pêşkêş dike. Gava li pêş çav bê girtin ku ji çaran sisêyê nifûsa Tirkîyeyê li sî bajarên mezin dijin û ev gurbûna hanê bi awayê paralelî meyla metropolbûyîna ya li dinyayê dê di salên pêş de zêde bibe, hem ji bo zêdekirina beşdariya li siyaseta hem ji bo çêkirina birêvebirina gelemper a hîn rasyonel hem jî ji bo bipêşketina sosyo-ekonomîk, ji çêkirina di asta bajarên de bêhtir hewce pê heye ku herêmên-bajarên metropolîten ên raserî bajarên bî çêkirin.

A dawî, nenavendîtiya herêmî ji bo kêşeya kurdî bi xwe jî çarçoveya çareseriyêke hîn giştgir pêşkêş dike. Li Tirkîyeyê, kêşeya kurdî heta îroj bi piranî li dor du teweriyên bingehîn li dest hatiye hildan û nîrxandin: Naskirina mafên nasname û kolektîf ên kurdan û bidawîbûna şidetê. Di gel vê, pêwîstî bi çareseriyêke giştgir a meseleya kurdî heye. Der barê vê mijarê de meseleya pêşî ya ku divê bal lê bê kişandin, newekheviya di navbera bajar û herêman de û dabeşbûna çavkaniyan e. Eger nenavendîtiya herêmî bi meseleya parkirina hêza îdarî û siyasî û bi meseleya mezinbûyîna giştgir a terazdar re bê têkildarkirin, wê gavê hem dê li ser newekheviyên sosyo-ekonomîk, xizaniya kûr û berbelav û dabeşbûna çavkaniyan ên tevahiya Tirkîyeyê hem jî yên di navbera herêm û bajarên kurdan de bê sekinandin û bi vî awayî jî ew dê bibe xwedî potansiyela hilberîna çareseriyê. Ew nîqaşên ku di çarçoveya kêşeya kurdî de tên kirin, gava li pêş çav tînin girtin ku bi piranî di wan de neyeksaniya sosyo-ekonomîk û dabeşbûna çavkaniyan tînin paşguhkirin, ev mijara hanê hîn bêhtir giring dibe.

Bi qasî rehenda sosyo-ekonomîk, ji aliyê rehenda siyasî û civakî ve jî nenavendîtiya herêmî ji bo kêşeya kurdî xwedî potansiyela pêşkêşkirina çareseriyêke giştgir e. Gava gelek meseleyên wekî naskirin û îfadekirina cudahiyên zimanî (kurmançî/kirmanckî) û dînî (elewî, sunî, êzdî) yên di nav kurdan de; li cografyaya Kurdistanê jî bilî kurdan naskirina grûpên din ên etnîk/neteweyî û kêmarên dînî û beşdariya van grûpên hanê li jiyana civakî û siyasî li pêş çav bê girtin, nenavendîtiya dê li cografyaya kurdan alîkarî li pluralîstbûna siyasî û civakî bike. Wek mînak, di sistemeke wiha ya îdarî û siyasî de, elewîtiya kurdî dê bikare li cografyaya Dêrsimê îmkana xwebirêxistinê û xwedêbirîna bi dest bixe û li bajarên mîna Mêrdîn û Sêrtê jî kurd, ereb û suryanî bikarin beşdarî li jiyana siyasî û civakî bikin û ji bo ku van yekan hildin bin garantiye jî, ew dê bikarin binyateke giştgir û pluralîst ava bikin.

Divê ku ne bi tenê nenaveditiyeke îdarî her wiha ya siyasî jî bê dabînkirin. Ji nenavendîtiya îdarî cihê li nenavendîtiya siyasî hêza qanûnsazî û darazê ya birêvebirinê cihê/herêmî jî heye (Keleş 2006, 22–23). Nenavendîtiya îdarî ku Fransa ji bo wê modeleke baş teşkil dike, di esasê xwe de ji bo ku îdareya gelemper rasyonelîze bike û xizmetên gelemper bi awayekî hîn berdar û çalak temîn bike, çarçoveyeke sînorkirî pêşkêş dike. Berevajiyê vê, di nenavendîtiya îdarî û siyasî de ku li Spanya û Îtalyayê nimûneyên wê yê çêtir tînin, tevî rasyonelîzasyona birêvebirina gelemper di warên mîna demokrasî, welatîti, beşdarî, pluralîzm, nasnameyên kolektîf, parkirina hêzê, mekanîzmayên teraz û pişkinanê, birêvebirina kanan/çavkaniyan û dabeşbûna wan de, bipêşketina norm û binyatên siyasî jî xwedî giringiyê ne (Çam 2015, 23; Keleş 2006, 89–105).

Der barê mijara raye û berpirsiyên birêvebirinê herêmî û çavkaniyên wan de dikare xebatên akademîk ên bikitekit bînin kirin û nimûne bînin vekolan û tiwêjandin.⁴¹ Tevî vê yekê hanê, divê bê notkirin ku ev mesele di esasê xwe de mijareke mizakereya siyasî ye. Her wiha li şûna verastkirineke sîmetrîk a ji bo hemû herêman, li gorî sertên taybetmendî her herêmekê wekî li Spanya û Îtalyayê modelên birêvebirinê yê cudabûyî dikare bînin bipêşxistin. Îroj modeleke îdarî ya ku ji bo herêma navenda wê Stenbol an jî Enqereyê ye, bê duristkirin û modela îdarî ya ji bo herêma ku navend Antalya, Edene-Mêrsîn an jî Wan e divê ji hev cuda bin. Ji lew re ev herêm ji gelek aliyên ve wekî demografîk, sosyo-ekonomîk, cografî û çandî cudahiyan giring ên hêjayî balkişanê li xwe vedihewînin. Di gel van hemû cudahiyan, divê bitûniya îdareyê jî li gorî palpiştiya prensîpa nenavendîyê were pêkanîn. Ji vî aliyê ve wek prensîpa giştî, warên mîna tîkiliyên derve, parastin (bergirî), edalet, maliye, xezîne, ticareta derve, xizmetên gumrikê ku hemû herêman eleqedar dike ji îdareya navendî re; warên mîna perwerdehî, tenduristî, aborî, veguhêzî, mirasa dîrokî û çandî, jîngeh û bajarbûyîn û hemû xizmetên gelemper ên mayî di çarçoveya prensîpa giştîyê de dikare ji birêvebirinê cihê/herêmî re bînin hiştin. Der barê vê yekê de wekî modelên Spanya û Îtalyayê, Makeqanûna 1921'ê jî dibe referansekê giring.

Bi qasî raye û berpirsiyên birêvebirinê herêmî, asta/pîvaneya wê jî giring e. Wekî ku di beşên borî de jî bal li mijarê hat kişandin, di birêvebirina gelemper de pîvaneyên cuda hene ku ji birêvebirinê herêmî re rajêriyê çêke. Si bajarên mezin, bîst û şeş herêmên SYHS'yê (Senifandina Yekeyên Herêma Statîstîkî) yê qedemeya duyem (herêma ajansa geşepêdanê), dozdeh herêmên SYHS'yê yê qedemeya yekem, pazdeh herêmên meteorolojîyê, hejdeh herêmên rêbehahiyê, bîst û şeş herêmên Karên Avê yê

⁴¹ Der barê vê mijarê de ji bo xebatên kirî yê bikitekit bnr.: (Benedikter 2009; Ackren 2009; Toksöz 2014; Gürer 2015)

Dewletê (DSÎ), ji wan in ku hema di serî de tîn hiş. Ev senifandinên herêmî dibe ku li pêş çav bîn girtin û pîvaneyeke nû bê çêkirin. Bi qanûna bajarê mezin re, ku di 2014'an de ket meriyetê, jixwe li sî bajarên mezin ku beşeke zêde ya nifûsê li wan dijî, îdareyên taybetî yên bajaran hatin fesxkirin. Ji vî aliyê ve birêvebirinên herêmî, di asta herêmî de li ser verastkirina ji nû ve ya birêvebirinên taybetî yên bajaran, dikare wek bajarên ku bi cureyekî hatine berfirehkirin bê sêwirandin. Tecrubeya sîstema wilayetan a osmaniyan jî dikare li pêş çav bê girtin û birêvebirinên nû yên herêman/wilayetan bîn çêkirin.

Der barê vê mijarê de xebatên akademîk ên şayanî dêhn û diqetê hene. Di bin binyeya Weqfa Etudên Ekonomîk û Civakî ya Tirkiyeyê (Türkiye Ekonomik ve Sosyal Etüdler Vakfı-TESEV) de, bi desteka heyeta şewirê ya berfireh xebata ku bi navê *Yeni Anayasada Yerel ve Bölgesel Yönetim için Öneriler* (Ji bo Makeqanûna Nû Pêşniyazên Li Ser Birêvebirina Cihkî û Herêmî) ji aliyê Oktay Uygun ve hatiye amadekirin û xebata bi navê *Türkiye'de Bölgesel Yönetim: Bir Model Önerisi* (Li Tirkiyeyê Birêvebirina Herêmî: Pêşniyaza Modelekê) ku ji aliyê Fikret Toksoz û Ferhan Gezici ve hatiye amadekirin (Toksöz & Gezici 2014) ji bo vî warê referansê giring in. Wek nimûne, Toksoz û Gezici çendî di xebata xwe ya bikitekit de pîvaneyeke berbiçav pêşniyaz nekin jî, lê krîterên di diyarkirina vê pêşniyazê de ku divê li pêş çav bê girtin bi awayekî biteferûat nîqaş dikin. Li gorî vê, divê krîterên jîngehê, krîterên civakî ku civariya dîrokî û civakî îfade dikin, krîterên finansî û maliyeta veguherîna û krîterên sazûmanî bi hev re bîn nixandî (Gezici 2014, 25–29).

Gava ku pîvaneyeke nû ya herêmî bê diyarkirin, divê herî kêrîkê pîvanedarkirinê cuda li pêş çav bîn girtin. Ev pîvanedarkirin ev in (Ji bo detayan bnr.: Veserr):

1. Cografya: Bîst û şeş hewzeyên çeman ên Tirkiyeyê
2. Nerîta dîrokî: Sîstema wilayetên osmanî
3. Fonksiyonîtî: Şazdeh herêmên fonksiyonî ku ji aliyê Rêxistina Plansaziya Dewletê ve hatine diyarkirin (1982)
4. Bipêşketina sosyo-ekonomîk: Senifandina Yekeyên Herêma Statîstîkî Ast 1 û Ast 2
5. Civariya Îdarî: Veavabûna herêmî ya saziyên gelemper û saziyên sektora taybetî
6. Metropolbûn: 30 Bajarên Mezin

Wekî ku Gezici binî xêz kiriye, ji bo ku herêm/wilayet bîn diyarkirin, divê ji aliyekî ve bi pisporan re xebat bîn kirin ji aliyê din ve jî divê beşdarî û rizaya civakî wek bîngehê wergirtin. Loma ji vî aliyê ve divê herêm/wilayet otorîteya navendî ya gelemper

bi desteka pisporan bi tena serê xwe û verastkirinan ji jor ve ber bi jêr ve neke, di gel vê divê li hemû bajaran birêvebirina cihkî bi beşdariya rêxistinên civaka sivil û welatîyan bê kirin. Birêvebirina herêman/wilayetan ji bo ku di warê demokrasî, bipêşketina sosyo-ekonomîk û di pêşkêşkirina xizmetên gelemper de bikare çalaktî û berdariyê zêde bike, divê veavabûna nû ji aliyê civakê ve were qebûl kirin. Ev jî dikare bi nîqaşeke civakî ya ji jêr ber bi jor ve û bi diyalog û mizakereyan çêbe.

Piştî nenavendîtiyê: Cihêbûn an jî avakirina dahatûya hevpar?

Dibe ku ji du aliyên cuda ve rexne li pêşniyaza nenavendîtiya herêmî ya îdarî û siyasî bê girtin. Li gorî nêrîna ku li siyaseta sereke ya tirkî serdest e, xweseriya cihkî yan jî ya herêmî dê ji siyaseta cudahîxwaz re zemîn amade bike û rê li ber Kurdistana serbixwe veke. Li aliyê din, li gorî siyaseta kurdî ya xeta neteweperwer, ku çareseriya kêşeya kurdî di federasyon an jî serbixwebûnêde dibîne, nenavendîtiya herêmî dikare wek gavê pêşî yê ber bi “çareseriya nihayî” ve bê nirxandin. Di gel vê yekê, li gorî vê xeta neteweperwer dê pêdivî û daxwazan neyîne cih û dê yekkeriya terîtoriyal a Kurdistanê hîn bêhtir parçe bike (Çiçek 2015, 211–40; Dönmez 2014).

Nenavendîtiya herêmî, béguman dibe ku rêya Kurdistana serbixwe salbend û xweş bike. Tevî vê, nenavendîtiyê dê bike ku kurd ji tirkan cihê bibin û heta bi kurdên Iraq, Îran û Sûriyeyê re bibin yek û Kurdistaneke serbixwe ava bikin an jî berê wan bide wê yekê ku dahatûyeke hevpar ava bikin, ev yek bi rewşa şekilgirtina têkiliyên kurd û tirkan ve girêdayî ye. Li vir meseleya hîmî ya ku divê li pêş çav bê girtin ev e: Siyaseta tirkî ya sedsalî der barê kêşeya kurdî de sernekeftî bû û bi awayekî zêde nema wek alternatîfekê bê dîtîn. Wekî ku encamên mêjûya du sedsalî ya meseleya kurdî dide nîşan, ev siyaseta ku bûye sedema qewimîna ziyan û zayıyatên mezin û wek normatîf jî divê ku li dijî bê sekinandin, di asta operasyonel de jî derbasdariya xwe bi rêjeyeke zêde ji dest da. Di dahatûya xuyabar de, du vebijêrk diyar dibin: (1) Ew têkiliya lihevexistîniya ku îroj didome, bi rûdanên ku di jeopolîtîka Kurdistanê de qewimîne, xerabûn û berdeambûna wê ya di nav krîzê de yan jî (2) avakirina dahatûyeke hevpar.

Nenavendîtiya herêmî, ji bo derketina ji qeyranê û avakirina dahatûya hevpar derfetekê dide. Wekî di nimûneya Spanya/Katalonyayê de, dibe ku ji aliyekê ve daxwaz û pêdiviyên cihkî û herêmî bi rêjeyeke zêde bînin bicihanîn û ji aliyê din ve jî li tevahiya welêt çêkirina rejîmeke demokratîk mimkin bibe. Ev modela hanê ku dê bi tevahî kêşeya kurdî ji şidetê xalî bike, béguman wekî çêkirina referandûma serxwebûnê ya li Katalonyayê, dibe ku bikeve ser rêjeyeke wiha jî. Di gel vê rewşê, eger bide ser şopeke wiha, wekî ku li Katalonyayê çêbû, berdeamkirina wê ya bi navgîn û

rêbazên siyasî, dê were temînkirin.

Nenavendîtiya herêmî, dibe ku yekkeriya/bitûniya terîtoryal a cografyaya Kurdistanê jî xera bike. Cudahiyên di navbera herêmên behsjêkirî de dibe ku bi qonaxa demê re kûrtir bibin. Dîsan reqabetên siyasî, çandî û aborî yên di navbera van herêman de, têkiliyên aborî, siyasî û civakî ku her yek ji herêman hem bi birêvebirina navendê re hem jî bi herêmên din ên Tirkiyeyê re deynin, dibe ku zêde bibin. Li hêla din, bi wesîteya herêmên ku dê bi grûpkirina bajaran çêbin, entegrasyona terîtoryal a mijara dabaşê jî dibe ku hîn zêdetir bibe. Ev hemû mijarên siyasî pêk tînin. Li vir meseleya hîmî ya xwedî giringiyê ew e ku bêyî ranêzikiyên cuda bîn nemeşrûkirin bikarin xwe derbibin û di qada siyasî de bîn nîqaşkin.

Li Şûna Encamê

Di vê lêkolînê de, di çarçoveya kêşeya kurdî de, li ser mijara aştiya siyasî û parkirina hêzê hat sekinandin. Di vê çarçoveyê de, li dora pirsên “gelo ji aliyê konteksta parkirina hêzê ve nenavendîtî dikare ji bo kêşeya kurdî ya Tirkîyeyê aştiya siyasî pêk bîne” û “nenavendîtî ji kêşeya kurdî wêdetir çi wehd dike”, derfet û sînorên nenavendîtîyê, Pêvajoya Çareseriyê û rewşa piştî wê ji xwe re kir navend û nîqaş li ser hatin kirin.

Gava di çarçoveya kêşeya kurdî de, pêvajoya avabûnê ya dîrokî û siyasî ya nêzikî du qirnî li pêş çav bê girtin, divê di warê parkirina hêzê û nenavendîtîyê de bal li pênc astengên sereke bê kişandin: (1) Rabêjiya beqayê ya ku li dewleta tirkî û li siyaseta sereke ya tirkî serdest e û endîşeya ewlehiya dîrokî, (2) nerîta dewlet û siyaseta zêde navendîparêz (3) newekheviya herêmî û navendîbûna/kombûna çavkaniyên aborî, (4) sîbera lihevxiştina kurdî ya li ser nenavendîtîyê û (5) sînorên siyaseta tirkî yê têkildarî kêşeya kurdî û amrazîkirina kêşeya kurdî.

Di gel vê, di warê nenavendîtîyê de pênc derfet û çavkaniyên sereke û sê firsendên hîmî hene. Derfet û çavkaniyên hîmî ev in: (1) Civariya dîrokî ya der barê nenavendîtîyê de, (2) ji aliyê îdareya gelemper ve, ew tecrubeya ku li ser birêvebirina cihkî û herêmî derketiye holê, (3) teşebusên reformên piştî 2000î yê eleqedarî birêvebirina cihkî û herêmî, (4) der barê xurtkirina birêvebirinên cihkî de mitebeqata li nav partiyên siyasî yê rewteka sereke û (5) nexşeya siyasî ya Tirkîyeyê. Firsendên hîmî yê ku nenavendîtî dikare dabîn bike jî ev in: (1) Mezinbûyîna giştîgir û terazdar, (2) bi modernîzasyon û rasyonelîzasyona îdareya gelemper re di xizmetên gelemper de zêdekirina çalaktî û berhemdariyê û (3) di mistewiya tîkane de bi pêkanîna hêzeke teraz û pişkinanê, xurtkirina demokrasîyê.


Gava ev asteng û derfet, çavkanî û firsendên hanê, bîr nîrxandin, dikare bê gotin ku du vebijêrk derdikevin pêş: (1) Di asta bajêr de nenavendîtîya îdarî û (2) nenavendîtîya îdarî û siyasî ya li ser bingeha herêmên cografîk. Vebijêrka pêşî, ji bo maweya demkurt xwedî wê potansiyelê ye ku dikare der barê meseleya kurdî de devê rûpela tundûtûjiyê bigire. Di gel vê, ji bo çareseriyê giştîgir û seqamgir, vebijêrka diduyan ku dikare îmkana bide parkirina hêza siyasî, wek terciheke hîn rasyoneltir derdikeve pêş. Her wiha vebijêrka duyem, eger ew bi demokratîkbûyîn, giştîgirî û mezinbûyîna mekanî ya terazdar û modernîzasyona îdareya gelemper ve bê eleqedarîkirin, ji bo çareserîya lihevxiştineke terîtoryal a li ser bingeha nasnameyê ya rajêr-dewletê, wekî kêşeya kurdî, modeleke somdar û giştîgir pêşkêş dike.

Kêşeya kurdî û lihevixistinên ji ber wê, li Tirkîyeyê heta îroj di pêkhatina otorîteriya warê siyasî de û newekheviya di warê aborî de, têra xwe bû xwedî fonksiyona çavkaniyeke bikarbar. Ji vî aliyê ve parkirina hêzê û nenavendîtî ne bi tenê ji bo çareserîya kêşeya kurdî û pêkanîn aştîya siyasî di heman demê de li Tirkîyeyê ji bo veguherîna bi tevahî ya warê sosyo-polîtîk û sosyo-ekonomîk jî xwedî giringiyê ye. Gava li pêş çav bê girtin ku der barê mijarê de ranêzîkîyên ku ji hev cuda dibin/ li hev dixin hene, loma hewcehî pê heye ku nîqaşeke giştgir bi beşdarîkirina grûpên cuda yên civakî bê dewamkirin. Loma ji bo ku ji hemû aliyan ve li ser meseleyê bê sekinandin û eleqedarî mijarê lihevkirineke civakî bê çêkirin, dê pêwîstî bi pêvajoyeke nîqaşê hebe, ku fikir û ranêzîkîyên cuda bêyî tê de bîn nemeşrûkirin, bikarin xwe îfade bikin.

VESER: Pîvaneyên ku Di Warê Diyar kirina Yekeyên Birêvebirinê Herêmî de Dikarin Bê Bikaranîn


VESER 1. Cografya û Jîngêh: 26 Hewzeyên Çeman ên Tirkiyeyê

26 Hewzeyên Çeman



Çavkanî: (Efe û Aydın 2009)

Pêşniyaza Sînorên bajêr a li gorî 26 hewzeyên çeman



Çavkanî: (Efe û Aydın 2009)

VESER 2. Nerîta Dîrokî: Sîstema Wîlayetan a Osmanî**Berawirdkirina li hev a wilayet û Senceqên osmanî û sînoren bajaran**


Împaratoriya Osmanî		Komara Tirkiyeyê			
Wilayet	Senceq	Rewşa îroj	Guherîna Sînoran		
			% 50+	%5 0-25	% 25-
Aydin	Îzmîr	Bajar			+
	Manîsa	Bajar			+
	Aydin	Bajar			+
	Denîzli	Bajar		+	
	Mûxla	Bajar			+
	Midilli	Derî sînor			
Konya	Qonya	Bajar			
	Antalya	Bajar			
	Bûrdûr	Bajar			
	Hamîd	Bajar (Îsparta)			
	Nixde	Îl			
Hudawendîgar	Brûsa	Bajar (Bursa)			+
	Karesî	Bajar (Balikesîr)			+
	Bilecik	Bajar		+	
	Kutahya	Bajar		+	
	Qerehîsar	Bajar (Afyon)		+	
Îzmît	Îstanbul	Bajar			+
	Îzmît	Bajar		+	
Edime	Edirne	Bajar	+		
	Kirkkilîse	Bajar (Kirklareli)			+
	Tekfûrdaxi	Bajar (Tekirdax)			+
	Dedeaxaç	Derî sînor			
	Gumulcene	Derî sînor			
	Gelibolu	Bajarok (Çeneqe)			
Bîga	Bîga	Bajarok (Çeneqel)			
Ankara	Enqere	Bajar		+	
	Qirşehrî	Bajar (Qirşehîr)		+	
	Yozxat	Bajar		+	
	Qeyseriye	Bajar (Qeyserî)	+		
Trabzon	Trabzon	Bajar	+		
	Samsûn	Bajar		+	
	Gumuşxane	Bajar		+	
	Rîze	Bajar			+
Erzirom	Erzirom	Bajar		+	
	Erzingan	Bajar		+	
	Beyazid	Bajarok –Bazîd (Agirî)			

Împaratoriya Osmanî		Komara Tirkiyeyê			
Wilayet	Senceq	Rewşa Îroj	Guherîna Sınoran		
			% 50+	%5 0-25	% 25-
Bedlîs	Bedlîs	Bajar		+	
	Mûş	Bajar			+
	Sêrt	Îl		+	
	Çepexçûr	Bajar (Bîngol)	+		
Diyarê Bekir	Diyarê Bekir	Bajar (Diyarbekir)		+	
	Erxenî	Bajarok (Diyarbekir)			
	Mêrdîn	Bajar		+	
M. Ezîz	Xarpêt	Bajar (Elezîz)			
	Meletî	Bajar	+		
	Xozat	Bajarok (Tünceli/Dêrsim)			+
Sêwaz	Sêwaz	Bajar			+
	Amasya	Bajar		+	
	Toqat	Bajar			+
	Qerehîsara Şerqî	Bajarok - Şebînqerehîsar (Gîresûn)			
Edene	Edene	Bajar	+		
	Silîfke	Bajarok (Mêrsîn)			
	Cebelî	-			
	Bereket	-			
	Sîs	-			
Heleb	Heleb	Derî sînor			
	Urfâ	Bajar		+	
	Mereş	Bajar (Qehremanmereş)			+
Wan	Van	Bajar		+	
	Colemêrg	Bajar (Hakarî)	+		
Qestemonî	Qestemonî	Bajar (Qestemonû)		+	
	Bolû	Bajar	+		
	Sînop	Bajar			+
	Kengîrî	Bajar (Çanqirî)			+

Çavkanî: Mercan Efe û Burcu Silaydın Aydın, "İdari Sınırlara Dayalı Planlamanın Değiştirilebilirliği ve Havza Temelli İl Sınırları Önerisi", *Ege Coğrafya Dergisi* 18, hejmar 1-2 (2009): 73-84, r. 80.

VESER 3. Fonksiyonî: Herêmên Fonksiyonî

16 herêmên fonksiyonî ku ji aliyê Rêxistina Plansaziya Dewletê ve hatine diyarkirin (1982)



Çavkanî: Yurttaşlık Derneği, "Bölgesel İdare ve Yerel Demokrasi", Yurttaşlık Derneği, 2016, <https://yereldemokrasi.net/bolgesel-idare-ve-yerel-demokrasi>, dema gihanê: 15.02.2021.


VESER 4. Bipêşketina Sosyo-ekonomîk: Senifandina Yekeyên Herêma Statîstîkî

12 Herêmên Statîstîkî yê Asta Yekem



Çavkanî: Türkiye'nin İşlevsel Bölgeleri - Coğrafyacı (cografyaci.gen.tr), dema gihanê: 15.12.2020.


26 Herêmên Statîstîkî yê Asta Duyem û Ajansên Geşepêdanê yê Avakirî



Çavkanî: Türkiye Kalkınma Ajansları İndeksi (wowturkey.com), dema gihanê: 15.12.2020.

VESER 5. Civariya Îdari: Veavabûna Herêmî ya Saziyên Gelemer û Sektora Taybetî

Bajarên ku navendên herêmî yên saziyên gelemer û sektora taybetî yên cuda li wan gur bûne




Çavkanî: Ferhan Gezici, "Bölüm 2: Bölge Sınırlarının Saptanmasında Yararlanılacak Ölçütler", ji nav *Türkiyede Bölgesel Yönetim: Bir Model Önerisi*, ed. Fikret Toksöz û Ferhan Gezici (İstanbul: TESEV Yayınları, 2014), 25–29, https://www.tesev.org.tr/wp-content/uploads/rapor_Turkiyede_Bolgesel_Yonetim_Bir_Model_Onerisi.pdf, r. 25.

Not: Mezinahiya nuqteyan bi hejmara rêxistinên herêmî yên saziyên gelemer û sektora taybetî re rêjedar e.

VESER 6. Metropolbûn: 30 Bajarên Mezin

30 bajarên mezin ên Tirkîyeyê



Çavkanî: Yurttaşlık Derneği, "Bölgesel İdare ve Yerel Demokrasi", Yurttaşlık Derneği, 2016, <https://yereldemokrasi.net/bolgesel-idare-ve-yerel-demokrasi>, dema gihanê: 15.02.2021.

Çavkanî

- “1971-1980 Arasında Kürt Sorunu”. 1988. Ji nav Sosyalizm ve Toplumsal Mücadeleler Ansiklopedisi, 2304–23. İletişim Yayınları.
- Acar, Salih, Leyla Bilen Kazancık, Mustafa Caner Meydan & Mustafa Işık. 2019. İllerin ve Bölgelerin Sosyo-Ekonomik Gelişmişlik Sıralaması Araştırması SEGE-2017. Ankara: Kalkınma Ajansları Genel Müdürlüğü.
- Ackren, Maria. 2009. Conditions for Different Autonomy Regimes in the World. Turku: Abo Akademi University Press.
- Adalet ve Kalkınma Partisi. 2011. Türkiye Hazır Hedef 2023: 12 Haziran 2011 Genel Seçimleri Seçim Beyannamesi. Ankara: Adalet ve Kalkınma Partisi. <https://www.akparti.org.tr/media/318778/12-haziran-2011-genel-secimleri-secim-beyannamesi-1.pdf>.
- Ağırdır, Bekir. 2020. Hikayesini Arayan Gelecek. İstanbul: Doğan Kitap.
- Agos Gazetesi. 2015. “KCK: Hükümet sorumluluklarını yerine getirirse biz de getireceğiz”. Agos Gazetesi. 01. 03. 2015. <http://www.agos.com.tr/tr/yazi/10726/kck-hukümet-sorumluluklarini-yerine-getirirse-biz-de-getirecegiz>.
- Akkaya, Ahmet H. & Joost Jongerden. 2011. “The PKK in the 2000s: Continuity through breaks?” Ji nav Nationalisms and Politics in Turkey: Political Islam, Kemalism and the Kurdish Issue, editör Marlies Casier & Joost Jongerden, 143–62. London: Routledge.
- . 2012. “Reassembling the Political: The PKK and the Project of Radical Democracy”. European Journal of Turkish Studies (Online), hejmar 14. <http://ejts.revues.org/4615>.
- . 2014. “Confederalism and autonomy in Turkey: The Kurdistan Workers’ Party and the reinvention of democracy”. Ji nav The Kurdish Question in Turkey: New perspectives on violence, representation, and reconciliation, editör Cengiz Gunes û Welat Zeydanlıoğlu, 186–204. London & New York: Routledge.
- Aktar, Cengiz. 2014. Ademimerkeziyet Elkitabı. İstanbul: İletişim Yayınları.
- Aktoprak, Elçin. 2015. “Katalonya’dan Yükselen Bağımsızlık Rüzgârı”. Demokrasi Barış ve Alternatif Politikalar Araştırma Merkezi - demos. 12. 11. 2015. <https://demos.org.tr/katalonyadan-yukselen-bagimsizlik-ruzgari>.
- Altıok, Zeynep. 2018. “OHAL Bilançosu: Hak İhlalleri Raporu”. Ankara. <https://content.chp.org.tr/file/24857.pdf>.
- Altun, Fahrettin. 2017. “KAOS Referandumu: Bu Maceranın Kazanani Olmaz”. Kriter, Hejmar 17. <https://kriterdergi.com/cerceve/kaos-referandumu-bu-maceranin-kazanani-olmaz>.

- Amerikanın Sesi (VOA). 2015. "Karayılan'dan 'Özgür Kürdistan' İddiası". Amerikanın Sesi (VOA). 26. 09. 2015. <https://www.amerikaninsesi.com/a/karayilan-dan-ozgur-kurdistan-iddiasi/2980472.html>.
- Anadolu Ajansı. 2014. "Yerel yönetime özerklik şartını getireceğim". Anadolu Ajansı. 05 09. 2014. <https://www.aa.com.tr/tr/politika/yerel-yonetime-ozerklik-sartini-getirecegim/124910>.
- . 2017. "Başbakan Yıldırım: Referandum ülkemiz için bir ulusal güvenlik meselesidir". Anadolu Ajansı. 16.09.2017. <https://www.aa.com.tr/tr/gunun-basliklari/basbakan-yildirim-referandum-ulkemiz-icin-bir-ulusal-guvenlik-meselesidir/912139>.
- Appleby, Paul H. 1945. *Big Democracy*. New York: Alfred E. Knopf.
- Arıkboğa, Erbay. 2020. "Türkiyede Yerel Yönetimlerin Temel Çerçevesi". İstanbul.
- Armstrong, David. 1998. "Globalization and the Social State". *Review of International Studies* 24 (4): 461–78.
- Aspinall, Edward. 2005. *The Helsinki Agreement: A More Promising Basis for Peace in Aceh?* Washington, DC: East-West Center Washington.
- Astleithner, Florentina ve Alexander Hamedinger. 2003. "Urban Sustainability as a New Form of Governance: Obstacle and Potentials in the Case of Vienna". *Innovation* 16 (1): 51–75.
- Ataay, Faruk. 2006. *Neoliberalizm ve Devletin Yeniden Yapılandırılması: Türkiye'de Kamu Reformu Üzerine İncelemeler*. Ankara: De Ki Yayınları.
- Atatürk'ün Bütün Eserleri Cilt 14. 2004. İstanbul: Kaynak Yayınları.
- Aydın, Yaşar. 2017. "Referandum Kürtleri böldü". *Birgün*, 29. 08. 2017. <https://www.birgun.net/haber/referandum-kurtleri-boldu-176965>.
- Bafoil, François. 2006. *Europe centrale et orientale: Mondialisation, Europeanisation et changement social*. Paris: Presses de SidencesPo.
- . 2009a. *Central and Eastern Europe: Europeanization and Social Change*. New York: Palgrave Macmillan.
- . 2009b. "Polonya'da Bölgeselleşme ve Ademi Merkezileşme: Karşılaştırmalı Perspektiften Bir Avrupalılaştırma Süreci". *Ji nav Bölgesel Kalkınma ve Avrupa Birliği: Karabük, Valenciennes ve Katowice'nin Karşılaştırmalı Analizi*, editör François Bafoil & Ayhan Kaya, 70–84. İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları.
- Bafoil, François & Ayhan Kaya. 2009. "Karşılaştırmalı Perspektiften Bölgeselleşme Süreçleri, Endüstriyel Yeniden Yapılanma ve Kentsel Yenilenme: Türkiye, Fransa ve Polonya". *Ji nav Bölgesel Kalkınma ve Avrupa Birliği: Karabük, Valenciennes ve Katowice'nin Karşılaştırmalı Analizi*, editör François Bafoil & Ayhan Kaya, 1–13. İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları.
- Barber, Benjamin. 1995. *Güçlü Demokrasi: Yeni Bir Çağ İçin Katılımcı Siyaset*. İstanbul: Ayrıntı Yayınları.

- Barkey, Henri J. & Graham Fuller. 1998. *Turkey's Kurdish Question*. New York: Rowman & Littlefield Publisher.
- Bates, Robert H. 2001. "Ethnicity, Capital Formation, and Conflict". 27A. Cambridge.
- Bayramoğlu, Ali. 2015. "Çözüm Süreci: Siyasetten Silaha". Londra.
- BBC News. 2017. "Catalonia independence: Rajoy dissolves Catalan parliament". BBC News. 28. 10. 2017. <https://www.bbc.com/news/world-europe-41783289>.
- . 2018. "Catalonia profile - Timeline". BBC News. 14. 05. 2018. <https://www.bbc.com/news/world-europe-20345073>.
- BBC News Türkçe. 2014. "CANLI: Suriye-Irak tezkeresi TBMM'de kabul edildi". BBC News Türkçe. 02. 10. 2014. https://www.bbc.com/turkce/haberler/2014/10/141002_tezkere_canli.
- . 2016. "Suriyeli Kürtler federasyon ilan etti, Şam 'tanımıyoruz' dedi". BBC News Türkçe. 17. 03. 016. https://www.bbc.com/turkce/haberler/2016/03/160317_suriye_federasyon.
- . 2017a. "İraklı Kürtlerin bağımsızlık referandumu: Hangi ülke destekliyor, kim karşı çıkıyor?" BBC News Türkçe. 27 09. 2017. <https://www.bbc.com/turkce/haberler-dunya-41414173>.
- . 2017b. "Türkiye Kürdistan Demokrat Partisi Sözcüsü Amedi: AKP'nin birçok Kürt teşkilatı KDP'li, böyle giderse koparlar". BBC News Türkçe. 29. 09. 2017. <https://www.bbc.com/turkce/haberler-turkiye-41440457>.
- Benedikter, Thomas. 2009. *The World's Modern Autonomy Systems: Concepts and Experiences of Regional Territorial Autonomy*. Bolzano/Bozen: EURAC Research - Institute of Minority Rights.
- Benz, Arthur. 2007. "Comments on François Bafail's contribution". Ji nav *La citoyenneté démocratique dans l'Europe des Vingt-sept*, editör Christian Lequesne ve Monika MacDonagh-Pajerova, L'Harmatta, 251–56. Paris.
- Benz, Arthur & Yannis Papadopoulos. 2006. "Introduction: governance and democracy: concepts and key issues". Ji nav *Governance and Democracy: Comparing national, European and international experiences*, editör Arthur Benz & Yannis Papadopoulos, 1–26. London & New York: Routledge.
- BertelsmannStiftung. 2020. "Political Transformation". Bertelsmann Transformation Index. 2020. <https://www.bti-project.org/en/index/political-transformation.html>.
- Beşikçi, İsmail. 1992. *Devletlerarası Sömürge Kürdistan*. Yurt Kitap. İstanbul.
- Bianet Bağımsız İletişim Ağı. 2007. "DTP Kongresi Sonuç Bildirgesinin Tam Metni". Bianet Bağımsız İletişim Ağı. 31. 07. 2007. <https://bianet.org/bianet/siyaset/102616-dtp-kongresi-so-nuc-bildirgesinin-tam-metni>.
